# HEQÎQET Û AZADÎ

**JI WEŞANÊN KOMÎTEYA ZANIST Û LÊKOLÎNÊN CIVAKÎ**

HEQÎQET Û AZADÎ
JI WEŞANÊN KOMÎTEYA ZANIST Û LÊKOLÎNÊN CIVAKÎ

# ÇAPA WÊ 2018

**www.civakademokratik.com/kurd/**
**civaka.dimokrat@gmail.com**

Akademiyên Civaka Demokratîk
أكاديميات المجتمع الديمقراطي

**M. SAÎT UÇLU**

**LÊKOLÎN-LÊHÛRBÛN**

M. Saît Uçlu: sala 1956 li Riha- Cirnê Reş ji dayîk bû. Dibistana seretayî û navîn li Cirnê Reş, dibistana amadeyî li Dîlokê bi dawi kir. Sala 1980 li zanîngeha Ege fakûlteya aborî qedand. 9' ê Adara 1981' ê dema ku di nav xebatên şoreşgerî de bû hat girtin û ew xistin zindana Amedê ya leşgerî. Di 1986' an de bi doza ku tê dadgehkirin cezaya darvekirinê lê hat birîn. Di Cotmeha 88'an de jî ji ber tunela li zindanê de derket holê ji zindana Amedê surgûnê zindana taybet ya Eskîşehirê hat kirin. Di Tebaxa 1989' an de dîsa ji ber ku tunela eşkere bûyî, di zindana Eskişehirê de berxwedana Tirmeh- Tebaxê ya ku di raya giştî de weke "surgûna bi xwîn" tê binavkirin, ji zindana Eskîşehirê jî ew surgûnê zindana Aydinê kirin. Di cotmeha 91' an de vê care jî ji zindana Aydinê surgûnê zindana taybet ya li Eskîşehirê ku bi navê tabûtgeha mirinê tê zanîn hat kirin. Di mijdara 91' an de ji Eskîşehirê rêkirin zindana Aydin a tîpa E. Di sala 1998' an de ji Aydinê wî rêdikin zindana Umraniye tipa E ya Stenbolê. Di 9' ê Adara 2001'a de ji zindanê derket. Lêgerîna xwe ya demokrasiyê, azadî û heqîqetê berdewam kir. Di 19' ê Adara 2004' an de ji ber fikrê xwe dîsa hat binçavkirin, piştre ew girtin û rêkirin zindana Semsûrê ya tîpa E. Ji Semsûrê ber bi zindana Tekîrdax a tîpa F hat sirgûnkirin. Di Îlona 2004' de ji doza ku tê dadgeh Kirin Serb hat berdan.

Weke nivîskarekî gelek nivîsên wî ên li ser siyaset, dîrok, aborî, wêje û huner di gelek rojname û kovaran de hatine weşandin.

**PÊŞKÊŞÎ:**

"Kesê ku siberojê nizane dibêje qey îro bê hempa ye"

raborî, îro û siberoj, diyalektîka bi heve ye. Bê ku duh hebe îro, bê îro jî sibê nabe. Kesê ku raboriyê nizane, nikare rojaneyê jî bizane. ji ber ku bê hebûna raboriyê rojaneyî jî nikare çê bibe. Bê rojane siberoj nayê hunandin.

Sermayedarî di bîra civakan de xwe weke "şaristaniya bêhempa" ya heta roja îro hatiye, bi cih dike. Ji bo bikaribe vê yekê bi ser bixe hewldide raboriya civakê tune bike û bide jibîrkirin .

Halbûkî raborî koka merova ye. Serdema dergûşê ye. Çîroka merovbûna merova ye. Bê ku raborî were zanîn rojaneyî rast nayê tehlîlkirin û siberoj rast nayê hunandin.

Sermayedarî hemû şaristanî û "bêhempayan" bi xwe re dide destpêkirin. Her tiştî dike malê xwe. Gelên ku ji dervayî şaristaniyê dimînin weke civakên "paşketî, hov, hoveber" diyar dike. Ev yek ji xwedayê Sûmeran  qurnaz Enki maye û ji bo gelan bixîne, bike xulam û kontrol bike, rêbaza herî qirêj, bi pinî û bi qurnazî ye .

Hêzên Mêtinkar bi van rêbazên hîlebaz, hewl didin gelên din bê kok, bê dîrok û bê bingeh bihêlin. Eşkereye ku civakên bê hiş, bê dîrok mehkûmê hilweşandin, perçebûn û tune bunê ne. Bê kok, bê dîrok û bê bîr hiştina gelan, tune kirina hefizeya wan a civakî ye.  Di derbarê dagirkirin û kontrol kirina gelên stembar de ev yek dibe rêbaza heri bi pinî û qurnazî. Kesên dagirker bi saya van rêbazên bi pinî û qurnazî pergala xulamtiya herî kûr û berfirehî ya herdem pêş xistin.  Di seri de wekî gelên rojhilata

navîn hemû welatên Rojhilat, bûne şahidê bêsl bûyî yê raboriya ku Rojavayî bilind dikin ser ezmana. (Maxîme Rodînson)

Halbûkî di encama kolandina arkeolojîk a li Xerapreşk(gobekli tepe-Riha), Newala Çorî (Curnê Reş- Girê Sor), Çayûnû (Erxenî), Girê Kortik ( Bismil), Çemê Xalan (Êlih), tiştên derketine holê piştrast dike ku rihê Şaristaniya Demokratîk ya merovahiyê ev cihe. Hişmendî û bîra civakî ya merovahiyê xwe dispêre ev erdnîgariya ku weke "Kevana Zêrîn" tê bi navkirin e. Li Kevana Zêrîn merovahiyê jiyaneke bi şeml ya demokratik berdewam kiriye û şaristaniya demokratîk pêş xistiye .

Sermayedarî vê raboriya bêhempa binhesîr dike û bi vê re xwe weke yekane alternatîfa bêhempa pêşkeş dike. Gelên din biçûk dibîne û dexma hovîtiyê li wan dixe .

Gelên lêgerîna Azadî û Heqîqetê dimeşînin ev rêbaza ku ji Enkî mayî ya bi nalet, bi pinî û qurnazî divê destpêkê derxin holê û mehkûm bikin. Divê li şûna wê rêbazên azadîxwaz, demokratîk ya ku bi nirxên wan yên bingehîn û bi koka wan re dibe yek pêş bixin.

Bi vê re peywendîdar rêbaza lêgerîna azadiyê ya gelan diyarker e. Berdelên ku ji bo azadiyê hatine dayîn her çiqas giran be û têkoşîn çiqas bêhempa be jî dema ku rêbaz şaş be encam jî wê şaş derkevin .

Di serdema sed salên 19. û 20. de Sosyalîzma pêkhatî, Rizgariya netewî û Demokratiya civakî ya bi berdêlên giran hate bi dest xistin, bi demeke kurt veguherî dijberî xwe. Ev yek çavkaniya xwe ji rêbazên şaş digre. Nexwe ji bo ku lêgerina

gelan ya azadiyê mayînde be pirsgirêka rêbaz diyarker e. Ev pirtûk vê mijara pir girîng bi şikilekî bixwe bawer ronî dike .

**LI ŞÛNA PÊŞGOTINÊ:**

"Zanebûn; merovê mezin dilnizm, merovê ji rêzê şaş, merovê biçûk jî qure dike."(Brîgîtte)

Xwîn hilketina iqtîdarêye, parvekirin rihê komûnalîtê ye, baran bereketa axê, xwêdan piroz kirina kedêye, rondik êşa dil e, evîna azadî û heqîqetê rihê merova ye .

Di civaka demokratîk- ekolojîk (hawirnasî) - azadixwaziya jinê de merov wê ne be gurê merov lê wê bibe hogirê rast yê merovan. Gelî xwendevan! Ev çîroka tê gotin çîroka te ye. Gelî Merovno !

Berî ku ez wisa bibim, ne zimanê min hebû ku bi axivim ne jî gotina min ya ez bibêjim hebû.

Şopên lingê min hîn ne hatibû dinyayê. Xweza û gerdûn ji destpêkê ve yê ku min afirandiye di hemla xwe de digerand. Her tişt li wir bi şikilê cewher hebû. xwe, ji ber xwe digerand. Zagona guherîn veguherîn û peresîna domdar di nav xwe de diparast. Tevgera made ya hundirî û derveyî, guherîn û veguherîn ji gerdûnê ber bi rojê, ji rojê ber bi erdgilorê ve, ji erdgilorê ber bi merov heya mêş û mora ji her tiştî weke zagoneka gerdûnî bênavber didome.

Berî gotinê xweza û gerdûn hebû. Ez berî kû bibim ez dayîka ax a bidawî û ezmanê bêsinor belavbûyî di nav bêdemiyê de gihêştin hev. Hebûn û tunebûn, ronahî û tarîtî dest bi pevçûnê

kirin. Yekemîn danîşanên jiyanê di navbera qeyranê de, bi pevçûn û lihevketinê xuya bû .

Jiyan di nav pêşveçûyinê de ji hêsaniyê ber bi tevlîheviyê, ji ya kêm ber bi ya zêde, ji yê jêr ber bi ya jor ve, bi şikilekî helezonî derket holê. Gava ku tovê yekemîn şînbûn û zêdebûn li ser rûyê erdê dest bi belavbûnê kirin. Ev belavbûn cewhera yekem ya ku "min dike ez" jî di nav xwe de muhafeze dikir. Hebûn heya niha jî gengaziyeke û mamika ku nehatiye zelal kirin e. Hebûna min bi nakokî û sirriyetan ve dagirtiye. Dizanim berî berî min pepûle, morî, marmarok, çûk, mar, masî, beq û fîl hebûn. Berî berî min giya, çîçek, dar darıstan, mêş û mor hebûn. Giya, bakterî, kurmik, mêşa hingîv, kîso, mêş û mor wê piştî min hebûna xwe berdewam bikin. Rûyê ezman a belavbûyî, stêrk, girestêrk, çalêreş, kadiz, û galaksî wê hebin .

Gerdûn di nav gengaziyeke bê sinor, pevçûn, curbecurî, rengîni û tevgerê de bû. Bi vê nakokî û pevçûnan xweza, di nav ahengekek mezin ya xas û bi mentiq dişixuliya .

Bi rastî mejî, hiş, edalet û meyla azadiyê ya xwezayê hebû؟

Di vê gengeşiya jiyanê de baranên pêtî pêtî di bariyan. Av kom dibûn û vediguherîn lehiyê. Her tiştî dida ber xwe û dibir. Xure xura ezmanên tirsnak, bayê wîzînî dikir, bahozên tirsnak vê rewşa qeyranê hin kûrtir dikir. Bi çirûskên birûska, agir bi daristanên qerase diket. Li lûtkeya çiyayên agirîn, lawên ku ber bi ezmana ve dipekiyan dibû lehî û her tiştê ku derdiket berê diheland û tune dikir. Her roj dema ku tav derbeya perê dawî lê dida, rûbereka reştarî ser rûyê erdê dipêça. Li hember hemû ev tiştên dibê û diqewime merov gêj û bê çare bû. Temam, li

hember hemû van tiştên diqewimîn ez kîme? Di nav vê gerdûnê de cihê min çiye? Di gerdûnê de merovê bi aqil û bi kêlî avabûye ma tenê ezim? weke zindiyê herî bi aqil min ev aqil li ku derê û çawa bidest xist؟

Ji vê dorhêla qeyranê xezal bi gavên çeleng hewldida bireve û xilas bibe. Şêr ji bo ku wê perçe bike û bixwe bi nahpikê tûj bi pey diket. Fîl bi gewdê xwe yê qerase darên derdiketin pêşiya wê gêrdikir. Margîse bi cihê xwe re dibû yek. Mar xwe bi erdê re kaş dikir, eylo (qertel) xwe ji ezmana berdida. Merov li hember hemû van yeka ditirsiya û xwe dikşand şikefta xwe .

Ey ademîzad, ey keça xwedawenda baş bifikire, tu van hemûyan kom bikî jî dîsa weke yek "ez" ê nabe. ji ber ku ez kombûna van hemûya me. Dibe ku cinsê herî pêşketî û senteza wê me .

Min jî li pey wan xwe da ber herikîna avê û ez hatim. Ez, ji ber vê yekê weke berheviya made û dîroka tekamûla biyolojîk im .

Yê ku çareser dibe ez im, gerdûn û xwezaye. Gava ku min xwe fêm kir min gerdûn fêm kir. Gava min xwe nas kir min xweza nas kir. Çiqas min xwe nas kir min civak jî nas kir. Yê çareser dibe ezim, heqîqet û azadiye. ji ber ku ez merovim .

Ez dizanim, Azadî û Heqîqet; gula sor ya heftber e. Ya ku çar demsal û sal duwazdeh meh di bedena merova de kulîlk vedike .

Heqîqet zimanê herî xurt û pêşketî ya ku şîfreya wê nehatiye dîtin e. ji Nebî Nûh heya vê demê her tim di merov de diaxive. Her mejî û dil fikirîn û hebûneke. Dikeve nav tarîgewrikê. Azadî û heqîqet; weke periya di bedena gulê de buyê heqê hebûna merova .

Her mejî cîhaneke. Her xeyal, tevî robara xeyala dibe. Destek, bi hezar desta digire. Merovek vediguhere civakê. Di berbanga dîrokê de yên din lêgerîna azadiye ya ku dawiya wê ne diyare û raperînekê, li hemû erdnîgariya derdikeve .

Çend hezar sal e di nav rûpelên dîrokê yên bi xubar, li nasnama xwe û xwebûna xwe digerim. Ez merovim, çend hezar sal e dixwazim ji te re behsa te bikim.

Ji ber ku ez rêwiyê Azadî û Heqîqetê me. ji berê heya niha, Ji niha heya siberojê hemû rê di min de bûne girêk. Ez "elbika Pandora" ya bi sir im. Ez şîfreya çareseriya vê girêka hişkim. Ey merov, ez dixwazim ji te re behsa te bikim, ji ber ku ez merovim .

Navê min Mezopotamya ye. Ez rihê şaneyên (hûcre) hemû şaristaniyê, hemû nakokiyan û êşa hemû zayîna me. raborîa min, îroj û siberoja min di kûrahiya vê erdnîgariyê de veşartî ye. Ez dayîka hemû dayîkanim. Ez pîrika hemû pirozî û serhildana me .

Ji dema ku ez bûme ez di navbera erd û ezmanan de bi bask dibim, li azadî û heqîqetê digerim. Bê navber li xwe digerim. Ez dizanim tiştê min wenda kiriye ezê li cihê ku min wenda kiriye bibînim. Ji ber wê jî di merov de israr dikim .

Nexwe ez ki me? Ez çawa çêbûm? Ez ji kur hatim û diçim kuderê? Destpêk û dawiya gerdûnê heye? Guhê gerdûnê yê me guhdar dike, çavê gerdûnê yê me dibîne, mejiyê wê yê difikire, dilê wê yê lê dide heye? Ya rast ez zarokê gerdûnê yê dijraber (çep) im. Di kîjan xala gerdûnê de cih digrim. Pêwendiya di navbera raborî û siberoja min de çiye .

Ez dizanim di navbera vê qeyranê de tiştê ku nizanim her tim ji tiştê dizanim bêtirin. Gava ku fêr dibim tiştê ku fêr nebû me zêde dibin. Bi zanebûna xwe sirriyeta tiştê ku nizanim, bi tiştê kû fêr bû me ve jî hewl didim şîfreya azadî û heqîqetê çareser bikim .

Ez mezopotamya me. Tu melîk tu xedar hîn kefen li min nekiriye. Heya niha ti kesê/î bi mirin perdeya sirriyetê ji ser rûyê min ranekiriye. Tu pêşbîn (falbaz) va sirrê hîn zelal nekiriye. ji ber ku ez, dayîka hemû jiyana, şaristaniya û lêgerîna me. Şoreşa şoreşê, dergûşa neolîtîkê me. Her tişt di hembêza min de form(şekil) girt, mezin bû û pêşveçû .

Serpêhatiya min hîn bê navber didome. Ez, bêrawestin li azadî û heqîqetê digerim. Di çemê dilcoş de,di kulîlka vebûyî de, di pepûleyê de li xwe digerim .

War û dewran cûda bû. Min, li çar parê cîhanê di dilê dayîka xwezayê de bizirê xas çand. Rojek hat bizir zil girt û mezin bû. Piştre bi gihêştinê re serî da. Ez jî mîna bizirê bûm merov û tevlî serpêhatiya jiyanê bûm. Niha ez, robara jiyanê me. Bi coş zêde bûm. Min jiyan zêde kir. Min geliyê zimrûdî (keska girtî) yê bi jin û zilam ava kir. Min çîrok, destan (çîrokên dirêj) û çîrvanok afirand .

Min, mînak Mem û Zîn, Rama û Sîta, Mecnûn û Leyla, Romeo û Jûlîet, Zal û Rûdabe, Ferhat û Şêrîn evînên mezin jiyan kir. Her tişt bi evînê destpêkir wê bi evînê bigihîje encamê. Ez zanim a ku evîna wî tune be,gotina wî jî tune ye. ji ber ku "heqîqet evîne, evîn jiyana azad e." Ez serpêhatiya merov ya sirrê wî ne hatiye zelalkirinim. raborî, rojane û siberoja merov di vê

serpêhatiyê de veşartiye. Ey keça merova, Ey lawê merova! Ezê ji te re behsa te bikim. ji ber ku "ez" çiroka te ya rastim .

Berê di destpêkê de min şînahî kom dikir. Bi xweza û dayîka axê re têkiliya min wisa destpêkir. Min, hemû mêş û mor û nebat naskir- me hevdû naskir . Nebat jiyana min bû. Yê min têr dike û xwedî dike bû. Têkiliya me weke dayîk û keç bû. Her çiqas zehmetiyê wê hebe jî di nav guncawî (aheng) û hevratiyê de bû .

Piştre jin û zilam karbeşiya xwezayî pêş xist. Li kêleka komkirina nebata neçîra xwe dispêre hêza bazûyê zilam pêşveçû. Nêçîr, rêya ber bi mirin-kuştinê ve diçe bû. Yekemîn dilopa xwînê ket dilê dayîka axê. Êşa yekemin, kêfxweşiya yekemîn, gunehê yekemîn, pîrozkirina yekemîn, baweriya yekemîn derket holê. Min ji bo nêçîrê fêl û xefik pêş xist. Li kêleka aqilê atifî, aqilê min yê dahuranî (tehlîlî) dest bi xurt bûnê kir. Lê dîsa di navbera min û xwezayê de guncawiya bêhempa û hevsengî berdewam dikir .

Roj bi roj tiştî ku fêrbûn û ceribandinê min yê jiyanî zêde dibûn. Ji kevirê fêrê avakirina amûran bûm. Min ax çand û mişar kir. Şoreşa çandiniye bi ser xist. Her tişt bi xwezayê destpê kir. Xweza di dilê min de pîrozê pîroza bû. Zindî û bi tevger bû. Ji min fêm dikir, min didît û çavdêriya min dikir. Ji min re rê nîşan dida, jiyan pêşkêş dikir .

Min nûveyê alavê yekemîn da. Yekemîn car lawîr kedî kir. Bi nebata re, lawira re hevaltî avakir. Min li ser xeyalê ku bi ewrên kûmûlûs (telpê ewrê reş) re biyek dibe, huner avakir .

Min bi hemû nasnava re di nav hevde jiyan kir. Em hemû zarokên azad yê heman malbatê bûn. Ji bo ku dîrokê ji bîr nekim min bîra civakî ava kir .

Min, rihê dayîka xwezayê, li ser esasê ku careke din neyê qutkirin, di mejî û dilê xwe de bi cih kir. Serpêhatiya lêgerîna min ya azadî û heqîqetê di vir de veşartî ye .

Ji bo ku jiyana min bi sazî bike, min xweda û xwedawendê bêhempa afirand. Min ew bilind kirin û dûre destkir. Piştre yê kû min wana afirandibû dest bi afirandina min kirin .

Êdî ez xwedayê bê mirin bûm, xweda ezê bê mirin bû. Nakokî, pevçûn û maske ket nav jiyana min. "Di serdema xwedayê bi maske û qralên pêçayî de bûm.

Êdî bi "goşt û hestî hatim nixumandin." Navekî min çêbû. Min nasnav girt. Ji navê min re gotin "Adem-Hewwa" . Piştre bûm Zerdeşt, Manî û Mûsa. Bûm xwedawenda ciya Nînhursaq. Dibûm xwedawenda Star û Înanna ya ku dibû stêrk. Bûm Her sê Meryemên ku bê navber êş dikişandin. Navê min xwedawenda berhemdarî bû. Dayîka hemû jiyanê bûm .

Êdî jiyan du çemê bi coş bû. Avên çemê çanda bingehîn ya neolîtîkê û çemê şaristaniya bi dewlet  tevlîhev bûn. Ev tevhevî, bûn destpêka pevçûna ku heya roja îro didome re bû destpêkek .

Ez dizanim, avên ku bi coş diherikin, behrê şîn û mezin yê li ser kefa sipî heyî, çiyayên ber bi ezmana ve hildikşin, deştên rast, daristanên kesk, çolên kûr, mêş û mor dayika xweza ji min re pêşkêş kiriye .

Piştre bi pêşkêşiyên dayîka axê min gund û bajar avakirin. Şaristanî pêşve bir. Ol, felsefe, huner û wêje zivirand çemê bi coş. Min şekil da şaristaniyên maddî yên qerase .

Jiyana xwezayî xira bû. Ez ji ez-tiya xwe derketim. Roj bi roj veguherîm xerîbekî ku xwe nasnake .

Îxanet û berxwedanî ketin nav serpêhatiya min. Mirin-kuştin pêşket. Bazarên xulaman ava bûn.  Qralên xwedayî derketin. Karesata şer hate ber hemû deriyan. Cenawirê Levîathan a bingeha hemû xirabiyan û makîna sûc a ku navê xwe dewlet e ket nav jiyana me. Bi vî cenawirê xwînrêj re têkoşîn dan zehmet bû. Dayîka ax li hember hemû tiştê diqewime bêçare û xemgîn bû .

Zalim, tîran, xwînmij derketin û li ser rûyê erdê belav bûn. Bager destpêkir. Habîl û Qabîl li ser xwişka xwe Aklîna şer kirin. Yekemîn kujeriya bira ket jiyana me .

Ber bi ezmana ve zîggûrat hilkişîn. Li ser navê şaristaniyê kelhên diranfîl û bajarên qerase yên di zordestiyê de deng dane, hatin avakirin. Ji artêşên di destê wan de şûr hatin çêkirin. Olên nû derketin holê. Heftê û du milet li ser navê şaristaniyê di bin kelehên diranfîl de civiyan û ketin nav şer. Kesî ji kesî fêm nedikir. Alozî berdewam dikir. Li ser nirxên dayîka ax, artêşan bi hev re şer dikir. Merovên xwişk û bira bi hêrs û kîn rimê tûj di dilê hev de diçikandin. Bi şûran serî difirandin. Di singa dayîka axê de çemên xwînê diherikîn. Firtûneyên xofdar yê xirabiyê digobilî. Her tişt ji qurmê xwe ve gêr dikir. Firawûn û Nemrûd derdiketin pêşberî rûpelên dîrokê. Hîtler û Mussolînî xeta Fîrawûn derxistin lûtkeyê .

Van serpêhatiyên bi xwîn her tişt vediguherandin mergasetê (trajedî). Jiyan bi rondikên çavan, birçîbûnê û nalînê hat strandin. Qêrînên merovan tevlîhev bûn .

Yên bûn mijara xirabiyê, xwezaya ku herkesî îstîsmar dikir û xwe jê xwedî dikir dayîka min a heqîqî bû. Ez, mîna pelên di payîzê de zer dibin, xemgîn bûm. Min xwe mehkûmî tenêtiyê kir. Di nav berhemdariya dayîka axê de min birçîbûn û xizanî jiyankir. Birçîbûn, xizanî û xulamî li ser rûyê erdê belav bû. Yên ked dixwin na, yên ku keda wan tê xwarin dest bi zivirandina çerxa kedxwariyê kirin .

Dayîka axê tiştê diqewimî di nav rondikê çavan de temaşe dikir. Heqîqet û azadî nepenî dibû. Xulamtî li ser rûyê erdê belav bû .

Û merovê bê hişmendî û bê evîn mayî, veguherî mexlûqê hov û xwînmij. Li şûna berxên me zarokên me hatin serjê kirin .

Di hundirê qenalê avê yê mezopotamya de li şûna avê çirik çirik xwîn herikî. Li şûna çîçekê dilrihetker, nebatên çolî yê bi dirî şîn bûn .

Belê, hişmendiyê dest ji Agadeyê berda. Mîna ku bûka ciwan dest ji mala bavê xwe berdide. Piştî wê jî xwedawenda evînê Îştar, Agadeyê terikand. Dest jê berdana fikir û evînê ji bajarê Agadeyê re tûfan anî .

Agade, tûfana merovatiyê a ku li ser zilmê bilind dibe bû. Ha, min di vê rewşa aloz de çareserî xeyal kir. Ez ketim pey heqîqet û azadiya ku min wenda kiriye. Çareserî dîsa ez bûm .

Min, li hember hemû Tîranan serî hilda. Min, ne Firewûn, ne Nemrûd ne jî Ebû Cehil guhdar kir. Êdî ez teyrê sîmir bûm. Ji xweliya xwe ji nû ve min xwe afirand .

Ez bûm, gelê ku li çiyayan dijîn û tu dagirkeriyê nas nake. Ji navê min re gotin "Gûtî". Di demeke berbangê de ji lûtkeya bi berf ya Zagrosan bûm lehî û herikîm ser Agadeya bi nalet. Agadeya kelha zilmê, li ser esasê ku carek din zindî nebe, bi erdê re bû yek .

Kawayê Hesinkar bûm. Di rojeke bîst û yekê Adarê de, bûm agir û min qesra Nînova şewitand. Piştî sedan salan Îsa wê bi gotina; "Nînova şewitî û xirabû, wê kî berbikeve" .

Ez spartakûsê palewan yê di qadên Roma de bi şêrên birçî re dan şer kirin, dema ku di rêkên Roma de li sêdarê darve kirin dibe kabûsa bega-bûm .

Di sitûyê min de zerzengê bi sitrî, Îsa`yê li ser girê Golgota dimeşiya bûm. Ezîz û Ezîzeyên li hember koledariya Romê qasî sê sed sal şer kirine bûm. Manî bûm, Mazdek bûm .

Babek bûm. Di Rojhilata navin de hêviya hemû gelên bindest bûm. Min li hember dagirkerê Ereb serî hilda. Min binxistin ji binxistinan da artêşa xelîfe. Piştre xiyanet li min hat kirin. Destpêkê destê min, milê min piştre jî lingê min jê kirin. Ji bo ku zerbûna rûyê min xwiya neke min rûyê xwe bi xwîna xwe boyax kir .

Ebû Muslimê Xorasanî bûm. Bi îşkence hatim qetil kirin. Nesîmî bûm, bi saxî çermê min gurandin. Pîr Siltan bûm, di sêdarê de ez darve kirin. Brûnoyê li ser navê zanist û heqîqetê,

ku bi evînê derketî rê bûm. Ji bo ku min heqîqet înkar nekir ez bi saxî şewitandin .

Artêşa çiptazî ya ku êrîşî zindana Bastîl kirin û melîk gêr kirin, bûm. Bi şîara civakparêzî, serhildêrê ku serweriya çarîtî yê gêr kirî bûm .

Di zindana Amedê de serhildêrê di mirinê de jiyan diafirand bûm. Ez, sûlavê bin erdê yê bi mirês û bi coş bûm. Tu hêz nikarîbû min zincîr bike. Ji ber ku ez, gelê ji singa dayîka axê derketî bûm .

Ji hozan Sin Lekke Ûnînnî vir de rêzên hemû hozanan a tevlî xeyalê min dibin. Di erdnîgariya min de jiyan, straneke trajîk ya li ser êşê hatiye avakirin e, Azadî jî di zimanê hozanan de qîrîna bê dawî ye .

Hêza min ji xeyalên min tên. Xeyal ku çemê bi coş in. Dirêj dibe û tevî umana dibe. Di bin sêla esmanî ya belavbûyî de, çiyayên bi mij yên bi ewran re di gihîjin hev in .

Dizanim, qasî ku ez bibim ez wê heqîqet û azadî ewqas li ser rûyê erdê belav bibe .

Ey xwendevan ha pirtûk çîroka te ya heq e. Ji ber ku ev pirtûk ji te re behsa te dike .            M. Saît Uçlu

**DESTPEK:**

Ji bo ku ol ji aliyê serdema zanistê werin qebûl kirin, ji mîtolojî hatine pak kirin. Çîrok bi şikilê ku ji encamên zanista hebûnê (ontolojî) werin xilas kirin, hatine şîrove kirin .

Dema min pirtûka nivîskar Yûrî Davîdov ya "Azadî û beyanî bûn "xwend, dîlemaya kûr min girt .

"Çirvanoka kevn heye. Rojekê mar dikeve devê zilamekî radizê û di madê wî de bi cih dibe. Dema ku zilam hişyar dibe fêhm dike ku, jiyana heya wê demê bi şikilê azad didomand bi dawî bûye."(Y.Davîdof)

Y.Davîdof, bi vê çîrokê dest bi pirtûka xwe dike. Ev çîrok, min bir zaroktiya weke mixekî di mejiyê min de eliqiye û bi xeyala pêçandiye. Axaftinên ji devê jina pîr û zana lib û lib derdiketin, di mejiyê min de ji nûve yek bi yek zindî bûn .

Jina Kurd ya pîr zana û Y. Davîdof heman çîrokê digotin. Ferqa di navberê de ev bû: Di çîroka Jina Kurd ya pîr û zana de lehengê çîrokê jina civan ya perî bû. Di veguhestina Y. Davîdov de lehengê çîrokê zilame. Çîroka jina Kurd ya pîr û zana ji min re hin bi wate û rast xuya dike. Ji ber ku ev çîrok bi civaka şaristaniyê re, wendakirina azadiya jinê ya di civaka neolotîkê de jî bi lêv dike .

Pîra zana hemû zarokê gund kom dikir û mîna ku ders dide, çîrok ji me re digot. Destpêkê li gorî tanzîmekê em didan rûniştandin û fêkî belav dikir. Piştre bi cidiyeta mezin, bi şidandina peyva dest bi çîroka xwe dikir. Ji ber ku bi Kurdî

digot, wate û telafûza wê ya xas hebû. Ziman bi aheng û helbestî bû. Di derheqê afirînê de tehlîlên hêsan û felsefî dikir .

Zarakno, ji mêj ve gur û berx di heman mêrgê de disekinîn. Merov û ajal li kêleka hev jiyan dikir. Li ser rûyê erdê ne xirabî ne birçîbûn hebû. Her tişt di hedê xwe de berdewam dikir .

Di berê de jineke ciwan a perî hebû. Ev jina ciwan a perî li tu derê ne disekinî her tim digeriya. Li çiyayan, li kêlaka avê, li geliyên kesk bi xezala re, pezkoviya re digeriya bi çûkên difirin re hevaltî dikir. Şeva stêrkê li ezmana, rojava diherike temaşe dikir. Li ser kaniyên bi zelalî diherike di xew re diçû. Bi pepûleyan re bi per dibû, bi masiyan re direqisî. Çiya bi çiya, gund bi gund, çem bi çem, gelî bi gelî, digeriya. Mala wê şikeft û kunên zinaran bû. Tu fermanî nas ne dikir, tena serê xwe bi azad digeriya. Ne derdê wê ne pirsgirêkên wê hebûn. Li xwezayê çi didît dixwar .

Rojekê dema li kêleka Feratê digeriya, cihekî xweşik yê bîşengê kesk, avên zelal li ser ditewin dibîne. Yekser biryar dide ku li vir birûne û bêhna xwe vede. Fêkiyê ku kom kiriye dixwe û di ser de ava qerisî vedixwe. Piştre li kêleka ava diherike dikeve xewa kûr .

Zilamekî bi navê "xew" ê ya ku li her derê amade dibe hebû. Wekî din bi navê "xeflet û mirin" ê du birayên xewê hebûn. Her sê jî ji yek dayîkê bûne. Xeflet, rêya kesa demên ku hêvî nakin digre, ji rêya rast dikşîne û wan ber bi rêyên kesnezan, xirab, şaş ve kaşdikir. Mirin, vejena (enerjî) herikbar-rih distand û bedena bê can dihêşt. Birayê sêyemîn xew jî, di tarîtiya şevê de, bi şîrînî diherikî çavên merovan û merova bi xeweke weke mirinê bi

mirinê re radizand. Ji ber wê yekê, di tarîtiyê de merov her tim dikevin şikeftê xwe. Keça perî jî ketiye xefika xewê ya birayê mirin û xefletê. Dema ku di bin siya bîşenga de bêhna xwe berdide, bê kû li benda şevê bimîne, xew dikeve çavê wê û diherike hemû gewdeyê wê. Çend roj çend şev razaye nayê zanîn. Dema di xewa kûr de ye çêlika mar bi bêdengî tê, bi devê wê yê vekirî re ber bi mîda wê ve pêş ve diçe .

Di dawiya dawî de xewa birayê xefletê, bi tarîtiyê re bi hev re lê dixin û diçin. Periya berbangê ya bi bedena gul, bi fikar keçik şiyar kiriye. Keçik şiyar dibe lê belê pê dihese ku tiştek pê hatiye. Keça perî di laşê xwe de bi xerîbiyekê dihese lê tu wate nadê. Bi derbasbûna demê re fêm dike ku di mîda wê de mar bi cih bûye. Bi erjeng û hengamêyeke mezin, mexlûqekî bi dileqi, bizinek derdikeve holê. Keçik dicirife, tirseke mezin jê re çêdibe. Şaş dibe, nizane çi bike bi vê re kûrekûr diponije .

Mar gazî keçikê dike.  "Ez çi bêjim tûyê bi ya min bikî, ger tu nekî ezê te jehrî bikim."  dibêje û gef dixwe .

Keça xweşik ya perî bê çare, mecbûr dimîne ku her tiştekî mar dibêje pêk bîne. Êdi jiyana xwe li gorî fermanên mar didomîne. Êdî ne diçû seyranê. Di destê mar de mîna bûkek lê hati bû. Di kûrahiya daristanê de hilkişiya bû şikefteka bêdeng, tarî û kufikî, azadiya xwe wenda kiribû .

Her diçe mar mezintir dibe. Çiqas mezin dibe zikê keçikê jî diwerime. Keçik ji tirsa xwe dernakeve tu derê. Bûye xulamê çar dîwarê şikeftê. Keçik ji bo ji vê xilas bibe li çareseriyê digere. Dibêje, li şûna wisa jiyan bikim, bimrim baştir e. Biryar dide ku êdî bi ya fermanê mar neke û serî hilde. Weke çare jî mar birçî

dihêle. Bê ku guh li gef xwarinên mar bide, bi rojan tiştekî naxwe û venaxwe. Li hember birçîbûnê berxwe dide .

Mar tî û birçî maye. Bê çare biryara derketina derve dide. Dilê keçîkê li hev dikeve û piştre jî divereşe. Dema keçik divereşe, mar ji devê wê derdikeve û diçe .

Keçik dikare bi nefsa xwe, bi vê re ji mar rizgar dibe .

Pîra zana cidiyeta xwe xera nake; "Ha wisa zarokno, ger hun bin bê dem li derdorê avê di xewde neçin. Nexwe mîna keça perî, wê serê we bikeve belayê." got û çîrvanoka xwe qedand .

Nizanim, gelo ev jina zana gihîştibû wateya dîrokî ya çîrvanoka behsê dikir. Piştî bi dehan salan encax, min ev çîrvanoka ku jina zana ya Kurd digot fêm kir .

Ev çîrvanok, çîroka kolebûn û azadbûnê bû. Çîroka jinê ya ji jiyana azad qut kirin û dîl girtina wê bû. Di şexsê jinê de kolebûna yekemin di hat jiyîn. Dîsa di şexsê jinê de yekem lêgerîn û berxwedana azadiyê bû .

Îro vê çîrvanokê difikirim. Gelo, têkiliya destana Gilgamêş ya bi mar re, çîroka şahmaran, mîtosa Yûnan ya pişemasî ( medûsa) ya porê xwe mar,  ku têkiliya xwe bi vê çîrvanoka Kurd re heye؟

Di bingeha mîtosa pişemasî de têkiliya Med-Yûnan heye. Li hember çand û êrişê Med-Pers Yûnanî, bi mîtosa pişemasî, Medan weke cinawirê bi tirs yê bin erdê teswîr dikirin. Weke peyvnasiyê jî têkiliya têgîna "Med-us-a" bi Medan re pir eşkereye. Gengaze ku mîtografan van çîrvanokên devkî girtin, bi guhertin û veguhertinê anîn rewşa havêna îdeolojîk ya pergala xwe .

Dema ku merov li Stenbolê, pişemasiya li "serdava bi erdê"dinêre, pê dihese ku di bin giraniyeke mezin de dimîne .

Dibêje qey hemû jiyan û cîhan bûye wek kevir. Merov dibeje qey li vê serdava bin erdê, jiyan bûye peykerekî ji kevir, merov dikeve çavdêriya bi wî rengî.

Ev yek di heman wateyê de rewşa zuwabûna jinê ya ku hatiye bêdeng kirin e.

Bi armanca xwestekan di bin ronahiya mat de bi bandora avêtina pereyên hesinî, di nav ava ku li dûvhev vedibin û tevdigerin xelekên tenikok û narîn xêzdikin de peykerê mermer a mezin ya Medûsa ya por bi mar ku serberjêr sekiniye, nediyarî û nayêzanîneke kûr diafirîne. Temaşeyên Medûsa yên bi qasê şevê bi sirr, çavdêriyeke masum-mazlûm dide … ku bê mafî hatiye tewanbarkirin û ji aliyê herkesî/ê ve hatiye kevirkirin.

Çavdêriyeke Masûm-Mezlûm dide... Bi xelekên tenikok re, weke ku direqise peykera mermer a serberjêr disekine vedana wê ya di avê de bi sekinî çikilî jî, herweke ku gihaştiye nasnameya xwe ya rasteqîn bi temaşeyên mezin dinêre li merovan...

Di wateyekê de pişemasi ji aliyê şaristaniya dewletî ve, nalet kirina jina ku weke pîreboka ye û divê were perçe perçe kirin, îfade dike. Mêzandina kûr ya pişemasiya ji hezar salan ve bûye kevir, hêz û sirriyeta her merovê ku lê dinêre bandor bike, heye. ji van meyzandina qet hun nikarin birevin û rizgar bibin.

Sermayedarî îro mîna ji aliyê mar ve dîl girtina keça perî, hemû merovatiyê dîl girtiye. Bi hezar û yek zincîr re bixwe ve girêdaye. xela, bê karî, kedxwarî, bîntengî, tundî, newekhevî,

mîna amûrê cinsî meyzekirin û madî kirin, zikê her kesî diwerimîne. Her kes ji cenawir û mexlûqê ku navê wê dewlet e, zerar dibîne û di nav êşan de digevize. Her kes dixwaze ji vî cenawîrî rizgar bibe. Lê çawa? Bi kijan rêbaza? Ha tam di vê mijarê de pirsgirêka rêbaz dikeve rojevê .

Keça perî , pala xwe da aqil,hêz û vîna xwe, bi fikirandinê, û bi nîqaş kirina cewhera xwe re gihişt encamê. Ji bo ku ji mar xelas bibe xwe bi xwe biryar girt. Tiştê ku mar digot êdî guhdarnedikir. Birçî hiştin û ne guhdar kirina mar wek rêbaz bi kar anî .

ji xwe de dest bi kar kir. Bi birçî hiştina xwe hêmaneke exlaqî tetbîq kir. Terbiyekirina nefsî pêk anî .

Weke çalakî birçîbûn tetbîq kir. Bi birçî hiştina xwe, mar mahkûmî birçîbûnê kir. Bi vê fikirandinê, biryarbûyînê, rêbaz û çalakiyê mar bin xist. Eşkereye ku ev yek, rêbazeke tekoşînê ye .

Hêza dijber, herî zêde bi kijan rêbazên ve koletiyê pêk tîne? Bi birçîbûnê, betaliyê û bi rêbaza dijwarî berdest dike. Bi birçîbûnê terbiye dike û dixe şûna evd-xulam .

Merovatî wê çawa û bi çi rêbazî ji nexweşî û cenawirê bi navê sermayedariyê rizgar bibe؟

Ha di vir de rêbaza rast pêwîste. Ji bo vê yekê jî Zerdeşt dibêje; "rast bifikire, rast biaxive, rast bike".

Nexwe ji bo gihiştina heqîqetê divê rêbaza rast were peyda kirin û hilbijêrîn. Bê ku rêbaz rast be, gihiştina encama rast ne gengaze. Tenê bawerî, vîn, têkoşîn têrê nake. Dema tekoşîn tê meşandin dive, encamê şênber derbixî û destkeftiyên mayînde

bixuliqînî. Ji bo vê yeke dive di dema rast de li cihê rast, bi amûr û rêbazên rast têkoşîn bide .

Dema ku lêgerîna heqîqetê li cihê rast bi rêbaza rast re nebû yek û yekîtiya diyalektîk bi dest nexe, wê demê lêgerîna azadiyê ruxmê berdêlên mezin, fedekarî û hewldanan bê encam dimîne û vedigere dijberê xwe .

Di dirokê de mînakên vê yekê tijîne. Di dîroka nêz de şoreşa mezin ya Sovyet ya ku pêk hatiye, di vê mijarê de balkêşe .

Şoreşa sovyetê bi diruşma azadî, wekhevî, û sosyalîzmê li ser navê kedkar, karker û xizanan pek hat .

Bi hêvî, fedekarî û baweriya mezin "di deh rojên ku cîhanê hatiye hejandin" de di dirokê de ser û bin bûyîna civakî ya herî mezin hat jiyîn. Pergala çaritî bi erdê re dûz bû. Li ser navê kedkar-karkera pergala civakperwer ava bû. Lê belê ruxmê hemû van yekan şoreşa sovyetê di nav 60- 70 salan de veguherî dijberî xwe. Sedsala 20. heman weke sedsala şoreşê derbasî dîrokê bû. Ji serî heya dawî bi raperîn ji serî heya dawî bi şerên bêhempa hunandîbû. Rêzek ji tevgerên rizgariya netewî yên mîna Viyetnam, Çîn, Engola, Mozambîk, Gîne, Filistîn, Kûba hwd. di çalak de bi diruşma civakperwerî bi encam bû .

Dîsa di navîna sedsala 19. de tevgera demokratiya civakî, li Rojavayê Ewropa bi diruşma sosyalîzm û azadî têkoşîna mezîn ya civakî pêş xist. Raperînên mezin pek hatin. Li Parîsê komûna ran taziya bi cih hat .

Lê belê, ruxmê hemû van yekan demokratiya civakî, rizgariya netewîtî û sosyalîzma pêkhatî, wekî varyanta sermayedarî

veguherî dijberê xwe. Temam, ji bo çi, çima, çawa wisa veguherî dijberê xwe؟

Eşkereye ku di vê lêgerîna heqîqetê de, di têkoşîna azadiyê de bi rêbazên hatine bikaranîn re têkildar e. Nexwe rêbaz çiye؟

## I-DIYALEKTÎKA RÊBAZ HEQÎQET Û AZADÎ:

"Fêrbûna bê fikirandin bê feyde ye, bê fêrbûn fikirandin xeter e".

Konfûçyûs

## DESTPÊK:

Ziman, mentiq û aqilê xwezayê ya xas heye. Her tişt di nav çêbûna diyalektîk, guhertin, veguhertin, têkilî, herikîn û pêşveçûnê de ye. diyalektika guherîn, veguherîn û pêşveçûnê, cewhera pêşveçûnên civakî ye. Mentiq, aqil, bîr û zimanekî civakê jî heye. Eger ev aqil, bîr û zimanê civakî rast were tehlîl kirin li gorî vê astê wê pêşveçûna civakî-dirokî û lêgerîna heqîqetê jî rast derkeve holê .

Cewhera paradîgmayên (model) civakî pala xwe dispêre vê yekê. Heya ev cewher rast neyê tehlîlkirin, gihiştina heqîqetê ne gengaze. Qasî ku ziman aqil û bîra civak û xwezayê di nav yekbûnê de were zelalkirin, wê di wê astê de lêgerîna heqîqetê jî bigihije encama rast. Rêya ber bi jiyana azad ve diçe, rêya kû xwe dispêre zagonên xweza û civakê ye. Sedema bingehîn a di bin têkçûna paradîgmayên li ser navê azadiyê hatine pêş xistin de, rast ne tehlîl kirina ev aqil û ziman e. Terzê jiyana dijberî zagonên xweza û civakê ye. Ev yek jî bi pirsgirêka rêbaz re têkildar e. Bê rêbaza rast, zagonên xweza û civakê nayên dahûrandin û gihiştina heqîqetê jî pêk nayê. Têgîna rêbaz-metod, weke jêderk ji zimanê latînî ye. Mixabin lêgerîna

heqîqetê ya herî mezin ji Rojhilat derketiye. Cihê jê derketiye Mezopotamya ye. Yekemîn zanyar li Mezopotamya derketine. Ev yek dibê ku ne tesadûf be. Zanyarên Mezopotamya û Hindî vê yekê gelek zêde piştrast dike. Zanyarî xwe ji "civaka çemê esasî" xwedî dike. Rihê civaka çemê esasî Kevana Zêrîn e. Di serî de wekî Tales, heft zanyarên Yûnanan, ji felsefeya Zerdeşt û Hermesê terzî yê li çanda Mezopotamya û Misirê cih digrin, feyde girtine. Zanyarê Rojhilat, ji bo bigihijin heqîqetê û zanista rast rêbazên çeşîtdar bikar anîne. "Mentiq" yek ji pediviyên vê lêgerînê ye. Ji bo gihiştina agahiyên rast hewldana rêya rast e .

Zerdeşt, bi gotina "rast bifikire, rast biaxive, baş bike"; Pêwendiya diyalektika, di navbera fikrandina bi hişmendî ya rast, rast bilêvkirina agahiyan û jiyana rast, derxistiye holê. Ev nêzikayî, rêbaza bingehîn yê gihiştîna agahiyên rast û heqîqetê ye. Ev rê û rêbaz xwe dispêre, rêbaza diyalektîka xas, ya ku li ser yekîtiya dijberiyan ava bûye û hîn zêde aliyên exlaqî derdikeve pêş bi vê re rehendên xwe yên olî û felsefî jî hene .

Di zanatiya Zerdeşt de xweza bi xwe heye. Xweza bixwe mijara lêkolînê ye. Zagonên xwezayê û zagonên civakî bi bitûmî tên dest girtin. Pîroziya ax, av, hewa, agir û şewqê ji têkiliya xweza û merov çê dibe. Di nazariya xulqandinê de çavkaniya deresiruştîparêzî (surnaturalîzm) dîsa xweza bixwe ye. Ji ber ku her du hêmanên bingehîn yê afirînê; "tarîtî û ronahî" bi xwezayê re têkildare. Çavkaniya agahiya, mijara lêkolînê yekser xweza, merov û hevrayiya "xweza-merov" e. Deresiruştîparêziya (surnaturalizm), bi felsefeya Zerdeşt re rastênhev û dijber pêşve

çûye, çavkaniya xwe ji Rahîbên Sûmerî digre û weke xeteke bingehîn mohra xwe li hemû pêvajoyan daye .

Ji ber vê yekê civakên Rojhilat, di gihiştina heqîqetê de qasî ku rêbaz-mentiq heye, pêşveçûna xeta metafizîk jî hatiye şopandin. sedema vê yekê ev e; felsefeya Sûmer,di meyzekirina cîhanê de xwe dispêre nêrîna sekinî (statîk) û neguherî .

Çîn û Hîndû hundirê tiştan ango cewherê wan "weke tiştên ku qet na guhere û eynî wekî xwe ye, didîtin ".

Di felsefeya Çîn de yek jî behsa "hêmana dijberiya" tê kirin. Çînî di avakirina gerdûnê de hebûna gelek duyitî û dijberiyan fêmkirine .

Di felsefeya kevin a Mezopotamyayê de, di navbera dijberiyan de hêmana şer û pevçûn heye. Li gorî vê ferasetê, li Gerdûnê her tişt dabeşî du kategoriyan dibe. Li milekî qenciya ku hêmana şewq-ronahî birêve dibe, li milê din de jî xirabiya ku hêmana tarîtiyê birêve dibe heye. Ronahî û tarîtî di heman demê de di afîrînê de yekbûna diyalektîk ava dike. Di lêgerîna heqîqetê de rêbaz xwe dispêre vê dualîzmê .

Nexwe heqîqet di serîde serpêhatiya merovbûnê ya merovan e. Cewherê merov e. Hev dîtina merovan a bi merovtiya xwe re ye. Ji bo ku em dakevin bingeha vê serpêhatiya berî hezar salan destpêkiriye, bi evîna mezin lêgerîn pêwistî û mecbûrî ye .

Heqîqet evîn e. Divê di serî de merov bi rihê xwe, mejiyê xwe evîndar bibe. Heya ku di asta evînê de ji azadiyê hez nekî û lênegerî, lêgerîna heqîqetê têr nake. Heqîqet, wekî elmasa di bin bahrê de cihê xwe ne diyar e. Ji bo dîtin û gihiştina wê, lêgerîna

bênavber pêwîste. Merov ji zayîna merovatiyê vir de di nav vê lêgerînê de ye .

Heqîqet evîn e. Ji bo gihiştina wê ked û hewldanên tije pêwîste. Ev ked û hewldan nebe gihiştin ne gengaze. Heqîqet evin e, evîn jiyana azade. Jiyana azad wê çawa were afirandin؟

Di vir de rê û rêbaz dikeve dewrê. Ji bo ku bi gihiştina elmasê divê li keştiyê siwar bibe, lêgerîn destpê bike û dakeve binê okyanûsê. Ango ji bo gihiştina heqîqetê rêbaz diyar nebe nabe. Di lêgerîna heqîqetê de rê û rêbaz diyarkere. Nexwe rêbaz çiye؟

**1-Rêbaz çiye؟:**

"Zanyarî weke roniyekê ye. Hun wê bişixulînin wê geştir bibe, ger neşixulînin wê bitemire. "(Alexandir Everett)

Rêbaz wek têgîn tê wateya; "1. rê, terz-metod 2. qabîliyet. 3. guncav, hêsan "

"Ji bo gihiştina zanyariya miteber û hevgirtî, rêya ku divê were şopandin e".

Nexwe di vir de rêbaz, di serî de tê wateya pergal, şêwaz û rêya ji bo gihiştina armanca diyarkirî .

"Ji bo bidest xistina agahiyan, rêya pêwist e. Ji bo her qada zanyarî rêbaza xas ya bidest xistina agahiyan heye." (O. Hançerlîoxlû)

Gihîştina hemû agahiyên rast yekser bi rêbaz ve girêdaye. Rêbaza şaş digihîne agahiyên şaş. Li gor her qadê rêbazên xas hene. Ji ber vê yekê jî "rêbaz, çênabe ku bibe yekîtiya rêzikên di berê de hatine diyar kirin." Rêzikên ji berê de hatine diyar kirin ku sekinîne û naguherin, merov ber bi çarenûsa zarûrî û dogmatîzma olî ve dibe. Ev yek jî cureyeke feraseta bextparêzî ye.

Lê belê rêbaz, divê rê bide hemû cureyên agahî girtinê. Ji ber vê yekê, di dîrokê de hemû zanyar, fîlozof û lêgerînvanê heqîqetê, li rêka rast ya gihiştina heqîqetê geriyane .

Parmenîdes, Herakleîtos û Platon bi pirsên " Zanyarî çiye? Çawa bigihijin zanyariya rast?" re mijûl bûne .

Arîstoo di berhemê xwe yê bi navê "Organon (alav) de pirsgirêka rêbaz digire dest. Alavên digihijînin agahiyên rast

lêkolîn dike. Arîsto bi vî awayî, di gihiştina agahiyên rast de, ji rêka tê şopandin û xebatan re rêbaz dide qezenc kirin .

Arîsto hemû mijarê ku digre dest, birêkûpêk lêdikole. Di derbarê mijarê de hemû agahiyên li ber dest kom dike. Rexne dike. Piştre jî xwe dispêre wan û rêbaza xwe pêk tîne .

Fîlozofên xwezayê wek rêbaz bi lêkolîn kirina xwezayê, bi dest girtina pirsgirêkên emelî yên merovan, gihiştina agahiyên heqîqetê esas digirtin. Platon bi lêkolîna metafizîk îdealîzmê pêşve dibir. Arîsto jî li ser vê pirsgirêka mentiq zêde dike. Li gor mentiqê Arîsto ؛

Hêmana zanavî, tiştek zanavê xwe ye. Nebat nebat e. Merov merov e. a - a ye .

Hêmana bê nakokîtî; Tiştek di heman demê de nikarê bibe bi xwe û dijberî xwe. Giyayek ne heywan e. Heybireserne giya ye. 'a' û yê ne 'a' ne wekhevin .

Hêmana derve hiştina ya sêyemîn; di navbera du îhtimalan de cihê ya sêyemîn tune ye. Zindiyek ya nebat e yan jî heywan e. vebijarka sêyemîn tune ye. Ger a û yê ne a dijberî hev be, Heman obje yan a ye, yan ji yê ne a ye .

Li gor biwêjaka gel, "rêya aqil yek e." Mentiqa Arîsto û aqlê selîm vê yekê raber dike. Tiştek an heye an jî tuneye. Tiştek di heman demê de hem spî hem jî reş nabe. Tiştek an miriye an jî zindî ye. Hêman, bergeh û zagonên ev mentiqa Arîstoo tê zanîn. Ji ber vê yekê pêwistî bi rêbazeke xas tune ye. Lê belê rastiyê jiyanê dijberî vê yekê ye. Merovan, berî hezar salan ji bo ku di lêgerîna heqîqetê de bigihêjin encamê pêwistiya rêbazên saxlem dîtine. Bi vê yekê re têkildar, hewldane ku rêbaz û hêmanên aqlê

selîm, aqilê hevbeş û rêya hevbeş diyar bikin. Mixabin hemû ev tişt çerçoveya aqilê bêteşe derbas nekiriye. Tiştê ku bi navê eqlê selîm a rastî ji xeynî mentiqa bêteşe ne tiştek e  .

Rêbaza diyalektîk a ku Hegel pêş xistiye, ev mentiqa eqlê selîm bi erdê ve yek kiriye. Yûnaniya diyalektîk weke amûrê nîqaşê raber dikir. Bi Hegel re, ji amûrê nîqaşê derket û veguherî rêbazeke giran. Marks û Engels ku vê yekê berevajî kirine, ji nû ve diyalektik watedar kirine û bi vê re rêbaza diyalektîka meteryalîst pêş xistine .

Diyalektîk, di lêhûrbûna tiştan de ne rêbaza nasîn û ravekirinê ye. Rêbaza, piçek baş çavdêrî û lêkolîna ew tişt e."(G. Polîtzer)

Ger ji van yekan were destpêkirin, ji bo gihiştina armanc û hedef rêbaz,dibe rêya tê şopandin. Di gihiştina armanca de tê wateya, dîtina rêya herî qayîm, ceribî, herî kurt û kurterê. Ji bo van hemûyan pirsgirêka rêbaz hewce dike. Ji ber ku bê rêbaza rast, hewldana afirandina jiyan rast, nagihêje encama rast. Nexwê rêbaz tê wateya, ji bo gihiştina hedef û armancekê rêya tê bikaranîn e. Ji Descartes û Spînoza heya Hegel gelek fîlozof, bi pirsgirêka rêbaz re mijûl bûne. Bi bayex û baldarî ev pirsgirêk dest girtine û lêkolan e. Ji bo gihêştina heqîqetê, ketin nav hewldana rêya herî kurt, guncav û herî rast .

Merovan, di dîrokê de her tim bi evîna mezin di nav lêgerîna heqîqetê de bûn. Lêgerîna jiyana azad, wek taybetmendiyê xwezaya merov, her tim bênavber û bêdawî ye. Mixabin di vir de ji bo encam were girtin rêbaz hatiye hilbijartin, diyarker e.  Ji ber ku bê rêbazên şaş nagihije encamên rast .

**2-Rêbaza rast digihîne encamê rast:**

"Yên bi zanyarî radibin ser xwe na mirin." (Hz. Elî)

Lêgerîna heqîqetê taybetmendiya merov ya sereke ye. Nexwe, merovê ku lêgerîna xwe heye wê çawa, bi çi, bi kîjan alav û rêbaz bigihêje heqîqetê؟

Ji bo gihiştina heqîqetê berî her tiştî divê bikeve rêyekî. Rêyek were şopandin. Ketina rê têr nake. Rêya ku dikevê, divê merov bibe ronahiyê. Ango deriyê derbas dibî, ne ji cehnema jê direvin, divê ji bihuşta ku lêdigerin re vebe. Rêya dikevin ger çewt be, armanc her çiqas rast û bêhempa be jî, wê bibe cihê çewt. Ji ber ku di vir de deriyê digihêjin, vedibe cehnema jê direvin. Pratîka sosyalîzma pêkhatî ya heftê sala, mînaka vê ya şênber e. Derketina olan jî bi vi awayî ye. Diroka tekoşîna civakî ya hatine dîkekirin vê yekê piştrast dike. Ji bo ku bikeve rêyekê, berî her tiştî merov di lêgerîna azadî û heqîqetê de divê zelal bibe û biryar lê were dayîn. Bê ku biryara wê bide nakeve rê. Nexwe wek gavê destpêkê divê biryar lê were dayîn. Merovê bê biryar, dudilî û xuya nabe rêwiya heqîqetê. Biryar dayîn û ketina rêyekê jî ne bese. Rêka herî qawîm, rast û kurta rê divê were peyda kirin. Ji dil û can, bi biryar û samimiyet derketina rê gengaze. Ger rê şaş bê wê hemû hewldan vala derkeve û nagihije heqîqetê. Pirsgirêka rêbaz tam jî di vir de derdikeve holê. Ji ber bê rê-rêbaz qet nagihêje heqîqetê. Di dîrokê de ji bo gihiştina heqîqetê rêbazên cur bi cur hatin pêş xistin û rê hatine ceribandin. Mîtolojî, ol, metafîzîk, zanist û hwd. wek rêbaz di ravekirina heqîqetê de kêm hatine şîrovekirin.

Merovê yekem gava ku çavê xwe li jiyanê vekir, berxweda, fikirî û pirs kir؟

Ez kîme? Ez ji kur têm? Ez ji kur têm û diçim kur? Ez çawa hatim afirandin؟

Ji wê rojê heya îro merov li bersivên vê pirsê digerin. Lêgerîn bênavber didome. Civakbûn û zihnî merov her çiqas pêşve diçe, lêgerîn-lêpirsîn jî bi  kûrahî aloz dibê û didome. Em, xweza, bûye û diyardeyên civakî, wekî pêwistiyên vê lêgerînê çawa bigrin dest û şîrove bikin? Lêkollîn- lêhûrbûna wan û gihandina encamê wê çawa bibe? Wê bi kijan alav, rê û rêbaz bigihije armanca diyarkirî ؟

Têkiliya diyalektîkî ya di navbera merov- heqîqet, merov-azadî, azadî-xweza de wê çawa be ؟

Merov li gor hewcedariya xwezayî her tim di lêgerînê de ye. Ji bo ya hîn baş hîn xweşik peyda bike dixebite. Lêgerîna azadiyê xwedî taybetmendiyê berdewamî ye. Ji ber vê yekê jî merov her tim dixwaze cîhanê, gerdûnê fêm bike û têbigihije .

Tiştê di tarîtiyê de dimîne û nagihêje sirrê wê, wateya wê zelal nekiriye; xwesteka fêm kirin, têgihiştin û wate dayîna wê her tim wekî xelekên zincîra li pey hev diçin, pêvajoya bingehîn ya agahî bidest xistinê pêk tîne.

Xwesteka zelalkirina tiştên nayên zanîn, hesta bi merov re xas ya bêdawî ye. Gava ku merov dikeve ferqa xwe, bi pirsa ez kîme, ji kur têm û diçim kuderê, xwesteka dozîna (keşf kirin) dinyayê jî kûr dibe. Bêedaletî, dagirî, tundî û koletiya di nav civakê de dibîne, dest bi lêpirsîna wê dike. Di vir de lêgerîna azadî her diçe kûr dibe. Ev yek jî bi xwe re pêkve pirsgirêka rêbaz dixe rojevê.

Gihiştina heqîqetê wê bi kijan rêbaza pêk were. Ha ev xala girîngtir her tiştî diyar dike. Ji ber rêya ku dikevinê ger şaş be gihiştina azadiyê ne gengaz dibe. Merov di pêvajoya agahî bi dest xistin û fealiyetên pratîk de hedef û armancên cur bi cur diyar dike, xebat û tesbîtê pir cure dike .

Mixabin dibêje gihêştina armanca diyarkirî, tê wateya pêk anîna tiştê hatiye armanc kirin. Ji bo pirsgirêk hîn bêtir were fêm kirin, em bi hinek mînaka zelal bikin .

Mînak 1: Merovek dikare çêkirina maseyekî pêwîst di mejiyê xwe de bike armanc. Wekî tesewir di eqlê xwe de bi plan bike. Heya ku bikeve pratîkê ev yek tenê weke planekî dimîne. ji bo ku bikare mase çêbike divê destpêkê diyar bike ku wê çawa, bi kijan rê- rêbaz were çêkirin. Ji bo çêkirina mase rêka herî saxlem, herî kurt û herî baş divê were peyda kirin .

Diyare, ji bo mase were çêkirin divê rê û rêbaza diyar bişopîne. Berî her tiştî ji bo mase çêbike divê hostetî û hunera xiratî û bi vê re melzemên pêwistî pê çêdibe hebe. Daring, alav, huner di dema rast de li cihê rast bi kesê tekildar re yek bibe wê çaxê bi rêbaza guncav, maseyê diyarkirî wê were çêkirin .

Alav û materyalê pir baş û ehîl di destê hosteyê xirab de dibe vegere maseyeke bê erk, weribandî û ji dervayê armanc û dizayna xwe. Hosteyekî baş dikare ji materyalên ewqas ne baş, maseyeke bi fonksiyon, bi feyde û nêzî armancê çêbike. Nexwe di vir de rê û rêbaz heta tu bixwazî girîngî dibîne. Mixabin pirsgirêk bi vê re naqede. Dema ku em "dibêjin ev yek maseye" ger em mase nîşan bikin, ev yek tenê rastiya diyarok e. Lê belê dema ku em bibejin " ev yek maseyê xweşik û wesfdare" wê

demê tê wateya ku di derheqê wê diyarokê de em di nav helwest, şêwe û destnîşan kirinê de ne. Gava ku kar dibe pirsgirêkên civakî, nivisandina dîrok û lêgerîna heqîqetê wê demê rewş qederekî dibe aloz .

Ji bo civakekê, gelekê; mîna azadî di pirsgirêka gihêştina armanca pîroz de, wate û girîngiya rêbaz bi hemû tazîtiya xwe derdikeve holê. Ji ber ku di vir de tekoşîneke civakî heye. Alî hene. Serdest û bindest heye. Mafdar û bêmaf heye. Çînê xwe bi berjewendiyan ve girêdaye hene. Di serî de wek tundî ji hêsanî ber bi girîft cur bi cur amûr û rêbaz ketine dewreyê .

Ha, di vir de wek diyarde dîrok derdikeve pêş me. Li gel vê, dîroka hatiye nivisandin û agahî- şehadeyên bi vê re tekildar yek alî ye û li gor berjewendiyê tebeqeya diyar şekil girtiye. Di lêgerîna heqîqetê de nûve û şadeyên dîrokî bi tena xwe bêwate ye. Di vir de ji xeynî paldana ev şehadeya, di radeya hunerî de şîrove kirin girînge .

Di vê dema têkildar a li ser tê sekinîn, merov, çîn û civak li kuderê, çima û çawa jiyan dikir. Terzê jiyanê çawa bû? Derfetên madî- manewî çibûn? Têkiliya merov a bi merov, xweza û civakê re çibû? Li vê derê tenê bi diyarokan derketina rê nagihêjê heqîqetê. Ji bo gihêştina baş, xweşik û rast hunera şiroveyê pêwîst û mecbûrî ye. Dîsa li vir nirxên exlaqî yê civakî dikevin dewrê. Bê hunera şîroveyê tenê bi dokuman û nûveya gihiştina heqîqetê ne gengaze. A rastî hemû dokuman (şahade) û nûve berhemê zîhniyeta merov e. Merov jî wek hebûneke civakî xwedî fikir, bergeha gerdûnê, nêrîna dinyayê, bawerî û dilxwazî

ye. Lewma dîrok û şadeyê dîrokî yê heyî li gor berjewendiyên serdestan şekil girtiye .

Ji bo yên hatine dîkekirin di vê feraseta dîrokê de cih ne hatiye dayîn. Dîroka yekalî ye .

Dîsa em vegerin mînaka xwe ya mase. Dema em dibêjin "ev maseyeke", ev yek rewşa bireserî (objektîf) bi lêv dike. Ger ev "Bireser" bi rastî jî maseyekî nîşan dike, wê demê ev yek tenê rastiyeke diyardeyî tîne ser ziman. Lê dema em bibêjin " ev yek maseya xweşik, baş û bi kalîte ye" tê wateya ku em di derheqê vê diyarokê de dikevin nav helwest, meyil û diyarkirinê .

Li vir, di rewşa yekemîn de ji ber ku mase diyarde ye tê piştrast kirin. Lê di rewşa duyemîn de ji bo mase em nikarin heman tiştî bibêjin. ji ber ku li vir helwest, tewir û meyla eşkere heye. Îspatkirina wê ne hewce ye. Meyil bi wî alî ve ye. Meyil, tewir, helwest û diyarkirin li gor kesa diguhere. Li gor nêrîna kesan ya di derheqê jiyanê de diguhere. Nêrîna çandî dikeve dewrê. Pîvanên zewqê, red qebûl rol dileyize .

Mînak 2: Ji bo bûyeê civakî ev rewş hîn bêhtir geremol e. Nêrînên bi mîhwera civaka çemê bingehîn û civaka şaristaniyê ji şîrove û nêrînên cûda re rê vedike. Wek mînak; Jenosîd û qetilkirina çerme sor yên kû gelên xwecihî yê Emerîka ye, ji ber ku rewşeke diyarde ye tê îspatkirin. Li Dêrsim ê Kurd bi komkujiyê re duçar man, ev yek diyarde ye û tê îspatkirin. Qirkirina Ermeniyan diyarde ye û tê îspatkirin. Dîsa bi milyonaan zencî ji hêla Ewropiyên spî ve bî rêbaza "nêçîrtiya merovan" bi zorê, zextê koçî nîvgirava Emerîka hat kirin. Ev rewş diyarde ye û tê îspatkirin. Lê, ji bo nêzîkatiyên zilamê spî;

" me merovatî birin axa wehşî", "ji merovê hoveber re me şaristanî bir", " zencî nijadeke ketiye" , "Dêrsim, raperîna rêbira ye. Me pergala dewletê bi cih anî." yên bi vî awayî bi temamî diyar kirina helwesta exlaqî ye. Di vir de qirkirin, mêtingerî, komkujiya li ser çerm sor, çerm reş û li Dêrsimê li ser Kurda hatiye kirin, wek tetbiqata derveyî merovatiyê nirxandin, dîsa ji bo merovê-a demokratîk û aşitîxwaz, rastiya helwesta xwe ya exlaqî ye. Li vir pîvanên nirxên exlaqî, merovê ya civaka çemê bingehîn û civaka şaristaniyê dikeve dewrê .

Ew derdikeve holê; di lêgerîna heqîqetê û nivîsandina dîrokê de xwe bispêre heman dokuman û nûveya jî, ji ber nirxên exlaqî, helwest û pivana encam dibe ku dijberî wê be. Tiştê ku ji bo yekî- yekê "baş-xweşik-rast"e ji bo yên din tê wateya "xirab, kirêt, çewt". Qirkirina çermsor û çermreşan, ji bo çermspiyê Emerîkî ji xwe re kirina war, li vir bi cîh bûn û li ser mêtingeriyê ava kirina bihuştê îfade dike, ji bo yên din komkujiya biêş, koç, mişextî, qirkirin û koletiyê ifade dike. Gava ku berxwedana Dêrsimê ji aliyê Kurdan ve lêgerîna azadiyê ye, ji bo aliyên din wek îsyana rêbir-eşkiya, dabeşkerî tê dest girtin .

Wekî xuya dike pirsgirêk ewqas ne hêsane. Ji ber ku qada civakî ye pirsgirêk û rêbazên çareseriyê jî di radeya bilinde tevliheve. Ji bo were zanîn ku ji kuçik re çi kêr tê divê em xwezaya kuçik lekolîn bikin. Ev xweza ji "hêmana feydebûn" cûda nayê fikirîn. ji bo heman hêmanê li ser merov bisepînin... divê destpêkê xwezaya merov, piştre jî di her dema dîrokê de guhertînên ku xwezaya merov tê de derbas bûye, di derheqê wê de divê agahî bidest bixin." (K. Marks)

Ji ber ku feraset, berjewendî û nêrîna jiyan, civak û dîrokê, ya dagirkeran û yên hatine dîkekirin cûdaye. Du qalibên cûda ya zîhniyeta bingehînin .

Li vir ji bo gihiştina armanc dîtina kurterê û rebazê herî rast pewîst û hewcedariye .

Nexwe di gihiştina armanc de divê rêya diyar were şopandin. Ev rê divê li gor hêmanên diyarkirî û armanca guncav be. Di navbera armanc û hêman de hevsengiya diyalektîkî, tekilî, daneheva nazarî, yekbûna lêkolîn û çalakiyên pratîkî rêbaza ava dike .

Rêbazeke diyar tune be, tu pirsgirêk bi çareserî nagihêje çareseriyê. Ji bo çareseriya rast rêbaza rast pêwist û mecbûriye .

Mînak 3: Ger em bixwazin têkeliya kîmyewî ya madeyekî derbixin, divê em rêbaza tehlîla kimyewî bizanin .

"Madeyên kîmyewî yê li ser wê madeyê bandor dikin, jihevkirin, taybetmendiyên wan yê kimyewî çespandin pêwiste. Ger em mecbûr bin metalekî bihelînin, teknîkê helandinê ango di ava kirina metal de pêvajoyên ji hêla merova ve derketiye holê divê were zanîn."(v. Afanasîev)،

Ger em teknîka helandinê nizanibin, ne gengaze ku hesinê bihelînin û bixin şikilên cûda. Rêya çêkirina amûrên ji hesin destpêkê, ji dîtina rêbaza helandina hesin re derbas dibe .

Dubare em vegerin pirsa ku me destpêkê kiribû. Nexwe rêbaz çiye؟

Di beriya her tiştî de rêbaz, di bûyer û diyardeyên ku tên bi destgirtin û lêkolînkirin de bê hebûna têkiliyekî, ku kesayet li

gor xwesteka xwe, diyarkiriye, hildibijêre ne kombûneke hejmarî ya mekanîk a rêbazêne ku – lêkolîn – lêgerîn dike ye .

Ji ber ku, ji her bûyerê re xas avayî, zagon, teşe, sedemên hundir û ê derva, rehê dirokî-civakî heye. Hemû ev yek di diyarkirina rêbaz de rol dileyîzin. Li vir rêbaz li gor kêfiyetê nayê diyar kirin .

Rêbaz li gor taybetmendiyên xas yê bûye û diyardeya, li gor rêzikên wan yê hundirîn diyar dibe. ji ber vê yekê jî her qad dikare rêbaza xwe yê xas dikare pêş bixe. Ev yek qasî kû were diyar kirin wê ewqas rêbaza rast diyar bibe .

Eşkereye ku li her qadê rêbaz ji hev cûda ne. Dema ku pirsgirêk qada civakî ya bi nakok, pevçûn û guhertinên bêdem û bê sinor dihewîne be, wê demê diyarkirina rêbaz hîn bêhtir giringî dibîne .

Wek encam; rêbaza bi wateya rêya herî kurtebir ya digihêjîne armancê, ne têgîneke Rojavayî ye. Ji serdemên herî kevin ve di ekolên zanyariya Rojhilata navîn de dihat ceribandin. Bi navbeynkariya zanyarên Rojhilat, rêkên gihiştina agahiyên rast her tim hatine ceribandin. Di nav wan de yê herî bi encam wek rêbazên bingehîn hatine hilbijartin. Di ekolên fikrî de, têgîna ku yek jê herî zêde li ser hatiye sekinandin "mentiq"e. Di zanyariya Rojhilat de "rêbaz-mentiq" şixulandin awayeke aşînaye. Bi serdema îslamiyetê re "mentiq" weke derseke bingehîn li hemû medreseyan hatiye dayîn. Dîsa zanyar û fîlozof di lêgerîna heqîqetê de rêbaza cur bi cur pêş xistine. Di felsefeya tesewufî de ev yek qederekî pêşveçûye .

Dema navenda hegemonî ya pergala şaristaniya cîhanî ber bi Ewrûpa ve diçe, bi rêbazên zanistî re, li pir qadan pêşketinên serdestî ava dikin jî ber bi Ewrûpa ve şemitîn. Heman pêşveçûn di mijara rêbaz de jî xwe diyar kir. Di serî de Bacon, Descartes û Galîleo, nîqaşên metod-rêbaz yên di serdema 16-17'an de hatin kirin, bi kok girtina serdestiya sermayedar ya li Ewrûpa re têkildar e .

Ji bo sermayedariyê têgînên herî girîng û bingehîn a rêbaz "kirde (subje) -Bireser (obje) ye". Veqetîna kirde - bireser ji hêla rêbaz ve serdema nû îfade dike. Di vê nêzîkayiya nû de kirde (subje) li ser Bireser (bi giştî xweza û civak) kontrola xwe çêdike û pê re ji kedxwariyê re vedike. Her tiştî dikin çavkaniya kedxwariyê. Bi vi awayî rêbaza, ku têgîneke kokê xwe ji Rojhilate, wek form û naverok ji guhertinê re dûçar dibe. Rêbaz li Rojhilat, gihiştina agahiya rast de rêka herî kurt hedef digre, lê li Rojava wek, bi temamî ji kedxwariyê re vekirina obje tê dest girtin. Ev yek tê wateya kontrola kirde ya li ser Bireser. Kedxwariya sermayedarî li ser vê yekê tê hunandin. Di dîrokê de li civaka şaristaniyê kirde her tim yê serdest e. Ev yek carna di kes de carna di sazî de şênber bibe jî encamê naguhere. Kirde, her tim afirînerê kedxwarî, koletî û zextê ye. Bireser jî wek yên hatine dîkekirin, her tim yê keda wê hatiye xwarin, li ser zext hatiye kirin û ketiye kontrolê. Bi civaka şaristaniyê ve, gava ku kirde yê serdest temsîl dike, bireser jî ji cewhera xwe pê ve nirxên di çerçoveya "civaka çemê bingehîn" û hemû avayiyên hatine dîkekirin ifade dike. Di serî de xweza, hemû civak ji

kedxwariyê re dûçar dimîne. Bi taybet rêbaza zanistî ev yek pêş xistiye, kûr kiriye û bi belavkirina wê bi sazî kiriye .

Di vê çerçovê de peydakirina rêbaza felsefî ya rast a ku pratîka civaka bi hezar salan, raborî - dîrok û kokên wan dike gelemperî, qasî ku girînge jî zehmet e. Di vir de hewceye ku zerengî (kapasîte) ya zanînê ya hemû nazariyan were derbas kirin û valahî neyê hiştin. Li gor biwêja "xweza ji valahî hez nake" pêwiste di zerengiya zanînê de jî valahî neyê hiştin. Her valahiya ku tê hiştin, tê wateya wê ji aliyê nazariyên din ve were tije kirin. Ev yek jî mecbûr dihêle ku zerengiya zanînê bitûn bibe .

## II-HEQÎQET YEKPARE YE:

"Demar (rih) li ser hemû laş belav bûne, ji xeynî tijî kirina gewde a bi can, bi avşolkê û bi tevgerê û ji xeynî destê yek reheka xweser ne tiştekin. Ez dizanim, nayê zanîn ka rihek ji kur destpê dike û li kur diqede. Ji ber ku di xirxalekê de, ne destpêk ne jî dawî heye".

Hîpokrates

Heqîqet di roja îro de, bi navê zanyarî, heya pirte (atom) xwe ji hev hatiye perçe kirin û dabeş bûye. Her çiqas perçe kirin û dabeş kirin zêde dibe heqîqet ewqas muxlak dibe, dikeve halekî bê hal. Heqîqeta tê perçe kirin ji zanist û heqîqetê dûrketine .

Di dîrokê de bi mihwera jiyana azad her lêgerîn gihiştina heqîqetê hedef digire. Armanca esasî ya lêgerînê ev yeke. Di vê çerçoveyê de lêgerîna heqîqetê bênavber berdewam dike. Lê belê her lêgerîn nagihêjê heqîqetê. Nagihêje armanca xwe. Ji ber ku gihiştina heqîqetê bi rêbaz ve têkildare. Ancax bi rêbaz bigihêjî heqîqetê. Ger rêbaz şaş be utopyayên herî pîroz, baweriyên herî xwerû, fedekariyên herî mezin, şerê herî bilind wê bê encam bimînin .

Mîtolojî, ol, metafizîk, zanist hwd. di dîrokê de weke rêbazeke rol leyîstine. Mixabin yek jî negihêştiyê yekbûna heqîqetê. Hemû jî gihiştine duduliya heqîqet-silte. Her çiqas bi van rêbaza gihêştibin hin alên heqîqetê jî, ji gihiştina bitûniya heqîqetê dûr sekinîne .

### 1-Heqîqet Çiye؟:

Wateya berrahî realîte ya rastiyê jî heqîqete e. Ev herdû peyv têgînên bingehîn yê felsefê ne .

Di ferhengê de li beramberî têgîna berrahî bi zimanê Osmanî de; vakî, Fransî; rêl, Almanî; real, Îngilîzî; real, Kurdî; rastî, bi Tirkî; gerçek heye .

Rastî; tiştê ji hişmendiye cûda serbixwe, hebûna xwe ya şênber û subjektîf heye .

Heqîqet jî rastiya agahiyan îfade dike. Ev rastbûna agahiyan bi jiyana azad re têkildar derdikeve holê. Di zimanê Kurdî de heqîqet û rastî dişibin hev û heman têgînin. Heqîqet; bi têgînên "Rastî, rasteqîn" tê îfade kirin .

Têgîna rastî, wek peyvnasî xwe dispêre Komê ziman ya Aryen. wek jêderk, xwe dispêre Kurdî ya ku dendika koma ziman ya Aryen .

Rastî; ji têgîna "Rast-Rastî-Rastîn-Rasteqîn" derketiye. Ev têgîn di koka xwe ya Kurd-Hurrî hatiye û heya îro jî tê şixulandin. Ev têgîn di zimanên Aryenî de ji peyva "Ra-Re" ya tê wateya "mal-milk" zêde bûye. "Ra-re; rêk e. Rêk; dibe "re, ra, rek, ray". Rêbaz wek, "re û dirb" tê îfade kirin. Dîsa bi peyva "ram" ya tê wateya dewlemendî, derbasî zimanê sankrîtî dibe. Ev peyv piştre bi peyva "ras-res" ya tê wateya "mal- tişt" weki rewşa navdêrê bi peyva "rem" derbasî Latînî dibe. Heqîqet jî dibe qada agahiya vê yekê .

Heqîqet; bi Osmanî wek; vakî,nefsûlemir, Fransî; Verîte, Almanî; Wahrheît, Îngilîzî; Truth, Îtalî; Verîte" tê îfade kirin. Bi Erebî heqîqet û rastî di heman wateyê de tê şixulandin, lê wateya felsefî cûdaye .

"Heqîqet; bi wateya herî berfireh, bi heqîqetên olî, exlaqî û zanistî re pewendîdar, beşa rastiya  bi qada zanebûnê an jî qada hebûnê ya tanzîmê dike mijar...

Bi taybetî car- caran wek berrahî, carna jî di wateya rastiyê de tê şixulandin lê di rastî de tiştê di cewhera xwe de, bi vekirina cevhera xwe pêk hatin û rewşa jê haydarbûna merov e .

Heqîqet wekî hin taybet; ji çar meqamê tesewûfê, miqabilê meqamê sêyemîn e. Bi navê ehlê heqîqetê; yên cewhera xwedê dizanin, jê bawer dikin ku hebûna rastî xwedê ye, xwe didin rêya xwedê û yên gihiştine sirrê xwedê diyar dike."(A. Cevîzlî)

Ji ev hemû yekan jî diyar dibe ku; hucreya bingehîn ya peyvên "heqîqet, rê, rêbaz û rastî" xwe dispêre zimanê Kurdî. Ev peyv mihtemelen bi çanda civaka çemê bingehîn re pêwendîdar e. Di civaka neolîtîkê de heqîqet, rastî û rêbaz bi yekîtiya diyalektîkî di nav yekbûn û ahengê de ye. Lewma koka hemûyan yeke. Qasî ku rêbaz û heqîqet birine Rojava ewqas wateyên cûda lê bar kirine. Têgîn jî li gor vê yekê guherîne .

"Rastî di îslamiyetê de têgîna bi wateya; tiştê li gorî rasteqînê ye, rastî, cewher, edaleta eslî... Di Kur-an’ê de li şûna heqîqetê peyva "heq" derbas dibe .

Di hedîsan de peyva heqîqet di wateya bi giştî eslê tiştekî, rewşa kamil de tê şixulandin. Di Tesewûfê de jî li ser peyva heqîqet gelek wate lê tê barkirin. Heqîqet wekî yek jê merhaleyê bi şikilê  şerîet, terîqet, heqîqet û marîfet tê rêzkirin, tê wateya dîtina xwede (muşahede), eşkere kirina sirrê têkildarê cewhera xwedayî." (Ana. Brît. Ansk. cild.10. rûpel 276)

"Di nivîsên Marks û Engels de (a) 'heqîqet' tê wateya wek asayî li gor rastiyê munasîb, (b) pîvanê nirxandina îdîayên têkildarê heqîqetê, bi asayî pratîka merove û pratîka merov digire nav xwe; ango Marks û Engels têgîneke klasîk (Arîstotelesî) û pîvanê heqîqeta pratîkî dipejirîne."(Tom Bottomore)

"Heqîqet sîtavka rastiya bireserî ya di fikir de... Rastî; rasteqîna bireseri (objektîf), heqîqet jî sîtavka kirdeyî (subjektîf) ya rasteqîna bireserî bi lêv dike. Heqîqet ne rastî bi xwe ye, sîtavka wê yê, guncav bûna di navbera fikir û bireserde tîne ser ziman. ( O. Hançerlîoxlû)

Pêwîste balê bikşînin ser vê yekê. Rastî û heqîqet guncavî û pêkvehiya diyalektîkî ye. Ne sîtavkên hev yê qeba, hêsanin; ne diyarkerê hev an jî siya hev, sawînê (îluzyon) hevin. Ewayên pênaseya têgîna heqîqetê hene. Encax heqîqet, berî her tiştê bi lêgerînê destpêdike. Ji pirsa jiyanek çawa re bi tevger, bi lêgerîna jiyana azad re têkildar e. Lê her lêgerîn nagihêje heqîqetê. Çima her lêgerîn nagihêje heqîqetê. Ji ber ku bi rêbaz re pêwendîdar e. Ji merovbûna merovan pê re lêgerîna heqîqetê jî berdewam kiriye.  Merov li gerdûna bêdawî ya di hundirê wê de ye dinêre, her hal van pirsan ji xwe dike û dest bi lêpirsînê dike. Ez kime? Ez çawa çêbûm? Armanca hebûna min çiye? Çima ji hebûnên din cûda me? Xweza û Gerdûn ji ku derê tê diçe ku derê ؟

Ev pirs di heman demê de lêpirsîn û lêgerînek ifade dikirin. Lêpirsîn û lêgerîn dibe destpêka lêgerîna heqîqetê. Di vir de lêgerîna heqîqet û azadiyê di nav hev de ye û nayê ji hev cûda

kirin. Lêgerîna heqîqetê heman demê lêgerîna azadiyê ye. Azadî û Heqîqet li hev bandor dikin û hevdû merc dikin .

Heqîqet li vir aliyekî bersîvê ya pirsa çawa bijîn e. ji ber ku di lêgerîna azadiyê de merov her tim li yê herî baş, xweşik û bilind geriyaye. Lêgerîna azadiyê, têkoşîn û lêgerîna, afirandina terzê jiyanê ya li gor hêvî û xeyalên merov e. Nexwe heqîqet çiye؟

Şaneya (hücre) kok ya Mîtolojî Mezopotamya Jorîn e. Heqîqetê li mezopotamya jorîn xwedawend temsil dikin. Xwedawenda Înanna, Star, Nînhursag, Tîamat hwd. tekoşîna zehmet û bêhempa ya vê yekê meşandin. Heman kevneşopî piştre bi şikilê cûda be jî derbasî Mîtolojiyên Rom û Yewnanî dibin .

Di mîtolojiya Rom de xwedawenda Verîtas temsîla heqîqetê dike. Xwedawenda Verîtas; bi latînî tê wateya "rastî, heqîqet". Verîtos; di mîtolojiya Roma de vejîna heqîqetê û xwedawenda heqîqetê bû. Li gor mîtolojiya Rom; îfadeya rastî û dilpakî ye. Ji ber vê yekê li Roma qedîm qederekî girîng bû .

"Alatheîa (truth), who art the begînnîng of great vîrtûe, kêp my good-faîth from stumblîng against rough falsehood". Xwedawenda Alatheîa nûnertiya heqîqetê dike. Ew hunera mezin û dilpakî ye. Li hember derewên qeba nûnerê rastiyê ye. Di wateya xaliya li ser tiştê veşartî rakirin, vekirin de jî tê bikar anîn. "Xwedawenda Alatheîa", li xwezaya bakîre, di bêdawîbûna çolê de, li lûtkeya çiyayan û kurahiya daristanan dijî. Li vir ne xweda, xwedawend heqîqetê temsîl dikin. Ev yek tekildarê civaka xwezayî-civaka dayiksalariye. Çanda civaka

çemê bingehîne. Cewhera heqîqetê xwe dispêre wir. Bi xwezaya bakîre re têkildar dest girtina wê, divê ji heman sedemê be .

**2 -Hin penaseyên derbarê heqîqetê:**

Di derbarê heqîqetê de gelek pênase hene. Kêm zêde her fîlozofî, her zanyar her dîroknas li ser vê mijarê pênase û destnîşaniyên cur bi cur kirine. Pênaseyên heqîqetê pir zêdene .

**a-Di Zerdeştî de "Mala Heqîqet-Edaletê":**

Li gor baweriya Zerdeşt tarîtî ronahî, başî û xirabî her tim di nav pevçûnê de ye. Ronahî, qencî heqîqete .

Lêgerîna heqîqet û edaletê hêmana bingehîn e. Aşa Vahîsta ya di nav nemirên pîroz (Ameşa Spenta) de dijmêre, lêgerîna heqîqet, rastî an jî bêqisûrî tîne ser ziman .

Li gorî Zerdeşt armanca cîhanê; ji aliyê heqîqetê ve bin xistina derew û xirabiyê ye. Di gerdûnê de yê pergala madî û manewî afirandiye, qanûnên xwezayê diparêze, Ahura Mazda ye. Çavkaniya xirabiya Ehrîmen e .

Li gor Zerdeşt li aliyekî "Aşa"(pergala alemê) ya ku ji aqlê selîm, qencî û ji ronahî pêk tê, li milê din jî "Drûg" ê(derew, gengeşî, fitne,fesadî u durûtî) di hundirê xwe de dihewîne, heye.

Divê merov aliyê qenciyê hilbijêre. Zerdeşt behsa dadgerîna alemî jî kir. Piştî wê 3 hezar sal wê hêza ehrîman belav bibe û mala heqîqet-edaletê ava bibe .

Di Felsefeya Zerdeşt de heqîqet dibe dijberî "Drûg". Drûg; Têgîna bî Kûrdî ye û tê wateya durûtî, fitne, fesadî, hîle. Ev yek tam jî li hev hatina şaristaniya dewletî ye. Mala heqîqetê û çanda

çemê bingehîn, ya dijberî vê çanda şaristaniyê ye,wekhevin. Bi lêgerîn û têkoşînê merov wê bigihêje heqîqetê û pergala Ehrîman ya pala xwe dide derewan wê dawî bibe .

**b-"Heqîqet Perçe nabe":**

Xelîl Cîbran; dibêje" heqîqet perçe nabe." Heqîqet bi hev ve ye. Qasî ku bi hev ve were dest girtin wê wateya wê derbikeve holê. Gihêştina hemû, bi evîna bêdawî lêgerîna domdar e. Biwêja " yê digere xwediyê xwe jî dibîne bela xwe jî." tekildarê vê lêgerînê ye. Lêgerîn rêbaza azadbûnê, zelal bûnê ye .

Ji vê hêlê ve heqîqet hewcedarê du kesane. "Yek yê wê dibêje, yê din fêm dike. " (X. Cîbran) Ev yek dişibe tekiliya murşît-murid. Yê tîne ser ziman pêşenge. Bi evînê li heqîqetê digere. Yê rêbaza rast nîşan dide ew e. Yê guhdar dike jî azadîxwazê hatine dîkekirin e. Rastî, ji bo jiyana azad, lêgerîna afirandina vebijarka ye. Rêbaza bi rêka herî kurt gihiştina wê ye .

**c-"Ji xeteyan derbasbûna heqîqetê çênabe ":**

Zanyarekî Hindî, dibêje " Ji xeteyan darbasbûna heqîqetê ne gengaze. Ji heqîqetê derbasbûna heqîqeta din dibe. " Gihêştina heqîqetê wek lêgerîna merov ya bêdawî, ji dîrokê heya niha berdewame. jiyana ku li ser xeteya hatiye ava kirin û şikil girtiye , nikare bigihêje heqîqetê. Ji jiyana bi kemasî ji lewre bi rêbaza çewt ancax bigihêje xeteyeke din .

**d-"Pirsgirêk ji pevçûna du şaşîtiyan derdikevin":**

Dîroka şaristaniyê li ser xete, vir û vîç û kedxwariyê hatiye hûnandin. Lêgerîna heqîqetê bi silteyê re wekhev bûye. Hegel dibêje " pirsgirêk ji pevçûna di şaşitiyan de derdikevin". Pevçûna şaşîtiyên bi mihwera silteyê, di dîrokê de karesat, hilweşîn û qirkirinê mezin afirandiye. Di serî de weke şerê cîhanê a yekemîn û duyemîn, dîrokê de şerê di mihwerê de peşve çûne, ji gelek komkujiyên dilsotîner re rê vekiriye .

**e-"Jiyana şaş rast nayê jiyîn":**

Li civakên bi dewlet azadî, her tim di bin xeteriyê de ye. Teqezî (mutleqî), dogmatîzm, determînîzma hişk, her tim ji azadiyê mehrûm e. Bi rêbazên dişibe van yekan gihêştina heqîqetê ne gengaze .

Theodor w. Adorno, hatina nijadkujiya cihûya gav bi gav şopand û bû şahid. Bi pirsa "Merov dikare piştî Auschwîtz ê jiyan bike" li ser lêpirsîn û çareserkirina rastiya civak û dinyayê, xebitî. Piştî şerê cîhana duyemîn vegerîna merov ya jiyana asayî, ji bo wî gelek bi nakok bû û ji vê yekê bawer nedikir. Merovê ji vê komkujiyê re bûye şahid û vê komkujiyê jiyan kiriye, çawa dikarin jiyan bikin, lêdipirsî .

Adorno bi gotina " Em di fetloneka heqîqet wekî derew, derew jî wekî heqîqet dixuyê de ne. İro encax derewa teqez dikare

rastiyê bibêje. Ev yek nîşana; Rastî û derew qasî kû nikare wan ji hev biqetîne ketine nav hev, ji bo ku perçeyekî herî biçûk a agahiyan bidest bixî jî keda sîsyphos pêwîste, hêmana li qada şer bin ketiye, li qada rêxistinbûna mentiqî bi ser ketiye. Lingê dirêj yê derewa hene: Li pêşiya serdema xwe dimeşin." moderniteya sermayedar, merov xistiye çi halî derdixist holê .

Adorno bi gotina "jiyana şaş rast nayê jiyîn" ev zanyarê Hindî vediguhazd îro. Eşkereye ku, jiyana şaş hatiye hûnandin, şaş rûniştiye ger were xwestin jî rast nayê jiyîn. Şaristanî jiyana şaş hatiye hûnandin e .

Li vir girîngiya rêbaz derdikeve holê .

Ji ber vê yekê tekoşîna azadiyê ya di kedkaran de rêbaz girînge. Gava rêbaz rast neyê diyar kirin, wê hemû hewldan vala derkevin .

Rêbaz; ji bo civakê yekser bi lêgerîna heqîqet û azadiyê re girêdayî ye. Ji bo gihiştina armancekê rêya tê şopandin, şêwe û pergale. Ji bo çareserkirina pirsgirêkên civakî rêya hatiye pêşxistin e. Di gihêştina armancan de rêya herî kurt, hêsan, rast û bi encame. Rêka ku merov digihijîne encamê; teşeya hînbûrî, feraseta aqlê selîm û nêzîkatiye. Nexwe rêbaz bi pênaseya herî kurt, rêka digihijîne encamê ye. Dîrokê de di serî de Descartes gelek fîlozof, zanyar, ramanger û civaknas bi hessasiyet û girîngiya mezin li ser pirsgirêka rêbaz sekinîn. "Ji ber ku wan, di gihiştina rastiyê de dîtina rêbaza herî bi aqil, ji xwe re kiribûn kar".

Nexwe rejîma heqîqetê; bi rêka herî rast, kurt çawa bigihijin bi jiyana azad re têkilîdar e .

Marks ji rêbaza metafîzik di parzûna rexneyê derbas kir. Rêbaza "diyalektîka meteryalîst" esas girt. Encax di pratîkê de cûda kirina "kirde-bireser" û meteryalîzma qeba ya Feûrbahc derbas nekir .

**f-Heqîqet û fîlozofê Hindî:**

Fîlozofên Hindî heqîqeta zihnî bi sê sedemên cûda ve girêdide. Nivîsên pîroz (mîtolojî, destan, çîrok), aqil (mentiqa merov) û ceribandinên şexsî .

Dibêjin, merovek destpêkê divê nivîsên pîroz lêkolîn bike. Piştre agahiyên ku ji wan nivîsa dest girtiye divê di parzûna aqil re derbas bike. Herî dawî jî, piştî ku ji guncawiya tiştê bi rêka aqil fêrbûye serwext (îqna) bibe, li ser van agahiya bikeve nav lêhûrbûna kûr .

Ger ew kes tenê ji nivîsên pîroz bawer bike wê bibe serhişk (dogmatîk). Aqil jî bi tena serê xwe nagihije heqîqetê. Ceribandin bi tena serê xwe razber dimîne .

Gihiştina heqîqeta zihnî, di yekbûna, senteza her sêyan derbas dibe .

Robarên diherikin gava ku bigihijin uman hebûna wan ya robarî wenda dibe .

Navê xwe, şikilê xwe, xweseriya xwe wenda dikin. Lê tune nabin. Di nav umanê de hebûna wan berdewam dike. Kesê zanyar jî dema digihije heqîqetê di nav de dihele, pê re dibe yek .

**g-"Rejîma Heqîqetê":**

Ramangerê Fransî M. Foûcaûlt (Fuko) bi gotina; "Silteya modern binçavkirina mezin e." bi temami kontrol kirina merov, wendakirina azadiya merov derdixe holê .

Fuko; têgîna "Rejîma Heqîqetê" pêş dixe. Li gor vê yekê; di derbarê heqîqetê de siyaseteke giştî ya her silte-civak heye. Li gor berjewendiyên xwe, gotinên wek rastî bi nav dikin û pêş dixin, mekanîzmayên ku "pêşniyarê rast-şaş" ji hev diqetîne, teknîk, rê û rêzanên li gorî armanca gihiştina heqîqetê hatiye eyar kirin, di civakê de "ji bo yê bi axaftina 'rast' re mukelef, statu tê dayîn" di derbarê van de dema nêrînê xwe tîne ziman peyva "rejîma heqîqetê" bikar tîne .

Di rejîma modernîta sermayedar de zanyarî di çerçoveya vê "rejîma heqîqetê" de tê dest girtin. Heqîqet, li derveyê siltê bi tu awayî nayê jiyîn. Li gor Fuko, "siyasî aborî"ya heqîqetê û pênc taybetmendiyên bingehîn yê vê yekê diyar dikin hene .

Yekemîn; Heqîqet " di şikilê gotarê zanistî" tê îfade kirin û di saziyên ku wê diafirîne de navendî dibe. Duyemîn; Her tim dibe mijarê teşwîqa "aborî" û "siyasî". sêyemîn; bi vê yekê re giredayî meyla bêdawî ya belavbûnê nîşan dide. Çaremîn; Heqîqet dikeve halê biresera xeritandinê. Pêncemîn; Çend hêzên mezin ya aboriya serdest û cîhazên polîtîk mîna heqîqet, zanîngeh, artêş û ragihandin, di nîkaşên siyasî û qada civakî de li dijberî hev disekinin. Ev mijar bi vê yekê re têkildar e. " Hêza wekî stratejiya zanistê" û "civaka ku ev agahiyan kom dike jî wek gerdûna têkiliyên hêza" bi nav dike. Hêz (qudret), gotin û kirinê

pêwîst asteng dike. Bes ji bo berjewendiyên îstiqameta civak û silteya navendî bûye "tiştên werin gotin" dide axaftin .

Agahî; têkiliya hêzê sererast û diyar dike. Hêz bê ku şixulandina zorê " ne diyar, bê pênase û bê şikil" dimîne. Agahî; şêwedarbûna "gotara aboriya siyasî" û "teknolojiya siyasî" ye. Zanebûn jî ji bo "dadgeh kirin û bindest kirin" tevger dayîn û bikar anîna hêzê ye. Li gorî Fuko, " bê hêz agahî, bê agahî hêz nabe ".

"Rejîma silteyê", têkiliya silte û heqîqetê di bingeh de ji bo berjewendiyên navendên agahiya ya ku agahiyan li cem xwe dihewînin ava dibe û pêş dikeve .

**h-xwedawenda çiya Nînhursag:**

Nînhursag! xwedawenda pîroz ya çiyayên pîroz! Xwedawenda bi taca zêrîn ya Zagrosane ku fetihî bi dest ne xistiye! Dayîka xwedawend ya civakên Hurriyê ku li hember tu desthilatdarî serî netewandiye!

Dibêjin ku dayika xwedawend ya Sûmeriyan rojekê li baxçê xwedawenda çiya Nînhursagê heşt şax çandiye. Şax zêde bûn û li ser rûyê erdê belav bûn. Piştre ji navê wê re gotin bihuşta "baxçê Aden". Hemû baxçeyên dinyayê bi vî rengî şikil girtin. Baxçên mêwê yê Semîramîsê bû sîketina wê. Nînhursaga xwedawenda çiya, hemû welatê xwe navbera Dîcle û Firatê veguherand baxçê bihuştê. Hemû pirtûkên pîroz ji vir re gotin "cenet"dibêjin .

Ninhursag bi xwezayê re bû yek, bûn wekhev. Mîna xwezayê serhildêr, har û kaotîk bû. Mîna xwezayê berhemdar, bibereket û afirîner bû. Mîna xwezayê wêrek, çalak, livdar û bêtirs bû. Zanyarî, raman, jiyan, zayendîtî hemû di wê de kom bû. Ji ber ku Ninhursag xwedawenda çiya bû. Wek gelê xwe serî neditewand, evîndarê azadiyê bû .

Li kovika dara jiyanê azad dijî. Xweda berî ku bibe xweda, berî tarîtî ronahiyê bidewisîne, berî ku ev erdnîgarî di xezeba xwedayan de derbas bibe, dema berbang rûyê erdê ronî dikir, Nînhursag, Înanna, Star, Tîamat, Lîlîth li ser vê axê bi merovan re bi azad jiyan dikir .

Nînhursag hemû jiyan diparast. Her tişt bibereket û bi aheng bû. Ne pevçûn, ne kedxwarî ne jî tundî hebû. Her tişt bi zagonên Nînhursagê yê bereketê di nav ahengê de bû .

Piştre xwedayên zalim, xwînrêj, kedxwar û xirabî belav dikin derketin holê. Her tiştê baş xweşik ya ku xwedawendan afirandibû hat şewitandin û hilweşandin .

Ha ji wê rojê ve jin, zilam hemû merovatî ji wê pergala wekheviyê ji nû ve bi xuluqînê hewl dide .

Dema ez zarok bûm, pîra ixtiyar zanyar ya ku dişibê Nînhursagê, ji me re çirok digot .

Digot zarokno, " Heyv ew heyva hûn zanîn li ezmana ye... Wisa nerênin ku weke çardeşevî nêz dixuyêe.... Ew pirrrr pir dûre. Hun nagihijên wê. Hûn hemû tiştê cîhanê li ser lûtkeya çiyayekî kom bikin, bidin ser hev û derkevin serê jî dîsa

nagihijin wê. Her tiştî bidin ser hev jî wê dîsa qasî hêkekê dûrahî bimine".

We demê me hemûya bi kelecanê ji devekî digot "pîrê em hêkeke din bibînin, hêkeke din bibînin". Wê dîsa bê ku cidiyeta xwe xera bike, bes em her tiştî danîn ser hev. Jê pê ve tiştek nemaye. Em hêkê ji kur bînin. Em hemû bêdeng dibûn, me xemgîniya negihiştina heyvê jiyan dikir .

Nexwe lêgerîna heqîqetê di cewhera her merovî de heye. Merov her tim dixwaze tiştê nayê zanîn zelal bike, bigihije ya hîn baş û xweşik. Ev yek jî di her serdema dîrokê de lêgerîna azadiyê û pirsgirêka rêbaz xistiye rojevê.

## III- DIYALEKTÎKA HEQÎQETÊ

"Berxwedana merovekî ya li hember serdema ku di nav de jiyan dike, wî di derî de nexistina hundir, jê hesap pirsîn, mecbûrî bandor ava dike. Feqet ne girînge ku ew kes wê yekê dixwaze; dikarê vê yekê bike ew girînge".

Nîetzsche

Benîadem (keç û lawê merovan) rojeke zelal û aram berê xwe da rûesman. Rûesman bimirês bû. Stêrkên bêhejmar armonî avakiribûn. Hemû bi hev re diçirûsîn. Stêrkên çirosek, hilû, bêqisûr ya di tarîtiya şevê de derdiketin li ser merov bandor dikirin. Heyv bi hemû hişmeta xwe temaşe dikir. Kadiz sihra cûda ava dikir .

Li lûtkeya çiyayekî, ji merov re wisa xuya dibe ku derkeve cihekî hîn bilindtir û destê xwe dirêj bike wê bigihije heyvê. Di rojên çardeşevî de heyv ewqas nêzî merove ku merov dixwaze bigihije wê. Yek din jî dema berbangê ger ji lûtkeyê ber bi jêr ve temaşe bike, wê bi hêza bandorker ya deştên riprast dirêj dibin re rû bi rû bimîne. Di nav deştan de avahiyên gund, bajarok, bajar...

Merovên bênavber bi hev re mijûl dibin, dikevin qirika hev. Piştre rengê çêşîdê bêdawî û nebatê rengê bêdawî... an heywan... an mêş û morî... Yên heya bê dawî mezin û fireh dibin, heya bêdawî biçûk û teng dibin...

Mar dikare bi rojan bi xuş xuşî derkeve lûtkeya çiya. Lê dîsa jî nikare bigihije lûtkeyê. Eylo (qertel) dikare di bêhnekê de bilind bibe û bigihije lûtkeyê. Her tişt wê li jêrê bimîne. Di nav

bêdawîtiya rûesmanê de bilindbûna eyloo wê çi îfade bike. Ev pirs dikevin aqilê merov. Merov ji ku de tên û diçin ku derê؟

Di nav gerdûna ku ewqas çeşîtbûna bêdawî, bêsînor û bî ihtîşam dihewîne, de cihê me çiye? Ewqas stêrkên bêdawî ji ku derê hatin? Li valahiya rûesman çawa disekinin? Cihê dinyaya me di nav wan de çiye? Û di nav ew hemûyan de li kuderê ye? Û mêş û morî ؟

Hemû van yek fêmkirin, bendê di navbera tegihiştina wan de kişfkirin, gihiştina rastiyê, xwesteka çareseriya vê sirrê bi lêgerîna heqîqetê re têkildare .

Di dîrokê de her tim fîlozof, zanyar, pêxember û merovên zanistê ji bo vê yekê çareser bikin, di nav hewldanê de bûn. Her yek ji wan li gor xwe îzah, çareserî peyda kir. ji ber ku rêbaza her yekê cûdabû. Temam, heqîqet kijan bû؟

Nîqaş û lêgerîn wekî berê dewam kir. Nakokî, cûdatî, lêgerîn mîna çeşîtdariya xwezayê bêdawîbûn .

"Berî milyon sala, li valahiya ezman ewreke germ ya xazê rû da. Ev ewr, piştî pêşveçûnên dirêj wê bibe dinyaya me. Em merov, hemû serpêhatiyên xwe yê baş xerab li ser wê jiyan bikin." Di rastiyê de hemû çîroka me bi ev ewrê xazê re destpê dike؟

Her tişt bi ev ewrê ku di bin ronahiya birqok ya rojê de bi reng dibe re destpê dike? Heqîqet ev e ؟

Û "Zanyar Oparîn, hewl da ku bi bandora ava bixwê ji têkeliya karbonên înorganîk ava bûna hîdrokarbon zelal bike".

Terzî Hermes ji bo bigihije sirrê heqîqetê hemû jiyana xwe danî holê. Di lêkolîna ku kir de gihişt encama; "Merov xwedayê bi mirin, xweda merovê bê mirine." Zanyarê çolê yê Medî Yetro, li bajarê kevnar Sogmatar, li aliyekî keriyê pez diçêrand, li aliyê din bi stêrka re mijul dibû .

Jiyan û jiyankirin mamik bû. Zindî çawa û ji bo çi dizên û dimirin? Tevger (hereket) jiyan bû? Wê demê kijan tevger؟

Bi kevir û axa xwe, bi nebatê xwe, umana xwe, robarên xwe, ezmanê xwe, stêrkê xwe, kadiza xwe hemû dinya û gerdûn zindî bû? Ne zindî be ev zindîbûn, jiyan ji ku derê tê؟

Fîl û moriyek, çûkek û masiyek, merovek û marmarok ji eynî binemalê tê? Îmtiyaz û cudahiya merov heye? Û pirs dirêj dibin diçin? Aqilê merov dikare vê heqîqetê çareser bike؟

Jiyan û zanebûna merov sînordar, gerdûn û tiştê divê werin zanîn bê sînor bûn. Ev nakokî wekî berê berdewam kir. Bersiva Arîsto hêsan bû; "qasî ku dixwînim cahil dibim." Çiqas dizanim serwext dibim ku tiştê zanim li kêleka tiştê nizanim çiqas biçûk dibin. Nexwe " xwe bizane" " "rastiya" di bin van hemûyan de veşartî çiye؟

Heqîqet lêgerîne. Pirsgirêka têgihîştinê ye. Têgihîştin diguhere. Li vir misogerî, hişkbûn û diyarkerî tune ye. Zanista bûye silte dogmayên hişk, determînizm derxist holê. Ji rêbaza herî kevnar ya fikirînê, heya mîtolojiya yekemîn û çîrvanoka yekemîn, meyze kirina gerdûnê heya asta dawî zindî, lêgerînvan û nerm e .

"Rastî û heqîqet ne heman tiştin. Rastî, rastiya bireserî, heqîqet jî sîtavka ev rastiya bireserî ya di mejiyê me de bilêv dike .

Wekî mînak dara em destê xwe lê didin rastiye. Lê sîtavka darê ya di mejiyê me de heqîqet e. Heqîqet, ne rastî bixwe, sîtavka wê ya di mejiyê me de ye. Qasî ku em lihevkirîbûna raman û bireser bidest bixin nispeten emê bigihijin heqîqetê .

Ji ber ku bireser (tişt) gerdûn û rastiya civakî bêdawî, bêsinor, mezin û biçûk (gerdûna makro û mîkro) e têgîhiştina wê çeşîdbûna bêdawî diafirîne .

"Heqîqet û dirustî (heqî) bendeyê hevin lê ne heman tiştin. Dirustî hêmanên mentiq, heqîqet jî rastiya bireserî tîne ser ziman .

Heqîqet, qasî ku divê bi rastiya bireserî re lihev bike, bi hin têkiliyên rastiya bireserî re lihev kirinê bi heman gotineke din, lihevkirina mentiqî tîne ser ziman".

Fîlozofên xwezayê ji dirustiya agahiyan zêdetir bi kirde-bireserê dibe mijara zanyariyê re mijûl bûne. Heqîqet li derdora pirsên; peydabûna yekemîn ya hebûnê çawa çêbu, pêşveçûyîn û yekemîn madeya bingehîn ya vê hebûnê çiye? geriyane. Mijara dirustî û çewtiya agahiya piştî felsefeya xwezayê bi sofîgeran, Sokrat, Eflatûn û Arîsto re pêş ket .

Rastî(realîte) û dirustî (heqîqet) weke têgînên bingehîn yê vê felsefê şêwe digirin. Rastî ji zihnê merov serbixwe dijî. Şikilê hebûna serbixwe ye. Dar, çiya, pênûs, heyv, kevir, kêzik û hwd rastiyekin. Ev yek ji zihn û seheka merov serbixwe xwedî hebûnê ne.

heqîqet jî, agahiya ku di hişmendî de şêwe digre bi guncaviya diyalektîk a realîteyê, rastiyê- heyberiyê re têkildare.’’Buharê bi helîna berfê re, çemê Feratê di nav çiyayan de bê rawestan û

delodîn diherikiya’’ rastî û şaşîtiya vê pêşniyarê buharê em dikarin lê nêrîna herikîna Feratê fêmbikin .

Di rastiyê de ger biharê Firat bi vî awayî delodîn biherike, agahî li gorî rastiyê be diruste. Yanî heqîqet e. Ji ber ku bireseriya Firatê heye. Firat ji derveyê me xwedî şikilê hebûnê ye. Rastiyekê diyarkirina " Herikîna belixav û çors" jî heye. Nexwe li vir em digihijin vê encamê; rastiya Firat (bireser) ê û dirustiya daraziya tekildarê wê heye.

Têgîna heqîqetê, di qada felsefî de pir girîng e û sereke mijara pevçûna di navbera meteryalîzm û îdealîzmê de ye. Bi taybetî dokterîn (nazarî, birdozî) ê îdealîst cur bi cur wateyên ji derveyê aqil dan wê. Ji bo pirsgirêk were fêm kirin, em bi hin mînakan şirove bikin .

**1-Baxçê gula Baxçewan û Rêwî**

Em baxçeyekî gula ya bi ronahî bifikirin. Gul, xweşikbûna gerdûndîbûyî îfade dike. Xweşikbûneka xitabê mejî û dilê merov dike. Tevayiya li hevkirin û nakokiya ye. Bi ton dayina bê dawî ya ronahiyê re girêdayî sîtavkên bêdawî ava dike. Li gor gobilîna bayê bêhnên tonê cûda belav dike. Dema bilbil diçe ser gulê dîmena rengê xemrî (şerabî) ya di berbangê de û sîtavka wê ya li ser mejî û şewqa çêdike cûda ye .

Wexta nîvro tîrêjên rojê bilind dibin, hin cûdaye. Kemilîbûn dikeve ser baxçe. Hinek jî westandin tê sehkirin .

Rengê xemrî di bin hingorî (dema roj ava dibe) de pir cûda ye. Tîrêjên rojê yên wenda dibin, bi xemeka nayê zanîn, ji hundir-hestiyar û şîrîn re hevaltî dike. Tirseke ne diyar derdikeve holê. Hesta li paşde mayînê şikil digre .

Gul li bin barana dixunive şevkeke cûda diafirîne. Li ser pelên gula dilopên avê yên zelal ava dibin. Bi tîrêjên rojê yên ji nav ewra diherikin, bi şikestin û biriqîna wan şahiya renga çêdibe. Bêhna gul û axê tevlihev dibin .

Rêwiyekî nû derketiye rê, dema berbangê li kêlaka ev baxçe ku dişibe bihuştê re derbas dibe diçe. Dema derbas dibe disekine û dinêre. Xweşikbûna bi rengê xemrî dikeve nav dilê wê/wî. Dengê bilbilê di dilê wê/wî de dilgeşî ava dike. Rêwî bi vê kêfxweşiyê dilezîne û rêya xwe berdewam dike .

wexteke hil û zelal a nîvro, rêwiyeke ku ji rêka dirêj tê, tî, birçî di nav xwêdanê de di wir de derbas dibe. Rêwî bi westandine li bin darekê rûnişt. Xurekê xwe vedike û zikê xwe têr dike. Ava xwe vedixwe. Hinekî bêhna xwe berdide û rêya xwe didomîne .

Li zeriya rojê her tiştî bi rengê sor xwe nixumandiye. Tirêjên rojê bi derbeya perê dawî li pişt çiyayan wenda dibe. Rêwiyek ji ber hezkiriyên xwe li pişt xwe hiştiye, ji dilê xwe bi xemgîn ber bi dûr ve diçe. Dema baxçê gula dibîne, disekine û meyze dike. Rihê wê/wî bi xeman tijî dibe. Bi kelegirî rêya xwe didomîne. Baxçevan sal dozdeh meh bi van gula re mijul dibe. Çar demsal çar karên cûda dike.  Axê ser û bin dike. Dizane ku gul kengê kulîlk dide, çawa dibe gulpik û vedibe. Reng û bêhna wan ji nêz ve nas dike. Çawa diçilmisin û pelê xwe diweşînin dibe şahid. Têkiliya wan ya bi roj, av, ax û bi şevê re dibîne. Guherîn û veguherîna ku hemû van yeka derxistiye holê ji nêz dişopîne. Gul bi sitiriyê xwe çawa xwe diparêze dibe şahidê wê. Lewma

li vir heqîqet û têgihiştina baxçevan ya gulê û têgihiştina rêwiyan ji hev pir cûda ye .

Gulên li baxçe dixuyê berrahiya bireseriye. Ev berrahiya em dibînin şewqa xwe dide mejiyê me. Gulên li baxçê me qasî ku li hev bikin, guncav bin û yekparestiya diyalektîkî hebe heqîqet e. Encax, şewq tu demê eynî û guncav nabe. Her tim pir nîzike, teqrîbî ye. Ji vê aliyê ve li gor kesan diguhere. Ji ber vê yekê jî heqîqet îzafiye(nisbî). Encax em nikarin li gor xwe,ketober şikil bidin ev baxçê gula. Ji ber ku li holê objektîfiyek (bireserî) heye. Tam ne eslî be jî bi şikilekî li nêzê wê pê dihesin. Di vir de ev yek derdikeve holê. Heqîqeta kirdewar ya şewqa xwe dide mejiyê me, aliyekî wê din ya bireserî heye. Heqîqeta me ji ber ku şeqka xwe ji tiştekî objektîv digre em dibêjin subjektîv e .

Li vir heqîqeta baxçevan û rêwiya ji hev pir cuda ye. Encax ji bo hemûya aliyê wan yên hevbeş hene. Di vir de yê/ya herî nêzî heqîqetê dibe baxçevan e. Ji ber ku ew baxçê gula û taybetmendiyê hemû gula dizane. Di vir de aliyêkî heqîqetê îzafî heye. Lê belê aliyekî wê jî xweser e. Bi serê xwe heye. Çiqas lêgerîn bidome, ev milê heqîqetê kûr dibe. Zanebûn, lêgerîn me gav bi gav digihîne heqîqetê .

## 2-Agir û Pepûleyan

Heya ku qelibîna beravê nede berçavan, merov nikare umanê nû keşf bike."(Andre Gîde)

Di çîrvanoka kevin ya Hindî de tê gotin. Çar pepûle agirekî li dûr pêketî dibînin. Dixwazin fêm bikin, agir tiştekî çawaye .

Pepûleya yekemîn; gotiye ez biçim lê binêrim. Pepûle hinek nêzî agir bûye... Dibîne ku agir derdor ronî dike. Dizivire cem hevalên xwe, gotiye " Ev agir tiştekî ronîker e"!

Pepûleya duyemin; qîma xwe bi vê re nayê, ew jî çûye. Hinekî din nêzî agir bûye û pê derdixe ku agir germ dike. Vegeriyaye ji hevalên xwe re û gotiye; "Agir tiştekî ronîker e û germ dike".

Pepûleya sêyemîn qîma xwe bi vê jî nayê, ew jî çûye. Hinekî din nêzî agir bûye, di carêkê de pê dihese ku agir gihiştiye purtê wê û bi purtê şewitî vegeriyaye û gotiye: "Agir tiştekî ronîker e, germ dike û dişewitîne.

Pepûleya dawî: Ji bo ku hin bêtir tiştan fêr bibe çûye. Hinekî nêz bûye, dîtiye ku ronî dibe. Hinekî din nêz bûye, pê dihese germ dibe. Hinekî din nêz bûye, agir purtê wê qewirîne. û piştî hinekî din nêz bûye bi temamî şewitiye .

Pepûleya çaremîn di rastî de fêrbûye ku agir çiye. Gihiştiye heqîqeta agir. Lê nekaribûye vegere û qala heqîqetê bike. Ji ber ku ew di nav heqîqetê de heliya ye, bûye perçeyeke agir...

Li vir, heqîqet ji her çar pepûleyan cûda û bi sînor e. Her yek ji wan bi fêrbûna hin taybetmendiya sinordar dimîne. Encax pepûleya çaremîn bi sotînê hînî heqîqetê dibe. Li qadeka bialoz ya mîna civak û azadiyê gihiştina heqîqetê, nêzîkatiya di radeya evînê de dixwaze .

Kesê li heqîqetê digere dema cih û wextê wê were, wê mîna ew pepûleyê di nav heqîqetê de bihele û wenda bibe. Wê bibe perçeyek ji wê. Encax wisa dikare bigihije heqîqetê .

## IV- HEQÎQET Û MEROV

"Merovên ku li vê jiyanê ti armanca wan tune ye, dişibin mîna pûşa li ser avê diherike û diçe. Ew bixwe naçin lê bi avê re diherikin diçin."Seneca.

Lêgerîna heqîqetê bi merov re eleqeder e. Rastiya merov îfade dike. Di nav hemû zindiyan de ya xwe ferq dike û li pey heqîqetê ye merov e. Heqîqet, azadî û merov bitûniya diyalektîkî ye .

### 1-Lêgerîna Merov ya Heqîqet û Azadiyê

Firdewsiyê Helbestvanê zanyar yê Mezopotamya؛

"Ev ezmanê şîn ji yakût zaye; ne ji hewa, ne ji avê, ne ji tozê". Ew bi evqas biriqînê, bi evqas stêrka mîna baxçê newrozê xemilî ye. Dema ew ji Rojhilat dizê, şeva tarî wenda dibe diçe."dibêje.

Di bingeha felsefeya afirînê ya Firdewsî de tava pîroz heye. Baweriya rojê, baweriya Mîtra li çanda Mezopotamya cihekî girîng digire. Xwe dispêre yakûta sor heya agahî, çand û daneheva zanebûna hemû ol, bawerî û merovatiyê. Di bingeha hemûyan de lêgerîna mezin ya heqîqetê heye .

Firdewsî jî mîna zanyarên din yên Rojhilat, felsefeya ronahî esas digre. Heqîqetê di rastiya ronahî de dibîne. Lêgerîna heqîqetê di heman demê de rêbazekê hewce dibîne .

Di dîrokê de her lêgerînên heqîqet û azadiyê yên ji dil, di destpêkê de utopyayên mezin in. Lêgerînên azadiye yên bê utopya, lêgerînên mirîne. Merovê bê utopya civakbûna xwe

wenda dike. Ji ber ku ji xwe re xeyal çê kirin bi merovan re sînordar e. Merovê bê xeyal ne merov e .

Hemû lêgerînên heqîqet û azadiyê pala xwe didin baweriyekê. Merov bê ku ji tiştekî bawer bike nikare wê bidest bixe. Di dîrokê de hemû fîlozof, pêşeng û zanyarên mezin yên nûjenî ava dikin û lêgerînvanê heqîqetê ne,di heman demê de bawermendên mezin in .

Lêgerînên heqîqetê yên mezin bê bawerî ne gengaze e. Ji ber ku yê bawer nake nikare bide bawer kirin .

Her lêgerîn li ser fedekariyên mezin bilind dibe. Berdêlên mezin dixwaze. Ji ola bigire, ji felsefe heya tevgerên civakî yên nûjen hemû wisa ye. Dîrok bîra civakî ye. Bîra merovahî, hişê civakî bi lêgerîna heqîqet û azadiyê hatiye hûnandin. Di vê aliyê de tenê ne hêzên çînatî, hin bêtir hêzen ku ji derveyê şaristaniya dewletî û tebeqeyî sekinîne, motora dîrokê pêk tînin. Di herikîna dîrokê de dema ku em li avahiya hêzên li dijî dewletê serîhildane dinêrin,  ev rastî hin baştir tê fêm kirin .

"Zaroktiya merovahiyê, dema ku civak herî xweş pêş dikeve û belav dibe, ew qonaxa ku careke din navegere, çima heya dawiyê li ser me bandora xwe na domîne? Zarokên bê terbiye hene û zarokên mîna zilamên mezin helwest digirin hene. Pir gelên serdema kevnarê di vê kategoriyê de cih digirin. Yûnanî zarokên normal bûn"...

(K. Markis)

Heya wê demê rastiya "dîrok bi Sûmeran destpê dike" nedihat zanîn. Dîrok ,şaristanî û hemû tiştê yekem, hemû destpêk bi Yûnaniya dihat destpê kirin. Ev nêzîkatiya ku navenda wê

Rojava ye, wek "şoventiya Rojava" gelê Rojhilat biçûk didît û heqaret li wan dikir. "Di bin navê ji gelên kûvî, gelên paşde mayî re birina şaristaniyê" di dîrokê de nîzama herî ketî ya kedxwariyê dihat pêşxistin. Tevgera talanê ya herî mezin ya wê serdemê dihat pêşxistin. Zaroktiya normal ya merovatiyê bi Yûnaniya dihat destpê kirin. Gelên Rojhilat "bê terbiye" bûn û zarokên wan ne zarokên normal bûn .

Piştî rastiya Sûmer derket holê, ev nazarî û feraseta di mihwera rojava de yekser bi erdê re bû yek .

Temam, ev nîzama tirsnak ya pala xwe dide kedxwariyê, dibe ku zaroktiya merovahiyê ya normal be? Ji ber ku zarokatî tê wateya; safîtî, xweşikbûn, duristî, paqij mayîn û jiyana bê hîle û bê derew. Rastiya şaristaniya dewletî bi vê yekê re nakok e. Zaroktiya merovahî ne Yûnan e ne jî Sûmer e. Herdu jî qirêjin û pergala koletiyê pêşve birine, kûr kirine.

Dîroka zaroktiya merovahiyê; serdema neolîtîka li "kevana zerîn a bi bereket"e. Li vê serdemê, di nav rastiya heqîqetê de pêvajoyeke herî dirêj, merov bi merov re, merov bi civakê re aştiyane û bi aheng jiyan dikir. Rastiya şaristaniya demokratîk e. Ev serdem, civaka çemê bingehîne ya ku mohra xwe li hemû pêvajoyan xistiye û bingeha feraseta merovahiyê, bîra civakî ava kiriye. Ev çax heya şaristaniya Sûmeran wekî şikilê civakê ya serdest didome. Ev pêvajo, tevlî serpehatiyên civaka çîndar, kole kirinê, pergala kedxwariyê, qirêj kirina civakê ne bûye. Di vê pêvajoyê de serdest û bindest, tundî tune ye. Em dikarin vê pêvajoyê di safîtiya zarokan de li bin têgîna "wext-çand" bi "civaknasiya çandên bingehîn" li ser lêbikolin .

Bi şaristaniya Sûmeran ve pêvajoya civaka bidewlet destpê dike. Mixabin ev pêvajoya zarokî ya ku hucreya bingehîn a merovahiyê ye, di çand, jiyan, rêxistinbûn û berxwedana qebîle û eşîrên Hûrrî yên Pro-Kurd, Gûtî, Kassît, Luwî, Mîtannî, Hîtît, Urartû û Medan de heya roja me îro hebûna xwe domandiye.

Hin mînakên dîrokî-civakî ku emê li jêr rêz bikin, vê rastiyê ji her aliyê ve zelal dike. Ji aliyekî ve şaristaniya dewletî û çîndar ya bi Sûmer re destpê dike, li aliyê din di rewşa hucreya bingehîn de çanda çemê bingehîn ya ku bi civaka neolîtîkê şikil girtiye... Nakokî û pevçûnên bingehîn di nav ev herdu gewdan de ye. Di bingeha hemû nakokî û pevçûnên dîrokî-civakî de ev yek heye .

**a)Lanetbûna Agadeyê**

Sargon (Weke di incîlê de derbas dibe navê melîkê qraltiya Şarrûm-Kîn), ji bo pîrozandina Agadeyê û ji bo di hişê gel de biçîne, xwedawenda evînê Înannaya ku di nav gel de herî zêde rêz dibîne, navê Îştar lê kir û ew ji bo xwe mîna xwedawenda parêzger îlan kir. Qîma xwe bi vê yekê neaniye bi ser de jî li ser navê wê helbest daye nivîsandin. "Înanna mala xwe Agadeyê bi zêra tiji kir. Embara wê bi kevirên mefreq (bironz) û lacîwerd tijî kir .

Encax rastiya jiyanê ji helbest zêdetir bi bandor bû. Agade, her çiqas bi navê Îştarê hat pîroz kirin jî, xelas nebû û ji milê gel ve hat lanet kirin .

Heftê du miletê duh li bin birca diranfîl ya Babilê di nav qeyran û gengeşiyê de diketin qirikên hev, îro li heman erdnîgariyê wek encama wehşeta ku Emerîka afirandiye, li bin bîrên neftê yên li Bexda, Şam û Trablusgarp, qirika hev digirin. Merov mîna ku harbûne, hemû jiyanê tune dikin .

Sargonê mezin layîqê împaratoriya hovîtiyê, paytexteka bi ihtîşam saz kir. Ev bajarê bi ihtîşam, li bakûrê Sûmer li navenda Mezopotamyayê çikand. Navê Agade lê danî .

Agade li dinyaya kevnar ji dîrokê heya niha bû bajarê herî mezin, herî bi şatafat. Lê belê qesra Agadeyê li ser zilmê bilind dibû. Tu zilm nikaribû mayînde bibe. Ev qesra zilmê her kes aciz dikir. Li gor baweriya demê, xweda jî jî vê yekê aciz dibûn .

Îhtîşama Agadeyê ya li ser hovîtî bilin dibû, ji bo kesên li ser vê axê jiyan dikin, tiştekî xerîb bû. Li Agadeyê di nav bereketê de xizanî dihat jiyîn. Bihuşta hindikeyan û dojeha pirayiya li kêleka hev û di nav hev de bû. Ev yek nikaribû wisa bidome. Dawiyê de " xwedayan bi yekitiya dengan, Agadêyê lanet kirin." Encax, lanet têr ne dikir, lewre pê re gihêştin zehmet bû. Xwedayê xwedayan Enlîl gelek fikirî. Weke çareseriya dawî, serê xwe ber bi çiyayan ve rakir. Çavê xwe li ser lûtkeya Zagrosan zoq bûn. Li vir gelê bi navê Gûtiyan yên ku tu serdestî nas nakin, azad dijîn dît.

Gûtî-Hûrriyê, gelê herî qedîm yên Mezopotamya, Agadeya lanet kirî bi xezeba merovên hatine kole kirin, ji bo careke din bi ser xwe ve bi erdê re neyê yek kirin .

Lanet kirina Agadeyê, ji aliyê gelên berxwedêr û azadîxwaz ve hilweşandina wê destpêka xeta berxwedana gelan ya Newrozê ye .

Di vir de du xet du ferasetên cûda derdikevin holê. Yek jê xeta di şexsê Sargon de digihije lûtkeyê, xeta kedxwar, xeta wehşî ya şaristaniya dewletî ya din jî; xeta jiyan û berxwedaniyê ya civatên Hûrrî-Gûtî, Hûrrî-Kassît, Hûrrî-Mîtanî, Hûrrî-Ûrartû, Medên ku nirxên civaka xwezayî mîna wekhevi, azadî esas digirin, li lûtkeya çiyaya, li kûrahiya deşt û daristanan dijîn .

Ev herdu xet ji civaka dewletî heya niha, di nav nakokî û pevçûnan de ne .

Çawa ku Agade hate hilweşandin û şewitandin, heman tişt wê were serê Nînovayê. Hem jî bi destê gelên li derveyê dewletê dijîn .

"Gelekî piştre xwedê, li dijî Asûra ku bûye bela serê gelan hêrs bû, weke artêşên cengê, serî li çareseriya dawî da. Li hember zilma Asûr xwedê got ku; 'Aha ezê li dijî wan Med'an şiyar bikim. Ji bo wan qiymeta zîv tune ye. Û bi zêra dilxweş nabin. Û Medî xistibû tevgerê".

Û dema ev roj hat yekîneyên berxwedêr mîna lehiyekê herikîn ser Nînovayê. Melîkê Asûr ji bo revê firset nedît. Bi malbata xwe re xwe avêtin qesra di nav agir de. Nînova şewitandin û ji holê rakirin. Careke din tu kesî kavilkê wê ne selihand. Piştî sed salan Îsa wê bigota; Nînova şewitandin û hilweşandin wê kî ber bikeve." Dîrok, 21 Adar 612... Rojeke nû ya bê Dehaq destpê dikir. Navê roja nû NEWROZ bû .

Ev berxwedana azadiyeke mezine ku qebîleyên ji koka Hurriyên- Pro Kurd, pêş xistine, " Li kevana zêrîn, li zozanê Medya û li hemû Mezopotamya bû sedema exlaqa mezin ya xwe spartiye azadî, edalet û wekheviyê. Di lêgerîna azadî û heqîqetê de cihê diyarker ya Zerdeştê Zanyar, bi ev exlaqê mezin ya ku xuliqandiye, bi vîna azad û berxwedanê pêşkêş kiriye ve têkildar e .

Meyla azadiyê her çiqas xwe dispêre kevneşopiyeke ewqas kokdar û kûr jî; ji gelê ku tu dagirkerî qebûl nake" heya îro û vê demê bi profîla kesayeta binketî terîf kirina wê, ketina vê rewşê trajediyeke mezin îfade dike. Li gel vê li vir pevçûna du xetên cûda mijara axaftinê ye .

Ya yekemîn, xeta Sûmer-Akad-Babil-Asûr e. Ev, xeta kedxwarî-çînatî û dewleta ku bi têgîna "çerx-şaristanî" tê bilêvkirin û dikeve bergeha "civaknasiya binyadî" ye .

duyemîn; xeta çemê bingehîn a ku xwe dispêre çanda civaka xwezayî û îfadeya xwe di têgînên "dem-çand" de dibîne, dibe mijara sosyolojiya çandê. Xeta azadîxwaz ya ku eşîr û qebîleyên ji jêderka Gûtî-Kasît-Mîtannî-Luwî-Urartu- Medên li derveyê dewletê li serê çiyayan bi awayeke azad û xweser jiyîn e. Ev herdu xet di cewher de şerê azadî û koletiyê ye .

**b) Jiyane ku Aliyekê wê Nemrûd Aliyekê wê Brahîm e:**

Herdu stûnê ber bi rûyê ezmana ve hildikşe çîroka Hz. Brahîm û Nemrûd tîne ser ziman, ji hezar vir de hin jî li Riha li ser gola masîdar wekî şehadeya dîrokê û şahidê vê mîtolojiyê bi wî awayî disekine .

Brahîm li vê derê avêtin nava agir? Agir veguherî avê, êzing veguherîn masiyan? Eyn Zelîxe ji bo evîna Brahîm xwe di nav agir de şewitand؟

Ev mîtolojî nayê zanîn... Lê pêwendîdarê mijarê mîtolojiya Hz. Brahîm û Nemrûd bi xweda Mardûk û xwedawenda Tîamat re,wekî nakokî û pevçûnên di nav du şaristanayan de dest girtin û şîrovekirin hîn bêhtir nêzî rastiyê ye .

Bi rastî jî bi tekildarê vê mijarê, têkiliya Hz. Brahîm, xwedawend Tîamat û xweda Mardûk pir balkêş û kartêker e .

Li gorî mitosa olî, xwedawenda Tîamat û Brahîm li dijî xwedayê Babil Mardûk şer kirine. Ev mitos di lêgerîna heqîqet û azadiyê de du şerê mezin ya di navbera herdu pergala de tîne ser ziman .

Li gori vegotina mîtografan; “ Li başûrê Mezopotamya her çiqas carna baran pir zêde bibare jî, berê wiha bawer dikirin ku bîr, çem, rûbar û gol avên xwe ji uman (okyanus) a şîrin ya li bin erdê li abzû (apsu) an jî engûr bidest dixistin.” (Jeremy Black-Antony Grên)

Dibêjin ku, pişti xuliqînê pişti ji hev qetina rûesman û rûyê erdê tenê yek zindiya ku hebûna xwe berdewam kiriye Tîamat û Abzû ye. Herdu digihijin hev û jiyanê diafirînin. Abzû dergistiyê Tîamatê ye .

Enkiyê qurnaz (Ea) bi hileyê Abzû dikuje. Li ser terme Abzû mala xwe ava dike û li ser mîrasa wî desteser dike .

Xwedawenda Tîamat, biryar dide kû tolê hilde. Li dijberî wê Mardûkê lawê Enkiyê qurnaz heye. Di navbera herdûyan de piştî ew şerê dijwar û demdirêj, Tîamat bin dikeve. Mardûk gewdê Tîamatê dike du qet. Bi nîvê wê rûye ezman lê dike. Bi nîvê din şikil dide rûyê erdê. Ji singa wê çiyayên Zagros û Torosan ava dike. Ji çavê wê Firat û Dîjle diherike. Tifa ewrên li ser zagrosan her tim heyî ava dike. Ewrên qat qat û kefa sipîwê li ser Zagrosan bi kefa sipî ewrên kumulus yên qat qat û bi kefa spî…

Mîtos; di lêgerîna heqîqetê de, di gihiştina koka hucreyê de her tim rênîşandêr û hînker e .

Ab-zû di Kurdiya îro de tê wateya (Ab;av, Zû; bilez, bi coş) robara bi coş. "Engûr" jî; di dimilkî de navê tirî ye. Têkildarê jêwergirtina li jor, Abzû tê wateya robara bi coş ya ku li cihê rezên-tirî diherike .

Dema ku merov bal bikşîne ser baxçeyên mêwê ya Babil, hin bêtir têkiliya wê ya bi rastiya dîrok û civakê ve wê hîn bêtir fêm bibe .

Mezopotamyaya jor weke "bihuşt" a welatê rez, baxçe û robarên bi coş tê teswîr kirin .

Dibe ku Abzû bi coşbûna çemên Dîjle û Firat ve eleqedar e. Ev welatê çemên bi coş dayik niştîmana neolîtîkê ye. Pal daye çanda jina dayik û xwedawenda. Abzû û Tîamat çanda Mezopotamya jorîn ya xwezayî, wekhevîtî, azadîxwazî temsil dike. Enkiyê Kurnaz û lawê xwe pergala dewletî-çînatî-koletî ya Mezopotamya Jêrîn îfade dike. Pevçûn di navbera herdu şaristaniyan de pêş dikeve. Rastî jî şaristaniya Sûmeran zemîna

xwe ji neolîtîka Mezopotamya jor digire. Yanê Enkiyê qurnaz mala xwe li ser termê Abzû (dibe çanda neolîtîkê) lê dike .

Ev pêvajo tam jî beranberî dema şerê di navbera Babil û civakên Hurrî-Kassît dê ye .

Ji ber ku Mardûk ji 3. Xanedana Ûr ve xwedayê parêzvan yê bajarê Babil e. Bilind bûyîna Mardûk ya bûyîna xwedayê sereke, bi derbasbûna Babilê ya ji dewletê ber bi împaratorî ve têkildar e. Ev di heman deme de serdema şerê Babîl û Hurrî- Kassît e .

Komên kedkar yên Hûrrî-Kassît (federasyonên qebîle), berî zayîne serdema 18. De welatê Babil xist kontrola xwe û heya 500 salê rêvebirin .

Pêvajoya dîrokî ya ku Hz. Brahîm jiyan kiriye li rastî sedsala 18. tê. Bi pêvajoya Hûrrî-Kassît û Babil-Mardûk re li hev tê. Di rastiya Hz Brahîm de melîkên Babil “Nemrûtên” ku bi zilmê nav û deng bûne ye. Dîsa xwedawendê Nemrût yê sereke Mardûk e. Li vir Hz. Brahîm, Abzû û xwedawenda Tîamat ne li heman cihî bin jî di heman pêvajoya dîrokî de li heman çeperê li dijî xwedayê qurnaz Enkî, lawê wî Mardûk û dijî Nemrût şer dikin .

Cewhera vê Mîtosê di gihiştina heqîqetê de piştrasteke girînge. Hz. Brahîm, xeta heqîqet û azadiyê temsîl dike. Têkoşîna li dijî Nemrûd, têkoşîna li dijî şaristaniya dewletî û koletiyê ye. Her çiqas efsûn tenê daxistine asta baweriya olî jî, çewhera mijarê, şerê di navbera çanda civaka çemê bingehîn û şaristaniyê de tîne ziman .

Belê, jiyane ku di navbera Nemrûd û Brahîm de birîneke xwîn jê tê. Aliyekê wê nalet e, aliyekî Pîrozî ye. Di vê çîrokê de Nemrûd civaka dewletî-tebeqeyî û şaristaniyê temsîl dike.

Nemrûd bûyîn di civaka şaristaniyê de dibe lûtke. Ji ber ku Nemrûd bûyîn, çawkaniya hemû xirabiyane. Çîrok ev e! Her çîrok bi rastiya dîrokî û civakî ve pêwendîdar e .

Mina duh, îro jî aliyekî jiyana Nemrûd, aliyekî Brahîm e. Aliyek koletî, aliyek azadî ye. Pêwîste di vê rastiyê de li heqîqetê bigerin .

**c) Prometeûsê zincîr kirî:**

Mîtosa Prometeûs yek jê mînaka kartêker ya lêgerîna azadî û heqîqetê ye. Navê prometeûs tê wateya kesê ji berê ve dizane, dibîne. Dibe kahîn yanê zanyarê serdema xwe.

Xwedayan li lûtkeya Olîmposê, merovan li quntarê çiyayan jiyan dikir. Zeûs li Olîmposê serdestiyeke teqez ava kiribû. Prometeûs bi hêza zanistê li dijî Zeûs derdikeve. Zeûs ji bo Prometeûsê alîgirê merovan ceza bike, agir li ser merovan qedexe dike .

Êdî agir li hemû cîhanê tenê li ser Olîmposê pê diket. Tenê xwedayan ji agir feyde didîtin. Agir aqil û zanist bû. Aqil û zanyarî xweseriya merovane. Di lêgerîna heqîqet û azadiyê de zanebûn û aqil tune be nabe. Encax çawa ku îro zanist di bin yekdestiya serdestan de ye duh jî di yekdestiya kesên serdest de bû .

Prometeûs ev neheqî qebûl nekir. Bi işkenceyê hêwildanê dide ber çav û rojekê agir (agahî, zanist) ji xwedayan diziya agir pêdixe û digihîne merovan. Xweda ji vê pir aciz dibin. Ji ber vê yekê Prometeûs bi cezayekî pir hêwildanî (xofdar) mehkûm

dikin. Li çiyayên Qafqas, li ser zinareke tenya zincîr dikin û heya bêdawî mehkûmî işkence dikin. Her şev teyrek tê kezeba wî dixwe. Roja din kezaba wî dîsa çêdibe û mezin dibe. Teyr dîsa tê û kezeba mezin bûyî dikiritîne û dixwe. Prometeûs vê işkenceyê wiha tîne ser ziman: " Lê ez tiştê ku were serê min dizanibûm. Min bi zanebûn bi xwestek sûc kir. Lê ezê li hember vê zehmetê tehemûl bikim".

Encax agir bi şertê ku careke din nevemire ji ser destan nehate xwarê. Li vir agir, aqil û zanebûn bû. Merov piştî ku gihişt aqil û zanebûnê û agir nas kir, gihişte jiyaneke nû. Êdî tu tişt wê ne wekî berê bibûya.

Şerê di navbere Zeûs û Prometeûs de şerê koletî û azadiyê ye. Ev lêgerîneke heqîqet û azadiyê ye .

Prometeûs li aliyê merovane. Li şûna serdestiya xwedayan serdestiya merova esas digire. Bi xapandinê ji Zeûs agir dizîna Prometeus, di derbarê hêza xwe, rastiya xwe û lêgerîna heqîqeta xwe de hişyar bûna merovan e. Prometeûs nûnerê merova ye. Trajediya dijî trajediya merovatiyê ye .

Li vir şer di navbera Zeûs û Prometeus de ye. Ev şer şerê koletî û azadiyê ye. Ev lêgerîna merovan ya heqîqet û azadiyê ye .

Zeûs, pergaleke li dijî merovan ava kiriye. Koletî mîna çarenûseke neguher li ser merova ferz dike. Kratos (Hêz) ê kû Prometeûs li ser zinaran bizmar dike vê rastiyê wiha îfade dike; “Hemû hebûn ji berê de bi çarenûsekê binbarî bûye. Tênê serokê xwedayan ne binbarî ye: Ji xeynî Zeûs tu kes ne azad e”.

Encax em dizanin ku di çîrokê de axaftina dawî ya Prometeûsê. Ji ber ku di dîrokê de her tim axaftina dawî lêgerînvanê heqîqet û azadiyê gotine .

Prometeûs têgîna ku li ser disekine. Hişmendî û Azadî! Ev herdu têgîn weke du têgînên civakî yên xweseriya merovan tên destgirtin .

Em dizanin ku her merovê lêgerînvanê heqîqet û azadiyê, ji bo tariyê çirûskeke hatiye pêxistin e. Her çirûsk mîrasa azadiyê ya dewrê neslê din dikin e .

Êdî di her lêgerîna heqîqetê de agir, ji bo agir bangek e. Di her asoya agirê vemîrî de agirên nû wê şewitînê bidomînin. Ji ber ku carekê agir gihiştiye merov. Şêx Xalib; Li cewhera xwe baş binêre, Ji ber ku çavê gerdûnê tûyî, tu nîva reşika çavê hemû merovatiyê, tu ademîzadî"!

Meslow; " Armanca hebûna merov, xwe pêk anîn e" û Şêx Xalib; "Jiyan xwe bûyîne!" dibêje. Merovan di dîrokê de her tim ji bo ku karibin bibin wek xwe û bigihijin jiyaneke azad jiyana xwe danîn holê .

Û "bayên mirinê yên ripîreş wan girt, taveroja têr ronî berdan û çûn".

Prometeûs bi gotina; " Heya ku Zeûs ji textê xwe nekeve dawiya işkenceya ku dibînim nayê." di lêgerîna heqîqetê de vê rastiyê îfade dike. Di vir de di lêgerîna heqîqetê de du meylên cûda derdikevin holê. Yek ya Zeûs ya din nêrîna Prometeûs… Yek feraseta "dem-çand", ya din jî "dem-şaristanî" ye .

Lenîn, Gramscî û Lukacs ji hev serbixwe bi gotina "Merov him bireser û him jî kirdeya dîrokê ye" diyar kirine .

Marks dibêje; "Merov tiştê ku wê bike destpêkê di mejiyê xwe de disewirîne lê vê yekê di nav şertên dîrokî de dike"

James W. Thompson bi gotina; "Di nav heyîna de tenê merov bi dîroka xwe ve eleqedar e, û ferq dike" di lêgerîna heqîqetê de xweseriya merov derxistiye holê. Nexwe, " Jiyan xwebûn e".

## d) Mûsa , Lêgerînvanê Heqîqetê yê serdemên kaosî:

Û Mûsa li dijî birayê xwe Fîrewn serî hilda .

Fîrawnbûn tê wateya zext, neheqî, bê edaletî, zilm, koletî û kedxwarî… Rixmê ku di ser de bi hezaran sal derbas bûye, navê Fîrewûn hin jî bi zilm û koletiyê re wekhev e. Di vê wateyê de di bira civakê de cih digire. Pergala Fîrewûn li her qada jiyanê hawireke kaosî ava kiribû. Bi sed hezaran kole bi qamçiya di avakirina pîramîda de dihatin şixulandin. Merov û gelên azad kontrol dikirin û ew mehkûmî koltetiyê dikirin. Fonksiyoneriya ev avayiyên qerase xwe dispêre ked, trajedî û zehmeta bi sed hezaran kole. Û Mûsa li hember birayê xwe Fîrewûn serî hilda .

Destpêkê bi kujeriyê hat sûcdar kirin. Musa ji Misirê reviya, li Rihayê (wê demê navê Sogmatar derbas dibe) xwe avêt ber bextê zanyarê çolê yê Medî Yetro (li gorî Kur-an'ê Pêxember Şuayîb, li gor tewratê Hanok). Heft sal ji Yetro re şivantî kir. Piştî heft salan Yetro hem keça xwe hem jî fikra xwe da Mûsa. Mûsa bi vê fikra nû xwe pêça û vegeriya Misrê. Qewmê xwe bi van fikra rêxistin kir û li dijî Firewûn seri hilda. Misir di nav

hemû serdeman de dema xwe ya herî tarî û kaosî jiyan dikir. Di vê dorhêla kaosî de lêgerîna heqîqet û azadiyê pêşve dibir û kûr dikir. Ji bo ku gelê xwe rizgar bike dema bi Fîrewûn re şer dike, deh xezebên ku ji serî heya binî li ser Misrê bandorker e tê jiyîn. Li gor çîrokê Behra sor diqelişe, Mûsa di vê qeliştekê de derbas dibe. Piştî derbas dibe av dîsa digihijin hev û artêşa Firewûn dixeniqîne. Ev çîrok di her sê pirtûkên pîroz de derbas dibe .

Li gori Tewratê Fîrewn, ji ber ku gelê Îbranî azad nekiriye û ji bo ji welat derkevin destûr ne daye, deh xezebên mezin çê bûye. Mûsa piştî têkoşînên mezin digihije axa mezin ya ku xwedê ji wan re soz daye .

Mûsa ji bo lêgerîna heqîqetê ye. Tê gotin ku qewmê xwe ji Misrê digire û çil salan li çola digerîne. Mûsa derdikeve çiyayê Tûr û “deh fermana” tîne. Heqîqet di deh fermana de veşartiye. Li vir heqîqet wekê sozê xweda pêk tê. Baweriya Mûsa olê teng ya qewmî ye û tenê ji bo cihûya derbasdar e. Wekî ola qewmekî pêş dikeve. Encax, ji ber ku olê yek xwedayî ye, xwediyê teşeyeke fikrî ya nû ye. Lêgerîna heqîqetê ji ber vê yekê girîng e .

**e) Îsa yê li Golgota yê çarmix kirî:**

Li Golgota yê digerim, lawê Meryem a bakîre (destpêneketî) Li bin roja dijwar, gewdê wî bi çermê ga vezelandine. Di serdema me de her cih Golgota ye. Bênavber zêde dibin Îsa`yan. Li ser navê xwe, ez kêfxweş dibim. Jiyana ku me xeyal dikir, li avên zelal sosina şîn ya avê ye. Li ser rûyê erdê Golgotaya

qedexe dikim. Hema bila Pontîûs Plate, serî hilde. Şa’ yê qelibandî bila rabin ser linga, kesên xedar ji min re ne xem e. Kîna gelan tê tûjkirin, hêza kedkaran mezin dibe. Em digihijin bendera deryayê. Kapîtan, lenger diavêje avê. Di destê wî de deftera seyrê, Nezîk de wê firtûneya heqîqet û azadiyê rabe.

Merovê li heqîqetê digere, ew merovê ku li beramberî mercan serî natewîne ye. Ew kesê ku wan şert û mercan li hêla xwe diguherîne, veduguherîne ye .

Îsa jî di serdema xwe de yek ji lêgerînvanê mezin yê heqîqet û azadiyê ye. Ne li ser navê gel û qewmekî li ser navê hemû merovahiyê derketiye rê. Rizgarkirina hemû merovahiyê hedef girtiye .

Di pergala Roma ya ku Îsa di nav de jiyan dikir de pergaleke hişkohol ya koletiyê serdest bû. Kole hemû nirxên merovahiyê wenda kiribû, kole kiribûn heywan. “Ji bo ku dexma li serê wan neyê veşartin, serê hemûyan heta nîvî qusandî bû .

Çavdêrek ji yê din re digot:

“ Li vî milê çiyê yê mîna pişta pars (şek, heywaneke goştxwar, dirinde) bixet binêre. Kî xezelok e kî zêde qemçî xwariye diyar dibe. Ew, ji bo ku kulmek genim xwariye hat ceza kirin. Cîranê wî jî, ji ber ku li ga miqate nebûye… Ewê din yên lingê wan zincîr kirî jî, ji bo xwestine birevin ceza xwarine. Careke din ji bo revê hewl bidin xelasbûna wan tune ye. Dawiya wan; an wê di firinê de werin şewitandin, an wê bi şêran wan bidin perçe kirin an çarmix bikin an jî wê cilê biqîr li wan bikin û wan bişewitînin.” (M. Îlîn, S. Egal)

Roma di dema xwe de împaratoriya herî mezin ya koledar bû. Wek felsefî û ramanî kole ne mîna merov, mîna heywanê “zindî û du lingî” dinirxand .

Heqîqeta Roma, dinyayeke tipûtarî ya ku hemû xirabî û kirêtiyên hemû deman bilind bûye bû. Koledariyeke belavbûyî ya li ser malê dinê hilkişiyaye serdest bû. Merov ji merovbûnê dûr diketin. Kirêtbûn, bêslbûn û ji cewhera merov dûr ketin belav dibû .

Artêşa koleyan ya digihişt milyonan, ji bo kulmek efendiyê bihagiran yên Romê dixebitîn. Rom bi gotinek dî kedxwarî û koletî bû. Kole, tenê weke “heywanê dulingî” di hilberînê de dihatin şixulandin. Gladyatoran ji bo efendiyê xwe kêfxweş bikin, li arena (meydan) yê Romê bi heywanên wehşî re berdidin hev. Merov wek fikrî, fizîkî û exlaqî, daxistin asta heywanan. Kedxwariya koledar ya Rom, di pêvajoya emperyal (kedxwarî) de heywanbûneke mezin pêş dixist. Çelexwaribûn, bêslbûn çeşîdek ji heywanbûna rastî bû .

Di serdema ku Îsa derket holê de Rastiya ku Roma di nav de dijî ev bû.

Îsa Mesîh, weke bingeha vê xirabî û kirêtiyê, bêsinor di bidest xistina koleya, dewlemendiya bêsinor û nêzîkbûna madî didît. Ketina koleya, kûrahiya cûdabûna civakî, jinê daxistina asta zayenditî, ya qeba û fahîşe kirina wê, rizandina exlaqî di madiyata ku wek hêza pasîf dinirxand de didît. Di felsefeya Îsa de ‘hêza pasîf’; “made+tarîtî+xirabî” bû. Îsa lêgerîna heqîqet û jiyana azad, bi vê felsefê re dide destpê kirin.

Di vê zemîna nakokiyên civakî de rihê merov kirêj dibû, manewiyata wan tune dibû, exlaq diriziya. Hemû xirabî û kirêtî ji vê madiyata qeba derdiket. Madiyata qeba ya Romê bênavber xirabî, nexweşî, kirêtî diafirand. Ev hemû civakeke ketî, ji cewhera xwe dûr ketî û civakeke nexweş ava dikir. Roma li lûtkeya rizînê bû. Tu tiştê ku bide merovan nemabû. Ketibû halê xirabeyê. Nekaribû zikê kolan jî têr bike. Di asta jor de rêveberiyeke kêfî û zexteke qeba ya tebeqeya hebû. Roma,di çareserkirina her tiştî de zexta eşkere esas digirt.

Li qesra Roma dawiya dek û dolaban nedihat. Kişkişeyên li qada civakî, raperîn, nerihetî bandorên xwe li ser tebeqeya serdest jî dikir. Rom ji koka xwe ve dihejiya û kaos serdest dibû .

Ji milê manewî ve jî merov bê hevî bûn. Êdî xwedayan tiştek ne dida wan. Ji milê manewî, moral û nirxên exlaqî ve civak gelekî di asta jor de qels bû. Ev westarî, paşveçûn, rizandin, koletî û madiyata qeba, pergaleke tarî diafirand. Lêgerîna Îsa ya heqîqetê di mercên wiha de destpê kir .

Îsewîtî li hember van hemûyan, ji bo merovan wekî şewqa hêviyê derket holê .

Merov, di şexsê Îsa de derket ezmana, ji nû ve pîroz bû û xwestin heqê merov bidinê .

“ Merov dixwazin xwe hilkişînin qata xwedê, xwe ji erdê qut bikin. Ango ji taybetmendiyên olên xwezayî rizgar bibin, ol bixin berhemê hemû merovahiyê, dixwazin berê xwe bidin têgîneke gelemperî. Li vir Îsayê ku merov e, wê xwe di rewşa xwedayî de bibîne. Rûyê wî yê din, her derê wî êdî tê nasîn, hatiye keşf kirin. Bila neyê ji bîr kirin ku, cihê lê keşf kirin hebe,

ol ji holê radibe. Hêz keşf bûne, taybetmendî keşf bûne, yê keşf nebûye jî gerdûne, rûezmane.” (Rêber A.Ocalan)

Îsa, dixwest merova ji xirabiyên, êşên rûyê erdê rizgar bike, merova pîroz bike. Ji ber ku xiristiyanî, ji hemû olê heya wê demê hatine cûdatir bû. Cûdahiya wê, rizgar kirinê ji bo hemû merovan xwestina wê bû. Ev ji milê ramanên olî û derketinê ve tê wateya jiyaneke nû. Xwesteka rizgar kirina hemû merovan, wekhevî û azadiya hemû merovan xwestin e .

Derketina Îsa radeyeke bilind da, merovperwer û nerm e. Derketin, li dijî silteyê derketineke olî ye. Lê belê bi gerdûnbûyînê ji olê din cûda dibe. Li ber birûskên hemû olên damezirandî dikeve .

Di vê xalê de Xiristyanî bi gelek zehmetiyan re rû bi rû dimîne. Li zexta zêde ya Roma duçar dimîne. Û Îsa li Golgotayê li çarmixê dixin. Hewarî, ezîz û ezîzeyên Îsa neçar diminin vedikişin bin erdê. “Rihê pîroz”, Îsayê lawê Meryem; tê wateya “xwedayê rizgar dike .”

Di cewhera kesên serî radike de xwestin û pêş xistina azadî, qencî, exlaq, nirxên moral û manewî heye. 35 hezar xweda û xwedawendên ku çavkaniya xwe ji mîtolojiya Sûmer digirin, li Roma hikum dikin. Lê dîsa jî li zemîna Roma, rizîna fikri, bijartekerî (eklektizm) herî bilind e. Li ser vê zemînê fikrê yek xwedayî esas girt .

Îsa ji vî aliyê ve, di lêgerîna heqîqet û azadiyê de derketineke nû û rêbaza çareseriyê bû. Derketina wî herî kêm qasî raperînên koleyan bibandor lerizîner bû. Îsa ji bo çareseriyê “ne bi zora çekan bi hêza rih” biafirîne dixebitî .

Îsa gihiştina rêka heqîqet û azadiyê di paqij kirin û pakbûna rih, di terbiye kirina derûn de lê digeriya. Ji bo vê şerekî mezin da destpêkirin. Îsa ji bo wê bi gotinên “min ji we re ne aşitî şer anî” xitabî girseya dikir. Di nav pergala damezrandî de aşitî nedihat bidest xistin. Ji bo aşitî pêk were, destpêkê pêwistî bi şerekî mezin hebû. Berê şer di yek navendê de kom dikir. Îsa digot; “Hem ji xwedê re hem jî ji mamona (serwet) re xizmet kirin ne gengaze”.

Ji ber ku li Roma newekheviyeke mezin ya serwet hebû. Hinek ji wan heta dawî dewlemend dibû, girseyên gel yên berfireh, kole heta dawî di nav xizanî, hêjarî û belengazî de bûn. Derketina Îsa di heman demê de tevgera wekheviya civakî bidest xistin û newekheviya serwetê çareserkirinê bû. Vê yekê destpêkê ji paqijkirina rih û bi terikandina serwetê re da destpê kirin. Ji dewlemendiya newekhev, ji malên neheq rizgariyê di heman demê de wekî ji xirabî û kirêtiyê rizgarbûn didît.

Hêmana “her tişt yê her kesî ye” esas digirt. Li gor Îsa hemû dewlemendiyên madî yên xwedêne. Lewma malên hevpar ye qanûnên wî ne .

“ Her tişt yê her kesî ne” Armanc seltenata xweda-yek xweda ava kirin bû .

Ev rastî terzê jiyana civaka neolîtîkê ye. Milkiyeta hevpar ya civakî tîne ziman. Ji bo gihiştina lêgerîna heqîqetê pêwiste serwet-milkiyeta taybet biterikînin .

Selteneta xwedê, “ Bingeha jiyanê li ser esasê hezkirina merovahî û ji nû ve avakirin, li ber yên bêhêz û guneh ketin, veqetîna di navbera dewlemendiyan de ji holê rakirin, Her kes

bi hev re û ji bo her kesi şixulîn, ya ku merovan ji xirabiya li ser wan de hatiye rizgar bike, ev e.(Max  Bêr)

Ya ku Roma li dijî Îsa ewqas erîşkarî kir, Îsa rêkir çarmixê, ramanên Îsa bû.

Îsa li ser zemîneke ku civak hatibû kerkirin, nehestiyar kirin û tune hesibandin derdikeve holê û di nav vê civaka kor û ker de dest bi lêgerîna heqîqet û azadiyê dike. Ji bo bigihije heqîqetê terikandina serwetê esas digire. Civak û rastiya civakê bi gotina "ruxmê ku dibînin, nabînin, ruxmê ku dibihîzin, nabihîzin û fêm nakin" dibêje. Dîsa dibêje; "Ev gel di lêv de ji min re rêz digirin, lê dilê wan jî min dûr e. Min beyxûde dihebînin." Li dorhêleke ku rizîn, qirêj bûn, bêslbûn û xerîb bûn derketiye asta herî jor, Îsa fêm kirin û têgihiştin qederekî girînge.

Îsa li hember ev rastiya Roma dibêje; "yê dixwaze li pey min were bila xwe înkar bike. Xwe çarmix bike û min bişopîne." Xwe înkar kirin, wê demê fikir, bawerî, hînbûnî û terzê jiyanê bi giştî danîn aliyekî û fikra nû, feraseta exlaqê nû, terzê jiyana nû ya ku Îsa dipejirîne esas girtin e. Ev tê vê wateyê. Ji bo gihiştina heqîqetê pêwîste şaristaniya heyî ya çînî-dewletî, koledariya Roma biterikînin. Di nav avahiya civaka Roma ya koledar de nagihije heqîqetê. Hewarî, Ezîz û Ezîzeyên Îsa, qasî 300 salî bi baweriyeke mezin, bibiryarbûneke mezin li dijî zilma Romê şer kirin û fikra Îsa wekî hêviya rizgariyê, li ser merovan belav kirin. Hemû kole digihiştin ola Îsa. Êdî rizgarî li wir bû. Ev di dîrokê de dibe lêgerîna herî mezin a heqîqet û azadiyê.

**f) Baxçeyên Manî yên bi Ronahî:**

“Ey jiyan, ewqas binirxbûna te bi saya mirinê ye” (Seneca)

Manî di nav şevereşiya serdema xwe a ku riziye, genî bûye û veguheriye keleha zilmê de, avakirina baxçeyên ronahî xeyal dike. Baxçê ronahî; di lêgerîna heqîqet û azadiyê de jiyana nû ya ku merovê nû bêriya wê dike, dixwaze bigihijê û heviyê xwe pêve girêdayi ye. Cûreyek ji Utopya ye. Lêgerîna heqîqet û azadiyê ye. Li hember tarîtiyê, tekoşîna lêgerîna ronahiyê ye. Ronahî; di kevneşopiya felsefeya Zerdeşt de heqîqet e. Baxçê ronahiyê; têkiliyên nû a kû merov dixwaze biafirîne û jiyana azad e. Terzê jiyana azad ya nû, ya ku merovê xweşikbûye, li dijî neheqiya serîhildaye û pêşveçûnê esas digire, armanc kiriye .

Di vê serdema dîrokê de Mezopotamya di nav tarîtiya de ye. Serdema qirêj bûye di rastiya merovê qirêj bûye de şênber dibe. Manî li hember vê tarîtiyê, di lêgerîna heqîqetê de bi felsefeya ronahiyê derdikeve holê. Baxçê ronahiyê, di lêgerîna heqîqetê de navê jiyana nû ya hatiye armanc kirin e .

Manî bi kesayeta xwe ya bawermend, biryardar, li dijî tarîtiyê tekoşîna avakirina baxçê ronahiyê dimeşîne. Navenda giraniya fikra wî ji felsefeya Zerdeşt pêk tê. Lê ew Zerdeştî derbas dike, bi nûjenkirina felsefeya Zerdeşt nûkirin û pêşxistinê bingeh digre. Manî ji aliyekî ve şervantiya baweriyê ya Îsa jî di xwe de şênber dike. Îsa û hewariyên xwe li ser pişta kerê, sefera mezin ya Quds û Roma pêk tînin. Manî jî ji bo fikir û baweriya xwe belav bike, di dilqê gerokî de seferên mezin li dar dixe. Ev ji

milekî ve heqîqet gihandina gel e, mejiyan ronîkirin û bi heqîqetê re yek kirina dila ye.

Manî ji bo baweriya belav bike û bigihîne gel, hemû erdnîgariyê ji seri heta binî digere. Jiyana wî wek lêgerînvanê heqîqetê, kesayeta wî jî di nav çand, kevneşopî, ol û baweriya Medan de şêwe digre. Ji çanda civaka çemê bingehîn bandor dibe .

Manî di zaroktiya xwe de ji milekî ve di nav çanda Med û baweriya Zerdeşt de şikil digire ji milê din ve jî bavê wî hewl dide ku Manî di nav terîqetekê de teşe bigre. Sîttayê ji Palmîra ji vê terîqetê re rêvebertî dike. Terîqeta Sîttay ruxmê ku ji Zerdeşt bandor bûye jî, terîqeteke ku ji Zerdeştî qut bûye, bi Zerdeştî re nakok e, di asta jor de ji Cihûtî bandor bûye û jirêderketiye. Manî heya bîst saliya xwe di nav vê terîqeta jirêderketî de dimîne. “Terîqeta ku di nav de cih digire cilê jina yê yek rengî li xwe dike. Xizanî esas digire, bi birçîbûnê nefsê xwe kuh dike.” (Amîn Maaloûf)

Manî li vê terîqetê digihije terbiya nefsî. Feqet ew, jiyana li wê derê napejirîne. Her tim li ya nû, xweşik û rast digere. Li dijî ev jiyana cemidî, hişk û yekparêz, serî radike. Bi terîqetê re dikeve nav nakokiyan û şer dike .

“ Manî, şalekî devlinga wê fireh, bi rengên zerê kufîkî û keska hirmî li xwe kiribû, xirqeyek şîna ezmana avêtibû ser mile xwe, kirasê wî spî bû û ew rojên dilteng yên bendêmayî kirasê xwe bi çîçeka xemilandibû. “(Amîn Maloûf)

Ev serhildana Manî ya li dijî kevnariyê û lêgerîna wî ya heqîqetê bû. Li hember cilên yeknesak, yek reng, cilên rengîn yên ku bîriya wan kiriye li xwe dike. Ruxmê ku qedexe ye bi koleyên Yewnanî re dide distîne û fikrê xwe ji wan re dibêje. Dîsa rixmê ku "qedexe û guneh e" jî bi jinan re dide distîne û fikrê xwe ji wan re dibêje. Ruxmê qanûnên terîqetê yên hişk, dest bi çêkirin wêne dike .

Vekolîna Zerdeşt dike û dikeve pêvajoyeke kûr ya lêkolînê. Yekemîn encama gihiştiyê; "di her tiştî de û di hindurê her yekî de tarîtî û ronahî heye" bû .

Di vê lêgerîna heqîqetê de şêwazê fikirînê yê bingehîn û xala destpêkê ye. Heqîqet ronahiya di hindurê merov de ye. Ev ronahî di her merovî de heye. Bi vê re rastênhev bi heman şikilî tarîtî jî heye. Nexwe, di bingeha çêbûnê de tarîtî û ronahî heye. Heqîqet, ronahî bixwe ye û li her derî, di her tiştî de peyda dibe. Ev felsefe û şêwazê fikirînê ya Zerdeşt e. Lê belê ew qîma xwe tenê bi vê nayîne, her diçe fikrê xwe kûr dike. Ji ber kû fikrê nû û terzê jiyana nû diparêze, ji aliyê terîqetê ve ceza lê tê birin û veder dibe. Tu tişt çavê wî natirsîne. Ew ji wê terîqeta ku xistine nav qanûnên biçûk veder dibe. Lê ev yek jê perçe kirina qalikê xwe û ji bo lêgerîna heqîqetê û li ser cîhanê belav kirina wê gava yekemîn e .

Dema ku Manî li heqîqetê digere, li Îranê hikumdarê Persan Artaban, li Roma Caracalla serdest e. Mezopotamya û Roma di nav aloziyeke mezin de ye. Li Roma li aliyekî ve raperînên mezin yên koleyan li aliyê din tekoşîna Ezîz û Ezîzeyên Îsa heye. Li Îranê serdema serdestiya Persan qediya ye û serdema Sasanî

destpê kiriye. Ardeşîrê ku ji Sasaniyan re serkêşî dike, melîkê Parta, Artaban kuşt û li Îranê qraltî xist deste xwe .

“ Sasaniyan seltanata xwe li ser gorên Parta avakirin. Li ser giştî axa Kurdistanê, ji Medan heya sînorê Hindîstan, Erebîstan dan pey wan”.

“Û tê manî vê yekê tu carê ji bîr neke, tu Persî, di çavê melîkên nû de tu emîrê Persayî.”(Amîn Maaloûf)

Li Mezopotamya û Rojhilatanavîn bi giştî alozî, rev, nediyarî û tevlîheviya fikir serdest e. Qasî pevçûnên fizîkî, aloziyên baweriyê, tevlîheviyên piralî yên fikri heye. Li aliyekî gelek terîqetê jirêderketî yên ji Zerdeştî qut bûne, ji aliyekî Îsewîtî, ji aliyekî baweriyên pir xwedayî… Ev hemû civakê ber bi nediyarî, nezelaliyê ve dibe. Ji her aliyê ve rewşeke kaosî tê jiyîn .

Manî; her çiqas ji Îsa û felsefeya rojane bandor bibe jî, wek esasî baweriya Zerdeşt li gor şertên rojanê guncandiye, lê belê wê nû kiriye, derbas kiriye û ol-felsefeyeke nû diafirîne. Bi baweriya nû fikra derdixe pêş civakê .

Piştî ku kakilê teng yê terîqetê perçe dike, cihê yekem seri lê dide Ktesîphoon (Medya) bû. Ev cih “paytexta Part-Sasaniyan e. Li serdema kevnar bajarê mezin yê metropol bû.” Navenda çandê ya serdema Medan bû. Persan, piştî ku Medya hilweşandin, cil û bergê wan, şikilê rêveberiya wan girt û navenda çanda wan jî xiste xizmeta rêveberiyê xwe. Ev bajar navendeke xurt ya çanda Med-Pers bû. Ji bo ku fikrên nû pêş bikevin cihekî guncav bû. Rewşenbîr û gelê bajêr li gor mercên demê xwedî asteke daneheva çandî bûn. Cihê ronakbûnê bû. Di

demeke kurt de Ktesîphon bû dergûşa Manîtîtî. Êdî Manîtîtî her çû weke şewqa hêviyê belav bû. Yekemîn mirîdê Manî bavê wî ye. Bi bavê xwe re bajar bajar digere, xîtabî bajariya dike û dest bi belavkirina fikrê xwe dike .

“ Destpêkê de li gerdûnê du cîhanên ji hev cûda hebû; dinyaya roniyê û ya dinyaya tarîtiyê. Li baxçê ronahiyê her tiştê tê xwestin hebû. Li tarîtiyê jî hewesên xurt, bî ihtîşam hebû. Di sînorê herdû dinyayan de teqîneke herî mezin, bi tund û tirsnak ya ku li cîhanê heya wê rojê tê zanîn çêbû. Zereyên şewqê bi hezaran şikil girtin û mexluq, stêrk, av, xweza û merov bi vî awayî derketin holê.” (Amîn Maaloûf)

Manî li vir felsefeya Zerdeşt esas digre û kûr dike. Her tişt ji pevçûna ronahî û tarîtiyê pêkhatiye. Hemû xweşikbûn, dirustî, yê heq û rast ji ronahiyê çêbû ye. Nexwe her tiştê kirêt û xirab xwemalê tarîtî ye. Ev dibe felsefeya nû ya merovê nû. Divê redkirina yê kevin, xirab û tarîtiyê û baxçê ronahiyê esas bigre. Serdest, zalimkar û yê gel diperçiqînin tarîtiyê temsîl dikin. Ji ber vê yeke jî Manî di encamê de ji hêla hikumdarê Persan ve mehkûmê mirinê dibe .

Manî di her heyberî de, tarîtî û ronahiyê dibîne. Di her heyberê de pevçûna ronahî û tarîtiyê heye. “Di her hebûnê, heyberê de ronahî û tarîtî li kêleka hev û di hindurê hev de ye. Goştê xurmeya ku em dixwin gewdê me xwedî dike, tam û bêhna wê jî rihê me, ronahiya ku di hindurê me de ye bi zanistê têr dibe.” Dibêje. Ronahî li vir xweşikbûnê îfade dike. Xweşikbûn xwe dispêre zanebûnê. Zanebûn dibe rêka gihiştina heqîqetê. Manîtî di heman demê de dibe pevçûna zanebûn û nezanî. Zanist qasî

şewqê bêdawî û ronahiye. Lêgerîna heqîqetê li vir jî bi hêza zanebûnê, felsefeya ronahiyê, şewqê destpê dike. Nezanî, tarîtî û zordestiyê temsîl dike. Ev dibin serdest. Merovê ku li heqîqetê digere jî li dijî van derdikeve .

Li vir felsefeyeke kûr mijara axaftinê ye. Di heman demê de nêzîkayiyeke kûr ya diyalektîkî heye. Nêzîkatiya "Her tişt bi hev ve girêdayî pêşve diçe" tê esas girtin. Di heman tiştî de hebûna tarîtî û ronahiyê qanûna yekîtiya dijbera pêk tîne. Li vir heqîqet ronahiye. Ronahî di nav her tiştî de ye. Merov qasî ku ronahiya di hindurê xwe de derxe holê, ewqas dikare bigihije heqîqetê. Ev dibe bingeha felsefeya tasawûfê ya Îslamê. Feraseta "Enel Heq" bi vê re lihev dike .

Silteya Part-Sasanî di dogmatîzmeke hişk de bilind dibe. Di heman demê de pevçûnên eşîrên teng û pevçûnên zadeganî (aristokrasi) ya Part-Sasanî jî di qewime. Li ser civakê hişkbaweriya olî dibe serdest. Manî li hember van hemûya derdikeve û bi gotina "Ji bo min ne nijad ne jî çîn girîng e" fikirandineke gerdûnî û terzê baweriyê esas digire. Ev, li hember genîbûyîna deme û awayiya zadeganiya bawerhişk şikilekî şer destpê kirinê ye. Ardeşîrê melîkê Parta, baweriya Zerdeşt dixîne asta ola qabîle-eşîr û li gor berjewendiyê xwe şekil dide .

Manî ji aliyekî ve ji nûve bi cewhera Zerdeştî re hevdîtin e. Di vê xalê de bi rêveberiya Îranê re şer dike. Ji ber ku cewhera Zerdeştî, felsefeyeke ku bi Serdestê Îranê re di nav pevçûnê de ye. Hêzên serdest yê Îranê piştre wê li gor berjewendiyê xwe eyar kirine .

Manî merov wekî perçeyek ji xwedê an jî weke sitavka xwedê didît. Gotina di her tiştî de ronahî û tarîtî heye, ger merov bixwaze bi giştî dikare bigihije ronahî û xweşikbûnê, diyar dike. “Xwedayê ku yekemîn ronahiya xwerû ye, cîhana tarîtiyê baş nas dikir. Li ser vê banga merovê yekemîn kir û, tu bi ronahiyê re yî, tu dostê herî baş yê ku bidest bixî tuyî. Belê ademîzad, tu xefika ku ronahiyê ji tarîtiyê re daniye yî, hikumkirina afirîneriyê û erkê parastina wê didim te." Dibêje. Yanî ronahiya xwerû, dirustî, agahî xweşikbûne. Xweda ronahiya xwerû ye. Aliyekî merov ronahiye bi vê re aliyekî wî jî tarîtî temsîl dike. Erkê merova, erka ku xwedê daye yanê, erkê şer kirina li dijî tarîtiyê pêk anîne. Manî lêgerîna heqîqetê wisa digre dest. Manî li dijî hemû zehmetî û astengiya derdikeve û bi vê re bajar bajar, gund gund digere, şervantiya baweriyê dike .

"Rêhevalên Manî, wî dişopandin. Ji Ganazakla heya Antropatenê, Ermenîstanê, Çiyayê Medan, Çiravê Mesena, Kaşkarê û herî dawî Dîcleya ku li keştiyê siwar dibûn..." (Amîn Maaloûf) û piştre heya Hindîstanê diçe .

Manî ne tenê fikrê olî belav dike. Her yek ji mirîdê wî bi beşekî hunerê re mijul dibe. Wêne çêkirin, nivîsandin li pêş e .

Li gor qanûnên hişk ya terîqeta ku zaroktiya Manî lê derbas bûye, bi jinan re danûstandîn, axaftin qedexe bû. Piranî jin dihat kêm xistin, biçûk dîtin. Manî li dijî vê jî tekoşîneke tund dimeşîne. Dema fikra xwe belav dike, di heman demê de wekheviya jin û zilam diparêze .

Li kêleka Manî Prenses Denag heye. Prenses Denag tehamulê hemû zehmetiyan dike û bi Manî re hemû cîhanê digere. (Tê

gotin ku Denag, keça Şapûrê melîkê Îranê ye) Bi hev re ola Manî belav dikin. Dîsa Melîkeya Palmîra ya bi nav û deng Zenobya jî li gor gelek dîroknasan tê gotin ku Manîtî pejirandiye .

Utopyaya mezin a Manî "BAXÇÊ RONAHIYÊ ye. Afirînerê baxçê ronahiyê merovê kû li heqîqet û azadiyê digere ye. "Baxçê ronahiyê", di Manîtî de şikilekî têgîna bihuştê ye. Tê wateya gihîştina ya xweşik, mikemel, ya herî nû û rast e. Ev lûtkebûn ji milekî ve ronahîbûn û bi ronahiya xwerû re yekbûn e. Heqîqet li vir tê gerîn. "Mirin gezgezka tê zanîn e." Û "dem dîlgirtiyê tarîtiyê ye".

Rastî jî tiştê serhişke û ruxmê tarîtiyan bi tîrêjên rojê re digihijin hev. Manîtî ronîbûn bû. Di tarîtiyê de dîlgirtina ronahiyê ne gengaz bû .

Lê belê her dem û li her derê " Mirin gezgezka tê zanîne." Hikumdarê Îranê çareseriyê di şixulandina vê gezgezkê de dît. Manî xist zindanê, bi roja bi meha birçî û tî hêşt, îşkence lê kir. Armanc, wî ji baweriya wî vegerandin bû. Melîk ew bi bê olî, bi redkirina baweriya Îranê ve sûcdar dikir .

Manî ji bo fikra ku rast didît heta dawî israr dikir û bi berdêla mirinê diparast. "Mirin gezgezka tê zanîn bû." Manî dema jiyana xwe ji dest dide, "melîkê baxçê ronahiyê ye"

Merovê nû, wê lêgerîna heqîqetê û afirandina jiyana nû bidomîne. Manî şaristaniya neolîtîkê, Şahê Îranê şaristaniya dewletî temsîl dike. Li vir jî pevçûn di nav du gewde de ye.

**g) Hz Mihemedê li dijî Ebû Cehil serîhildaye:**

"Du tişt kêmbûna aqil diyar dike: Li cihê ku biaxive bêdeng mayîn, li cihê ku bêdeng bibe, axaftin" (Sadî)

Di pêşveçûna dîrokî, civakî de lêgerîna merov ya heqîqet û azadiyê bênavber e. Merovê her serdemê li gor qirîna xwe bi tekoşînê guncaw, her pêxember, fîlozof, rêberê polîtîk bi rêbazên xas, lêgerîna heqîqetê pêşvebirin e .

Çîroka zayîna baweriya Îslamiyetê jî di dîrokê de giranbihayek lêgerîna hêqîqet û azadiyê ye. Mekke di wê serdemê de yek ji navenda bazirganiyê ya herî girînge. Mekke, li ser xaleke stratejîk ya ku rêkên navend yê bazirganiyê weke Behrasor-Xelîç, Yemen, Hebeşîstan û Şam digihijin hev e .

Dîsa di vê pêvajoyê de ji ber bazirganiyê ji "qebîleya Ereba ya Qureyş" tebeqeyeke girîng ya çînayetî-arîstokrat" pêk hatibû. Bazirganên hilbijartî wek; Ebû Cehîl, Ebû Sofyan, Ebû Leheb, ji Mekke`yê heta Şamê kontrola rêya karwanan dikirin. Weke bawerî jî ji pûtan bawer dikirin. Girêdayî vê jî gelek girîng "sermayeya bazirganiyê" hatibû berhev kirin. Li herêma Mekke û Medîneyê, Zerdeştiyan ku di Kur-an’ê de navê wê weke "Mecûsî" derbas dibe, qederekî belavbûyî bû. Dîsa kêm be jî Cihûtî, Xirîstiyanî û çeşîtdar grûbên baweriyê hebûn. "Qasî ku tê zanîn li Kabeyê xwedayê Laat, Menat, Ûzza hebûn. Ev xwedayê qebîleyane. Li kabeyê qala hebûna 360 pût (peyker) tê kirin. Çiqas qebîleyên Ereban hene, her hal ewqas pût hene".

Di çîroka jiyana Hz. Îbrahîm de, nakokî û pevçûna Hacera cêrî û Sara tê jiyîn. Îbrahîm destpêkê di navbera herdûyan de dimîne. Ev di navberê de mayîn di heman demê de di navbera Îshaqê ji Sara çêbûye û Îsmaîlê ji Hacer çêbûye, mayîne. Îbrahîm di encamê de Hacer û Îsmaîl digire û derdikeve rêwîtiya trajîk ya Mekkeyê. Ev koma biçûk ya yekem ji qebîla Îbraniyan qut dibe heya digihije Mekkeyê, piştî çîroka trajîk ya bê aviyê, li ser ava ku ji bin lingê Îsmaîl dizê xaniyek çêdikin. Ev yekem cihê perestgeh e. Piştre qebîleyên Ereban hîn pûtên ku temsîliyeta wan dikin dixin nav perestgehê. Perestgeh bi demê re vediguhere qadeke berjewendiyên eşîr û qebîleyên Ereban. Di serdema cahiliyê ya berî Îslamiyetê de ji bazirganên weke Ebû Sofyan, Ebû Cehîl, Ebû Leheb re xizmet dike .

Ji vê yekê jî dixwuyê ku derketina Hz. Mihemed ku ji qebîleyeke xizan ya Qureyşî û ji malbateke xizan hatiye dinyê û lêgerîna wî ya heqîqetê, li ser xaleke ku van hemû pûtan derbas dike, destpê kiriye. Di wê pêvajoyê de Mekke hetabêjî di rewşa navbera kaosê de bû .

"Ji bo Mekkeyê demên xirab hatibû. Pereyên zêrîn di destte împaratoriya Bîzansê de bû. Rêya karwanan ya ku diçe Rojhilat jî Îranê girtibû. Erebîstan li teniştê dimîne, bazirganî her diçe xira dibe. Behra spî roj bi roj tenha dibû. Wehşiyên ku xwe ji Bakûr berdidan, li Îtalya bicih bûna ji wan re malên Hindî bi rêkeke din ji Îran û Bîzansê digihişt cihên dûr .

Dişibiya weke ku dawiya dinyayê hatiye. Dema ku êdî karwan nedihatin navendê bazirganiyê yên herî dewlemend jî ditemirîn. Ev yek di dîrokê de pir caran hatiye dîtin. Bajarekî bi wî awayî

dizivirî kaniyeke ava wê ziwa bûyî. Qesrên mermer di nav xîzê de dima. Ew dewlemendiya berê encax wêraneya dianî bîra merovan. Li ser Mekkeyê jî xeteriyeke wisa çêdibû. Divê çareserî li kuderê bigeriya?" (M. Îlîn, S. Egal)

Çareserî li milekî, xeterî ne tenê ev bû. Li aliyê din yên bindest, keda wan tê xwarin hîn di rewşa xirab de bûn. Bazirgan û serdest jî tundiyeke qatqatî didîtin û bi birçîbûnê re rû bi rû bûn. Selefdar û navbeynkar zêde bûne, mîna zîloyekê bi qirika hêjara girtibûn. Nakokiyên civakî her diçû kûr dibû. Qebarîn û belav kirin bêserûbin hebû .

"Di serdema cahiliyê de bi nîşaneke herî biçûk ya zilam, jin mecbûr bû mal biterikîne. Jin bi berdêleke diyar û ji bo demekê dihat kirîn û malbat dihat avakirin. Di vê çeşîdê malbatê de ji bo malbatê berdewamî tune bû. Berî Hz Mihemed jixwe di nav qewmên Ereban de yekîtî tunebû, di parzemîna Erebîstanê de şikilê bajarên bicîhbûyî, li Yemenê jî di encama pêşketina bazirganiyê de navendên diyar pêk hatibûn. Li vi welatî, cihê din yê bi arî pêçayîbû, ji aliyê civatên koçer ve talankariya bêqanûn dabaşa axaftinê bû. Ereb li gor tebieta xwe ya kûvî qewmên talankerbûn û li ser rûyê erdê bi ewaniyê re mijûlbûn. Ji ber ku ew ji wehşet û tundiya xwe, bi hikum û berpirsiyariya xwe ve ne girêdayî bûn. an jî di talankeriyê de sînor nas nakin."(A.N.Olçen)

Di vê nêvenga rewşa aloz û qeyranê ya li Erebîstanê de jin eynî wek heywanekî muamele didît. Ji bo ku ne kevin destê çeteya û nebin fahîşe zarokên keç zindî zindî dixistin bin axê û bi awayekî xovane ji bo mirinê terk dikirin. Dikarin bêjin ku di rewşa wan

rojan de gelek qebîleyên Ereba ji diyardeya dewletê re xerîb bûn, ji koletiyê re xerîb bûn. Hin bêtir qebîleyên bi terzê koçer, nîv koçer azad dijîn bûn.

Li hember van hemû pêşveçûna gel di nav bêçaretiyeke mezin de bû. Çiqas alozî û qeyran zêde dibe gel weke çare ber bi kevirê pîroz yê li Mekkeyê (Hacer-ul Eswed) ve diçû û xwe davêt ber. Lê belê kevirê reş nedibû çare. Bi sedan "xwedayên pût" yên ku wek çareseriyê dihat dîtin bêçaretiyê zêdetir kûr dikir.

Li milê din li kêleka wan şaristanî bilind dibûn. Xiristiyanî û Cihûtî ji merovan re di asta bilind de tiştên hin xweşiktir, xurtir soz dida. Bazirganên Ereb, ev olên nû, xurt yên li kêleka wan bilind dibe ji derdor nas dikirin û roj bi roj tengbûn û rageşiya ola wan hîn baştir derdiket holê .

Li gor şertên wan rojan civaka Ereb û erdnigariya wan wek madî û manewî ziwabûneke kûr dijî. Belbele û buhran ji rageşiyên mezin yên civakî re rê divekir .

Derketina Mihemed ji ev merovên ku li çola sorkirî di nav xîz de maye, mîna serabekê ye. Hz. Mihemed ji aliyekî ve li hember ya kevin, ji wan re heqîqeteke nû û jiyaneke azad soz dide û ji bo vê tekoşîneke mezin dide destpê kirin. Di van şertan de derketina Hz. Mihemed li çola sor herikîna robarekî ye .

Hz. Mihemed ha di van şertan de wek rizgarkerê merovahiyê derdikeve holê. Ola nû ya ku ew pêş dixe, hemû olên ku heta wê rojê hatine derbas dike. Olên berê yê heyî ji avakirina yekbûn û silteyê dûrbûn û olê qebîleyan bûn. Cihutî jî tenê olê Îsraîliya bû. Ji vî aliyê ve teng û netewperest e. Ola Îsa jî ji bo kesê ku

Xirîstiyanî qebûl dike ye. Îsa, di şexsê xwe de merov dike lawê xwedê, bilind dike û derdixe ezmana .

Ola Hz. Mihemed ji van hemûya cûdatir e û di cewher de ji bo hemûyan derbas bike hewl dide. Ji hemû olên berî wî hatine milên baş digire, sentez dike û di nav pergala olî ya ku nû avakiriye cih dide her kesekê. Encax hemûyan bi giran rexne dike, xwe weke pêxemberê dawî, ola xwe weke ola dawî û Îslamiyetê weke olê hemû merovahiyê îlan dike. Berovajiyê Îsa merov ne wek lawê xwedê, wek evdê xwedê dibîne. Ji rastiya mentiqa ku merov nikare bibe xwedê bi rê dikeve û xwe weke pêxemberê xwedê diyar dike .

Ev ji aliyekî ve di şertên wê rojê de tevgereke mezin ya azadbûnê ye. Lêgerîneke nipînû ya heqîqet û jiyana azad e. Wek madî û manevî civak xistina nîzameke nû ye. Armanc hemû merovahiyê rizgar kirine. Îslamiyet, bi nêzîkatiya umet, wek ola hemû merovan şikil digire .

Hz. Mihemed di nav vê nîvengiya xirabî û aloziyê de ji bo ku merovan bigihîne heqîqet û azadiyê, milîtanê ku wê şerê mezin rêvebîbe, perwerde dike. Ev kes bawermendê (momîn) Hz. Mihemedin. Momîn di asta jor de bi biryar, bibawerî, bî iman û kesên ku bawer kirine. Xwe bi giştî xistine vê rêkê. Bi saya ev milîtanên ku bawer kirine, Misilmantî di demeke kurt de li çar perçê cîhanê belav dibe .

Di çolên Ereban de jiyaneke nû avakirin, li hember ew pergala kevin ya xira bûye serîhildan, civak xistine nizameke diyar encax bi fikrekî bi vî awayî tûj û bi hêza baweriyê gengaz bû. Hz. Mihemed di vê xalê de heta radeya dawî realîst e. Ola wî di

heman demê de oleke iqtidarê ye. Halbûkî Îsa bi israr ji silteyê direviya. Tenê ji merovan re li dinya wî alî bihuşt soz dida. Hz. Mihemed ji merovan re hem dinya wî alî dide hem jî li vê dinyayê silteyê dide. Lewma, pirsgirêkên civakî, siyasî jî çareser dikir. Berî şer îman tê. Bê merovên ku ji armancê, ji ola bawer kiriye nikaribû biser bixe. Merov ji bo eşqa xwedê, bi hêza îmanê şerdikirin. Ji ber ku li nîvgirava Erebîstanê tiştê herî zêde qels dibe maneviyata merovabû. Bi sedan xweda êdî tiştek ne dida wan. Bawerî di asta dawî de qelsbûn. Ev jî nakokiyên civakî kûr kiriye û civak ber bi aloziyê ve kişandibû. Rêka merovan di bin sîwanekê de kom kirinê, ji gihandina baweriyeke xurt derbas dibû .

Dema hay ji van hemûyan hebe, li gor şertên wê rojê li nîvgirava Ereb, derketineke mezin ya şoreşger, bêhempa bû. Pût dişkiyan, nîzamên berê ya genî bûye ji qurma xwe ve dihat dinamîtkirin, li şûna alozî û kaosê nizameke nû ya civakî tê afirandin .

Gava ku Hz. Mihemed derketineke wisa dikir, kesên wek Ebû Cehil, Ebû Sofyan û Ebû Leheb yên qebîle û hezên serdest êrîş dikin. Hz. Mihemed hîn li ser kar e. Ji bo ku hêz kom bike ji Mekeyê koçî Medîneyê dike. Li wir bi lez dest bi belavkirina fikra xwe dike. Her diçe Îslamiyet li her derî belav dibe. Hz. Mihemed di dawî de piştî deh salan bi şikilekî serfîrazî vedigere Mekkeyê .

Li vir lêgerîna Heqîqet û Azadiyê di bingeha xweseriya Erebîstanê de pêşve diçe. Pevçûn û nakokî ne di navbera di refên çînên teng de, di nav qebîla Kureyş de di navbera du beşên cûda

de, di navbera qebîleyên serdest û qebîleyên li derve hatine hiştin de pêş dikeve .

**h) Tevgera çîptaziyan:**

Di dîrokê de serî rakirin û raperîna herî mezin ya civakî 1789 şoreşa Fransa ye. Di tevgera hemwelatiyên Fransa ya mezin de çîptazî, birçî, hêjar, bêkar bi hêviyeke mezin ya azadiyê li hember Qraltiyê, feodalîzmê serîhildan. Sed hezaran bi ser "zindana Bastîlê" de girtin, girtiyên dîl rizgar kirin. Bi berxwedaniyeke heta mirinê Qraltiyê, textê wî, taca wî rê kirin kevnarxaneya (mûze) asar-î attîka. Diruşma bingehîn "wekhevî, azadî û biratî" bû. Di şoreşa Fransa de jî raperînvan û kesên di nav lêgerîna azadiyê de ye çîptaziyên ku ji derve hatibûn hêştîn bûn. Diruşmên "wekhevî, azadî û biratî" ku qîr dikirin, bi kontrolkirina burjuwazî vediguherî wekhevî, azadî û biratiya sermaye. Di şoreşa fransa de jî pirsgirêka rêbaz kartêker e. Çîptazî seltenata Qraltiyê hildiweşînin. Encax dewleteke ji ya wê hişktir saz dikin. Dewleteke nû dixin şûna dewleta ku hilweşandin. Ev jî wan digihijîne pratîka "heqîqet silte ye, silte heqîqet e".

**J-Şoreşa mezin ya Sovyetê:**

"Merov dikarin şaşitî bikin, tenê merovên mezin şaşîtiyên xwe fêm dikin" (F. Von Kotzebûe)

Di şoreşa mezin ya Sovyetê de mûjîk, karker, bêkar û hemû gel serîhilda. "Her tişt ji bo sosyalîzmê" bû. Ji bo oxira sosyalîzmê, azadî, wekhevî sed hezaran bi baweriyeke mezin xwe fedakirin. Ruxmê ku şoreşa Sovyetê ji bo armancên pîroz derket holê çima veguherî dijberê xwe? Çima li dijminê xwe çû؟

Ev hemû serhildanên bêhempa yê dîrokê, lêgerînên azadiyê di encamê de dibin perçeyek ji pergala ku li dijî derketine, redkirine, ji vê yekê xilas nebûn .

Li vir bersîva yekemîn ya ku ji bo pirsa çima, ji bo çê bê dayîn, pirsgirêka rêbaz e. Dema ku pirsgirêka rêbaz diyar nebe gihiştina armanc pêk nayê. Nexwe li vir di lêgerîna heqîqetê de destpêkê, pêwîste pirsgirêka rêbaz rast were diyar kirin .

Wek encam; Ji ev hemû mînakên dîrokî civakî ev derdikeve holê. Pêşveçûna dîrokî civakî wek du gewde, du şaristaniyên bingehîn, di navbera şaristaniya dewletî û şaristaniya demokratîk de derbas bûye. Motora dîrokê ev rastî çêdikin. Tekoşîna dîrokî bi tekoşîna teng bi çînî îzahkirin nêzikatiyeke kêm û ne têrker e. Dema tekoşîna çîna bi van herdû şaristaniyan bigrin dest wê demê wê wateya xwe hebe. Di hemû ev bûyerên ku dexma xwe li dîrokê dan ku em weke mînak digirin dest, pevçûn ne di navbera çînên li refên dijber cih digirin de, di navbera du hêzên bingehîn yê şaristaniyê de derbas dibe .

Yên li dijî Babîl, Akad û Asûr serîhildan û seltenata wan hilweşandin ne kole bûn, kesên hêjar û qebîle- eşîrên çiyayî yên azad dijîn bûn. Rastiya Îbrahîm û Mûsayê li hember Nemrûd û Firewûn serîhilda jî wisa ye. Îsayê li hember împaratoriya koledar ya herî mezin, dîrokî serîhildaye, pêgirî (mensûb)

qebîleya xîzan ya Eseniyane. Yên şoreşa Fransa pêk anîne tevgera çîp taziyane. Yên şoreşa Sovyetê pêkanîne Mûjîkê Rûs in .

Wek di van hemû mînakan de ku tê xuyakirin, lêgerîna heqîqet û azadiyê û pêşveçûna dîrokî civakî, ne di mîhwera "kole-serf-proleteryayê" de ye di navbera du şaristaniyên bingehîn de pêşdikeve .

Careke din pêwîste were diyar kirin ku xeletiya rêbaz, xeletiya encam jî derxistiye holê .

**2-Yên Nêzî Heqîqetê bûn, bi xezeba pergalê re çûn:**

Di civaka xwezayî de merov bi heqîqetê re di nav ahengekê de bû. Kedxwarî, kedxwar û yên keda wî dihat xwarin tune bû. Silte, hiyerarşî, dagirkirin, kole kirin, serfkirin, zext tunebû. Têkiliya bindest serdest tune bû. Merov bi xwezayê re di nav ahengê de bûn. Têkiliya jin-zilam li gor herikîna xwezayê xwedî xisleteke wekhevixwaz û azadîxwaz bû. Dirûtî, derew, hîle, xapandin, bin xistin, xistina bin kontrolê tune bû. Têkiliyeke li gor xwezayê guncaw hebû. Merov di nav rastiya heqîqetê de bû .

Bi şaristaniya dewletî re aheng xirabû. Zîgûrat ber bi ezmanan ve bilind bûn. Hiyerarşî ava bû. Dewlet û çînatiya yekemîn şikil girt. Têkiliya kedxwar-kedkar, serdest-bindest şikil girt û nîzameke nû derket holê .

Merov civaka azadixwaz, wekhevîxwaz ya ku wendakiriye dest bi lêgerîna wê kir. Lêgerîna heqîqetê şerekî mecbûrî derdixist holê. Wek lêgerînvanê heqîqetê; wêrekî û bêtirsî

pêwist bû. Pergala dewletî ya xwe spartiye kedxwarî, zext, neheqî, newekhevî, bê edaletî xwezaya merov temsîl nake, derveyê xwezaya merovane. Hewce bû ku vê yekê bi wêrekî, bê tirsî derbixin holê .

Encax, vê derxistina holê bibiryarbûn, bibawerîbûn, birêxistinbûnê hewce dikir. Ya herî girîng jî milîtantiyeke di asta fedayîtiyê de raber dikir. Lêgerînvanê heqîqetê bûyîn li hember her cûreyê zextê sekinandin bû. Ji ber ku li heqîqetê gerîn û parastin dihat wateya ber bi xezeba silteyê ve çûyîn .

Di dîrokê de her kesê ku nêzî heqîqetê bûye, ev derxistiye holê ber bi xezeba bê eman ya pergalê re çûye. Di dîrokê de hemû lêgerînvanê heqîqetê yên ku neketine qada pergalê bi hezaran zehmetî re rû bi rû mane .

Di dîrokê de yekemîn qurbanê vê yekê jin e. Bi civaka dewletî û çînayetî re ya yekemîn hatiye xistin, hatiye kole kirin jin e. Jina ku nûnerê civaka xwezayî û wekhev e, bi her cûreyên zexta pergala baviksalarî re hatine ber hev. Dewletbûn ji heqîqetê dûr ketinê re wekhev şikil girtiye. Ji ber vê jî yekem berê xwe dan jinê .

Jin li hember vê berxweda. Pergala nû ya koletiyê qebûl nekir. Yekemîn pêlên şikestinê bi dewleta Rahîp ya Sûmeran re destpêkir. Zîgûrat wek sazkirina yekemîn ya vê şikestinê derket holê .

Heta berî zayînê 2 hezarî berxwedaneke xurt nîşan da. Şerê di navbera xwedawenda Înanna û xwedayê qurnaz Enkî encama vê yekê ye. Enkiyê qurnaz bi hîle "M"yên di destê Înanna de dizî. Li vir şikestinek heye, encax hîn binketina jinê tune ye. Tekoşîn

deqe- bi- deqe didome. Ev şer di destana Gilgamêş de jî bi zimanekî kartêker tê ser ziman .

Di mîtolojiyê (zimanê çîrokî) de şerê di navbera xweda û xwedawendan de vê rastiyê îfade dike. Xeleka şikestina dawî şerê bê eman yê di navbera xweda Mardûk û xwedawend Tîamat de ye. Wisaye ku jina tê xistin, vîna wê tê şikandin bi têgeha "çarenûs"ê re derxistin holê. Ji vî alî ve xwedawenda Tîamat hema bêje bi têgeha "çarenûs"ê re hatiye wekhev kirin. Koletî wek çarenûsekê di bîra civakî ya merovahiyê de hate bicîhkirin. Bîra civakî ya xwe dispêre civaka xwezayî a wekhevparêz, azadîparêz ya di mihwera jinê de hat mesihandin û ser hat girtin. Hafizeyeke nû ya pişta xwe dide kedxwarî û koletî hat ava kirin. Ev di cevherê xwe de ji heqîqetê hatiye şêlandin, li ser esasê koletiyê bîra civakî ya nû li ser merovahiyê wek çarenûsekê hat ferz kirin .

Ev rastî di mîtolojiya Sûmeran de wiha tê gotin; "Di Sûmeriyan de tayê çarenûsê xwedawend Tîamat birêve dibe, ji bo ku bi xwedayê neviyê wê ne re şer bike ji cenawira arteşekê ava dike, Tayên çarenûsê dide destê dêwê Kîngû yê ku daniye ser artêşa cenawira. Destpêkê xwedayê ku li hember artêşa dêw û cenawir bin dikevin, di dawiyê de fermandariya Mardûk qebûl dikin. Xweda Mardûk jî miqabilî erkê fermandariyê, dixwazê tayê çarenûsê bidin wî. Di kêlîka şer de Mardûk, Kîngû dikuje û tayê çarenûsê ji singa Kîngû digire û bi singa xwe ve dike. Bi vi awayî dibe hakimê çarenûsa gerdûnê".

Mîna ji vê mîtosê jî tê fêm kirin di vir de rol, dest guhertin heye. Ji nîzameke derbasbûna nîzameke nû heye. Şer û tekoşîna

wê ya hewlnak heye. Binketina Tîamat tê wateya bi giştî bi dawîbûna civaka xwezayî, wekhevîparêz û azadîparêz. Tayê çarenûsê dest diguhere. Jina ku hakimê çarenûsa gerdûnê ye, bi binketinê re hakimiyeta gerdûnê dikeve destê zilam .

Di mîtosa Yewnan de nêzikatiya "çarenûs"ê hîn bêtir tê kûr kirin û vediguhere trajediyekê. "Di Sophoklesê qedîm de koroya ku dengê civakê ye wiha diqîre. ' Merov ji çarenûsa ku li ser eniya wan hatiye nivîsandin qet nikarin birevin û xilas bibin.' Tiştê ku li ser eniya wan hatiye nivîsandin, yê ku merov jê nikarin birevin koletiye. Ev bêçaretî di çîroka Sophokles de bi hin bûyerên trajîk derdikeve holê. Edî çarenûs tora koletiyê bi hemû şaxên xwe lê kiriye. Ev nêzîkatî di hemû olan de weke hêmana yekemîn ya bingeh berdewamiya xwe didomîne. Edî çarenûs di hemû olan de dibe wek nêzikatiyeke bingehîn, hêmana bingehîn. Dibe navê pergalê, koletî û kedxwariya ku pergalê ava kiriye... Koletî û serî tewandin çarenûseke ku xwedê derxistiye holê û jê nayê revandin .

Heta Îslamiyetê yek ji şeş baweriya "Amentûyê" ye. Ev eynî weke 10 fermanê Cihûyan teqez e. ji çarenûsê rev ne mimkine. Ev tê vê wateyê. Tu ji koletiyê tew nikarî birevî ji ber ku ew çarenûs e. Bi latînî "Fatûm, farî, fato" ye. Yanê; "di sûretekî ku neyê îtiraz kirin de dayin e" Encam koletî çarenûseke. Bi ti şikilî li hember vê nikarî îtiraz bike. Koletî bê îtiraz divê were qebûl kirin. Fermanê ji zayînê tê û çarenûsa bê îtiraz e .

Li gor nivîsên Pehlevî yê Îranê jî "Fermanê ku ji destpêkê ve hatiye dayîne" Yanê, koletî bi destpêka merov re wek çarenûsekê derketiye holê û hatiye hikumkirin .

Li vir ji rewşekê derbasî rewşeke din dibe. Her tiştî di derbarê heqîqetê de ye ji holê tê rakirin. Tiştê girêdayî derew û koletiyê dixin şûna wê. Ji bo ku ev rewşa nû hîn baştir were fêmkirin şerê di navbera Tîamat û Mardûk de divê hîn baştir were şîrove kirin. Tîamat tê wateya "dayîka hemû jiyanê." Tîamat nûner û parazvanê civaka binêrîna jinê ye. Nexwe ew berî her tiştî ya hemû jiyanê afirandiye. Şaneya Kok a jiyanê û çavkaniya esasî ye. Hemû şikilên jiyanê yên din ji vê şaneya kok derketine. Ev wek dîrokî civakî rola esas ya jinê derdixe holê .

Mardûk jî; "têgîneke di nav de îsyan (raperîn) heye, ji navê Nemrûd yê bajarê Babil avakiriye tê û navê Nemrûd yê hatiye xwedakirin e. Mardûk, navekî ku sifatê efendiyê serdest bar kiriye." Nexwe Mardûk nûner û efendiyê pergala koletiyê ye .

Tîamat xwedawendeke baş bû. Çavkaniya esasî ya jiyanê bû û şaneya qurmê civakê bû. Encax şerê ku bi xweda Mardûk re ket nav wendakir. Wendakirina Tîamat wendakirina jiyanê ye. Ji vî alî ve Tîamat di çavê pergala zilam de wek "pîrebok, şeytan, mexluqeke" divê were perçe-perçekirin wisa tê diyarkirin. Bi vê pêlên şikestinê re edî jin ji her aliyê ve hatiye kolekirin. Lewma bi heqîqetê re jiyana hevseng bi bitûnî ji holê rabûye. Edî lêgerîna heqîqetê lêgerîna tekoşîneke zehmet e. Dîrok bi mînakên vê yê bê hejmar ve tijî ye .

Li gor efsaneyê Îbrahîm ji aliyê Nemrûd ve avête nav agir. Mûsa di xezeba Firewûn de derbas bû. Exlaqnasê civakê yê mezin zanyar Zerdeşt jî bi zextên mezin re rû-bi-rû ma. Duçarê

bextreşiyan ma. Avêtin zîndanê. Mecbûr ma ku welatê xwe biterikîne .

Îsa di sitûyê xwe de zerzengê bi stirî li ser girê Golgotayê hat meşandin û hat çarmix kirin. Spartakûsê palewan, bi şeş hezar koleyan ve li rêka diçe Romê bi dîrekan ve daliqandin .

Maniyê zanyarê bi ronahî yê baxçê ronahiyê ku digot "min her tim berxweda, ez ne ji ti olê me" bi îşkence hate qetilkirin. Aqûbeta Mazdek eynî bû. Xelefê wan rêberê tevgera Hurremî Babek, bi îşkenceyan hate qetilkirin .

Galîleo Galîle di bin gefên îşkenceyê ya "engîzasyona pîroz" de zor lê kirin ku ji fikra xwe vegere. Gîardano Brûno, ji ber fikra xwe di mehkemeyên engîzîsyonê de di singa de hate şewitandin, bi şikilekî hovane hate cezakirin .

Charles Darwîn, ji ber ku li hember fikra "xweda gerdûn di çar rojan de avakir" kevneşopiyê derket, li Brîtanya bû hedefa nîzama olî .

Kartêkeriya lêgerîna heqîqetê merov dikarê bi van peyvên Gîardano Brûno bibîne: " Ez ne ji veşartina heqîqeta dibînim hez dikim ne jî bi şikilekî eşkere ji îfadekirina wê ditirsim. Li her derê tevlî şerê di navbera ronahî û tarîtî, zanebûn û cehaletê de bûm. Ji ber vê yekê li her derê bi zehmetiyan re rû-bi-rû hatim. Ji xeynî akademisyenê fermî yên bavê cehaletêne, di heman demê de di hedefa hêrsa girseyên serhişk de min jiyan kir".

Mînakên bi vî rengî qasî tê xwestîn tên zêdekirin. Silte, yên bi lêgerîna heqîqeta derketine rê an kişandiye gel xwe an jî kiriye dijberî xwe û tune kiriye.

Hemû kesên zanistê yên ku zanistê li derveyê xeleka silteyê girtine dest jî, heman tişt hatine serê wan. Îro jî heman mentiq û nêzîkatî bi hemû şaxên xwe didome .

Li vir ev derdikeve holê. Ji bo gihiştina encamê pirsgirêka rêbaz rast tehlîl kirin pêwîst û mecbûrî ye. Dema ku pirsgirêka rêbaz rast neyê çareser kirin, tekoşînên ku di dîrokê de hatine dayîn jî negihîştine encameke mîsoger û ji ketina xeleka pergalê xilas nebûne. Berî ku pirsgirêka rêbaz bigrin dest pêwîste hin mijar bi xetên bingehîn li ser bisekinin .

**3-Zihniyeta Merov û Lêgerîna Heqîqetê:**

"Tu tişt ji tunebûnê çênabe, ji hebûnê tune nabe"

Ger tevger, jiyan, zindîbûn û hîskirin hebe, ji tunebûnê ava nebû. Havên û cewherê wê di nav xweza-gerdûnê de hebû .

Nexwe merov ku zindiyê herî pêşketiye, xweza û cewhera wê bêyî ku nas bikin hemû lêgerînên rêbaz û heqîqetê bê encam dimîne .

Zihniyet û awayê fikrî ya merov bi giştî xwedî xîsleteke dualî ye. Fikra atifî (hestiyarî) û fikra analitîk (tehlîlî) .

Fikra atifî di qêlî de ye û şaneya kok awayê fikrandina giştî ye. Fikra tehlîlî piştre pêş ketiye û çalak bûye. Fikra atifî zêde tehlîl naxwaze. Li gor helwesta xwe ajoyî pêş dikeve. Para xeletiyê, şaşkirinê zêde nagere. Fikra hestiyarî di wek esasî aîdê civaka dayîk ya jinê ye û bi xwezayê re di nav yekîtiya diyalektîkê de ye .

Fikirandina analitik di mihwera silteyê de ye û tehlîlên kûr dixwaze. Rêbaz, xebitîn û lêgerîna heqîqetê wek esasî xwe dispêre awayê fikirandina tehlîlî .

Nexwe destpêkê pêwîste nîzama xebitîna mejiyê merov were nasîn. Bê kû nîzama xebîtîna mejî were fêmkirin,di lêgerîna heqîqet û azadiyê de, agahiyên di derbarê rêbaza diyarker yê lêgerîna heqîqet û azadiyê seranser, lêrasthatinî dimîne. Ji bo vê jî pêwîste destpêkê nîzama mejiyê merov nas bikin. Di lêgerîna heqîqetê de rêka rêbaza rast dîtin, ji nas kirina zihniyet derbas dibe .

Zihna merov di radeyeke bilind de xwedî awayeke nerm e. Zihnê merov tune be, di gerdûnê de bi şikilekî azad, firseta tercîhkirina wê di asta tunebûnê de be. Zanyar, qada azadiyê û azadiya tercîhkirinê bi çeşîtbûna gerdûnê û li dinyaya bin atomê bi awayê perçe û pêlan ve girêdidin .

Encax nermbûna zihnê merov qasî têgihîştinên rast ji têgihîştinên şaş re jî vekiriye. Ji ber vê yekê jî zihn; di tora "qayîşokîtî, zext û hest de her gav dikare ji rê derbixe. " Ji ber ku ji pênc hezar sal heta niha şaristaniya çînî dewletî, bi hezaran amûra re hewl dide ku li ser zihnî merov zext û kontrol çêbike. Axaftin li cih be, zihnekî li gor berjewendiyê xwe guncav ava kirine .

Têkiliya diyalektîkî ya di navbera zîhin û tercîhên azadiyê de bêgûman bi rastiya civakî ve girêdayî ye. Zihîn qasî ku azad dimînin di wê radeyê de tercîhên azad dikin û li gor pîvanên edaletê tevgerîn çêdibe. Dema ku zihîn li gor nîzama gerdûnî mafê bijartinê bidest bixe, di wê radeyê de digihije edaletê û bi

edalet dibe. Ji ber ku cewhera têkiliya edalet û rastî xwe dispêre nîzama gerdûnî. Qasi ku têkiliya nîzama gerdûnî bidest bixe dikare têkiliya edaletê bidest bixe. Ev tê vê wateyê. Lêgerîna bi hezar salan ya li derve hatine hiştin wan beralî kiriye. Divê neyê jibîrkirin ku dîroka civakî zihna me perwerde dike, bandor dike û bi tercîhên rast amade dike. Ev jî wek pirsgirêka zanebûneke kûr derdikeve pêşberê me. Di derbarê hişmendî perwerde û bandorkirin de pirsgirêka pêşengtiya rast jî girîng dibe .

Nexwe zihîn di bingeha şaş de digihêje. Zexta ku civaka dewletî ya bi hezar salan avakiriye, kontrolkirin, beralî kirin, demîn pêdan girtin û bi rêka hest û şikil girtinê wê tevbigere .

Encax çiqas rêbaza rast û derfetên tercîhên azad were avakirin, ewqas zihîn dikare bersîv bide têgihiştinên rast. Daneheva agahiyan ya kûrtir û yekpare, dema şertên azadiya civakî yek bibe derfeta ferdê azadbûyî wê derkeve holê û zêhîn li ser vê bingehê dikare têgihîştineke rast bike .

Dîsa metafîzîk xisleteke bingehîn a merovane. Ev ji milê rêbaz û gihiştina agahiya taybetmendiyeke girîng e. Merovan di fêmkirin, têgihîştin û tehlîlê de yek ji xalên herî girîng e .

Eînsteîn dibêje; " hînbûnî ji bombeya atomê xetertir e." Tiştê ku perçekirina wê herî zehmet e. Hînbûnî, bûye qalib û hişmendiyeke civakî. Ji dema Arîsto ve berdewame. " Her tiştê ku ne bitevgere wek bê rih" dinirxînin. Hemû heyberan wek bê rih digirin dest. Zindî-bê rih, made-rih, heyber-kirde, meteryalîst-îdealîst dîlemayên hwd. Bê derfetbûna rewşa sêyemîn raber dike. Diyalektîka jiyan, xweza, merov û tevgerê qebûl nake .

Jiyan ne tenê wek ku hişmendiya keba mekanîk ya Feuerbach diyar dike; "madeyek ji madeyeke din hin tiştan digire û hin tiştan dide madeyeke din" pêk nayê. Berevajiyê wê di cewhera made de zindîbûn, tevgera hindurîn û bi hîskirin re girêdayî pêşve diçe .

Ya ku vê livdariyê, zindîbûnê bidest dixe, taybetmendiya ku di cewhera xwezayê de bixwe heye, taybetmendiya şewqî (în'îkas, reflexîon) e.Tevgera di xwezayê de, rê dide guhertin, veguhertin û pêşveçûnê. Rêbaz jî divê li gor wê guncav be. Li vir armanc gihiştina wateya jiyanê ye. Rêbaz jî divê ji gihiştina jiyana azad re xizmet bike. Nexwe wateya jiyanê çiye؟

Li vir girêdayî pirsa "çawa bijîn", pirsên "ji kuderê destpê bike" û "çi bike" jî dikevin rojevê. Ji bo vê tenê ne bi merov re eleqeder, nêzîkatiyeke yekpare ya ku hemû xwezayê û zindiyan eleqeder dike pêwîste. Eşkereye ku jiyaneke azad ya ji xwezayê ji zindiyên din qut nayê fikirandin. Jiyana ji xwezayê qut bûyî, jiyaneke maneya xwe, nirxê xwe û cewhera xwe wendakiriye.

Sermayedariya ku di bingeh xwe dijberiya xwezayê de pêşve diçe û xwezayê tenê weke bireser (heyber, tişt) dibîne, ji merovahiyê re ne azadî, koletiyeke tirsehêz aniye. Sermayedarî ji xeynî hilweşandinê, kedxwari, koletî û eşê ji merov re tu tişt neaniye. jiyan li ser nakokî û pevçûnan hatiye hûnandin û ji bo hindikahiyan bihuşt, ji bo piranî jî jiyan veguherandiye dojehê .

Bê kû vê pergalê bi giştî lêpirsîn were kirin, bê kû ji parzûna rexnan re derbas bikin, bê ku xisletê wê yê dijberî merov-civak û aboriyê were mehkûmkirin, azadî û lêgerîna jiyana azad dibe hewldaneke vala.

### 4-Lêgerîna Heqîqetê encama civakbûnê ye:

Civakbûn şertê hebûnê yê cinsê merovane. Ferdê tenê tune ye. Şexs bi civakê dikare nasnama xwe bidest bixe. Bê civak şexs nikare civakbûn bidest bixe. Ferdperestiya zêde, şexs ji civakê qut kirin, tenêkirin û nirxên civakî di potaya (selik) ferdperestî de helandin, qedandin wek pergala hişmendiyê aîdê sermayedariyê ye .

Rêbaza olî civakbûn di terzê hişk dogmatîk de digire dest. Ebû Tufeylî ku ji Hz Îbrahîm ji milê xezalekê ve hatiye mêjandin bandor bûye, di pirtûka xwe ya ûtopya ya bi navê Hay ibnî yekzan ( Yekzanê lawê Hay) de civakbûnê wek taybetmendiyeke xwedayî datine holê .

"Sê xisletên bingehîn ya çîroka Îbnî Tufeyl, 'Hay bîn Yekzan'; Hayê Wehşî, Absalê razdar û Salamanê civakî ye". Hayy li giravekê ji dayîk dibe, ji aliyê xezalekê ve tê mêjandin û mezinkirin. Li "xwezaya wehşî" tu pêwendiyê wî yê civakî tune ye. Zindiyeke bi tenê serê xwe ye. Ew û Absalê razdar yê ku ji giraveke din tê rastî hev tên. Li vir hewldanên bi rêka aqil gihiştina heqîqetê yê "Hayyê wehşî" û "Absalê razdar" tê vegotin .

"Hayy bîn Yekzan"ê ku tê wateya "şiyarê kurê zindî", li giraveke tenha bi tenê serê xwe bi ceribandinên xwe yê şexsî di nav hewldanên lêgerîna heqîqetê de ye.

Hayy, " bi xwezayê re rû- bi- rû, ji her cûreyê bandorên derve û ji her fikrê merovî û xwedayî dûr, bi nêrîna derdorê xwe zanebûna heqîqetê û sirre hebûnê kifş dike".

Îbn-î Tufeyl di şexsê ev her sê xisletan de sê çeşîdê agahiya nexş dike. Hayy fîlozofekî li girava tenha li heqîqetê digere, Sofiyê Absal, Salaman jî alimê bi qanûnên olî ve girêdayî temsîl dike .

Li vir felsefe, tasawûf û şerîet "wek xuyabûnên cûda ya heman heqîqetê" derdikeve holê .

Îbn-î Tufeyl li vir "li gor hêmana yekbûnê ya di hebûnê de, bi rêkên cûr bi cûr gihiştina heqîqetê" û li ser rûyê erdê bi tena xwe bidest xistina merov ya civakbûnê dixwaze îspat bike.

Heqîqet di aqil de veşartiye. Aqil jî bac û taybetmendiyeke xwedayî ye. Bi rêya aqil merov çawa civakbûnê bidest dixe, derdixe holê. Di heman demê de bi vê yekê re hewldide ku mîtosa Adem û Hewa jî piştrast bike .

Hayy bin Yekzan li ser gelek hunermend û zanyarên mîna Defoe, Bacon, Spînoza û More bandor kiriye .

Çîrokvanê Brîtanî Danîel Defoe ji Ebû Tufeyl bandor bûye û çîroka wî kopî kiriye. Di çîroka xwe ya "Robînson Crûsoe" de ji bo ferd-ferdperestî di hişmendiyan de bicih bike, hewl dide ku bi tena xwe civakbûna ferd îspat bike .

Halbûkî li derveyê civakê jiyîna ferd û weke hebûneke civakî jiyan domandin ne gengaze. Li civakên xwezayî klan û qebîleyan ferdê ku sûc dikirin, davêtin derveyê civatê û bi vi awayî ceza dikirin. Cezaya avêtina derveyê civakê tê wateya cezaya mirinê. Ji ber ku ferd bi tenê serê xwe li derveyê civakê derfetê jiyînê tune bû. Bijî jî wê bibe şikilekê jiyana wehşî. Di

roja me ya îro de modernîteya sermayedarî merov bi hezar û yek pêwendî ve ferdî dike, tenê dihêle û tîne ber deriyê heywanbûnê .

"Ferdê kû civaka wî hilweşiya ye be dibe. Lê dîsa jî herî kêm ev kes bi biranînên civaka xwe ya hilweşiyayî li ser linga ye." Kesê bi tenê û jiyana bicivakê çiqas ji hev were qut kirin û rêzber kirin dîsa jî weke teorî, diyardeyeke di nav tu derfetan de îspatkirina wê ne gengaz e .

Hêz bidest xistina ferd û merov, civakbûna wî, lêgerîna heqîqetê bigiştî girêdayî têkiliya ku bi civakê re daniye pêş dikeve. Li derveyê rastiya civakî lêgerîna ferd ya heqîqetê hewldaneke vala ye. Ji bo vê ye ku kesên serdest, di lêgerîna heqîqetê û di tekoşîna afirandina jiyana azad de ji bo ferd qels bike û ji hêz bixe serî li rêka tenê kirinê dide. Di dîrokê de terzê herî wehşî yê koletiyê, asta tenêtiyê ya li ser wî tê ferzkirin e .

Nexwe heqîqet ne tenê lêgerîneke rêzber e. Bi civakê re piştrast, lêgerîna jiyana azad ya bênavber e. Bi civakbûnê re bi hev re encama lêgerîna heqîqetê û jiyana azad a afirandiye û derxistiye holê ye. Nexwe heqîqet ji berrahiya jiyanê qut nayê dest girtin. Pênaseya heqîqetê ya ji objektîfî (bireserî) qut wê kêm û ne kafî bimîne .

Eşkereye ku heqîqeteke ji berrahiya jiyanê qut û rêzber nayê fikirandin. Encax lêgerîna wê bêdawî û bênavber e. Ji ber ku lêgerîna azadiyê weke meylekê di xwezaya merov de heye. Jiyana herî baş, herî xweş, li gor xwezaya xwe jiyaneke guncav avabike jî dîsa wê ji bo ya hîn baştir, hîn xweşiktir biafirîne wê lêgerîna xwe bidomîne. Li vir afirandina ya hîn baş û hîn xweşik wê berdewam bike. Ji bo lêgerîna heqîqetê û jiyana azad sînorên

hatine diyarkirin yên tûj, teqez tune ye. Pirsgirêkê bi vî awayî dest girtin tê wateya navber dayîna tekoşînê .

Merov qasî ku li gor cewhera guncawiya xweza û civakbûnê jiyan dike di wê radeyê de heqîqet jî cewher û xwezaya jiyana merov pêk tîne. Jiyana baş, xweşik girêdayî merov e. Ger jiyana merov li gor cewher û xwezaya civakê be wê demê wê xweşik û baş bijî. Merov qasî ku ji cewhera xwe dûr dikeve ewqas li hember xwe ewqas beyanî dibe û nasname xwe wenda dike. Jin, zilam hemû merovan di serdema civaka neolîtîk-xwezayî de li gor rastiya heqîqeta xwe jiyan kiriye. Merov bi civaka şaristanî re ji xwezaya xwe dûr ketiye, bûye beyaniyê xwe û ji heqîqetê dûr ketiye. Xerîbî û ji heqîqetê dûr ketin rastîhev e. Herçû heqîqet wendakir .

Ev jî lêgerîn û dîtina heqîqeta ku wenda kiriye anî. Ji nû ve lêgerîn, pirsgirêka rêbaza rast rojev dike. Pirsgirêka rêbaz girêdayî lêgerîna heqîqetê derketiye holê .

## 5-Cewhera wendakirî heqîqeta wendakirî ye:

Jin, zilam kengê cewhera xwe wenda kir? Çawa xerîbê cewhera xwe bû? Heqîqet çawa, li kuderê û kîngê wendakir? Cewhera wendakirî çima rê da wendakirina heqîqetê؟

Pirsên bi vi awayî hîn zêde dibin. Merov, destpêkê di civaka xwezayî de dijî. Di civaka xwezayî de azadî wekheviya xwezayî hebû. Di vê civaka di mîhwera dayîkê de kedxwarî, koletî, çîn tunebûn. Dewlet-hiyerarşî tune bû. Nakokiyên di navbera

zayendan de tunebûn. Ev hemû bi jiyanê re di nav ahenga xwezayî de bûn .

Piştre şaristaniya dewletî-hiyerarşîk derket holê. Têkiliyên kole-efendî şikil girtin. Heqîqet bi silteyê re bû wekhev. Merov cewhera xwe wendakir. Bi xwe re heqîqet jî wendakir. Lêgerîna silteyê merov kir wek gurê merov. Merov li hember nirxê xwe, nasnama xwe û xwe dest bi îxanetê kir. Li miqabilê lêgerîna azadiyê koletî hat derxistin. Elbet silte ne çarenûs ne jî mecbûriyet bû. Merov bi deh hezaran sal bê silte, kedxwarî, zext û koletî, bi awayekî azad, wekhev, li gor xwebûna merov û xwezayê jiyankir. Şaristaniya dewletî ji aliyê Rahîbên Sûmeriyan ve li Zîgûrata bi hişmendiyeke dijberî şoreşê destpê kir, pêvajoyeke heta roja îro bênavber berdewame. Her ku nirxên civaka di mîhwera jinê de hatin tunekirin, şaristaniya di mihwera silteyê de bi hêzbûnê pêşveçû. Piştî wê tekoşîneke li ser nakokî û pevçûnan kûr dibe, fireh dibe û bi hezar salan belav dibe ye .

**6-Meyla xwezayê ya azadîxwaz**:

" Tu dibêjî qey xweza ji bo meraqa xwe bidawî bike merov afirandiye." (Rêbertî)

Azadî, di xwezaya hebûn-çêbûnê de heye. Hebûn, çêbûn meyla azadiyê ye. Hebûn-çêbûnê, yê dixwaze çêbibe, awayiya heyînên çêdibin merov dikare ji meyla azadiyê serbixwe bigire dest? Ne mimkûne. Hebûn, dema ji awayiyeke çêbûnê derbasî ya din dibe di esas de dixwaze hîn bêtir azad bibe. Qaliqê ku di nav de ye êdî wê aciz dike .

Cewhera pêşveçûnên xwezayê jî vê yekê piştrast dike. Her tişt dema pêş dikeve û diguhere destpêkê qaliqê xwe perçe dike,

davêje. Berî ku vê perçe bike û mezin bibe, pêşbikeve, biguhere ne mimkine .

Heqîqet û azadî-wekhevî-edalet-rastiya jiyanê yekîtiyeke diyalektîk avadike. Lêgerîna azadî û heqîqetê wek meylekê di cewhera merov de heye. Ji yê xwerû ber bi yê tevlîhev, ji yê jêr ber bi yê jor, ji hejmar ber bi çawanî bi awayekî giloverî bi guhertinê, çêşîdbûnê pêwistiya cûdabûn û zêdebûnê di cewhera xwezayê de heye û yek ji qanûnê xwezayî ye. Xwezaya hebûnê zêdebûn, çeşîdbûnê pêwîst û hewce dike. Yê vê pêvajoya hebûnê derdixe holê, jiyan û livdariyê bicih tîne, derdixe holê çeşîdekê enerjiyê ye. Gelo ji ev herikîna enerjiyê bênavber re ya ku jiyînê pêk tîne bêjîn zindîbûn, hês û heqîqet wê ne rast be? Ji ber ku ji doh heta îro, ji îro jî heta sibê, di gerdûnê de ev herikîna enerjiyê ji bo hemû zindiyan taybetmendiyeke hevpar e .

Meyla azadî-hîskirinê ya di xweza-gerdûnê de bi şikilê herî kartêker û pêşketî di merov de xwe dide ber çav. Merov berhema hemû xwezayê ye. Gerdûneke biçûk e. Nexwe merov bêje "merovê tê tehlîlkirin, gerdûna tê tehlîlkirin e" ne nêzikatiyeke fîşal e .

Merov weke zindiyê herî pêşketî yê xwezayê, hemû çêbûnê dixe lêpirsînê û lêgerîna heqîqetê didomîne. Civakbûn ji merovan re xase û lêgerîneke heqîqetê di hindurê xwe de dihewîne. Hewldana merov ya gihiştina heqîqetê û şopa wê taqîbkirin, beşa dîrokê ya herî girîng pêk tîne. Bêguman civakbûn di cewhera merovan de heye û teqabûlê pêvajoyeke diyar ya dîrokê yê .

Civakbûn girêdayî nirxên neolîtîk-komînal, demokratî, exlaqî û polîtîk şikil girtiye .

Ji civaka xwezayî heta roja me îro bi dema ji deh hezaran bêtir bi serdestbûna van nirxan pêkhatiye. Civakbûn ji bo merov gelek biwate û girînge. Ji ber ku di dema dirêj ya bi deh hezaran de ji bo civakê şert û mercên jiyanê afirandiye. Bê ku ev yek avabibin merov weke merov, civak weke civak li ser vê bingehê nikaribû hebûna xwe bidomîne. Civakbûn çima ewqas biwate û girînge؟

Ji ber ku civakbûn îro, şikilê jiyanê yê em di gerdûnê de dijîn, hemû xweşikbûna wê, hunera jiyanê, çêbûna hebûnên zindî, dîroka wê, di wateyekê de têkiliyên civakî yên ku em mîrasa wê dijîn, heta wek giştî exlaq, felsefe hwd hemû nirxan temsîl dike .

Ev terzê jiyanê û civakbûna yekemîn ya li gor cewhera merov û xwezayê pêkhatiye, di wateya rast de çêbûn û şikil girtina heqîqetê ye. Di vê terzê jiyanê û şikil girtina heqîqetê ya çêbûyî de azadî weke meylekê heye .

Bi pêkhatina civakbûnê lêgerîna azadiyê û tekoşîna afirandina jiyana azad bênavber berdewam kiriye .

Çawa ku di cewhera xwezayê de zindîbûn, hîskirin hebe bi heman terzê meyla azadiyê û lêgerîna heqîqetê jî heye .

**7-Li gorî Mîtosa yekemîn çalakiya azadiyê "Ger ne ji bo xwe bim, wê kî ji bo min be؟:**

"Ger tenê ji bo xwe bim, ez kim e? Niha nebe kengê"؟

(Talamûd Mîsnah, Abot)

Di civaka xwezayî de merov ne tenê ji bo xwe ji bo civakê bû. Tu kes ne ji bo tu kesî bû. Şexs bi civakê re hebû. Ferdên civakê, di nav herikîna xwezayî ya azadiyê de wekhevin .

Azadî weke meylekê di gerdûnê de ji lewre di xwezaya merov de heye. Wek encama vê meyla xwezayî, çalakiya merov ya yekemîn, wek binpêkirina qedexeya yekemîn bûye çîrok û di her sê olên semawî de cih girtiye .

Destpêkê zilam û jin (Adem-Hewa) di baxçên bihuştê de bi hev re bi xwezayê re di nav hevsengiyekê de dijîn. Jin û zilam di nav aşitiyê de bû. Li gor mîtosê mecbûriyeta kar kirinê jî tune bû. Pirsgirêka wek tercîh, azadî, wekhevî jî tune bû .

Ev bihuşt wek hemû ol jî terîf dikin li Mezopotamya jorîn, li erdnîgariya hîlala zêrîn, awayiya civaka neolîtîkê ye. Di civaka neolîtîkê de ya bi pêşengtiya jine koletî, newekhevî, zext, çîn, dewlet û şer tune bû. Merov bi merovan re, jin bi zilaman re, merov bi xweza re, şexs bi civakê re di nav ahengê de bû .

Li gor mîtosê xwarina fêkiya zanistê (sêv-genim) ya merov qedexe bû. Sêv xwarin li dijî fermana xwedê derketin bû .

Qedexe aîdê civaka çînî û dewletî ye. Guneh, tabû, qedexe, fermanê xwedê, zext, kedxwarî di nav hev de pêşve diçe. Bi qedexeyê re ahenga xwezayî xirab dibe .

Ev mîtos ji bo merov destpêka azadiyê ye. Li dijî qedexeyê derketin, li dijî fermana xwedê serîhildan, xwe ji zorê xelas kirina merovane. Ji ber ku merov li hember civaka qedexekirî û qedexeyan zehmetî dikşîne .

Li dijî desthilatdariyê, li dijî qedexeyê derketin, ji bo vê guneh kirin erênî, ji aliyê merovî ve çalekiya yekemîn ya azadiyê yanê yekemîn çalakiya merov e .

Ev qedexe binpê kirin, wek meyleke azadiyê û çalakiya serî rakirina merov di heman demê de destpêka mantiq e. Mantiq li

dijî qedexeya derketin raber dike. Ev, xirabûna ahenga xas ya di navbera merov û xwezayê de jî îfade dike. Ji ber ku bi civaka qedexekirî re di navbera jin-zilam, merov-xweza, merov-merov û civakê de çeşîdekî şer destpêkiriye .

Qewitîna Adem û Hewa ya ji bihuştê û avêtina wan li cihê cûda, dijber kirina jin û zilam û ji xwezayê dûr ketine. Di navbera herduyan de nakokî û pevçûna yekemîn e .

Merov bi xerîb bûna ji klan-civakê re, bi qutbûna ji jiyana komîn û milkê hevpar dibe ferdperest û takekes. Ji "em" derbasî "ez" dibe û ber bi şaristaniya dewletî-çînî re pêşve diçe. Û li pey hev qedexe û tabû pêş dikevin .

Adem-Hewa (merov) bi xwarina fêkiyan qedexe li hember van hemûyan dijî derketin û çalakiya yekemîn pêktînin. Mîtos; zehmeti, nakokî û êşa ku bandora xwe ji vê çalikiya merov digire îfade dike. Merov çima vê çalekiyê pêktîne؟

Ji ber ku merov ji merov re ji xwezayê re xerîb bûye û hatiye kolekirin. Nakokî ketiye navbera jin û zilam. Di pergala ku pala xwe dide koledariyê de êşên bêdawî destpê kirine .

Nîgarê tazîtiyê yê di mîtosa Adem û Hewa de bi xerîb bûnê re elaqedar e. Adem-Hewa çima fedî dike û bi pelê hejîra ve xwe dipêçe؟

Xweza derbas kirin, bi xwezayê re dijberî hev bûn, jê re xerîb bûne. Fedîkirin çawkaniya xwe ji jê re xerîbûnê digire. Di wateyekê de dibe îxaneta li hemberî xwezayê. Ev xerîbî, ji xwezayê qutbûn û cûdabûn, ji xwe tazî dîtin û fedîkirina merov re rê vedike. Bi pelê hejîrê re xwepêçandina merov, xwesteka ji nû ve vegerîna xwezayê ye. Ji ber vê jî merov li dijî qedexeyê

çalakiya yekemîn pêk tîne. Lê li hember vê yekê tê cezakirin. Bûyerên di mîtosê de pêşve diçin de merov piştî cezayê tena xwe ye lê dîsa jî azad e .

Lê belê merov bêhêz, qels û bitirs e. Yên ku qedexe afirandine bihîle, qurnaz, rêxistinkirî û bihêzin. Ji ber ku azadiya ku bi çalakiya xwe bidest xistiye dîsa ji aliyê pergala fikrê dogmatîk, serdest ve hatiye berevajîkirin, weke lanetekê derketiye holê. Ji bo vê bi hezar salan bênavber wê serîhilde û tekoşîn bike. Lêgerîna azadî û heqîqetê wê bênavber bidome .

Pêwîste neyê jibîrkirin ku xwezaya merov, perçeyekê dinya û xwezaya zindiye .

Merov di baxçeyên şîrîn yê bihuştê de azad bû. Lê roj hat merov azadiya di ev baxçê şîrîn yê bihuştê de wendakir. Paşiya wê lêgerîna heqîqet û azadiyê ya heta roja îro didome ye .

**8-Ji nûve pênasekirina azadiyê:**

"Kûantayên wek perçeyên herî biçûk yên enerjiyê tên pênase kirin, di roja îro de hema hema wek kartêkera hemû zindîbûnê îzah dike, tê bi nav kirin. Divê em li vê yekê binêrin" (Rêbertî)

Bi van hemûyan re azadiyê ji nû ve pênase kirin, li gor wê rêbaz diyar kirin û lêgerîna heqîqetê li gor vê bi kûrkirinê domandin girîng e. Nexwe azadî çiye؟

Azadî; têkiliya merov bi merov re, merov bi civakê re merov bi xwezayê re û xweza bi merov re îfade dike .

Li gor felsefeya Zerdeşt azadî; li hember tarîtiyê biserketina ronahiyê, bi binxistina wê mimkin e .

Hz. Mihemed azadbûnê bi fermana "bixwîne" destpê dike. Şerê vê li dijî bavê cehaletê Ebû Cehil dike .

Ronesans û Reform (vejîn û guhertin) jî vê rastiyêîfade dike. Spînoza azadiyê mîna çeşîdekê ji cehaletê rizgarbûn, derketin pênase dike .

J. J. Roûsseaû dibêje " pêwendiyên koletiyê bi têkiliyên merovan yên beramber hev re destpê kiriye. Merovê ku xwe ji bo yên din nake hewcedarî, tu demê wî nake kole"

Em ji vê yekê derkevin rê, " yên kû kesên din ji azadiya wan dikin ew bixwe jî azad nabin" (O. Hançerlîoxlû) J. J. Roûsseaû, di navenga siyasî a Ewropa ya ku bi firtone de şikil girt. Azadî û koletî jî girêdayî tekoşîna civakî pênase kiriye. Hegel û Marks jî azadiyê wek pirsgirêkeke bingehîn dest girtine .

Li gor Hegel azadî, "gihîştina mecbûriyeta hişmendiyê" ye. Serdestbûna vê hişmendiyê, tê wateya diyar kirina her tiştî, li ser her tiştî kontrol avakirinê. Hegel ji fikir derdikeve rê, dibêje yê bingehîn hişmendiye, merov encax mecbûriyeta vê fêm bike, li ser kontrol çêbike dikare azad bibe. Li gor Hegel pêwistiya azadiyê bi zanebûnê heye. Divê hemû qanûnên aqil were zanîn û mecbûriyeta wê derbixe holêe. Ji ber vê jî gihîştina heqîqetê di rihê xwedayî yê teqez de dibîne .

Marks vê yekê berevajî dike, wek " gihiştina hişmendiya mecbûriyetê" pênase dike. "Azadî ji qanûnên xwezayê ne qut e. Berevajiyê wê fêr bûna van qanûna û ji hin armancên diyar şixulandina wan e. Ev qasî ku ji bo qanûnên xwezayê ye, ji bo qanûnên ku biryarên gewde û rihê merov rêve dibe jî wisa ye. Wek encam azadî, mecbûriyetên ji xwezayê tên nasîn, hem li ser

merov hem jî li ser nesuriştî axaftinê wê meşandin e. Bi vi awayî azadî berhemeke zarûrî ya pêşveçûna dîrokî ye. Merovê seretayî ji bo ku tiştê jê re pêwist bidest bixe, hebûna xwe biparêze û zêde bibe çawa li hember xwezayê tekoşîn dida, merovê medenî jî, awayî ya civakê û terzê hilberînê çawa be jî mecbûre ku heman tişta bike. (K. Marks)

Li vir ji navbera qanûnên koletî azadî, xwezaya mecbûrî qanûnên civakî derdikeve holê. Ji bo bigihije azadiyê divê ev nakokî ji holê were rakirin. Li vir çareseri; wek zarûrî li ser qanûnên xweza û civakê kontrol avakirinê re derbas dibe. Ji bo vê pêwiste merovê medenî jî weke merovê seretayî li hember xwezayê şer bike. Ev nêzîkayî ji aliyekî ve tekoşîna qeba ya çînî bi şikil dike li aliyê din rêka ku ber bi xirabûna xwezayê ve diçe vedike .

Ev hemû bûyer û diyardeyan di nav dîlemaya "kirde-bireser", "proleterya-burjuvazi" de dest girtinê re rê vedike .

Berî her tiştî "merovê seretayî"(merovê neolîtîkê) li hember xwezayê şer nekiriye. Berevajkî xwezayê wek dayîkekê pîroz kiriye, qasî pêwistiyê xwe ji wê sûd girtiye û pê re di nav ahengê de jiyan kiriye .

Ev encama mantiqê pêşveçûna xezikiya rast e. Li gor hişmendiya dîroka bipêşveçûnî, wek zarûrî wê azadî pêş bikeve û wek çarenîn wê bigihîje sosyalîzmê. Di dîroka tekoşînên civakî de bi hezaran car xuya kir ku ev yek şaşitiye. "Li gor 'felsefeya zarûretê' ya mîna stoaparêzîan jî spînozaparêzî merov, tenê hêmaneke gerdûnê, perçeyekê biçûk yê gerdûnê yê ji aliyê

hemûyan ve hatiye diyar kirin, di nav makîna gerdûnê de diranîteke hêsan e.

Eşkereye ku lêgerîna azadî û heqîqetê qasî ku bi civak û pêşketinên civakî re pêwendî girê bidin, bi gerdûnê re jî têkilî danîn wê nêzîkayiyeke hîn biwate û rast be. Xebatên dawî yên merovên zanistê ya di qada kûantûmê de têkiliya gerdûn û azadî bi şikilekî vekirî derdixe holê .

Merov azadiyê tenê bîne ser merov û civaka merov wê nêzîkayiyeke kêm be. Ti tişt ji hebûnê tune nabe, ji tunebûnê jî çê nabe, li gor wê hucreya bingehîn yaa azadiyê û qadeke pala xwe dispêre heye. Kesên ku bi xwezayê re kêmekî eleqedar dibin wê bizanin ku her cisnê zindiya ji hêla ku lê dimîne ve di nav hewldana ya hîn baştir de ye. Yanê xweajoyên hin bêtir azadbûyînê heye .

Her lawirê dîlgirtî, hewldana rizgarbûn û azadbûnê dide .

Em dizanin ku azadî, wek meyleke ji xweza-gerdûnê bixwe heye. Li gorî diyalektîka kuantûmê, hîmê gerdûnê dîlemaya partîkul(perçeyên biçuk)-enerjî pêk tîne. Li gor destgirtina têkiliya diyalektîk ya dîlemaya enerji-partîkul, enerjî çeşîdekê azadiyê ye. Enerjî li hember partîkul di radeya dawî de xwedî taybetmendiyeke herikbar, livdar, guhêrok û çalak e. Mesela şewq çeşîdekê rewşa enerjiye. Şewq ji her aliyê ve livdar û çalak e. Di nav qalibên sekinî, sabît de nayê heps kirin. Di radeya dawî de herikbar e. Li gor van taybetmendiyan enerjî-şewq çeşîdek ji azadiyê ye. "Merov dikare azadiya civakî jî li vê bîne. Partîkulê li hember enerjî jî wêk pakêteke enerjiyê ya di rewşa dîlgirtî de ye. Anîmîzm, hîskirin wek meylekê di pakêta enerjiyê de heye .

Nexwe bingeha hemû guhertin veguhertin û peresendinê jî ev e. Her tişt li gor qanûna peresanê zêde dibe û biçeşîd dibe. Hucreya bingehîn ya zêdebûn û çeşîdbûnê gerdûn bixwe ye. Ji aliyekê ve ev kuantame.

Nexwe di vir de ev pakêta enerjiyê, çeşîdekî hêza afirandinê ye. Çeşîdbûn, livdarî, guhertin-veguhertin, zêdebûna bêsînor ya gerdûn-xwezayê azadiyê tîne bîra merov. azadiyê ji vî aliyê ve divê destpêkê bi aqilê merov re pêwendîdar were dest girtin .

Qadên herî tîr ya aqilê merova, qadên li hember azadiyê herî hesas e. Têkiliya helbest bi azadiyê re, lêgerîna jinê ya azadiyê dikarin bi vê yekê re şîrove bikin .

Ji ber ku ev yek wek qadên herî tîr ya aqilê merov, ji azadiyê re cihê herî hesas u guncav e. Divê neyê ji bîr kirin ku tîrbûna zekaya atfî xwezaya herî pêşketî ye. Civakek ji aliyê gel-ferd aqil, hêza aqil, hişmendîû çandî ve çiqas dagirtîû tîr be ewqas di azadiyê de bikêr e .

Partîkulê madî yê dijberî partîkulê enerjiyê, di jiyana civakî de tekabulê yê madî ye. Rastiya cihû vê yekê piştrast dike. Ji aliyê madî ve pere, bazirganî, ji aliyê manewî ve pêxembertî bi lêhûrbûnê re rastî vê yekê tê. Wek Marks, Eînsteîn, Freûd, Spînoza hwd koka gelek zanyarên ilmî yahûdî ye. Herhal ev ne rasthatinî (tesadûf) ye. Aliyê din ê meseleyê jî hêjarî, koç, sirgûn (mişextî), komkujîû hwd in. Nexwe azadî divê dîlemaya “em-yê din” û dîlemaya “enerjî-kuantom” derbas bike. Ji ber ku aliyê din ya diyardeya bi navê pere-bazirganî-sermaye, kedxwarî, zext û koletî ye. Bi milyonan bi vê yekê tên kole kirin .

Ger hay ji rastiya Yahûdiya hebe, ev aliyê madî her tim wan ber bi komkujîû koletiyê ve biriye. Li vir pere- bazirganî-sermaye wek dijberê enerjî pêşve diçe. Perçeyek ji çeşîdekî dijberê enerjiyê ye. Jib o Yahûdiya wek dîrokî-civakî encama ku afirandiye dîmeneke tarî-tirsnak e.

Hişmendiya merov bi azadiyê re di nav têkiliyeke diyalektîk de ye. Hin bêtir nêzî azadiyê ye û kerî azadiyê tê. Dema ku şertên guncav yên civakîûdaneheva agahiya ehil bibe hişmendî her tim ji azadiyê re rê vedike .

Nexwe em dikarin azadî wek çeşîdbûna gerdûnî, cûdabûn, ji hev cûdabûn û zêdebûnê bigirin dest. Nazariya Darwîn ya peresanê jî ev zêdebûn û çeşîdbûnê derdixe hole. Bi terzê domdar û zêdebûnê, di asta bilindtir û bi terzê biker çeşîdbûn û zêdebûna lawira encama ve yekê ye. Rastiya civak çand jî bi vî awayî ye .

Pêvajoya cîvakîbûna merova jî vê pêşveçûna diyalektîki şopandiye. Bingeha rast ya civakbûna merov, her hal bi ast û nermbûna aqilê merovê civakî dibe ve girêdayî ye .

Nexwe, enerjiya ku azadiyê ifade dike çeşîdeke hêza afirîner e. Pê re girêdayî, azadiyê di dîrokê de her tim wek hêza ava kirinê xwedî rist bûye. Exlaqê civakî bi azadiyê re dikare bijî. Çavkaniya heqîqî ya exlaqê civakî rastiya azadiyê ye. Exlaq weke halê hişkbûyî yê azadiyê jî tê pênase kirin. Şikilekî hişmendiya hevbeş û wijdanê civakê ye .

Felsefeya azadiyê di dîrokê de ji bo civaka weke nasnameya eslî, berjewendiya eslî, wijdanê hevbeş, exlaqê civakî û têkoşîna polîtîk erk pêkaniye .

Halbûkî ev mantiq û nêzîkayiya pêşveçûna rast, di lêgerîna azadiyê de her tim hevşibîn û wekhevbûna bi dijberî xwe re derxistiye hole û nebûye çareserî. Ji ber ku nêzîkayî şaş û çewt e. Jiyan qasî ku xwe dispêre hêmanên azad bi wate ye. Jiyana ne azad koletiye. Nexwe lêgerîna merov ya jiyana azad, wek hêmanekê cewhera lêgerîna azadiyê pêk tîne. Li gor vê hêmanê lêgerîna azadiyê lêgerîneke heqîqetê ye .

Dema ku hêman û nêzîkatiya bingehîn ev be, bi perspektîfên kevin, bergeh û zîhniyeta teng nagihije azadiyê. Bê encamp mayîna lêgerîna pênc hezar sala, vê rastiyê riprût derdixe holê.

Bi pêşketina zanista kuantûmê re serdestiya fizîka Newtonî ya du sed sala hilweşiya. Êdî nêzîkayî û mantiqa pêşveçûna xêzekê îflas kiriye. Wek pêdiviyên encamên fizîka kûantûmê, di bûyerên xweza û civakî de pêvajoyên guhertin û pêşveçûnê, hewcedarê navbera kaosê ye. Di vê navbera kaosê de wê encameke çawa derkeve, ev yek girêdayî tesadûfa ye .

Di esas de vê pêvajoyê, tekoşîna li hember hev ya hêzen civakî wê diyar bike. Lêgerîna heqîqetê ya rêxistinî, bi tekoşîna hişyar û bi rêbazên rast wê li ser encamê bandor bike. Gava ku derfet ava bibin heta “perwezdan a perperîkê” jî di asta bilind de dikare encamê biguherîne. Bandoreke biçûk(mîkro) encamên mezin(makro) derdixe holê .

Temînata serkeftina mîsoger ya vebijark(alternatîf), cins û tercîhekê tune ye. Di nav vebijarkên cûda de ya weke fikrî û awayî ked û hewl dide, şansê wê yê serkeftinê zêdetir e. Hişmendî û pêşketina azadiyê vê yekê raber dike .

Nexwe nêzîkayiya tenê bi diyalektîka “kole-efendî, kole-beg, kedkar-karsaz” ve girêdayî azadiyê naxuliqîne, ev yek di dîroka pênc hezar sal ya dîroka tekoşînên civakî de hatiye îspat kirin .

Ji ber ku azadî berî her tiştî encax bi pirrengî, cûdahî û çeşiddarî pêş dikeve. Lêgerîna jiyana azad encax bi nêrîneke li ser vê bingehê tê afirandin .

Fikir çiqas kûr, bitanzîm û yekpare be gihiştina heqîqetê jî ewqas nêz dibe. Di navbera birêkûpêk kirina fikir û gihîştina heqîqetê de bendeke diyalektîkî heye. Yê di fikir de xwe kûr neke gihîştina wî ya heqîqetê jî wê zehmet bibe. Di jiyana azad de îsrar an jî lêgerîna jiyana azad di vê bingehê de bi kûrbûn û yekbûna fikir re yekser têkilîdar e .

Li vir lêgerîna heqîqetê pirsa heqîqeteke çawa derdixe pêşberî me. Li vir ger tercîh di jiyana azad de îsrar be, divê merov ji jiyaneke çawa re pirsên ‘çima, ji bo çê jiyaneke azad’ bi her awayî lêpirsîn bike û heqîqetê derxîne holê. Jiyana azad, berî her tiştî rastiya jiyanê ya ku merova li gor rêgezên azadiyê, bi xweza, humanîzm û nirxên jinanî(mêyî) re înşa kiriye, îfade dike .

Eşkereye ku heqîqet, perçeyek ji lêgerîna azadiya merov e. Ji wê cûda û rêzber dayê dest girtin. Heqîqet û azadî bitûniya diyalektîkî ye. Heta ku heqîqet rast neye tehlîl kirin lêgerîna azadiyê jî rast şekil nagire .

Ji ber ku lêgerîna merov ya heqîqetê di heman demê de lêgerîneke azadiyê ye. Azadî, berî her tiştî di xwezaya merova de heye. Hebûn bi serê xwe meyleke azadiyê ye. Piştî ku merov wek hebûneke civakî teşe girt, azadî weke meylekê ji ber xwe ve

hebû. Lêgerîn jî ji vê hêlê ve bêdawî ye. Awayiya hebûna merov û meyl-xwesteka azadiyê dinav hev de ye û ji hev nayê qetandin .

Merov li gor xwezaya xwe her tim bi diguhere, vediguhere, zêde dibe, cûda dibe, biçeşîd dibe, di nav hewldan û lêgerîneke bênavber de ye. Ev xwesteka lêgerînê mîna çeşîdekê enerjiyê lîvdar û herîkbar e. Wê sekinandin an jî tune kirin ne mimkin e. Ev herikîn, zindîbûn, guhêrî, çeşîdbûn û lêgerîn çeşîdek enerjiyê, ev enerjî jî di wateyekê de lêgerîna heqîqet û azadiyê ye .

## V- DI LÊGERÎNA HEQÎQETÊ DE RÊBAZÊN TÊN ŞIXULANDIN:

Jin, zilam di dîrokê de her tim gava bi eşq ketine pey heqîqet û azadiyê rê, rêbaz û amûrên cûr bi cûr şixulandine. Ji ber ku bê rê û rêbazekê gihîştina armanc ne pêkan e. Lêgerîna heqîqet û azadiyê çênabe .

Ji ber ku cevhera şerê heqîqetê, wek dîrokî-civakî ji her aliyê ve li nasnameya civakî gerîn, koka xwe wek cewher-şikil derxistina holê û pêşwaziya modelên çareseriyê yên mimkin, pêk tîne. Li vir heqîqet û lêgerîna jiyana azad, bi zîhniyet û terzê jiyanê re têkilîdar pêş dikeve. Bi giştî şaristaniya dewletî-çînî, bi taybet û bi rehendên rojane jî, tekoşîna ji terzê jiyana moderníteya sermayedar xelas bûnê ye. Moderníteya sermayedar ya ku binalet e, wehşî dike, kole dike, kedxwar û takekesî ye. Heqîqet û lêgerîna azad jiyîn bi şoreşeke zîhniyet ya rast pêşve diçe. Şoreşa heqîqet û jiyana azad, şoreşa ji jiyana moderníteya sermayedar xelasbûnê ye .

Sedsala 20. Sedsala şoreşên di mîhwera çîna de bû. Coşeke mezin bawerî, biryardarî, mezinbûn û tekoşîneke mezin hebû. Bi milyonan bi şîara “sosyalîzm, azadî, wekhevî, rizgarî” tevdigeriyan .

Sedsala 21. Jî vediguhere sedsala dijşoreşa. Ev dijşoreş; hewl dide ku li ser kelefe û gora şoreşên ku dijberî armanc û xeyalên xwe derketine, hilkişe.  Di heman demê de dîroka îxanet û hevkaran li pey dîroka binketina şoreşa diçe.

Li şoreşa sedsala 20. di lêgerîna heqîqet û azadiyê de tiştê kêm çibû؟

Sedema vê yekê bi rêbazên lêgerîna heqîqet û azadiyê re têkilîdar dest girtin wê hin bêtir watedar be. Hêzên demokrasiyê yên di bin bandora modernîteya sermayedarî de dimînin, rêbaza "sanista pozîtîf" esas digirin ûhewl didin pirsgirêkê çareser bikin. Ev hewldana wan ji xeletiya bingehîn re rê vekiriye. Têkilîdarê vê li kêleka rêbaz, mîras û kevneşopiyên dîrokî yên ku xwe dispêrinê jî bixelet bûye .

Di lêgerîna heqîqet û azadiyê de wek rêbaz; mîrasa civakî ya ku pêwiste xwe bispêrinê kevneşopiyên berê yên kevin nabe, çanda her tim xwe nû dike, adet û mîrasa xwe dispêre terzê jiyanê ye. Ev pergala nirxên şaristaniya demokratîk e .

Nûnertî û pêşengiya li gor terzê jiyanê şikil digire jî pirsgirêkeke girîng e. "Divê yekbûna diyalektîk ya "Fikir-zikir-çalakî (tekoşîna jiyanê ya çalak)" hebe .

Heqîqet û azadî mirşîdê afirîner û pêkaner yê şoreşê, nirxên wek edalet, wekhevî, demokrasiyê ye, divê di emel de teşeyên jiyana nû temsîl bike û xwe ji jiyana modernîteya sermayedar pak kiribe. Ji ber ku li vir kevneşopî, çand, teşeyê jiyanê û mîrasa me ya ku qet dema wê derbas nabe, her tim bi xwe nûkirinê nasnameya me ya civakî temsîl dike. Pêşeng, divê di lêgerîna heqîqetê de nûner û modelê nû ya vê yekê be. Ev hemû têkilîdarî rêbazin .

Ji bo afirandina jiyana azad û gihîştina heqîqetê peyde kirina rêbaza rast pêwistî û mecbûrî ye. Merov di dîrokê de ji bo gihîştina agahiyên rast û ji bo pêkanîna armancên xwe gelek

rêbaz şixulandine. Ev hemû rêbazên ku merovahiyê şixulandiye di bin hin sernivîsên bingehîn de kom kirin wê hêsantir bibe û rê nîşandêr bibe. Rêbaza mîtolojîk, dogmatîka olî, rêbaza meteryalîst, rêbaza metafîzîk, rêbaza zanistî hwd. Ev rêbaz hemû yên din di nav xwe de dihewînin .

Rêbaza mîtolojîk teqabûlê civaka xwezayî, çanda çemê bingehîn e. Rêbaza dogmatîk ya olî di esas de bi civaka şaristaniyê re derketiye hole û bi olên semawî(asîmanî) re mohra xwe li serdemeke dirêj xistiye .

Rêbaza zanistî jî wek esasî tekabûlê serdema modernîteya sermayedar e. Bi netewperestî re ketiye şikilê oleke dogmatîk ya xizmeta berjewendiyên bajarvanî dike û li textê qraltiya du serdemên dawî xwe bi cih kiriye.

Bi vê yekê re taybet li sedsalên 19., 20. Rêbazên metafizîk-rêbazên îdealîst û meteryalîst gelekî bûye mijara nîqaşa û mohra xwe li hin pêvajoya daye. Di mijara me de cih dayîna van rêbazên jî di derbarê yekbûna mijarê de wê têkariya xwe hebe .

## A) Rêbaza Mîtolojîk:

"Her çi hal e, ne zanist ne jî aqilîtî; ji bo mîtos, fikrandina 'seretayî' an jî hin zanyariyên gerdûnî ya li pişt hin baweriyên olî ye, li derve bihêle ne xwedî rayedariya têrker e. Îdîaya xwediyê otorîteyeke bi vî awayî bûn ne meşrû ye. Ger pêwist bike jî divê bi serlêdana rêkên siyasî ev yek were red kirin".

P.Feyerabend

“ Pirtûk dibêje ‘berê ewil gotin hebû.’ Ger Platon vê yekê bibihîze wê pirs bike. Gotin, kîjan gotin? Ji ber ku di zimanê Yewnaniya kevin de ji bo têgeha gotin bidin xuya kirin sê bêje hebûn. Mythos, Epos û Logos. Mythos: Peyva hatiye gotin an jî hatiye bihîstin e, tê wateya çîrok, çîrvanok, dastan. Epos: Gotina ku li gor tanzîm û pîvanekê hatiye gotin e. Logos: Bi zimanê merova bi lêv kirina rastiyê ye.” (E. Erhat)

Mythos (Mîtos an jî çîrok) ger naveroka gotin be, epos teşeyê wê ya bi pîvan, bi hevsengî û xemilî ye. Epos çiqas xweşik be, mythos jî di wê rejeyê de wê bibandor be. Di encama yekbûna xurt ya Epos û mythos de, dastan ji dîroka heta roja îro hatine û gerdûnîtî bi dest xistin e .

“ Logos jî dengê pergaleke meşrû dide. Her çiqas di navbera mythos û epos de guncanî hebe jî, di navbera logos û wan de ji roja ewil ve dijberiyeka her diçe tûjtir dibe destpê kiriye”.

Mîtolojî wek peyvnasî; Ji Yewnanî peyvên mythos(çîrok-hîkayet) û logos(gotin) pêk tê. Mythos; çîrok û çîrvanokên di adet û kevneşopiya civakê de şênber dibin, ji neslekî bi devkî derbasî neslê din dibe ye. Ev çîrok û çîrvanok, wek berhemê pevxistin, xeyal û nîgaşa, vegotineke bedewkarî dihewirîne. Bi giştî mîtosa wek niviskî û devkî cûda kirin mimkin e .

Kok hucreya hemû mîtosa mîtosa devkî ye. Koka erdnîgariya mîtosên devkî Mezopotamyaya jor e. Erdnîgariya mîtosên niviskî jî Mezopotamyaya Jêr e. Rahîbê Sûmeriyan, bi esas girtina mîtosên devkî wek tanzîmî(sistematîk) mîtosên niviskî pêş xistine.

Mythos bi gelemperî; zanisteke ku li gor dem, cih û mijar li ser çîroka vedikole. Logos jî tê wateya axaftin vegotin. Mîtolojî ji yekbûna her du peyva pêk tê. Nexwe Mythologîa wek “zanista dastan(efsane) a tê pênase kirin .

“ Li gor bînahiya xwe ya hindirî encax em dikarin xwe bi rêka mîtolojiya îfade bikin ka em çi ne. Mîtos ji zanistê bêtir şexsî ye û jiyanê jê bêtir bi şikilekî misoger pênase dike.”(Carl Gustave Jung)

Di rastiyê de hemû çîrok perçeyekê rastiyê dihewînin. Pirtuka Oera Lînda ya ku hin rayedar tenê weke çîrok dihesibînin, dîroka gelê Frîgyaya kadîm ya berî tofanê û piştî tofanê neql dike.” (Atlantis Efsaneye ango Rastî ye- Mûry Hope)

“ Mîtolojî, şexsiyet dide heyîn û bûyerên xwezayê û şikilê bi vi awayî veguhestina wan e.” (E. A. Gardner)

“ Ji efsaneya re Mythûs û Mythe tê gotin. Mîtolojî jî beşekê zanistê ye. Ya ku van efsaneya tehlîl dike. Lêkolînên mîtolojî bi vekolînên dîroka ol re jî ji nêz ve têkilîdar e. Encax mîtolojî, ne tenê dîroka ol e jî. Mîtolojî, eynika nefsê merova yak u bi sembola hatiye îfade kirin e.” (Prof. Dr. B. Ogel)

Berî her tiştî mîtolojî çavkaniya esasî ya weje û huner e. Çavkaniya gelek berhemên hunerî yên bêhempa ye. Valmikî, Tûlsî das, Ram Çarît, Manas, Harsha, Magha, Bhasa, Kalîdasa Homeros, Hesîodos, Eûrypîdes, Sophokles, Arîstophanes, Heredot, Ovîdîûs, Vergîlîûs, Zerdeşt, Konfuçyûs, Platon, Platûs, Firdewsî û hemû dastanên gelerî deyndarê mîtolojiyê ne. Îro û berê dema ku qada hunerî were lekolîn kirin; di serî de helbest, dastan, peyker, muzîk, şano û hwd di hemû qadên hunerî de

bandora kûr ya mîtolojiyê tê xuya kirin. Dastanên herî mezin yên dîrokê bi temamî vehûnanên mîtolojiyê ne .

Em nikarin mîtosê wek lihevanîn û derew bigirin dest. Ji ber ku ew afirîna mikemmel ya hişmendî, zihn û xeyalê merov e. Merov ji pêwistiya şîrove kirina xwezayê hatiye dinyayê .

Çîrok(mîtos) di heman demê de şikilekê hişmendiya civakî ye. "Di şexsa de bi sembolên têgihanê, bi sembolên şewka xwe daye tişta re û piştre jî bi hin vegotînên hunerî re xwe îfade dike".

Mîtos di rewşa kok hucreya fikrandina sîstematîk ya merov de ye. Fikir û hişmendiya ku mîtosê qebûl nake, pê re pêwendî na deyne wê bê bingeh bimîne û nagihîje ferqa xwe. Nîzama fikir û hişmendiya ji mîtolojî qut tê wateya; ji dîrokê qut, bêkok e û negihîştiye hişmendiya xwe. Ji ber ku ji koka xwe qut e nagihije heqîqetê. Eşkereye ku tanzîmeke fikir û hişmendiyeke ku nagihije heqîqetê haydarbûna wê jî tune ye. Tebatî û pasîf dibe .

Halbûkî hişmendî û fikrekî ku li ser mîtolojiya hucreya kok xwe mayînde kiriye, dikare xwe ji nû ve ava bike. Di wateyekê de hişmendiya cewherî ye û çalak e. Di heman demê de "logos" e .

Merov bê ku rêbaza mîtolojîk red bike, dikare hin rasttir bigihije koka xwe. Dikare çavkanî hin rasttir tespît bike. Ji ber ku dîrok; li ser raborî, rojane û siberojê şikil digire .

Divê neyê ji bîr kirin ku felsefe, bi avêtina çawaniya ji nav ol re destpê kiriye. Wek mînak di mîtolojiyê de xweda û xwedawendê av, bahr, uman, robara hene. Fîlozofê xwezayê yê nav û deng Thales jî çawaniyeke fizîkî daye avê û çebûna yekemîn pê re destpê dike. Eşkereye ku li vir çawaniya fizîkî

wek jêderk xwe dispêre çawaniya mîtolojîk. Mîtolojî qonaxeke girîng ya zekaya merov û awayiya fikrê merov pêk tîne .

Merovê civaka xwezayî ji bo bûyerên gerdûn, afirîn û xwezayê îzah bike, mîtolojî wek rêbaz şixuland. Di heman demê de mîtolojî bû perçeyeke dîroka vê civakê. Dîroka merovê civaka neolîtîkê di mîtolojiyê de veşartiye .

“ Ji ber ku merovê neolîtîkê di wan mîtolojiya de diroka xwe, siberoja xwe û bergeha xwe vedibêje. Bi dîroka xwe re, taybet jî ji bo domandina sererastkirina bunyewî, hewce bû ku bi şikilekî şidandî girêdayî bimîne.” Di vê dême de hîn nivîs tune bû. Merov raboriya xwe û tiştê jiyîne, bi stran û qasîdeyên gotinî û bi dastana derdixistin holê. Ev dihatin jiberkirin ji bav heta kur ji nesil heta neslê din dihat veguhestin. “Kêrtika dîrokê û bi vê ve girêdayî vegotina dîrokê ya her civak, klan-qebîle-eşîr a ku ji wan re xas hebû .

Felsefeyên Rojhilat û Rojava bi hêmanên mîtolojîk re kelijiye û pê re yek bûye. Dîsa di dîrokê de gelek bûyer û diyarde xwe ji mîtolojî xwedî kiriye û xwe spartiyê. Ger em ol, dîrok, felsefe û zanistê weke ku bi kêre re qut bikî, ji hev cûda bigirin dest wê demê emê bikevin xeletiyê .

Nexwe em ji bo mîtolojî bêjin; Zanista efsaneya ya ku bi rastî û geremola re ketiye nav hev, ev pênase hîn bêtir nêzî rastiyê ye .

Di mîtolojiyê de di asta herî bilind de feraseteke xwezayê ya zindî-livdar û çalak-afirîner heye. Nêzîkayiyeke pêşvebir, azadker heye.

Nexwe weke ku tê gotin ne tenê çîrok, çîrvanok û derew e. Bi vî awayî dest girtina pirsgirêkê nêzîkayiyeke hêsan dibe. Koka

her çîrokê di rastiya xwe ya dîrokî civakî de veşartiye. Tu mîtosa ku ji rastiya dîrokî civakî qut tune ye. Mîtos berî her tiştî berhema fikir, zîhniyet û xeyala merov e. Ger em Mîtosê, bereday,bêesl, bêbingeh, tenê weke lihevanînê bigrin dest, tê wateya înkar kirina jêderka xwe .

Mîtolojî di wateyeke teng de rêbaz e. Şikilê dest girtin û şîroveya xwezayê ye. Ji aliyekî ve rêbaza merovê berê ya dest girtina bûyerên xwezayî, şîrove kirin, bi pêşveçûnên civakî re pêwendî girêdan, bi baweriyên olî ve têkilî danîn û ji bo van hemûya îzah kirin û rave kirina gerdûnê ye.

Xweza çawa ava bû? Merov ji ku derê diçe ku? Civak çawa şikil girt? Têkiliya merov civak û xwezayê çawa teşe girt? Van hemûyan şîrove dike. Dastan, efsane, masal di derbarê qadên têkilîdarê merovahiyê yên civakî, derunî, jiyan, felsefî û olî de şîrove û nirxandina îfade dike. Destanê weke Ramayana, Mahabharata, Gilgameş, Mem û Zîn, Îlyada, Odyeseûs, Şehname hwd. Çîrokên mezin yên pêşveçûna merovahiyê ne. Bîra civakî û raboriya wan e. Ji aliyekî ve dîroka devkî û raboriya wan e. Wateyek Mahabharata jî "çîroka mezin ya merovahiyê ye"

Kurtasiya dastana Ramayana jî ji me re naveroka dastana, pêwendiya bi civak, dîrok û afirînê re bi ji serî heta binî dide xuya kirin .

" Qral Dasaratha yê ku hikimdarê welatê Ayodhya ya li Bakûrê Hindîstanê ye, çar hevjinê wî hene û ji van jî çar kurê wî… Rama ji van yê herî mezin e û Xwedayê Vîşnû yê ketiye

şikilê merova ye. Dayika wî Kaûsalya bû. Navê kurê wî yê duyemîn Bharata, her dû yê cewiyê Lakşama û Sat bûn .

Ramayê bi lehengiya xwe navdar e, bi Sîtaya keça Qralê Mîthîla re dizewice. Li şûna bavê wî ji bo qraltiyê biryar li ser Rama tê dayîn. Dema ku ji bo vê bûyerê amadehî tên kirin, ji her aliyê cîhanê seredan(ziyaretkar) û diyarî tên. Ji Çînê kevirên yeşîm, hevrîşim(armûş), çay ji Îranê; çînî, kevirên giranbiha yê rengo rengo, Ji welatê Mîtanî û ji Ahanatonê ku zavayê Qral Dasaratha ye amber, misk, pirtûka jiyanê û papîrûsê bixeml yên kû sirê xewna li ser nivisiye tên .

Kurtasî, Rama ji ber dek û dolabên jinbava xwe, ji aliyê bavê xwe ve mecbûr dimîne ku welatê xwe biterkîne. Hildikişe daristanê, dema li daristanê jiyaneke hêjar dijî, hevjina wî xwedawenda axe Sîta, ji aliyê Qralê şeytana Ravana ve tê revandin. Rama bi Qralê meymûna Hanûman re lihev dike û piştî şerekî mezin hevjina xwe xilas dike. Bi alîkariya brayê xwe Bharata li ser textê bavê xwe dirûnê”.

Hin nirxandinên di beşa “ bijareyên ji Bhagavat-Gîta” de ji bo rêbaza mîtolojîk wê hin bêtir raveker be .

“ Tu tiştê ne rast nikare ava bibe. Yên rast kî qet tune nabin. Kesên ku veqetîna di navbera van herdûya de bibînin, wê rastiyê bibînin.” (Beşa 2: Merovê ronî bûye)

Xala ku ev felsefe gihiştiyê nêzîkayiya “ tu tişt ji tunebûnê ava nabe, ji hebûnê tune nabe” ye. Ev nêzîkayiya heqîqetê hîn rasttir e .

Feraseteke ku heta digihije zindîbûna xwezayê. Dikarin vê şîroveyê bikin. Zindîbûna di merov de li xwezayê bixwe heye.

Ger ji tunebûnê ava nabe, zindîbûn jî ji tune bûnê ava nabe. Nexwe di cewhera xwezayê de ev yek heye. Di roja me ya îro de felsefeya kûantûmê, perçeyên binatomî, dîlemaya perçe-pêl vê yekê piştrast dike .

"Kesên ku xwe di her tiştî de, her tiştî jî di xwe de dibînin, her cûreyên takekesiyê ji dilê xwe avêtine, kesên kû gihîştine zanyariyê ne." (Beşa 2: Merovê ronî bûye)

Zanayî lêgerînvanê heqîqetê ye. Gihîştina heqîqet û zanayiyê di destpêkê de bi derbas kirina ezezîtî mimkin e. Ya rast di wateya giştî de were dest girtin ev, têkiliya bi xwezayê re tîne ser ziman. Merov perçeyekê xwezayê, wek temamkerê hevdû tê xuya kirin. Bûyera xwezayê ji xwe, xwe ji xwezayê dîtin e. Li ser vê bingehê pêşiya ezezîtî jî tê girtin .

Tenê kêliyek be jî bêçalak bûna merov nayê fikrandin. Bêxwestek be jî her merov bi qanûnên xwezayê re dikeve nav çalakiyê. (Beşa 3: Rêya çalakiyê)

Li vir zindîbûn û livdariya xwezayê danîna holê ye. Çalakî-livdarî(tevgerîn) di xweza bixwe de heye. Xweza wek zindîû livdar tê dest girtin. Liv û çalakî bi qanûnên xwezayê re tê diyar kirin.

" Baweriya merov ji xwezaya wê ne cûda ye. Baweriya wê-wî çi be bixwe jî ew e. An jî ew çi be baweriya wê-wî jî ew e." (Beşa 17: Hêza baweriyê) Diyalektîka têkiliya di navbera merov û baweriyê de qelekî watedar e .

“Ji ti tiştî hêrs nebe û zirar ne de tu zindiyê, nerm û bimerhamet be, ji bo her kesekê bi niyeta paqij be” (Beşa 16: Merovêxwedayî, merovê şeytanî)

Li vir jî weke tê xuya kirin parastina xwezayê, li hember xweza û merov bimerhamet tevgerîn tê raber kirin. Di nav merova de jî qencî tê nesîhet(şîret) kirin. Diyalektîka lihevhatî ya merov û xwezayê tê raber kirin. Berî ku ava çem vexwe li çavkaniya wê binêre. (Dastana Ramayana)

Ev qasî parastin û hurmet dayîna xwezayê, nêzîkayiya rast şixulandina çavkaniyê ye. Roja me îro mantiqa rêbaza zanistî xweza qetil kiriye, cîhana me aniye rewşa ku lê neyê jiyîn. Di vê axaftina ku bi hezaran sal berî vê serdemê hatiye gotin de em hîn baştir fêm dikin ku tê çi wateyê .

Divê berî kû avê vexwe li çavkaniya muqate be. Piştî ku te vexwar û qedand, tê watêya hîmaya wê tune ye. Sermayedarî jib o “kar, hîn bêtir kar” her tiştî ziwa dike. Çavkaniyê bixwe ji bo kar dişuxilîne. Ev siberoja (demên pêş) merov û tofana merov amade dike. Li vir di derbarê xwezayê de nêzîkayî û zîhniyeta mîtolojiya ku ji aliyê “zanist” ve weke derew tê dîtin, em dibînin ku ji zîhniyeta zanistê bêtir avaker û merovî ye.

Ji dema ku merov difikire heta niha hewl dide ku wateyekê bide jiyan, gerdun û hebûnê. Ji bo vê jî her tim li pey lêgerînekê ye. Ev lêgerîna heqîqetê ye .

Heqîqet merova ber bi cur bi cur lêgerîna rêbaz ve bir. Lêgerîn bû sedema mîtolojiya, felsefeya, ol û zanistan. Ev yek weke rêbazekê bi sed salan bîra merovahiyê ava kir. Bi van rêbazên hewldana lêgerîna heqîqetê hat dayîn .

Rojhilata navîn erdnîgariyeke baweriya ye. Sê olên semawî jî li vê erdnîgariyê derketin holê. Mîtolojiya yekem, şaristaniya yekem li vir za û li ser rûyê erdê belav bû. Çavkaniya hemû felsefeya jî ev der e .

Gotineke bi nav û deng ya latînî “Ex Orîentê lux” yanê şewq ji Rojhilat bilind dibe” ev diyar kirin jî nîşan dide ku çavkanî Rojhilat e. Helbestvan Firdewsî, bi gotina “Roj her tim ji Rojhilat dizê” vê rastiyê tîne ser ziman .

Em dikarin bêjin ku ji aliyê dîrokî ve rêbaza yekemîn mîtolojî ye. Di wateya teng de mîtolojî jî weke ol û zanist rêbazek e. Rê û rêbaza ravekirina heqîqetê ye. Hişmendiyeke gerdûnê heye. Bi rêbaza xwe ava bûn û pêşveçûna gerdûnê îzah dike. Bi mantiq û di nav hevgirtinê de afirînê îzah û şîrove dike .

Rêbaza mîtolojiyê ne wek ol hişk û dogmatîk e. Weke rêbaza zanista serdest kirde û bireser ji hev naqetîne. Di rêbaza mîtolojî de xweza di radeya bilind de zindî û livdar e. Vê yekê di hemû dastan, efsane û çîroka de dîtin wê mimkin e. Xweza zindî ye û bi riha ve tijî ye. Tu tiştê hişk û cemidî tune ye. Xwezayeke zindî û livdar heye. Merov û xweza di nav ahengê de ye. Xweza tê pîroz kirin û tê parastin. Di rêbaza mîtolojiyê de xweza ne dogmatîk e ne jî determînîst e. Têra xwe dike, zindî, livdar, çeşiddar û ji azadiyê re vekiriye .

Mîtolojî di serdema olên semawî de wek rêbazeke derbasdar û çalak erka xwe pêk aniye. Divê neyê ji bîrkirin ku efsane, dastan, mîtolojî zîhniyeta jiyana serdema neolîtîkê ne. Her çiqas ji aliyê rahîbên Sûmeran ve di zîguratan de hate tanzîm kirin û weke birdoziyeke olî xistibin xizmeta şaristaniyê jî, weke zîhniyet

çavkaniya xwe ji civaka neolîtîkê digire. Çanda dayîka xwedawend ya neolîtîkê vê zîhniyetê ava kiriye. Bi civaka dewletî re berxwedana çanda xwedawenda ya li ser hezar salan belav bûye heye. Heta serdema Babîl ev tekoşîna xurt berdewam kiriye .

Heta rêbaza mîtolojîk neyê fêm kirin dîrok baş nayê îzah kirin. Dastana Gilgamêş ya Sûmer, Ramayana-dastana Hindî, Memê Alan-Dastana Kurd, Îlyada-Odyeseûs dastana Yewnan ne be em nikarin dîrokê baş îzah bikin. Dîrok encax bî şîrove kirina mîtolojiyê wê baş were fêhmbar kirin. Ji ber ku mîtolojî di jiyana merovahiyê de şikilê rêbaz ya herî dirêj kiriye. Rastî civaka çemê bingehîn tê, ya ku em dikarin bi têgeha "dem-çand" re îzah bikin. Ya rast rêbazên zanista roja me jî ji mîtolojiyê pêk hatiye. Ji vê aliyê ve mîtolojî bi utopya re merovê hevin, demeke dirêj ji bo şîroveya xwezayê, lêgerîna heqîqetê weke rêbazeke bingehîn hatiye şixulandin. Divê ji nû ve were nirxandin, îtibara wê lê were vegerandin û li cihê heq dike were rûniştandin. Mîtolojî bîreke. Hişê civakî ya merova ye. raborî û siberoja wan e. Zinhiyeta merov e. Eşkereye ku merov-civak bê utopya-mîtolojî (dastan, efsane, çîrvanok) hiştin dişibe di hindirê havînê de bê av hiştina gewde .

Rêbaza zanistî zihnê merov ya ku kombûna zihnê hemû zindiya ye, tenê dixîne asta matematîk-analîtîk. Bi wê yekê re sînordar dike. Bi van qalibên matematîkî re mehkûm kirina zihnê merov, bi wan re sînordar kirin, di asta jor de li dijî zindîbûn, zêdebûn, rengînî û livdariya xwezayê ye. Ji ber ku merovahiyê bê matematîk bi sed hezar salan jiyan kir .

Ji xweynî wê çawa ku bi milyonan zindî matematîk nizane, zîhniyeta merov ya ku kombûna wan e jî di nav van qaliban de nayê mehkûm kirin .

“ Li gel vê matematîk, ji bo hesab kirina berhemê zêde îcadeke ku rahibên Sûmeriyan pêş xistiye ye. Yanê berhemeke eqlê merov e. Di roja me îro de wek encama vê nêzîkayiyê eqlê merov âdeta daketiye asta makîna hesabê. Eşkereye ku ev nêzîkayiyeyeke xelet û çewt e”.

“ Nexwe em zihnê bi milyonan zindiya, heta tevgera perçeyên binatomî, mezinahiyê astronomîk yên nayên pîvandin çawa û bi çî fêm bikin. Diyare ku hêza matematîk têrê ev gerdûnên mîkro û makro nake. Herî kêm divê merov ji rêbazên nû yên wateyê re derî vekirî bihêle. Ji xweza bi xwe ve animîzm û hestên zindî hene. Ev nayên biçûk dîtin. Ji ber di derbarê jiyanê de her tiştê ku heye, bi van re girêdayî pêş ketiye. Her tişt di vê zindîbûn û hestan de veşartiye. Nifteya tehlîl, têgihîştin û fêm kirina xwezayê ev der e. Ev hîs û zindîtî ji gerdûnên mîkro û makro ne qut e. Taybetmendiyeke bingehîn ya ev cîhana hestên ku nêzî ferasetêye û gerdûnê ye. Ev taybetmendî nebe, bê ku em bala xwe bidin vê yekê nikarin gerdûnê îzah bikin. Nêzîkayiyeke li derveyê vê an wê me bibe rêbaza dogmatîk ya olî an jî wê bibe rêbaza zanistî ya ku xwe spartiye cûda kirina kirde -bireser. Dawiya herdûyan jî bêçaretiyê îfade dike.” (Rêber A.Ocalan )

Ger em ji vê yekê derkevin rê, kok hucreya mîtolojî Mezopotamyaya jor-Kevana Zêrîn e. Bi gelemperî jî Rojhilat e. Roj her tim ji Rojhilat derdikeve. Erdnîgariya ku roj lê derdikeve

û lê ava dibe xwedî taybetmendîû nêrînên cûda ne. Di lêgerîna heqîqetê de xwedî pîvanên cûda û zîhniyeta cûda ye. Mîtolojî di lêgerîna heqîqetê de di wateya teng de rêbazek e. Çavkaniya zayîna wê Mezopotamya-Kevana Zêrîn-Rojhilat e. Mîtolojî jî Rojhilat ber bi Rojava ve bi şikilê pêla çandê belavbûye. Ji ber wê yekê mîtolojiya Rojhilat û ya Rojava ji hev cûda ye .

Her kevneşopî, adet, nerît, çand li Rojhilat weke taybetmendiyeke xwezayî pêş ketiye. “Reqsa çermsora, şikilê kêfxweşiya kesên Rojhilatanavîn, çanda fedakarî ya kesên Rojhilata Dûr ”.

Nêrîna xwezayê ya Rojhilat ji aliyê zilamên Rojavayî ve her tim wek derveyêmantiq hatiye dîtin .

Halbûkî hest nebin, merov ne tenê bi mantiq dikare bijî ne jî bi aqil. Pîvanên mantiqîbûnê yê her dem û li her derê derbasdar û hevpar tune ye. Mantiq-aqil-hest û merc qasî ku di nav bitûniya diyalektîk de were dest girtin wê xwedî wate be. “Weke Foûcaûlt baldikşîne, di civakên Rojhilat de, dînê ku di nav civakê de hûrmet tê nîşandan, çavkaniya dilcoşiya civakê ne, li Rojava her tim kêm hatiye xistin û mehkûmê hindir kirine.” Weke li vir jî tê xuya kirin, zîhniyet û feraseta civakên Rojhilat hin bêtir xwedî xweşbîni(musamaha) û piştgir e. Şexsê Rojava heta atomê xwe ferdperest, xweperest û egoîst e. Em nikarin vê yekê ji şertê dîrokî civakî yê ku dijîn qut bigrin dest .

Rojava, merov-civak-ferd bi bitûnî ji dîrokê qut dike. Eşkereye ku ji dîrokê qut kirin, razber kirin (jê cihê kirin) û deveyê dîrokê hiştina merov rê li ber korbûna civakî vedike. Ferdê ji raboriya xwe qutbûye kor dibe û ji aliyê civakî ve melekeya dîtinê wenda

dike. Ji ber li derveyê dîrokê hiştina wî tê wateya bîr û hafiza civakî wenda kirinê .

“ Lehengê dastana Ramayana Rama, ji ber hevjina wî Sîta ji aliyê zilamekî ve tê revandin, hevjina xwe red dike û ceza didê, ev yek ji xwendevanê Rojava ve divê ku dehfdêr were. Dîsa jî tevgera Rama tê fêm kirin, ji ber ku di civaka wî de hin jî tevgera nimûne ev e.”(D. Rosenberg)

Li vir tevger û helwesta Rama tenê bi tenê di nav hin şertên diyar de tê fêm kirin. Dema ku Rama ji dîrokê were qut kirin, ti tevgera wî nayê fêm kirin. Dema ev hemû di ber çav de werin derbas kirin, mîtolojî bi hezar salan di jiyana merova de ji bo îzah kirina gerdûn-xwezayê weke rêbazeke. Ev yek bi hêsanî tê fêm kirin .

Nexwe mîtolojî di rave kirina heqîqetê de rêbazeke xas e. rêbaza mîtolojîk, di têgihîştin ûîzah kirina merov, gerdûn, civak û raborîyê (dema bihurî) de herî kêm qasî rêbaza zanistî tevkarî kiriye. Merov demeke dirêj vê yekê weke rêbaz şixulandiye.” Dema mîtos rast were şîrove kirin tê xuya kirin xezîneya zanebûnê ya ku hin tiştê ku zanist ne di ferqa wê de ye û car cara dijberî wê dikeve ye. (dema tê tehlîl kirin dirustiya wê bi rêka lêkolînên zanistî tê piştrast kirin) Pir tiştê ku em ji bav û kalê xwe fêr bûnêû emê fêr bibin heye. Weke encam ؛

Berî mîtosa niviskî, mîtosa devkî hebû. Mîtosa devkî, bi hezar salan weke avayiya fikrandinê şekil da merovê neolîtîkê. Nirxê manewi, exlaq û moral yê civatên neolîtîkê biteşe kir. Civata bi mîtosa devkî jiyana xwe ya civakî tanzîm kirin.

Fikrê mîtos û efane ne xwediyê naverokeke diyarde ne, şaş û çewt e. Schlîemann ev nêzîkayiya çewt vala derxistiye. Hin merovên zanistê, dîroknas bi salan berpêş kirin ku merovê neolîtîkê xwedî avayiya aqilekî hêsan yeknesak (monoton, yekalî) e. Hin nûveyên di kolanên arkeolojîk de derketine holê diyar kir ku ev yek ne wisa ye. Rojnamevan Alexander Marschak derxist holê ku merovê civaka neolîtîkê xwedî qabiliyet û avayiyeke pêşketî, sîstematîk û tevlîhev ya fikir e .

Di civaka xwezayî de nivîs nebe jî hebûna fikrandineke gelekî pêşketî, sîstematîk û tevlîhev hatiye pîştrast kirin. Li gel vê hin nûveyên di kolandina arkeolojîk ya xerawreşk de derketin holê, kok hucreya nivîsê nîşan dide. Mîtosên devkîû dastan ji aliyê rahîbên Sûmeran ve ji cevhera xwe hate derxistin û bûn niviskîû ji xizmeta çîna serdest ya ku nû derketiye pêşberî dîrokê re hate pêşkêş kirin .

Mîtolojiya niviskî, weke îcada rahîbê Sûmeriyan, wek yekemîn birdozî, ol û felsefeya çîna serdest teşe girt. Di lêgerîna heqîqet û jiyana azad de bû weke rêbazekê .

## B- RÊBAZA DOGMATÎK YA OLÎ:

### Destpêk:

Piştî rêbaza mîtolojîk ya herî dem dirêj di jiyana merova de cih girtiye rêbaza olî ye. Ol jî weke rêbazên din bi mantiqê xwe û zimanê xwe ve ji avabûna gerdûn, afirîna merov re îzahatekê tîne. Weke rêbazekê bi şaristaniya hiyerarşîk û dewletî re dikeve

dewrê û gav bi gav serdest dibe. Roja me îro jî di jiyana civakê de rêbaza herî belavbûyîû bi kartêker(çalak)e .

Ji bo rêbaza dogmatîk ya olî were fêm kirin, divê em, bi hin mînakên ku mohra xwe li pêvajoyên dîrokî civakî dane re taybetmendiyên wê yên bingehîn vekin .

**1-Bergeha (panorama, dîmen) di derbarê Afirandinê de:**

Serdemeke zêrîn ya ku merova bi hezar salan xeyalê kiriye hebû? Bihuşteke ku lê jiyan kir çê bû? Welatê rojê-Welatê Atlasê (yek ji peyka saturnê) rastî bû? Ger hebe kîngê, li ku derê, çawa derket holê? Çima, ji bo çi, çawa wenda bû? Pekî ev cehnema merova dike evd, kole dike, tune dike kîngê, çawa, li ku derê derket holê؟

Yên reşbîn, bêhêvî, bêçare rastiya jiyana madî tune dihesibînin. Yê madî tenê weke sawîn (îluzyon, sitavka tiştekî)û demkî dinirxînin. Li gor wan heqîqet yê bi çav nayê dîtin, yê li derveyêe me heye û li ser her tiştî hakîm e .

Pirtûkên pîroz yên li ser baweriya hişk, dogmatîk hatiye ava kirin, reşbînî û bêhêvî ne. Her sê pirtûkên pîroz; Weke Upanîşadê Hindiya bi kehanet û mîtosê tirsnak re tijî ne. Her sê olê semawî di xala raborî, rojane û siberojê de yek difikirin .

Li gor vê yekê; Raboriya me tofaneke reşbîn û bêhêvî ye. Tofan mîtosa tune bûnê ya li derdora keştiya Nûh hatiye hûnandin e .

Dinyaya ku em rojane lê dijîn jî sawîn e. Her tişt demkî, fanî(nemayînde), her tişt xewn û xeyal e. Em di xeweke ku tê de hatine hîpnotîze kirin de ne. Tu tiştekî rasteqîn tune ye.

Siberoja (dema pêş) me mehşer û qiyamet e. Her tişt wê ser û bin bibe. Kevir wê li ser kevir nemîne. Dinyaa wê rast bibe.

Di dinyaya demkî, derewî de wateya tu tiştî tune ye. Divê her tişt li gor dinyaya din were eyar kirin. Dinya âdeta robareke fûriyayî ye a ku bi hestirên çavên merova ava bûye. Pergaleke bi qedexeyên tirsnak tijî bûye, li ser êşa ava bûye. Her tişt bi qedexeyên hip hişk, bi guneha, tabûya, bi destnedayîniya teşe girtiye .

Hemû çerçove ji milê çarenûsê ve xêz bûye û hatiye diyar kirin. Jin, zilam çi jî bike dikare derkeve vê xelekê? Kî dikare di xeleka çerxê(felek) de derbas bibe. Sedem û çavkaniya van hemûya gotin e. Ji ber destpêkê gotin hebû. Her tişt pê re destpê kir .

Gedûna mezin ji gotinê zaye. Dinya ji gotinê zaye. Merov ji gotinê zaye. Hemû zindîû nezindî ji gotine za ne. Pirtûkên pîroz wisa dinivisînin .

Di kêliyeke dema herîkbar û bêdawî de Xweda gotiye “çê bibe”!

Piştre her tişt bi ya gotina çê bibe kiriye. Gerdûn çêbûye, stêrk çêbû ne. Ronahî, rûesmana şîn û belavbûyî çêbûye, av çêbûye, ax çêbûye, merov çêbûye, dar çêbûye, mêş û morî çêbûye... Destpêkê gotin hebû!

Gotin fermana xweda ya çê bibe bû. Gotin pîrozahiya xwedayî bû. Li gor ola kevin ya Hindiya gotin pîroz bû. Gotina xweda ya “çê bibe” ji her tiştî berpirs bû .

Di olên kevin ya Hindiya de “ÇÊ BIBE”, “DENG”bû. Gerdûn û xweza bi denga tijî bû. Dengê bayê, vejandina birûska, gure gura esmana, hirîna şêr a, herikîna robara, waqewaqa roviya, kûzîna gura, xişe xişa dar a, wîçandina qumrî ya hemû dengek bû. Zimanê her tiştekî hebû .

Afirîn bi denga tijî bû. Ji denga gotin ava bû. Nexwe berî gotin deng hebû. Her deng ji bo zayîna zimanekî bû çavkaniyek. Ji ziman gotin ava bû. Gotin bû sedema afirînê .

Jin, zilam hemû merovahî bi şoreşeke mezin ya ziman ber bi şaristaniyê ve pêşveçû. Piştre gotin-zimanê merov li ser merov bû serdest. Destpêkê merov ziman-gotin ava kir. Piştre gotin li ser merov hikim kir. Û “merov xwedayê bimirin, xweda merovê bêmirin bû”

**2-Di derbarê rêbaza dogmatîk ya olî de hin diyar kirin:**

Yên rêbaza olî pêşxistin û parastin hewldan angaştê(îdîa) xwe piştrast bikin. Ji bo ku lingê rêbaza dogmatîk ya olî bihêz bikin û piştrast bikin angaştên cur bi cur dan pêş .

Rêbaza olî merov û civakê weke rastiyeke civakî nabîne. Ji ber diyardeya xweda li derveyê merov û civakê weke berrahiyeke serbixwe digre dest .

Halbûkîxweda encama zihnê merov yê afirîna xweda ye. Li gor pêdiviyên civakî, şertên civakî hin çawanî(wesf) li têgeha xweda bar kirin. Li derveyê merov û civakê dest girtina diyardeya xweda ne mimkin e. Destpêkê merov xwedaya afirand, piştre afirînên merova dest bi hikum kirina li ser merova kir. Ev diyarde perçeyeke berrahiya merov û civakî ye .

Ji ber ol di dîroka fikir de xwedî cihekî girîng e. Çeşîdekê bîra civakî ye. Bi taybet ya merov bi giştî jî nasnama nijadî(qewmî) ya civata ye. Wijdanê hevpar ya merov û civakê ye. zîhniyeta civakî ye .

Nexwe ol, şikilê xwe derxistina holêûîfade kirina civakê ye. Tê wateya çeşîdekê binav kirin û nasnamê. Di civaka xwezayî de xwedawend, nasnama civakî ya merov, klan û qebîleya ne. Bi vê yekê re xwe îfade dikirin. Totemeke her klan û qabîleyekê yê kû miqabilê hêzên xwezayê ye hebû. Her totem weke wijdan, zihn û nasnama hevpar ya wê klan û qebîleyê teşe girtîbû .

Di civakên xwezayî yên çavkaniya wan dayîke de xweda perçeyekê civakbûnê ne. Di nav civakê de ne û bi merova re lihevhatî ne. Li vir hikm kirin tune ye. Hurmet û parastina beramberî hev heye. Berrahiya civakî şikil dide çawaniya berrahiya xwedayî. Dikarin vê bêjin, diyardeya ol ûxweda weke exlaq, huner, felsefe, çand û zanist diyardeyên metafîzîk yên afirîna merova ne. Merov bixwe jî diyardeyeke metafîzîk e. Ji ber em nikarin bi awayeke din civakbûna metafîzîkîîzah bikin .

Berî her tiştî ger metafîzîk nebûna civakbûn pêşve nediçû. Merov ji xwezaya madî derdikeve, wê derbas dike, bi rêka huner, exlaq, çand, polîtîka ne xwezayeke nû diafirîne؟

Xweza û merov dîlemaya diyalektîk e ya hevdû bandor dikin, ji hev bandor dibin û hevdû merc dikin. Merov qasî ku civkaî dibe xwezayê derbas dike. Azadbûn di wateyekê de bi xwezayê re di nav ahengekê de derbas kirina xwezayê ye. Ger derbas kirina xwezayê civakîbûn be, civakîbûn jî azadbûn e. Li vir bi civakîbûnê derbas kirin, li ser xwezayê ne hikm kirine, lihevhatineke diyalektîk bidest xistin e. Li vir civakîbûn, derbas kirin, di cewhera xwe de metafîzîk e. Berhemeke hêza fikirandinê, tesewirê ye .

Ji ber xwezaya ku dibe merov gerdûneke xas, aîdê xwe, taybet û metafîzîk ava dike. Xweza qasî ku dibe merov, ewqas civakî dibe. Qasî ku civakî dibe, merovbûna xwe mayînde dike. Xweza li ser vê bingehê gerdûneke metafîzîk ava dike. Encax miqabilê vê rêbaza olî, bi veşartina vê rastiyê re wesfandineke qeba, seranser dike. Civakbûn bi serê xwe gerdûneke. Merov bixwe gerdûneke mîkro ye. Merov li gor hebûn û afirînê xwedî taybetmediyên metafîzîk e. rêbaza olî ji ber ku ev berrahiya bi xwezayê re heye, li ber çavan derbas nake, ji bo her cureyên jirêderketinê re vekirî dimîne .

Nêzîkayiya ku Marksîzmê derxistiye holê ya “ol tiryak e, ol paşverûtî ye, hişkbawerî ye” zêde rast û raveker naxuyê. Ev nêzîkayî ji xeynî tevlîhev kirin, şilo kirina zihnê merov tu çareserî ava nake .

rêbaza olî ya siltewî li ser vê bingehê ol bi îqtidar(silte) re kir yek û berevajîkirina herî mezin afirand. Ji bo ol-xweda-silte meşrû(rewa) bikin şixulandin. Ev jî koletiyeke piralî pêşxist û rewa kir. Nirxên azadîxwaz yên civaka xwezayî, lêgerîna

heqîqetê perçe kir û paşxist. “Bi vî awayî xwedê, di cewher de jî dewlet koletiyê aniye weke şikilê jiyanê, ev terzê jiyanê weke çarenûsa naguhere di mejiyê merova de hatiye nexşandin.” Bi şaristaniye dewletî re mîtolojiyan xislet(xusûsiyet) guhertin. Ya rasttir rahîbê Sûmeran li Zîgûratan mîtolojiya civaka xwezayî ji nû ve teşe dan. Xisleta zilam dan mîtolojiya xwedawenda û ji nû ve vesaz kirin .

Mîtolojî ji amûrê ravekirina rastiyê derxistin û veguherandin amûrê rewakirin, teqez û bêdemkirina îqtidara rahîbê-qral. Bi vî awayî rêbaza heqîqet zanîn, rewa ûîzah kirin, veguherî amûrê veşartina heqîqetêû esasgirtina berjewendiyên qralan .

Bi mîtolojiya Sûmeriyan ya ku li gor dewleta rahîb-qrala ji nûve xwe bişikil kiriye, veqetîna “kirde-bireser” jî weke çalak destpê kir. “Bi şixulandina vê rêbaza merov ji bo bibin kole û evdê hêzên îqtidarê hatin îqna kirin û felsefeya evdîtî hatiye pêşxistin.” Li vir mîtolojî dibe rêbaza ravekirina gerdun û xwezayê .

Her çiqas têgihîştin û zihnê merov pêşveçûye rêbazên ravekirina heqîqetê jî guherîne. rêbaza olî jî ya ku piştî rêbaza mîtolojîk hatiye pêş xistin, di asta bilind de li dîroka merovahiyê mohra xwe lêxistiye.

Bi serdema qralên xwedayî re hemû nirxên azadîxwaz bi qalibên dogmatîk, mutleqî(teqez) xistin bin kontrol û zextê. Wekî ku pêş ketin, guhertin û veguhertinê berasteng dike. Ji ber ku “xwedayên qral” bi rêka mîtolojiyêîqtidarên ku xuliqandine weke “teqez-naguher û heqîqeta tenê” rewa dike û bi civakê dide qebûl kirin .

Di cîhanê de bi birdoziya mîtolojiya olî re “pergala qralên xwedayî” weke rastiya yekane, naguher û nayê nîqaş kirin, di asta pîrozî de vediguherînin hafizaya civakî. Vê yekê bi tekoşîna birdozî re bi hemû civakê didin qebûl kirin. Bi rêka îqna bûnê qebûl kirina koletiyê bi vê tekoşîna birdozî biser dikeve. Ji sedema vê pîroziya nayê nîqaş kirin, her axaftina ji devê Rahîbê Qral derdikeve pîroz e û di çerçoveya fermana xwedê de tê dest girtin û tê pêk anîn. Her gotina qral weke destureke olî ye. Hemû êşên pergala koletiyê li ser ve pîroziyê hildikşe .

**3-Di Civaka xwezayî de xweza û bawerî di nav ahengekê de bû:**

Di civaka xwezayî de gelek heyberên (tişte, bireser) ku di jiyana çiya, ax, av û merov de rol dilîstin pîroz bûn. Baweriya têkilîdarê jiyanê li ser tiştên xwezayî yên weke çiya, agir, av, roj, stêrk hwd. dihat hûnandin. Li ser wan sond dihat xwarin. Merov bi hemû civakê re dinav hev de bû, jiyana xwe ya madîû manewî jê digirt .

Di têgihîştina merova de xweza zindî bû. Xweza livdar bû. Xweza çavkaniya hemû jiyanê bû. Ziman, gotin û rihê xas yê çûk, gur, çîçek, mêş û morîû axê hebû. Merov xwezayê weke xwe zindî difikirî. Zindîbûn livdarî guhertin, veguhertin û pêşketin e. Merov û xweza heqîqeteke di nav hev de bû. Ji zimanê hev fêm dikirin û dost bûn .

Mînak, ger tu zimanê çiya bizane, çiya vediguhere jiyaneke xweser. Zimanê wê nizanibe, jiyan li wir bi her awayî zehmet

dibe. Dema pirsgirêkek bi rêbaza rast were dest girtin digihije heqîqetê. Digihije jiyana rast û çareseriyê .

Ji ber ku çavkaniya çareseriya xwe di xweza bi xwe de heye. Li tenhayiya çiyayan hilkişîna xelwetê ya zanyar, pêxember û weliya her hal ne rasthatinî ye. Ger zimanê wê fêm neke, mirin û koletî ye. Di stranên gelerî de gotina “çiya çiqas bilind be jî rêkek derdikevê.” İifadeya vê rastiyê ye .

Di jêderka afirînê de xweza heye. Merov bî meyzekirin û bi vekolana xwezayê her tiştî fêr bû. Tov ket axê. Dema bi hewa û avê re bû yek ket “halê rûşeym” Hêdî hêdî serê xwe derxist derve. Piştre jî veguherî çîçek û simbilê. Di hemû teolojiyên(îlahiyat) nêz de çavkaniya esasî ev e. zîhniyet û çavkaniya esas ya her sê olên semawî jî xwe dispêre ev derê .

Çavkaniya bingehîn, madeyê xam ya hemû nazariyên afirînê xweza ye. Di afirîna demê nêz de pênaseyên weke “lawê kesekî, lawê darê, lawê agir, lawê axê” hwd. her diçe di fikir de wekhev dibe, yek dibe .

Dema ku afirîna serdema destpêkê bidin berçav; Ademê ku Îslamiyetê demeke dirêj wî di nav çiravê de sekinandibû, ji nişka ve veguherîna wî ya kese- lawê adem rewşeke tê fêm kirin e .

Destpêkê derketina hunerê, armanca wêû şikil girtina wê jî bi vê re têkilîdar pêş dikeve. Huner, jiyanê ji nû ve, di asta jor de bi terzê hin xweşik û mikemmel afirandin e .

Ev afirandin tenê ji merov re xas e .

Merov, civak, xweza û huner bituniyeke diyalektîk e. Tiştê ku di xweza, merov û civakê de nabîne, bi rêka hunerê di şikilê dixwaze de diafirîne. Hunermend, di korîdorên mirinê yê

pergala koletî de civakeke ronakbîr, azad û wekhev xeyal dike. Tiştê xeyal dike bi afirîna hunerî derdixe holê .

**4-Fikrê ezel- ebed bi merova re destpê kir:**

Bi hiş têgihiştina hiş ji merova re xas e. Yê “ezel(bêdestpêk) û ebed(bêdawî) e di heman demê de girêdayî merov e. Afirandineke merov e. Ji aliyê merov ve hîs kirina wê ye .

Li vir çîrok bixwe çîroka merovê ku xwe bixwe hîs dike, xwe dibihîze ye. Merov bixwe di nav vê çîrokê de ye. Nexwe ev serpêhatî afirîn û serpêhatiya merov bixwe ye. Qasî ku merov bixwe tê fêm kirin, di wê astê de wê ev serpêhatî jî were zelal kirin û sirr wê were fêm kirin. Ji ber ku merov nagihîje rastiya xwe, nagihîje heqîqetêû nikare kok hucreya xwe derxîne holê, pirsgirêkê dispêre têgehên “ezel û ebed” û hewl dide bi vî şikilî îzah bike .

**5-Têgîneke ku li ser Tirs û Guman Teşe girtiye:**

Û merov li derdorê xwe mêzand. Di her tiştî de li her derê bêdawîtî hebû. Erdnîgariya ku li ser dijî heta ku çav çavan dibîne dirêj dikir. Ji ku derê destpê dikir û heta ku derê diçû? çawa ava çêbû? Kî ji bo çê çawa afirandibû? Ewqas zindî çawa derket holê? Piştre merov çavê xwe li rûesman beq kir. Dîsa bêdawîtî hebû .

Merov dema ku çavên xwe li jiyanê vekir dît ku li xwezayê hin hêzên jê xurttir hene. Ev hêz hem di made hem jî di rih de

dixuya. Merovê yekemîn navê Mane(Wate) lê kir. Ji fikrê mane baweriya totem pêş ket. Totem, awayekê mane yê şikil girtiye .

Totemekê her klan û qebîleyê hebû. “çeşîdekê lawir an jî nebatê ya diyar, weke ya herî mane kom dike hilbijartine û wê pîroz dîtine.” Her çiqas merov kesên ku li kêleka wî ne, bi hev re dijîn wenda kir, mirin, bêmirinî, û jiyana xwe fikirî. Vê yekê bi mane teşxis kir. Dema ku li bêmirinê digeriya, fikrê piştî mirinê jiyana nû pêş xist. Teşxîsa mane feraseta zindîtî(anîmîzm) pêş xist. Merova baweriya ku xweza bi riha tijiye pêş xistin, êdî xweza jî weke merova zindî hat têgihîştin. Bi demê re têkilîdarê vê sêrbazî û sêhr pêş ket. Merovê yekemîn Ji bo xwe ji hêzên ji xwe xurttir biparêze, dest bi lêgerîna hêzen parêzvan kir. Ev hêza parêzvan, hêza li kêleka wî, perçeyekê xwezayê an darek an jî lawirek bû. Di hin civata de jî bahr, stêrk hwd bû. Ji navê vê parazvanê re totem hat gotin .

“Fikrê bingehîn yê totem gotineke Mane ya gotineke Malenezya bû.” Mane, hêza belavbûyî û pîroz e. Dikare li her derê belav bibe, ji aliyekî ve kesên ku jê bawer dikin de jî ev hêz heye”.

Merova wisa bawer kir ku di mane de hêmaneke tanzîmê heye. Ev jî ji kevneşopîtî re rê vekir. Ji bo ev tanzîm were bidest xistin dilpakî(fezîlet) hate pêş xistin. Dema ku merov mane bi şikil(kesayet) kir wê li her derê dît. Her çiqas çu ev ji pirxwedayî re rê vekir. Xwedê zêde û zêde bûn. Her tiştekî xwedayê wî çêbûn. Çiqasî hêza razberkirinê pêş ket, îzahata gerdûna yek, rê li pêşiya di yek xwedayî de kombûna hemû xwedaya vekir .

Qurban, dia, rêzdayîna qanûna, dilpakî, cejn, efsane û halê ji hişê xwe çûyînê ji baweriya totem ya herî seretayî heta olên pir pêş ketî jî, mijara hevbeş ya hemû ola ne.” Edî pîvan pîvana rûesman e. Ev pîvan destpêkê li erdê destpê kir. Piştre derket lûtkeya Olîmpos, piştre jî derxistin rûesman. Ev pîvana rûesman di serî de weke mirin, ronahî, tarîtî êdî ji her tiştî re îzahat û çareserî danî. Hemû nelihev kirinên civakî, pirsgirêk bi vê pîvanê hatin çareser kirin .

Demek hat merovan bi baweriya totem li hember pirsgirêka kêm û bêçare man. Li dorhêla xwe, tiştê di jiyana rojane de diqewimin xwestin fêm bikin, çareser bikin. Jê bawer kirin ku hin rihên ku bi çavên xwe na xuyên hene. Merov ji dayîk dibûn, dijîn û dimirin. Yên dimirîn çareke din ne vedigeriyan. Çima dimirin? Rih û zindîbûna miriya jî dimir؟

Ev nêzîkayî fikrê mirî jî jiyanê berdewam dikin, pêş xist. Anîmîzm a ku em dikarin weke “zindîtî” pênase bikin, pêş ket .

Rihên naxuyên, miriyên zindî jî sêrbazî afirand. Li ku derê anîmîzm hebe, li wir sêrbazî jî heye. Encax, mana, tabû hwd. ku fikrên mane ne di anîmîzmê de jî berdewam kir. Heta di her sê olên semawî de jî şopên wan qederekî hene .

Rahîbê Sûmer, li hember hemû tiştê berî xwe şer destpê kir. Erişî her tiştê aîdê civaka xwezayî kir. Ji bo tune bike hewlda, yê ku nikaribû tine bike jî kişand nav pergala xwe û veguherand madeye xam yê pergala ku înşa dike .

Di Zîguratan de bi îqna û tirsê, di derbarê ya nayê dîtin de sirriyetek ava kir. Li ser vê yekê baweriyeke nû ava kir. Yên pîştî wî hatin vê yekê hin bêtir pêş xistin. Sîstematîk kirin .

**6-Çavkaniyên Bingehîn yên Afirendinê:**

Di civakên Sûmeriyan de hêmana “av”, di bin hîmaya “erd”, Enkî de bû. Agir jî bi ezman re hatibû wekhev kirin. Enlîl, weke nûnerê agir û ezman dihat pejirandin .

Di pirtûkên pîroz de dibêje Adem-merov ji axê, Şeytan ji agir hatiye afirandin. Afirîn li ser vê yekê teşe digre.

Çavkaniya bingehîn ya afirînê jî av e. Di baweriyên kevin de robar û av dihat pîroz kirin. Şikilekî perstinê bû. Pakbûn û ceza kirinê bi cih dianî. Di olê Zerdeşt de av, agir, ax û roj pîroz bû. Li ser avê sond dihat xwarin, dihat pîroz kirin û weke dayikekê rêz diyar dikirin .

Di mîtosa Helen de çîroka xwedaya robar û keça xwedaya robar Defne xwe dispêre vê baweriyê. Dîsa xwedayê bahrê Poseîdon bi milêba xwe bahrên bi kefa spî bipêl dike. Xwedayê avên yekemîn Phokys, xwedayê bahrê Poseîdon, Glaûkos, Nereûs, Xwedawenda bin bahrê Amphîtrîte, Leûkkothea, Dorîs, Thetîs, Dayîka robar Acheloos hwd. têkilîdarê avê gelekî xweda û xwedawend hene. “Gilgamêş, hin miriyên avêtine robarê dîtibû .

Di şerê Troya de ji bo biranîna Patraklos heywanê zindî û merov biavêtina robarê qurban kirina wan tê vegotin .

Di mîtolojiya Sûmeran de jinên ciwan yên wê bi Enlîl û Enkî re rakevin destpêkê li robara pak ya pîroz xwe dişuştin .

Di merasîmê pîroz yê zewacê de xwedawend an jî rahîbe destpêkê di merasîma şuştina pîroz de derbas dibûn .

Em, heman pîroziyê di fîlozofê xwezayê yê Yewnan Thales de jî dibînin. Bûyera waftîz ya xirîstiyaniyê, di baweriya Ezîdîtî de bi ava pîroz şûştina zaroka şî pala xwe dide vê kevneşopiyê. Di Îslamiyetê de ava zemzem ya pîroz jî her hal bi vê yekê re têkilîdar e .

Bi ava sar, sar û germ an jî bi ava kel şuştina kesekî mirî, her çiqas şikilê yamyamtî(merovxwarin)ya miriya bide jî, destnimêj, waftîz, qedexeyên girêdayî robara, hemamê bûk û zave hwd. divê mîna avêtina kesekî nav avê, di nav avê de kuştin, di nav avê de mirina temsîlî were dest girtin”.

Li vir av tê wateya ji xirabiya paqijbûn, weke ruhî pakbûnê .

Bi avê re pakbûn, waftîz, di civakên kevin yên Mezopotamya de ewqas girîng e ku Îsayê Mesîh yê taybetmendiyê “bav-law-rihê pîroz” li xwe kom kiriye jî, taybetmendiya pêxembertî an jî xwedatî, piştî ku li robara Şerîa ji aliyê Yehya ve hat waftîz kirin nû bidest xist”.

Ji hemû van yekan ev derdikeve holê. Çavkaniya baweriyê ya yekemîn xweza ye. Di eslê xwe de bi rêka tewrat, incîl, Kuranê belavbûuye jî bi yek şikilî hatiye pênase kirin û derketiye holê .

“ Adem” tunebû. Gelek zilamên cûda weke “Zilamê axê”, “zilamê tevir û çape(tevrik)”, “zilamê agir”, “zilamê darê”, “yê ji ezman hatiye afirandin”, “yê ji erdê, ji axê hatiye afirandin” hebûn .

**7 -Ol tê çi wateyê؟:**

Berî ku rêbaza olî rave bikin divê bi gelemperî, pirsa ol çiye bibersivînin. Em dikarin bêjin ol, yekbûna baweriya ya xwedî ayîn, tetbîq, nirx û saziya ye ya ku çavkaniya xwe ji xwezayê digire, bi demê re ji çavkaniyê re beyanî dibe û bi gelemperî hêmanên pîroz û exlaqî yê nesirûştî dihewîne ye .

Ol di jiyana rojane de pir caran bi peyva bawerî re di nav hev de û wekhev tê bikar anîn. Dema ku ol weke dîrokî civakî tê vekolandin, wisa dixuyê ku di jiyana her civatekê de cûda cûda şikil digire û pêş dikeve .

Têgeha ol bi Erebiye û ji aliyê peyvnasî ve tê wateya "îtaet(peristin-guhdari), rê, hikm, mikafat." "Ol ji endamên xwe re armanca girêdayînê, quralên nêzîkayiya yê ku encamê çalakiyên civakî û şexsî bipîvin û ji bo kes, grubê xwe û gerdûnê rave bikin çerçoveya fikir û pergala hest û çalakî ye".

Li gor Bergson ol; "Li hember belavbûn û bêçaretiya aqil berteka parêzker ya xwezayê û hin pêş de bi yekbûna jiyanê ve girêdan e".

Li gor Edward Sapîr ol, " di nav dorhêla nayê fêm kirin û xeter ya jiyana rojane de, dîtina rêka ku wê merov bibe aramiya dil, aramiya hindirîn e. Ji xeynî vê ne tiştek e û xwedî avayiyeke pir belav e".

Li gor Parsons ol; "Di derbarê cihê merova yê li kaînat(gerdûn)ê, têkiliya merova bi derdorê xwe re û girêdayê têkiliya bi merovên din re tiştên tên dil kirin û nayê dil kirin" de feraseta tê pêşxistin û pêkanîn e .

Li gor tesawûf û derûnnasê ol; “Disiplîneke ku ji bo merov bibe merovê kamil sewq dike.” Li gor Hz. Mihemed ol; rêya kû hûn têde diçin e”.

Li gor Anton Szandor Lavey; Her cûreyê qada elektirîkî ya jiyana merova bandor dike.” Li gor Karl Marx, “ol tilyak e”

Li gor derûnnasa ol; “bûyereke ezîtiya bilind e. Saziyên duyemîn yên şexs bi civatê re girê dide, avayiya şexsî bi rêka projeksiyonê diyar dike. Civaknas jî ol bi civakê ve rave dikin.” Civaknasî li olê weke “di jiyana civakê de ceribandina ya pîroz” dinêre .

Em ji hemû van pênaseyan derkevin rê, yekemîn fikrê ol weke perçeyekê xwezayê teşe digire. Encax bi demê re ji xwezayê tê razberkirin, çawaniyeke li ser xwezayê(nesirûştî) bidest dixe. Ol bi gelemperî pîroz û neguher e. Ola ji xwezayê tê razber kirin xisleteke dogmatîk digire. Ji her aliyê ve ji dil ve girêdayînê, bi giştî xwe teslîm kirinê dipejirîne.

Ev ji holê rabûna vîna azad û zayîna çarenûsîtiye .

Pênaseya vekirî ya ol li her grûbên cûda yên olî û di her olê de cûda ye. Encax çawaniya ku ol dihewîne û hêman, di hemû olan de li ser xalên hevbeş digihîjin hev .

“ Ol ji bo hemû kesên di giştî jiyana xwe de xebitîne, tunebûn dîtine re, li vê dinyayê qîma xwe  bi ya kêm anîn, sebr kirin û li dinyaya din domandina hêviya bihuştê fêr dike.” Her tiştî dicemidîne û bi quralên hişk yên pîroz ve girê dide .

**8-Hebûna Heqîqet û Rastiyê Gumankerî:**

Brahîm ji sîtema baweriyê ya Nemrûd biguman bû. Li hemû pergala Nemrûd bi guman dinêrî. Her tiştî lêpirsîn dikir. Ev pût kêrî çi karê tên? Pût ne xweda ne. Heqîqet ji van pêk nayê!

Û Îbrahîm li dijî Nemrûd serî rakir. Rojekê ket hindirê pûtxaneyê. Hemû peyker bi bivirekê şikand û perçe kir. Tenê peykerê MARDÛK hişt. Bivirê xwe li stuyê MARDÛK daleqand û derket. Ev bûyer, yê kû Nemrûd û Mardûk dihebînin, pir aciz kir. Her kesekê ji Brahîmê lawê Azer guman girt. Ji ber di vê mijarê de dîroka wî bi bûyer bû. Brahîm girtin û kişandin lêpirsînê. Pirs kirin ku " Ey Brahîm ev kar te kiriye"؟

Brahîm qesta MARDÛK ê bivir di stuyê wî de ye kir û got "Dibe ku vî karê wî kiribe. Ger bikare biaxive jê bipirsin".

" Ey Brahîm! Tu jî dizanî ku pût naaxivin. Dixuyê ku ev kar te kiriye".

Brahîm, "Nexwe hun çima van pûta dihebînin?" got. Û Brahîm bi derbas kirina hemû zehmetiya, bi pergaleke nû ya baweriya gihîştina heqîqetê hedef kir .

Gumankeriya Yewnan gumanê di asta fikir de digirt dest, ji her tiştî guman dikir û bi vî awayî hewl dida bigihije hebûna rastiyê. Fikrê "zihnê merov bi awayeke misoger nikare bigihije tu rastiyê" berpêş dikir .

Îdîa dikir ku 'hêza zihn tune ye ku rastiya tiştekî îspat an jî înkar bike'.

**9-Merov pivana her tiştî ye:**

Protagoras digot "  merov pîvana her tiştî ye." Anatole France, bi gotina "Merov têkilîdarê gerdûnê encax tiştê kû merovîbûnê dizane. Ew encax merovîtiya tişta dizane" Protagoras şîrove dikir. Soqrat jî Protagoras wiha dinirxand.

" Car caran heman ba yek ji me dilerizîne, yê din na lerizîne. Ev nayê serê me? Nexwe em ji bo bayê bi tena xwe û tekilîdarê xwe çi bêjin? Ew hênik e an ne hênik e? An jî weke ku Protagoras dibêje ji bo merovê dilerizê hênik, ji bo yê nalerize ne hênik e"؟

Îdîayeke di derbarê tiştekê de ne tenê li gor kesan diguhere, di heman merovî/ê de jî li gor kêlî, rewşa merov ya derûnî û li gor rewşa nefsî jî cûda dixuyê. Heta li gor xala çavdêriyê jî diguhere. Li gor gumankeran rastiyên objektîf(bireserî) tune ye, bes nêrînên bi giştî ji hev cûda yên şexsî hene. Lê belê li vir pîvana bingehîn merov e. Nêzîkayî cûda bin jî di lêgerîna heqîqetê de merov tê esas girtin .

**10-" Difikirim nexwe ez heme":**

Descartes(Deqart) bi gumana li her tiştî dinêrî. Bi gumana mutleq dest bi kar dikir .

Aûgeasê kurê Qral Ellîs di axurê begîtî ya veguherî axurê wî de çi hebe bi guman lê dinêrî. Eynî xwe dixist şûna Herkul (di mîtolojiya Yewnanî de kesekê nîv merov nîv xweda ye) digirt,

hewl dida ku robareke bi coş biherikîne ser axur û her tiştê ku jê guman dike paqij bike .

Encax ev gumana Descartesî, demkî ye. Descartes dibêje; “tiştê ku em dibihîzin, dibînin û tevgerê xwe difikirin; encax em fêm dikin ku ev şasitiye”

Dema Descartes ferq kir ku ji xeynî diyardeya jê guman dike, dikare ji her tiştî guman bike, wê demê ev guman bidawî bû. Ev rastiya ku jê guman nayê kirin ya “difikirim ez heme”, yekemîn rastiya kû wê pir rastî jê derkevin e.” Nexwe ji bo Descartes her nêrîn, her fikir bi guman îzafî ye.

**11-Şaristaniyeke ku sirrê wê nayê diyar kirin; Pîramîd:**

Berî îro pênc hezar sal bû. Li Misrê Fîrewna kevirê avayiya pramîda, yên ku heta niha jî sirrê wan zelal nebûye, ava dikirin. Koleyan bi qamçiya, bi ziktêrî dan şixulandin.

Ev avayiyên qerase yên madî, ji kevirên her yek ji wan 20 ton e dihat înşa kirin. Cihê herî nêz yê ku van kevira lê temîn bikin bi sedan kilometro dûr bû. Ev kevir çawa, bi kîjan teknîkê hat çêkirin, kişandin؟

Pîramît li ser navê kî were çêkirin, “Xwedayê Rojê Ra” tenê salê du cara diket xurfeya ku ew lê dimîne. Ev rojên ku Firewn jidayik bûye û derketiye text bû. Xwedayê rojê RA, bi zayîn û derxistina text ya Firewn, dihat xelat kirin. Ew jî li ser navê xwedê vê avayiya bêmirin înşa dikir .

Ya Mûmya! Ji bo di hindirê wan de madeyên radyoaktîf hebû 12 merovên zanistê yên kû yekem car mûmya dîtin ji seretanê mirin .

Li roja me îro di hindirê pîramîdan de cîhazên weke “ûltra sound (cîhazên dengê bilind), radar (cîhaza pêlan diyar dike), sonar(cîhaza pelên denga)” naşixulin .

Ger hun ava qirêj deynin hindirê pîramîda, piştî çend roja pak paqij bibe”.

Di nav pîramîdan de şîr, heta çend roja teze dimîne, bê ku xira bibe dibe mast. Nebat di hindirê Pîramîdan de zûtir mezin dibin .

Di hindirê pîramîdan de av piştî 5 hefteya bimîne weke losiyona rû tê dikarin bişuxilînin .

Di nav pîramîdan de gemar-xwarinên avêtî bê kû bêhn bide dibe mûmya. Birînên şewatê, birînên qut kirî di nav pîramîdan de hin zûtir baş dibin .

Sirrê hin xurfeyên pîramîda çareser nabe. Nayê zanîn ku di hindirê xurfeyan de çi heye. Piranî lêkolînvan an di hindirê wê de wenda bûn an jî li heman cihî çend tûr avêtin. Ji xeynî wê negihîştin encamekê .

Quncê pîramîda mezin sêgoşeya herêma Nîl ê dabeşî du perçeyên hevbeş dike .

Sê pîramîdê li Gîze yê di nav bera xwe de dibin sêgoşeya Pîsagor. Bi vî şikilî hatine tanzîm kirin. Rêjeya koşeyên sêgoşeyê 3:4:5 e .

Dema ku ruxara erda pîramîda mezin dabeşî du qetê nîvê pîramîdê bike hejmara pî 3,14 tê bidest xistin .

Kombûna çar ruxarê pîramîda mezin bi çarçuha bilindahiya pîramîda re wekhev e .

Pîramîda mezin di navenda bejahiya cîhanê de cih digire û li gor çar aliyên bingehîn hatiye tanzîm kirin. Di heman demê de saeteke mezin ya rojê ye. Siya di nava Cotmehê û li serê Adarê dikeve dirêjahiya demsal û dirêjiya salê nîşan dide. Lewhayên kevir yên ku li derdora pîramîdê dizivirin, bi dirêjahiya siya rojekê re wekhevin. Li ser lewhayên kevir bi çavdêrî kirina van siya, di beşa 0,2419 ya rojê de dirêjahiya salê bê xeletî dihat tespît kirin.

Dûrahiya di navbera pîramîda mezin û navenda cîhanê, bi dûrahiya navbera wê û cemsêra bakur ve wekhev e û bi dûrahiya navbera cîhanê û cemsêra bakur re wekhev e .

Rêjeya di navbera bilindahiya pîramîdê û derdora wê de, bi rêjeya nîvçapa daîre û derdora wê re wekhev e. Çargoşeyên wê sêgoşeyên herî mezin û balkêş yên cîhanê ne .

Qincoka ji Gizeyê derbas dibe, behrên dinyayê û parzemînên wê dabeşî du perçeyên wekhev dike. Ev qincok di heman demê de ji aliyê bakur-başûr ve qincoka herî dirêj ya li ser erdê derbas dibe û di pîvandina hemû parzemînê de xala sifir ya xwezayî ava dike .

Sertava Pîramîda mezin cemsêra bakur, derdorê wê jî dirêjahiya ekvatorê temsîl dike .

**12-Sirrê Terzî Hermes û Lêgerîna wî ya Heqîqetê:**

Dema ev hemû diqewimîn li Misirê terzîyek dijî. Hemû hewldana wî ji bo gihîştina heqîqetê bû. Bi yek kirina nazarî û pratîkê dixwest bigihîje encamê. Terzî ji bo vê jî hemû zanebûn sentez dikir. Diyalektîka danehev, agahî û hişmendiya merova ya bi sed hezar salan ava dikir. Qasî pîramîda fikrê Terzî jî bi sirr û nediyariyên balkêş ve tijî bû .

Ji Terzî Hermes heta niha di hemû danehev û pêşveçûnên bi hezar salan de şopa pîramîda û Terzî heye. Di hemû roniyên ku di nav pîvanên erd û ezman de dişewiqin, çiruska Terzî heye .

Terzî di papîrûsê Misir de wek "Hermes Tût" derbas dibe. Fîlozofên Yewnan yên ku ji her alî ve pir tişt deyndarî wî ne, ji bo wi digotin; "ewliya an jî Trîsmegîste ya ku tê wateya sê cara zanyar"

Yahûdî wî weke "Hanok" binav dikirin. Di Tewratê de wiha derbas dibe; " Û Yared bi emrê xwe yê 162 bû bavê Hanok. Hanok sê sed sal bi xweda re meşiya û hemû rojên Hanok bûn sal û ji ber çav wenda bû. Ji ber ku xweda bir." (Tewrat, pirtûka afirandin) Tewrat dibêje ku Hermes, 3000 sal B.Z jiyan kiriye.

Encax ji ber ku Pîtagorasê Yewnanî şagirtê wî bû ev yek vê dîrokê dixe gumana .

Ereb navê "Hermes-ul Heramîse" lê kiribûn. Di Quranê de weke "pêxember Îdrîs" derbas dibe. Îdrîs li gor pirtûka pîroz, piştî Adem û lawê wî Şît, pêxemberê sêyemîn e .

Qisasa enbiya wî wiha pênase dike; "Piştî Hz. Şît pêxembertî ji Îdrîs a.s re hat. Û jê re 30 sahîfe nazil bû. Yekemîn merovê ku

bi pênûsê nivîs nivisiye û cil dirûtiye ew e. Berî wî merova çermê heywana li xwe dikir. Ji Îdrîs a.s re sirrê ezmana eşkere bû. Dawiyê de hin sax bû xwedê wî rakir ezmana. Piştî Hz. Îdrîs hilkişiya ezmana, merov ji rêka rast veqetiyan, pût hebandin. Xwedê ji wan re Nûh aleyhîsselam rê kir.” (Ehmed Cewdet)

Çavkaniyên Yewnana diyar dikin ku 42 berhemên Terzî hene. Encax yek ji van berhema jî ne gihîştiye roja îro. Em fikrê Hermes qasî ku di çavkaniyên Misir û Yewnan de derbas dibe, dizanin.

**A-Merov xwedayên bimirin, xweda merovê bêmirin e:**

Fikra Terzî yê bi ronî bi vî hevoka sernivîsê tê îfade kirin. Diyalektîka bingehîn ya di navbera merov û xwedaya de bi vî awayî derdixe holê .

Felsefeya “merov xwedayê bimirin, xweda merovên bêmirin in” diyar dike ku hişmendiya merov û xweda ji heman çavkaniyê hatiye û ji eynî çavkaniyê sûd werdigre. Xwedê ji me, em ji xwedê jiyan dikin. Ev bingeha fikrê tesawûfa Îslamiyetê pêk tîne.

Fikre Mansûr El Hallac yê “Ene’l Heq” ne gotinê Terzî nû kirin e? “Ene’l Heq” bi Erebî tê wateya “Ez heqim”, “ji Heq ne cûda me”. Ger ez Heq bim Heq jî di mîn de dijî. Digihîje encama merov di Heq de Heq jî di merova de heye. Di vê felsefeyê de heq û merov yekbûneke kûr ya diyalektîkî ye. “Merov xwedayê bimirin, Xweda merovên bêmirin in”.

“ Mansûr dema li sêdarê qîr dikir, digot “Ez rastiya xwedê bixwe me!” selteneta Xalîfeyê Ebasiyan dilerizî, qesr di nav aloziyeke mezin de bû .

**b-Teoriya Hermesê Terzî ya "Heqîqeta teqez" a bi şewqa ezmanî:**

Li vir çavkanî dîsa Mezopotamya ye. Terzî Hermes jî weke Gilgamêş yek jê lêgerînvanê nemirî û heqîqetê bû. Gilgamêş li pey heqîqet û bêmirineke fizîkî ye û di xwezayê de li nemirî digere .

Piştî hemû serpêhatiyên di dastanê de derbas dibin, diçe û tê nemirî-heqîqetê bi axa xwe re, bi xwezayê re yekbûnê de dibine .

Terzî Hermes jî akse Gilgamêş li “heqîqeta teqez” di dinyaya ruhî ya şewqên ezmanî de digere. Ferqa made û rih derdixe holê. Gerdûnê dabeşî heft qata dike. Armanca esas gihîştina qata herî jor ya stêrka Zuhal e. çawa ku felsefe û nazariya gihîştinê hatiye diyar kirin, rêbaza wê yê pratîkî jî tê diyar kirin. Rêka merov digihîne wir, bi derbas kirina ezmûna zehmet re têkilîdar e .

rêbaza digihîne heqîqeta teqez; “ hişmendiya ronahî ya di ezmûna cihanê de bi şixulandina vîna xe, bi spartina hêza xwe, bi êş kişandinê hatiye bidest xistin e.” Vê yeke jî weke nemirî û heqîqeta teqez îfade dike.

Di bin valehiya gerdûnê de li herî jêr dinyaya em lê dijîn “cihê bêdawîtî” heye. Li valehiya gerdûnê cihê herî jor jî “cihê nemirî stêrka Zûhal” heye. Gihîştina stêrka Zûhal, gihîştina nemirî û

heqîqeta teqez e. Ji ber ku stêrka Zûhal hemû sirrê aqlê gerdûnê dihewîne.

Qata yekemîn heyv e.  Heyv di destê xwe de dasa zîv, zîrekiya fikrandinêye. Ji bo gihîştina heqîqet û nemirinê divê destpêkê kar ji fikirandinê dest pê bike. Rêka heqîqetê ji fikirandina rast destpê dike. Ev yek di eslê xwe de weke ku di felsefeya Zerdeşt de jî heye, diyalektîka “rast bifikire, rast biaxive, rast bike” ye .

Qata duyemîn stêrka Utarît e. Utarît “zîrekiya esîlî” ye. Ji bo yên dixwazin derkevin stêrka Zûhal rê nîşan dide. Li vir weke mîsyona pêşengîtî, li ser bingeha “murîd-murşîd” derdikeve pêşberî me. Ger sekna esîl tune be gihîştina heqîqetê ne mimkin e .

Qata sêyemîn stêrka Zuhre ye. Di destê xwe de eynika evînê, zîrekiya evînê ye, yên ku hev du ji bîr kirine digihîne hev. Divê di rêka diçe evînê de bi eşqa mezin bimeşe. Yên rêka xwe şaş kirine, koka xwe jêderka xwe ji bîr kirine, bi meyze kirina eynika evînê dikarin bigihîjin heqîqetê .

Qata çaremin roj e. Roj zîrekiya xweşikbûnê ya têr ronî ye. Ji bo gihîştina nemirî û heqîqetê û ji bo hilkişînê divê bi hemû xweşikbûna re yek bibin. Felsefeya xweşikbûnê, lêgerîna xweşikbûnê ne be lêgerîna heqîqetê jî nayê domandin .

Qata pêncemîn stêrka Merîh e. Merîh di destê xwe de bi şûrê tûj zîrekiya edaletê ye. Ji bo gihîştina heqîqetê bi edaletbûn û temsîl kirina edaletê pêwist e .

Qata şeşemîn stêrka miştêrî ye. Miştêrî, di destê xwe de gopalê hêza mezin, zîrekiya zanebûn, zanyariyê ye. Gihîştina heqîqetê, bi diyalektîka agahî, danehev ya bi hezar salan re yekbûn e. Ger

zanebûneke hemû serdema derbas dike, hemû nazariya derbas dike nebe gihîştina heqîqetê ne mimkin e .

Qata heftemîn û dawî stêrka Zûhal e. Rêka gihîştina nemirî, heqîqet, ronahiya mezin, ji "gihîştina aqlê tevayî" re derbas dibe. Nexwe li vir jî gihîştina heqîqetê tenê bi tenê bi aqlê merov pêkan e. Heqîqet pêwistiya hemû aqlê merov e. Ji ber ku merov gerdûna biçûk e. Merovê te dahûrandin, gerdûna tê dahûrandin e .

Li vir jî weke felsefeya Zerdeşt, ronahî rih, tarîtî madeyê temsîl dike. Li gor Hermes; "Rihê merov, zarokê rihê tevayî(xwedê) ye." Ji bo bi şewqa mezin, heqîqeta teqez, nemirî re bigihîjin hev, pêwiste heft qat derbas bikin bû bigihîjin stêrka Zûhal.

Ger ezmûnê derbas neke ew ronahiya tevayî (şewqa xwedayî) di rih de heye wê bitemre, şewq wê bi tena xwe vegere cihê jê derketiyê, wê rih di tarîtiyê de bihêle. Rih jî dema bê şewq bimîne, wê di nav tarîtiyê de bihele, tune bibe. Valehiya mezin bi bagêra rihên bêhejman yên ku derdikevin, dadikevin û di navberê de dihelîn ve diqelin. Rihên ku ezmûnê derbas kirine, bi şikilekî serkeftî heft qat bilind dibin, dibin nemir û rastiya xwerû (heqîqeta teqez) fêr dibin .

Rihê serkeftî yê li ber made serî natewînin, piştî ku ezmûna kurt ya li ser rûyê erde derbas dikin, ger rêka kû derdikeve biserkeftî bidawî bike wê bigihîje heqîqeta teqez. Yên ezmûnê derbas nakin wê di nav tarîtiyê de bihelin biçin .

Tarîtî made ye. Li wê serdemê di seri de li Misrê şaristaniyên madî yên qirase pêş diketin. Şaristaniya madî bêserûbin merova kole dike. Merov ji xwebûnê derdixe. Di bingeha her pîramîdê

de keda sed hezaran kole heye. Çanda madî weke cenawirekî her tim koletiyê zêde dike. Terzî Hermes fikre xwe li dijî çanda madî ya qirase û merova tune dike, weke helwesteke, dijî derketinekê pêş xistiye .

Em heman nêzîkayî û derketinê di doktrînên weke Zerdeşt, Konfuçyûs û Bûda de dibînin .

Li dorhêla ku heqîqet û silte, heqîqet û şaristaniya madî dibin yek de, lêgerîneke nû ya heqîqetê destpê dike. Doktrîna Terzî Hermes ya heqîqetê, weke sirrê mezin û pîroz yê perestgeha Tep û Memphîs yê Misrê jî tê dîtin .

Dîroknasê felsefeyê û lêkolînvan bi şikilê, “ ji bo sirr neyê diyar kirin li ser tu papîrûsê ne hatiye nivîsandin, tene li ser şikefteke di bin erdê de veşartî bi îşaretên sembolîk hatiye nivîsandin.” şîrove dikin .

Li vir pirsgirêk berepaş xwendin hin bi mentiq e. Pirsgirêk ne tenê bi derxistina holê an nederxistinê re eleqedar e. Pirsgirêk di lêgerîna heqîqetê de, weke pevçûna serdest û yê li derve hatiye hiştin derdikeve holê .

Îsa ji ber ku oleke nû pêş xistibû di sitûyê wî de zerzeng li ser girê Golgotayê hat meşandin û bi sûcdarê edlî re hat çarmix kirin. Ezîz û Ezîzeyên fikrê Îsa diparastin, qasî sê sed sal rastî zilma herî giran ya Romê hatin. Roma pişti sê sed salî ev sistema baweriyê ku dixwest tune bike, ji ber nikaribû tune bike, li gor berjewendiyên xwe guhert û weke ola fermî qebûl kir. Li ser navê wî avayiyên madî yê bêhempa çêkir. Bi pêş xistina aliyên wê ya madî aliyê bîrdozî-manewî qels kir. Bi berjewendiyê xwe re wekhev kir .

Îsa, ezîz û ezîzeyên xwe ji qralên Roma çi kişandibe, Hermesê Terzî û alîgirên xwe jî ji Fîrewnê Misrê heman tiştî kişandin .

Asklepîosê xwendekarê Hermes ev axaftina hosteyê xwe yê mezin jî rave dike: “ Merov xwedayên bimirin, xweda jî merovên nemir… Derveyê tişta weke hindirê wê ye. Di navbera hindir û derve de tu cûdahî tune ye. Biçûk mîna mezin e. Di navbera mezin û biçuk de tu cihêtî tune ye. Di gerdûnê de tu tişt ne hindir ne derve, ne biçûk ne jî mezin e. rêzikek tenê, karekî tenê yê bi wê rêzikê tê kirin heye. Yê ku wateya vê peyvê fêm dike, rastî dibîne.”(Dîroka raman O. Hançerlîoğlû)

Ev destura yekîtiya heqîqetê ye. Hindir û derve, mezin û biçûk perçeyek ji bitûnê ne. Pêxember Îlyas bi gotina “hemû ruyên çiya wekhevin” ji aliyê xwedayî vê yêkbûna heqîqetê tîne ser ziman .

Bi sedsalan merova çima ev pergala raman, bidizî ji guhê hev re gotin û veguhestandin؟

Nexwe li wir tirs û xeteriya di xezabe Firewna de derbas bibin hebû. Piştre jî Firewna vê pergala baweriyê jî kişand nav pergala xwe, li gor berjewendiyê xwe veguherand û fermî kir .

**C) Di gihîştina heqîqetê de ezmûna pratîkî ya Terzî Hermes:**

Lêgerînvanê heqîqetê destpêkê dibin perestgeha Îsîs. “Perestgeh bi kunên ku diçin goristana bi erd ve tijî ne. Li deriyê perestgehê peykerê Îsîs heye. Îsîs rûniştiye, li ser çoka wî pirtûkeke girtî heye, ruyê wî pêçayî ye. Li bin peyker ev gotin nivisî ye: “tu merovê bimirin rûberê li ser rûyê min nikaribû rabike ”.

Tê vê wateyê. Tu fanî (merovê bimirin) ne gihîşt heqîqetê. Rakirina rûberê tê wateya gihîştina heqîqetê. Ev jî rêyeka zehmet e. Nexwe ji bo gihîştina heqîqetê, pêwiste di vê rêya zehmet de bimeşin û ji bo nemiriyê amadehî bikin. Ev jî hewldaneke salên dirêj dixwaze .

Gava yekemîn di lêgerîna heqîqetê de bi xwe îqna kirine destpê dike. Bê xwe îqna kirine tu lêgerîna heqîqetê pêş nakeve .

Gava duyemîn xizmetkariya di perestgehê de salên dirêj didome ye. Şikilekî Kynîkcîtî ye. Dema xizmet kirine quralê bêdengbûyîn, bêdengbûyîn û dîsa bêdengbûyîne fêrbûn e .

Gava sêyemîn, ji nav kuneke biçûk avêtina nav labîrenteke tarî û dawiya wê ne diyar e. Derî weke gure gure tirsnak ya esman tirsnak li ser te tê girtin. Ezmûna tirsnak ya vînê destpê dike. Lêgerînvan di nav korîdorên tirsnak yên bi mar û herrî, bixuşikînê wê demeke dirêj bigere.

Car caran ji bo vîna wî biceribîn xurfeyên biçûk wê derkevîn pêş wî. Radibe ser lingan, nefes distîne. Encax li xurfê rastî

îskeletê miriya, hin lawir û maran tê. Bê ku dem wenda bike, bi xuşikînê di wan kunê biçûk û tarî de rêka xwe didomîne .

Piştî van hemû zehmetiyan li ev xurfeyê biçûk, carna rahîbekî bêdeng disekine derdikeve pêşberî wî. Rahîp jê dipirse ka dixwaze paşde vegere an na. Ger lêgerînvanê heqîqetê bibiryar be, di korîdorên tarî, biherî û bimar xuşikînê didomîne.

Di korîdoran de ev qêrîn tê guhê wî; “Dînê ku zanebûn û hêz dixwestin, li vir geber bûye.” Bi xwestek ezmûna nefsi û vînê dide. Êdî paşde vegerîn ji holê rabûye .

Ji bo vegerê ji xeynê mirine tu vebijark(alternatîf) tune ye. Serma, tarîtî, maran, dûbişkan, qêrînên wehşî, kujende, birçîbûn, tîbûn; çokên ji xuşikînê perçe bûne, di nav birîna de mane, kulmên bênavber xwîn jê tê… Ji xeynî xwe spartina vînê tu hemû rêk hatine girtin. Her diçe êş û kul zêde dibin. Tarîtî hemû zindîbûna wî dadiqurtîne. Her diçe çok dikevin nav heriyê, mirin û vîn duelo dikin. Êdî bilibitîna ji ber xwe ve bi rê de diçe. Di vê tarîtiya kujende û tirsnak de hîs dike ku di palekî tûj de berjer diçe. Hemû enerjiya wî tune dibe, ji hêz dikeve, enerjiya xwe ya dawî dişuxilîne, bi xuşikînê derdikeve dawiya korîdorê, rastî kendaleke bêbinî tê. Kêliyeke dînbûnê ye. Divê hêza neharbûnê û xwe bi cihekî ve girtinê diyar bike. Nexwe wê ji kendalê gendir bibe û papçewesle bibe .

Ev şikilekê kêliya yê nû dîtin û ava kirine ye. Ji bo guherîn û veguherîna ferd kêliyeke kaosê ye. çawa çûk li kêleka kendalê biper dibin. Merov, li kêleka kendalê kêliya rizgarbûnê bidest dixin. Di navbera man û nemanê de kêliyek e. Di korîdorên

dawiya wê ne diyar de, kêliyeke wendayî ya ku celadê wê nediyar e, ye eli ruyê kesên bixwestek dieliqe…

Ger vîna lêgerînvanê heqîqetê xurt be, ger jê bawer be ku rêka dimeşe wê wî bigihîne heqîqetê, wê li derdorê xwe binere û di vê kêliya herî zehmet de jî wê lêgerîna xwe bidomîne. Ew kêlî, li kêleka çepê ya koridora ku tê de xwe dixuşikîne, deriyekî derketinê wê bixuyê .

Ger bi hewldaneke dawî xwe bavêje ew deriyê rizgariyê wê ji ketin û perçebûnê xilas bibe. Piştre di derenceyeke ku hildikşe jorê de hêdî hêdî wê hilbikşe û bigihîje xurfeyeke çîrokane ya di nav îhtişam(şeml) de ye. Di diwarên xurfeyê de sembol, tîp, hejmar û nexşên ku bîst u udu sirra diyar dike, hene".

Eşkereye ku ev 22 sirren li vir çavkaniya gelek felsefe, ol û ramanan e. Pythagorasê şagirtê Hermes, razdariya hejmara ye ku pêş xistiye ji vir fêr bûye. Di Îslamiyetê de çewtbawerîtî jî çavkaniya xwe ji vir digire .

Ev xurfe perestgeha bi şewq ya Ozîrîs e. Ev der rawestgeheke girîng ya lêgerîna heqîqetê ye. Li gor doktrîna Hermes; Ji bo ku merov rastiyê diyar bike û destura bicîh bine" li vir bi hêza xwedayî re dibe yek. Encax zehmeta lêgerîna heqîqetê û lêgerînvan ji nû ve destpê dike .

Ev zehmetî û ezmûn hin salên dirêj wê bidome. Ezmûn û ceribandinên bêhejmar li benda lêgerînvan in. Ezmûna agir, ezmûna avê, ezmûna şehwet hinek ji wan in. Her yek ji wan ezmûnên tirsnak bi salan didome. Ezmûna agir, di firûneke sorkirî de bi wêrekî derbasbûn dixwaze. Piştî hezar salan Hesen

Sabah, wê ji bo milîtanê xwe heman ezmûnê tatbîq bike. Sîtavka vê çandê bi gelek cûreyan di hemû olan de heye.

Lêgerînvanê heqîqetê pişti ezmûna agir bi rojan tî û birçî dimîne. Li korîdorên tarî bi maran û bi heftcarkan tijî, wê gerînê bidomîne .

Vê carê "wê bigihîje odeya razanê ya bi çarçefên rengîn xemiliye, li wir wê muzîka şehwetê guhdar bike, jineke ciwan, tazî û xweşik re rastî hev werin. Jina ciwan wê jê re xwarin û vexwarin pêş keş bike. Jina bedew, wê ji bo berdêla êşên ku heta wê rojê kişandiye, wê tiştê di destê xwe de û xwe jê re pêş kêş bike. Ger bi wê jinê bixape, li hember hêza birçîbûn, tîbûn û şehwetê serî bitewîne, êş û zehmetiyên heta wê rojê kişandiye wê berhewa bibin. Wê demê heta dawiya emrê xwe, li perestgehê weke dîlgirtî wê xizmetkarî bike. Hewl bide bireve, wê were kuştin".

Piştî van hemûyan dora ezmûna tenêtî ye. Lêgerînvanê heqîqetê pişti her ezmûnê "digirin xurfeyeke kevir, ji bo bifikire bi mehan bi tena xwe dihêlin." Ev yek çeşîdekê ketina xelwetê ye. Ev hetina xelwetê wê siya xwe bide hemû pergalên raman û şopên kûr bihêle. Bi vî awayî merov wê bistrandinê şikil bigire û wê bigihîje ya mikemmel. Hz. Mihemed li şikefta Hîra ket xelwetê. Zerdeşt hilkişiya çiyayê Sakbana. Mûsa derket çiyayê Tûr. Ev sepandin heta roja me îro bandora xwe didomîne .

Ezmûna dawî ezmûna qebrê ye. Lêgerînvanê heqîqetê bi saxî û bi merasîmeke taybet wê binax bikin. Edî bi yê madî re, bi dinyayê re hemû pêwendiyên wî, wê qût bibe .

Piştî zehmetiyên salên direj, ked û berdêlan, encama ku bidest xistiyê wê wî bigihijîne sirrê mezin. Li vir wê bi xwe re bikeve nav hesab ji xwe pirsînê .

Piştî ezmûna qebr wê were ser hişê xwe. "Bi rahîbê mezin re, di şeva germ, bêdeng û kûr ya Misrê de, wê derkeve nêrîngeha perestgehê. Li wir wê heft stêrkê heft qata ezmana temaşe bike û ji devê rahîbê mezin wê sirrê Hermes fêr bibe".

Bi vî awayî şexs, piştî ewqas zehmetiyan digihîje heqîqetê .

Li gor Hermes, "Bi merovî bimirin bûn jî, bixwedayî nemirbûn jî di destê me de ye." Lê belê her aqil nagihîje vê heqîqetê.

Nexwe divê sirrê mezin-heqîqetê di dilê xwe de veşêrin û di çalakiyên xwe de pêk bînin. "Bila bibe hêza zanebûn-zanîn, şûrê baweriyê, mertalê aramiyê".

Nexwe bi lêgerîn, zanîn, dîtin, tîbûn û bi kirina çalakiyê divê encam were girtin .

" Li gor Prof. Dorû Toderîcîyû, Zalmoxîsê şagirtê Pîsagor, ji bo tiştê ji hoste fêr bûyê bide fêr kirin çûye Alesîa.

Li gor vê rîwayetekê jî, li Samosê dema ku koleyê Pîsagor e ji aliyê wî ve serbest hatiye berdan û dema vedigere gele xwe, nemiriya rih fêrî wan dike .

Di derbarê wî de çîrokeke ecêb ya Heredot heye: ' Maleke wî li bin erdê hatibû ava kirin hebû. Li ber çavên Trakyayiyan wenda bû û ket xelwetê, sê sal li wir ma. Her kesî digot qey miriye û digirîn. Dawiyê de di nava sala çaremin de derket holê û bi xêra vê stratejiya xwe, ji bo ku ji doktrîna wî bawer bikin merovan îqna kir .

‘ Ez, Zalmoxis û tiştê li ser perestgeha wî ya binerdê tê gotin ne înkar dikim ne jî qebûl dikim’(Heredot wisa didomîne) . Encax; li gor min ew gelek salan berî Pîsagor dijîbû”.

Em dibînin ku ev sîstema raman bi şikilên cûda li gelek cihên dinyayê belav bibû. Dibe ku ev rêbaza fikirandinê berî Terzî Hermes jî hebe. Terzî wê pêş xist û hin bêtir bisîstem kir .

**13-“Yahovayek di nav Eloah’an de”:**

ELOAH; Bi Îbranî “rih” e. Yahova jî dîsa bi Îbranî tê wateya “EW E” “Yahovayê di nav Eloah an de , tê wateya di nav riha de rihê pîroz ew e .

Bi mîtolojiyan re xwedayê her tiştekî çebû. Her civat girêdayî şertên dirokî, civakî û erdnîgariya dijî ji bo xwe xas xweda û xwedawend afirandibû .

Sîj û pên xweda û xwedawendê ku bi pirsgirekê merova yê qencî û xirabî re mijûl dibûn hebû. Pergala nirxa ya ku wan afirandiye, pîvanê exlaqî gelek caran nakokî derdixistin .

Ev jî ji aliyê rêvebirina serdesta ji aloziyê re rê vedikir. Ji bo yên li derve tên hiştin, tên kole kirin, bixe nav lepên axtapotê û kontola navendî ava bike pêwistî bi gerdîşeke navendî hebû. Yekpîvanî bi yek xweda dihat peyda kirin. Ji bo bikeve şûna 35 hezar xweda û xwedawend yek xweda pêwist bû. Li şûna pîvanên bawerî û exlaq yê piralî, zindî, rengînî û cûda, divê pîvanek tenê çê bibûna.

Mûsa bi cinayet(merovkujî) hat sûcdar kirin. Xwe avêtin ber Yetroyê li herêma Medya dimîne. (harabeyên Sogmatar yên îro

li başûrê Rihayê, bîra Mûsa û bajarê kevnar yê Şûayb). Mûsa heft sala li gel Yetro şivantî kir. Li gor şîroveya dîroknasan; “Yetro, tevî keça xwe fikrê xwe jî da wî”.

Mûsa vegeriya Misrê. Li Misrê koletiyeka sed salan hebû. Wisa xeyal dikir  ku civateke weke kêriye koletî qebûl kiriye, bi şiara rizgarî-azadî bixe tevgerê. Pîvanên cûda yên bawerî û exlaq, di ava kirina yekîtiyê de zehmetî diafirand. Ji bo yekîtî û rizgarbûna ji koletiyê, ramanên pêwist ji Yetro girtibû .

Îsraîl; Pêxemberekî Yahûdî ye. Wateya wê ya bi Îbranî, yê bi xwedê re gulaş digre ye. Qebîleya herî mezin ya neviyê îsraîl qebîleya Yahûda ye. Peyva Yahûdî aîdbûna qebîla Yahûda îfade dike. Piştre ev têgîn, baweriya bi ola Mûsa îfade kir .

Weke Yahûdî derbasî zimanê Tirkî bû. Cihûtî(Yahûdîtî) tê wateya ji olaa Mûsa bûn. Cihûtî bi navê Mûsa re hat girêdan û weke Mûsewîtî hat gotin. Weke li vir jî tê xuya kirin Cihûtî-Mûsewîtî ola qebîleyê ye. Tu heta bibêjî teng e .

Di her sê pirtûkên pîroz de avakerê olên semawî pêxember Brahîm e. Tewrat jî jêderka xwe digihîne wir. Ji çîroka Brahîm, Sara û Hacer; Ji Hacer Îsmaîl, ji Sara Îshaq jidayik bû. Îsmaîl bû avakerê nijada Ereb, Îshaq jî yê Cihûya. Li gor îdiya olê Brahîm-baweriya Yahûda B.Z sala 1440” tune bû. Dema ku Mûsa derdikeve çiyayê Tûr-Sîna û “derh ferman”ê emrê xwedê digire, baweriya Yahûda ji nû ve tê çalak kirin .

Bi vî awayî Cihûtî ji her sê olên semawî yê herî qedîm e. Xirîstiyanî û Mislimantî li ser esasên wê şikil digrin .

“ Ji ber vê yekê ye ku olên piştre tên, yên berî xwe naskirine û qebûl kirine, ema bi heman emrê xwedê divê êdî jê bawer bikin,

û êdî bi ola kevin ya ku xirabûye ve girêdayî neminin, vê yekê daxwaz kiriye. Olê pêşî jî yê piştî xwe nas nekiriye û weke sexte qebûl kiriye. Ev dijmintî û şerên ola gur kiriye. Pirtûka pîroz ya cihûya Tewrat(Tora) piştî ku afirandina gerdûn û merov rave dike, çawa merov ji nijadekê û ji zimanekî derbasî gelek nijad û zimana dibin, bi hacetên metafizik rave dike û neslê merova ji Adem dide destpê kirin. Navê lawê wan yek yek dibêje, bi vê rêbaza re weke xelekekê bi hev ve girê dide û heta Mûsa tîne. Pêxemberên weke Brahîm, Îshaq, Yaqûb, Yûsiv û Mûsa hemû ji nesle Samê ku yek jê sê zarokên Nûh e. Navê "Samiyan" jî ji vir tê .

Pirtûka yekemîn Tekvîn(afirandin) ji destpêkê heta pêxember Yûsiv, hemû tiştê ku pêxembera kiriye vedibêje. Zayîn û kirinên Mûsa di pirtûka duyemîn Exodûs(Derketin, Ji Misrê derketina Cihûya) vedibêje. Dema ku Mûsa kêriya xezûrê xwe Yetro xwedî dike, xwedê jê re li Horebê dixuyê û jê re wiha dibêje: "Mûsa, Mûsa… Nêzî vir nebe, çaroxê xwe ji lingê xwe derbixe, ji ber ku ye tu li ser disekinî axa pîroz e. Ez xwedayê bavê te, yê Brahîm, Îshaq û Yaqûb im."(Exodûs, îI, 4-6)

Xweda, Mûsa ji bo lawê Îsraîl ji Misrê derxe erkdar dike. Û dibêje "Min qêrîna wan bihîst û ji bo ez wan ji destê Misriyan derxim, ji bo wan li cihê ji wê herêmê xweştir, firehtir, li herêma şîr û hingiv jê tê, li şûna Kenaniyan, Hîtî, Amor, Perîzzî, Hîvî û Yebûsî bi cih bikim, daketim" (Îbîd. 8)

Mûsa ji xwedê navê wî pirs dike. Xweda wiha bersiv dide: "Ez, yê ku ez im. Ez Yahovayê, xwedayê kalên we, xwedayê Brahîm,

xwedayê Îshaq, xwedayê Yaqûb im. Heta bi hetayê navê min ev e, ji çerxa heta çerxa wisa bibîr têm.”(Îbîd, 14-15)

Fermana wî ev e: “Bi ixtiyarên Îsraîl re tu biçe gel Qralê Misrê û jê re bêje, Xwedayê Îbraniya rastî me hat, em rica dikin, rêzik bidin ku li çolê sê roja rê bimeşin, ji bo xwedayê me Yahova qurban jê bikin. Ez dizanim ku wê qralê Misrê destur nade. Wê demê ezê destê xwe dirêj bikim û bi hemû berzîşên xwe li Misrê bixim. Piştre wê dev ji we berde. Hun destvale naderkevin. Her jin ji cîranê xwe û ji mêvanê mala xwe tiştên zîv, tiştên zêr û cil bila bixwaze. Lawê xwe û keça xwe bi wan bixemlînin. Misriyan rût bikin” (Îbîd, 18-22)

“ Ev çîrok destpêka serpêhatiya Mûsa û gelê xwe ya li dijî Fîrewn derketine û xwe berdane çola ye. Dema Mûsa serî radike, xwedê tofana li ser Firewn dibarîne. Mûsa jî bi gelê xwe re behna xwe li çiyayê Sîna-Tûr digire. Deh fermanê li ser lewhayên kevir niviskiye tîne. Piştî wê  azadiya bi zehmetiyan hatiye hûnandin, lêgerîna welat û serpêhatiya çolê ye

Gelek ji van fermanan di pirtûka miriya ya Misrê de jî hebû û lawên Îsraîl van dizanîn. Encax ji fermana du heb nû bûn. Di hefteyekê de rojek îstirahat kirin û ji xeynî Yehova tu kesî ne hebandin…”(O. Xençerlîoxlû)

Ev derdikeve holê. Mûsa destpêka rêbaza dogmatîk ya yekxwedayî ye. Yahova hemû xwedaya red dike û hebandina wan qedexe dike. Wek ola teng qewmî şikil digre. Ne tenê ji aliyê Mûsa ve tê afirandin. Xwe dispêre gelek pêxemberan. Ev dibe şikilê bipergalbûyî, nazarîbûyî ya rêbaza dogmatîk .

Ev ji quralên; “Xwedê yek e, xwedê rih e û qet nayê temsîl kirin, xwedê nemir e. Dia tenê ji bo xwedê tê kirin. Hemû gotinên pêxemberê Cihûya rastin. Xweda afirîner û parêzvanê dinyayê ye. Mûsa pêxemberê herî mezin e. rêzik û kevneşopî ji aliyê xwedê ve ji Mûsa re hat dayîn, ji xeynî vê tu rêzik û kevneşopî tune ye. Ev rêzik û kevneşopî qet nayê guhertin. Xweda hemû fikir û çalakiyên merovan dizane. Xweda kesên diyarî dike kesên ku fermanê wî bi cih tînin. Yên pêk naînin jî ceza dike. Xweda, Mesîhê ku pêxember qala wî dikin wê bişîne. Xwedê wê miriya zindî bike.” pêk tên .

Xwedanasiya cihûya, têgînên ava kiriye weke “RIH(Eloah) û EW’ E(Yahova)” belaya serê ramanen merovahiyê kiriye. Ji hezar salan vir de li hember her cureyên meylên azadiyê berbest(barîkat) honandiye.

“ Ew rihê li Horebê ji Mûsa re xuya kiriye” (eloah) ji têgîna “Ellah” ya Ereban re jî rê vekiriye. Di Mislimantî de nêzîkayiya “ji xeynî xwedê tu xwedayê bihebînin tune ye”(La îlahe îll-Allah) xwe dispêre vê çavkaniyê. Çavkaniya vê yekê jî digihîje heta çanda semîtîk .

Ger bal were kişandin, cewhera îdealîzmê jî xwe dispêre ev herdû têgînên ku xwedanasiya Yahûdî ava kiriye. Heta Hegel jî hewlda ku ava bûna gerdûnî bi vê têgîna “rih” îzah bike. Ji rihnasiya Yewnan heta egzistansiyalîzma serdema me xwe dispêre ev têgîna “eloah”.

Ya duyemîn jî têgîna “EW’ E”(Yahova). Mûsa li Horeb ê li devîstanekê laqî “Eloah” tê, jê navê wî dipirse.

Ew jî dibêje “ez ez im.” Dema ku Mûsa dibêje; ger qewma min navê te bipirse ez çi bibêjim? Wê demê ji nav devîstanê bi şikilê riheke şewqî jê re dixuyê, Tu ji wan re bêje “Rih” “EW’ E”

Êdî têgîna “EW E” heta roja me îro wê ji îdealîzmê re bibe çavkaniya îlham .

Li gor îdealîzmê; yên heyîna wan tên dîtin (yekeyî) heyîna wan tineye. Yên heyîna wê heye jî (tevayî) heyîna wê nîne .

Yanê di xwezayê de çîçeka spî, kêzika spî, kevirê spî heye lê spîtî tune ye. Li gor îdealîzmê çîçeka spî, kêzika spî, kevirê spî tê û derbas dibe û tev ji dîmen pêk hatiye. Berrahiya eslî spîtiya ku tune nabe ye. Ji ber wê kêzika spî bimre biçe lê spîtî her tim hebû û wê her tim bimîne.

Li gor “îdealîzmê heyîna hebûnên rastî” tune ye. Hemû yên bi heyîn (merov, nebat, lawir, hemû tişte) razber dibin, vedigerin“hebûna yek û naguher” Li EW” vedigerin. Dema merov tiştê heyîna wan heye ji çawaniyên wan yên ku wan pênase dike, ji hev biqetîne, li holê bitenê “EW” yanê hebûn dimîne. Weke dixuyê çavkaniya bingehîn ya ku îdealîzm jî xwe dispêre ev herdû têgîn in .

**14-Exlaq û Felsefeya Zerdeşt:**

Zerdeşt di dîroka raman de xeleka girîng e. li şerê di navbera xeta Şaristaniya Dewletî û xeta Civaka Çemê Bingehîn de rawetgeheke esas e. Zerdeşt nirxên civaka xwezayî di şertên rojane de bi avayiyeke sîstematîk ya fikrî, li hember “xwedayên bi maske û xwe pêçayî” weke dengê yên li derve hatine hiştin,

derdikeve holê. Ev derketin bi şikilekê ku mohra xwe li hezar salan bixe, dikeve jiyana merovan. Zerdeştiya ku ji fikrên fîlozofên Yewnan, yên piştî xwe re dibe çavkanî, di lêgerîna heqîqetê û pêş ketina civakî de xwedî ciheke diyar û girîng e .

## a) Diyalektîka Ronahî û Tarîtî

Felsefeya Zerdeştî di lêgerîna heqîqetê de ji asoyên nû re xwe vekirin e. Li hember mîtolojiya di mîhwera dogmatîzm û siltê de ye, lêgerîneke azadiyê ye. Zerdeşt û Bûda bi pêş xistina rêbaza felsefî ya aliyê we yê exlaqî di pêş de ye, di rave kirina heqîqetê de derketineke nû pêk anîn. Bi vê rêbaza ji bo parastina nirxê manewî-exlaqî-moral-polîtîk yê merov-civakê derketineke nû peyde kirin. Li hember rêbaza ku xwe di silteyê de asê kiriye, bi rêbaza felsefî ya nirxê wekhevîxwaz-azadîxwaz yên civaka xwezayî esas girtiye, qaliban dixe lêpirsînê, şîrove dike, xwe dispêre zanyariyê û zanebûn-exlaq derdixe pêş, di tarîtiyê de bû ronahiyek. Bi vê rêbaza ve zor dan sînorê rêbaza dogmatik, tarîtî rohnî kirin û lêgerîna heqîqetê kûr kirin .

Hevratiya diyalektîk ya exlaq û rêbaza felsefî di rave kirina heqîqetê de qederekî raveker bûye û di lêgerina jiyana azad de têkar bûye. “Yê exlaqî ye, felsefeya wê/wî ya hezkirinê heye, felsefeya bêexlaqî an tune ye an jî felsefeya dizî-kedxwariyê ye. Felsefe bêexlaq, exlaq bê felsefe nabe! Civaka bêexlaq nabe civak. Merovê bêexlaq nabe merov. Yanê merov bi exlaqê xwe yê civakî re merov e. Merovê civakîbûye ji xwe bi xêra felsefeya exlaqî û polîtîk bûye merov”.

rêbaza felsefî çima ji rêbaz qut bû? Çima ji exlaq dûr ket? Ev berî her tiştî bi siltê re girêdaye. Felsefe qasî ku ket xizmeta silteyê, di wê radeyê de ji nirxên exlaqî-xwezayî û azadîxwaz qut bû. Wek mînak fîlozofên Yewnan yên xwezayê hin bêtir nêzî exlaq in. rêbaza rave kirina xwezayê hin çêker e. Encax Arîsto, Soqrat û berdewamiya wan ketiye xizmeta silteyê û îdealîzma dogmatîk-hiphişk biteşe kirin e. Arîsto ji Îskenderê mezin yê dagirker re mamostetî kiriye û rê nîşan daye. Qasî fikrê xwe, weke fizîkî jî ketiye xizmeta silteyê. Îdealîzma Yewnanî qasî ku ji exlaq dûr ketiye di wê radeyê de ji heqîqetê jî dûr ketiye. Halbukî Maniyê ku ji kevneşopiya Zerdeşt tê, berevajiyê Arîsto, rixmê bergeriya hikumdarê Parta ku digot “Em, fikrê te û şûrê min bikin yek” dibêje “Ez ji her olî me, ne ji tu olî me” û red dike.

Tiştê ku têkiliya heqîqet û rêbaza felsefî diyar dike; Li hember nirxên civakê yê polîtîk, azadîxwaz û exlaqî ne dijber bûn û esas girtina dinamîkên eslî yê civakê ye. Bi Arîsto re rêbaza felsefeya Yewnan bûye dijberî nirxên xwezayî yê civakê, ji dînamîkên civakê dûr ketiye, naveroka xwe bi silteyê ve tijî kiriye û koletiyê meşrû kiriye. Arîsto, koleyan weke heywanê du lingî dinirxîne û felsefeyê pêşkêşî xizmeta silteyê dike, bi vê yekê re vediguherîne sîleheke tirsnak.

Ev bi xwe re veqetîna kirde-bireser hin bêtir kûr kiriye. Aqil weke kirde, hemû tiştê li derveyê wê weke bireser(tişte) hatiye pênase kirin. Aqilê bûye kirde veguheriye sîleha herî mezin ya silteyê. Çima sîleheke tirsnak û mezin e? Ji ber ku aqil, ji hest, ji gewde, ji civakê, ji xwezayê, ji zekaya hestyarî, ji xwezaya jinê

qut bûye û hest, civak, jin, gewde û xwezayê kiriye heyber. Ev hinek jî bi tunekirina nirxên dayika xwedavend û li şûna wê serdestkirina nirxên nêrî yê îqtîdarê re têkilîdar Arîsto bi gotina “jin heywana malê ya du lingî ye” aqilê zilam, zekaya analîtîk weke kirde, zekaya hestyarî û jinê jî weke heyber û bêaql nirxandiye.

pêwiste Felsefeya Zerdeşt ji nêzîkayiya îdealîzma Yewnan cûda were dest girtin û şîrove kirin .

Kont de Volney(1757-1820), di berhêmê bi navê enqazan(Les Rûînes) ya nav û deng de alimê olê dide xebitandin û bi devê alîmeke ola Zerdeşt vanan dibêje: “Ey cihûyan û Xiristiyanên ku zarokê wan in, pirtûka ku em dibêjin ya Mûsa ye 600 sal berî Mûsa hatiye nivisandin. Em dikarin vê yekê bispêrin bîst belgeyên heqîqî û piştrast bikin. Di wê pirtûkê de fikrê kû li ser Mûsa tê hesibandin, Mûsa yekê ji wan jî nizanibû. Kesên ku wê pirtûkê nivisandine, Bêgumane ku di encama lihev kirina Keşeyek û Qralekî de hatiye nivisandin; nemiriya rih, jiyana piştî mirinê, bihuşt û cehnem, li hember xirabiye, êşa herî mezin ya ku merovahî dikşîne, serî rakirin ji pêxemberê me Zerdeşt fêr bûne. Hem jî ev fikir piştî sedsala qralê we yê yekemîn dijiye, di nivîsên we de dixuyê. Zerdeşt, bised salan berî wan nivîsa van gotiye. Qalên we yên ji aliyê qralê Babîl û Nînova ve hatine binxistin, ji aliyê Qralê me Serhas ve hatin rizgar kirin, we çi zû ji bîr kir? Kalên we, wê demê me mînak girtibûn, ji me ders standin. Bi fikrên nû re vegeriyan Qudsê. Hun li benda qralekî bûn ku hêza we ji nû ve bilin bike. Me jî xwedayekî gerdûnî yê qenciyê yê ku rizgar dike û diselihîne, mizgînî dikir. Ha we

Xiristiyanî ji yekbûna van herdu fikra ava kir. Hun zarokê Zerdeşt yê ku rêka xwe wenda kiriye ne, ji xweynî wê ne tiştek in“ .

Hemû baweriyên xwe dispêrin ronahî û şewqê, ol û xeyal çavkaniyên xwe ji wê digrin. Ronahî û tarîtî du diyardeyên bingehînin. Felsefeya Zerdeşt li ser vê teşe digre. Ronahî; qencî, xweşikbûn û dirustiyê temsîl dike. Tarîtî jî; xirabî û çewtî temsîl dike .

Merovahî bi vê felsefê re mesafeyeke dirêj rê çûye. Lêgerîna Zerdeştê zanyar berevajiyê qalibên dogmatîk yên olê, ji yekbûna bi xwezayê re, ji zindîbûn û azadbûnê re gelekî vekiriye. Weke ku di rêbaza dogmatîk de heye, veqetîna kirde û bireser tune ye .

Wisa tê texmîn kirin ku Zanyarê Kurd Zerdeşt(Zaratûstra), B.Î qirina 7. de jiyan kiriye. Ji ber xwedayê Ahûra Mazda(Mazdek) ev ol derxistine, ji bo wê ji vê olê re Mazdeîzm jî dibêjin. Koka Mazdeîzm xwe dispêre gelek beriya erdnîgariya Mezopotamya. Zerdeşt vê olê pak dike, biteşe dike, bi Zend Avesta re niviskî dike. Aliyê wê yê exlaqî û dilpakî pêş dixe, weke oleke dualîst derdixe holê. Rewşa wê çavkaniya hemû olan e. Zerdeşt zanyarê heqîqî û hozan e. Aliyekî vê olê ronahî, qencî, xweşikbûnê temsîl dike, Ahûra Mazda, aliyê din xirabî û kirêtî temsîl dike, Ehrîman heye. Herdu her tim di nav pevçûnê de ne .

Dualîzma felsefeya Zerdeşt di nav hev de ye. Qencî û xirabî, ronahî û tarîtî hevratiya dijberan e. Li gor Zerdeşt; Yên qencî di rih de, xirabî di made de dibînin dixapin. Ji ber ku qencî û xirabî, him rih him jî made pêçaye. Pevçûn, tekoşîn, şer li ser herdu qada tê meşandin. Ehrîman bi ronahî re, Ahûra Mazda jî bi tarîtî

re di nav şer de ye. Ehrîman bi desteser kirina ezmana hewl dide him li ser made him jî li ser rih kontrol ava bike .

Şer li vir tirsnak û hewlnak e. Merovê dilpak divê ligel Ahûra Mazda cih bigrin. Merovê dilpak yên ligel Ahu Mazda cih digrin, qasî ku dikevin şer di wê radeyê de, wê bigihijin dilşadiyê .

Ahûra Mazda li welatê xwe yê bişewqa ezmanî dirûnê. Ehrîman jî li welatê xwe ye tarî-binerd dijî. Dinyaya me di navbera van herdu welata de weke qada ezmûnê ye. Merov qasî ku vê ezmûnê serkeftî derbas bikin di wê radeyê de wê derbasî refê qenciyê bibin .

Zerdeşt, şoreşa gund-çandinî ya ku li Mezopotamya jorîn pêş dikeve û li ser rûyê erdê belav dibe, esas digre û felsefeya xwe ava dike. Armanca wî afirandina sîstemeke aborî ya xwe dispêre çandiniyê ye. Serdema Zerdeşt lê dijî, nirxên civaka xwezayî xirabûne, li şûna wekhevî û azadiyê koletiyeke xedar cih girtiye. Nirxên merovî û exlaqê civakî dest bi xerabûn û rizandinê kiriye. Mirin-kuştin û koletî ketiye halê pergalekê. Derketinê li vê xalê dike. Li gor Zerdeştê zanyar “çavê xwedayê Ahûra Mazda, bala wî her tim li ser cotkar-gundiyê kedkar e.” Oldariya rast, gihîştina heqîqetê “ne bi rojî, perestin û îbadetê” encaz bi çandinî û şixulîna axê ve were dest xistin. Qasî temaşe kirina mala cotkarekî ya ku idareya roj bi rojê tê kirin, di hindirê wê de lawir û zarok hene, tu tişt Ahûra Mazda ewqas kêfxweş nake. Di Zend Avesta de şîretên weke “ heywanên çandiniyê baş xwedî kirin, ax baş cot kirin” tê rêz kirin .

Merov wê çawa tevlê şerê di navbera ronahî-tarîtî, xweşikbûn-kirêtî, qencî-xirabî de bibin û bigihijin heqîqetê؟

Zerdeşt rêbaza wê wiha diyar dike: “Weke oldarî, weke dilpakî, weke zîrekî…” Zerdeşt têkilîdarê van her sê hêmana gihiştina heqîqetê raber dike. Li vir oldari, bi çandinî, bi lawiran û bi axê re mijûlbûn, cotkarî kirin e. Cotkarê zîrek e. Oldariya rast ev e. Ji ber ku pergala koletî ya ava bûye, kole dike û bendê rast yê bi axê re berevajî dike. Ev di şoreşa bêhempa ya çandiniyê ya li Mezopotamya de israr kirin e. Dilpakî bi exlaqê civakî re eleqedar e. Bi pergala nû re merov serlêdana derew û hîleyan dike. Pergaleke xwe spartiye derewa pêş dikeve. Nirxên merovî xira dibin. Zerdeşt li hember ev derew û xerabûnê jî dilpakî raber dike. Beşeke girîng ya Gataya beşa tekilîdarê “durev” (derewa) ye .

Xebatkarî jî bi bi kar kirin û kedê re têkilîdar e. Di civaka xwezayî de her kesek li gor hunerên xwe û li gor pêwistiya xwe par hilanînê, li gor van pîvanan tevlî hilberînê dibû. Ji xeynî nexweş û zarokan her kes dixebitî. Nêzîkayiya “ji yên na xebite re nan tune ye” esas bû. Bi şaristaniya dewletî re, beşek ji civakê bê ku kar bikin bi keda koleyan ve seltenata xwe domandin. Bêkar jiyîn bû weke diyardeyekê. Xebatkarî, wekhevî pêk anîn, hêmana tevlîbûna her kesî ya kar e .

Weke dixuyê ola Zerdeşt li gor qanûnen xwezayê, li gor pêwistiyên civaka xwezayî tevgerînê esas digre. Rêka heqîqetê ji vir derbas dibe .

**b)Felsefeya Zerdeşt û Azadbûna Merov:**

Zerdeşt ji merov û gelan re bi nîşandana ya rast, xweşik, baş û biedalet ve ronahî û tarîtiyê ji hev cûda dike. Pevçûna heduyan bimantiqeke diyalektî re digre dest. Dikarin bêjin, Zerdeşt ji aliyê Felsefê ve zanyarê yekemîn yê diyalektîkî ye. Ev nêzîkayiya wî ya diyalektîkî bi nirxên mezin yên exlaqî ya civaka xwezayî re yek dike. Ji vî alî ve weke exlaqnasê yekemîn yê civakê jî rol dileyîze. Bî sîstema bawriyê ya ku pêş xistiye ve weke kok hucreya hemû olan e. Felsefe, ol û exlaq bi nêzîkayiyeke diyalektîki digre dest û sentez dike. Gerdûn û tekoşîna azadbûna merov di çar merhaleya de digre dest û şirove dike.

Merhaleya yekemîn; di gerdûnê de tarîtî(xirabî) bêdawî û ronahiya bêdawî(qencî) heye. Herdu jî bêdawî û di rewşa xewê de ne. Encax tarîtî bi hîleyan zû hişyar dibe û bidizî dikeve nav ronahiyê. Ev merhaleya yekemîn çeşîdeke merhala afinînê ye. Avabûna gerdûnê ye. Encax hin di dema ava bûnê de jî tarîtî li dijî ronahiyê serî li hîleyan dide. Ev tê vê wateyê. Di cevhera xwezayê de qencî û xirabî, rastî û xeletî li kêleka hev hene. Herdu jî di heman astê de ne. Ev ji aliyekî ve dişibe dîlemaya pêl û partîkul(parçik) ya ku kuantûm derxistiye holê. çawa ku meyla zindîbûn, hîskirin û azadî di xwezayê bixwe de heye, bi heman rengê xirabî û kole kirina dijberî vê jî weke meylekê heye. Vê yekê derdixe holê. Ew jî ji tune bûnê ava nabe. Encax ev meyl bi civaka çîndar re vediguhere pergalekê. Bêguman îhtimal hebû ku pêşveçûn ne bi vê aliyê ve be .

Merhaleya duyemîn; ji ber vê tê çûna bi hîle û zû dinya dikeve nav tarîtî, karesat, kirêtî, çewtî û xirabiya. Tarîtî, çewtî û kirêtî dibe serdest. Ev rahîbê yekemîn yê Sûmeran, di Zîguratan de bi rêka îqna (ku ev çeşîdekê hîle ye. Rûyê xwe yê rast veşartin e.) merova ji pergala Zîgûrata re, rêka diçe ber bi koletiyê ve qayîl kirin e. Ev bi hîle ketina taritiyê ya nav ronahiyê ye. Ronahî; civaka neolîtîkê ya wekhevîparêz, azadîparêz û alîkarîxwaz e. Tarîtî jî rastiya şaristaniya dewletî ye. Ev di eslê xwe de ji civaka neolîtîkê qutbûn û derbasbûna şaristaniya dewletî ye. Kûrbûn û serdestbûna pergala ku rahîbê Sûmeran ava kiriye ye. Di şerê Tîamat û Mardûk de bînketina Tîamatê, wek "cadû-şeytaneke" ku hewceye were perçe kirin, diyar kirina jinê ye .

Ol vê pêvajoyê weke "tofan" dinirxînin. Tofana Nûh jî ji vir îlham digre. Nûh gemiya ku lê kiriye mîna hemû nirxên neolîtîkê lê bar dike, ji vê tofana neolîtîkê direve û xwe dispêre çiyayê Cûdî ya ku dergûşa neolîtîkê ye .

Ji ber ku bi şaristaniyê re wekhevî, azadî û edalet dîbe qey ji ser ruyê erdê diçe. Tarîtî li ser her tiştî serdest dibe .

Di merhaleya sêyemîn de jî qencî û xirabî dikevin şerekê. Şer gelek dirêj didome. Encax di dawiyê de ev şerê zehmet "dirustî-xweşikbûn-qencî" bi ser dixe. Ev bibiryar, bibawerî lêgerîna merov ya heqîqet û azadiyê ye. Tekoşîna azadiyê ya di dîrokê de her tim diyar kiriye ye. Şerê civatên li serê çiyayan, li kûrahiya daristanan, li geliyên asê li derveyê dewletê maye ye. Aliyekê wê şerê Brahîm, Mûsa, Îsa, Manî, Mazdek, Mihemed û yên ji derve hatine hiştin, aliyê din xeta Fîrewn, Nemrûd, Ebû Cehil e. Aliyekê wê efendiyê Romayê yên li arenayaan ji bo kêfa xwe

palewanan bi şêrên birçî re dixistin şer, Qralên Asûr yê zalim yen ku ji seriyên merova deriyê kaleyan zexm dikirin, aliyê din rapêrînên di xeta Spartakûs de ne. Aliyekê wê Dehaq, aliyekê wê Kawayê hesinkar e. Li gor baweriya Zerdeşt ev merhaleya ku wê 3 hezar sal bidome, wê di dawiyê de bi serfirazî encam bigre. Tarîtî wê li hember ronahiyê bin bikeve .

Di merhaleya çaremîn de jî, hemû xirabî, kirêtî û çewtî wê tune bibin. Dinya wê bigihîje aşîtî û dilxweşiyeke gerdûnî. Bratî û aşîtî wê li ser rûyê erdê bibe serdest. Ev jî rastiya civakên bêkole, bêçîn, bêzext, bêkedxwarî ya ku utopyayan dixwazin ava bikin e. Modela raborîa civakê ya ku Zerdeşt raber dike ye. Xeyalên merova yên ji bo siberojê ne. Hêvî, bawerî û utopyayên ji bo qencî, xweşikî, azadî û dirustiyê ne .

Em dikarin bêjin ku Zerdeşt, di dîrokê de zanyarekî yekem car ewqas girîngî daye vîna merov, di navbera azadî û vîn de pêwendiyeke diyalektîkî ava kiriye. Ev nêzîkayî di heman demê de bingeha hemû utopyayan ava dike .

**c)Rexneyek û şîroveyek:**

Baweriya Zerdeşt bi hezar salan civakên Rojhilat yekser bandor kir. Ket nav bawerî, felsefe û şikilê jiyana wan. Ji bo civakên Rojava jî, di belavbûna çandî de rola kok hucre leyist. Felsefeya Yewnan û Romê em nikarin li derveyê wê bigrin dest. Ronesansa Ewropa jî li ser ronakbiriya Yewnana kevin teşe girt .

Nivîsên li ser kevira hatine nivisandin yên ji ber baweriya Ahûra Mazda mane hatin dîtin. Ev nivîs ji aliyê Henry Rawlînson ve ji sala 1840 vir de hatin dahûrandin. Piştre yên hatine dahûrandin cara ewil li Îngilîstanê hatin weşandin. Hemû merovên zanyarê, rewşenbîr, lêkolînvan bi rêka Îngilîstanê gihîştin van agahiyan. Yên derketine holê ji bo ronî kirin û şîrove kirina dîroka Rojhilat-Mezopotamya agahiyên girîng bûn. Ji çar aliyên cîhanê dîroknasan van agahiyan girtin û nirxandin .

Encax rewşenbîrên Ewropa ji ber nêrînên navendî yên Ewropa û sedemên polîtîk ve helwest girtin. Zerdeştî, li cihê ku heq dike ne rûniştandin .

Gelek rewşenbîr ev daneyên arkeolojîk, belge û dîtinan yên ku di ronî kirina dîrokê de wê rolên girîng bileyzin, nexistin rojeva xwe jî… Li hember şikilekî terzê veguhestina dîrokê mîtolojiyê, bi helwesta xwe ketin rewşa pozîtîvîstên ji rêzê. Li hember van bêdeng û şermokê tevgeriyan. Li hember dîroka Rojhilat bi zihnê Rojavayî bêdeng man.

Halbukî ji bo berhemên di heman demê de derketine holê yên “Morganê Emerîkî û Darwin” heta dawiyê deriyê xwe vekirin. Lê belê li hember merovahî û kok hucreya şaristaniyê Mezopotamya, ketin nav bêdengiyê .

Di vê pêvajoyê de li eniya Marksîst jî ji ber heman ferasetê li ser Mezopotamya helwest û diyar kirineke hêja û girîng tune ye. Ji bo Hindîstan jî heman nêzîkayî derdikeve holê .

“ Tu dîrokeke civaka Hindiya, herî kêm dîroka wan ya tê nasîn tune ye. Tiştê ku dibêjin dîroka Hindiya, dîroka sîlsîleya dagirkerên li ser civaka Hindî ya ku pasîfe, xwe naguherîne,

Împaratoriya xwe ava kirin e. Dîroka Hindiya ji xeynî vê ne tiştek e."(Marks)

" Îngilîstan mecbûre ku li Hindîstanê rola xwe ya dualî(yek xeraker yek jî ji nu ve avaker) bi cih bîne. Yanê civaka kevin ya Asya tune kirin, li şûna wê li Asya bingeha madî ya civaka Ewropa avêtin e. Hindîstan encax bi veguherîna civakêke Rojava dikaribû pêş bikeve. Hemû dinya encax ku şopa Ewropa taqîb bike dikaribû pêş bikeve. Navendîtiya Ewropa ya Marks di encamê de ji ya Las Casas ne cûdatir e."(Antonîo Negrî-Mîchael Hardt)

Ji van hemûyan jî dixuyê ku xeletiya di rêbaz de mijara axaftinê ye. Dema bi qalib û reçeteyên hazir li dîrok, mîtolojî û ol nêzîk binêrin, nirxandin jî bi rastiyên civakî re nakok dibe. Ji ber ku rêbaza mîtolojîk tenê weke çîrokeke hatiye dîtin, kok hucreya dîrokê jî şaş hatiye dest girtin .

## 15-Di Îslamiyetê de lêgerîna heqîqetê û Gazalî:

Îslama di nav olên semawî de ya herî dawî ye, ji bo civakên Rojhilata navîn di her qada jiyanê de diyarker e. Derketina Hz. Mihemed hemû civak bikûrahî bandor kiriye. Derketin di asta dawî de şoreşger û veguher e. Azadî weke pîvan li pêş e. Ji ber vê yekê bazirgan û selefdarê herî dewlemend yê Mekkeyê, weke Ebû Cehil, Ebû Leheb, Ebû Sufyan, heta dawî li dijî Îslamiyetê şer kirin e. Kole û xîzan jî li kêleka Hz. Mihemed cih girtine. Ev di heman demê de tekoşîneke mezin ya civakî ye. Piştî wefata Hz. Mihemed ev xeta azadîxwaz ji aliyê qebîleya "Ebû Sufyan-

Hînt-Muaviye-Yezît" ve tê birrîn. Bi taybet bi silteya-Muaviye-Şam û "bûyera Kerbela" re xeta Ebû Sufyan serdest dibe. Li şûna Îslamê xeta dijîslamê dest bi serdestbûnê dike .

Îslamiyet bi wefata Hz. Mihemed re cewhera xwe ya azadîxwaz wenda dike. Dikeve nav lepên silteya kevneşop. Hîn cenazeyê Hz. Mihemed li erdê ye şerê li ser silteyê bitund dibe. Yên piştî wê şerên hindirîn yên bêdawî, kişkişîn û dagirkirinên derve ne. Her tişt ji bo silteyê tê şixulandin .

" Şerê îslamî bi pêşkêşiya manewî ya bêhna yekdestiyê, ber bi qadên şaristaniyê re herikîna enerjiya qebîlê ya serxweş û coş e. Bi nara, bi şûr, bi xwîn, bi îman û bi ganîmet! Ez ji bo şerkeriya qebîleyên Ereb biçûk bixînim van têgîna naşuxlînim. Li vir pêwist dibînim ku ji hev cûdabûneke bi girîng bikim. Xîzanên qebîleyê bi rastî jî bîrdoziya li ser navê Îslamiyetê hatiye ava kirin, bawer dikirin. Bi wan dabûn bawer kirin. Jê gelek bawer dikirin ku şereke pîroz dikin. Qasî piçikekî gumana wan tune bû ku ji bo xwedê şer dikin. Encax heman tişt ji bo arîstokrasiya qebîle, qedemeya fermandariyê nayê gotin. Beşek mezin ji van, hîn gava Hz. Mihemed jiyan dikir bêhna yekdestiyê girtibûn, dizanîn ku beşê xwedê propagandaya kar an jî zêdekirina axaftina ye. Ji xwe di demeke pir kurt de dewleta nû (ger dema çar xelîfeya jî bihesibînin nêzî bîst sal) weke Hanedana Emewiya wê bidest bixin." (A. Firat)

Emewiyan ji rê derketina Îslamiyetê û veguherîna hanedana klasîk ya begê Ereba ye. Piştî wê şerê silteyê ya di navbera hanedana de ye. Şoreşa ku Hz. Mihemed pêk aniye veguherandine dijşoreşê. Îslam veguheriye dijî Îslamê .

Li salê 650-660 tekoşîna di navbera herdu xeta de bi dijwarî kûr dibe. Li derdor-navbera Eli, Mûaviye û Osman de hin bûyer pêş dikevin .

Ji xeynê vê “tevgera xariciya” ya li hember nakokiyên “Elî-Mûaaviye-Yezîd” helwest nîşan didin, weke tevgerekê pêş dikeve. Tevgera xariciya xwe dispêre bedewiyên çolê yên xizan,kedkar û dijşaristaniyê. Ji bo Îslamê hêza esas ya ku şer dike ew in, rixmê wê di encamê de tu par nastînin. Ji ber vê jî bihêrs in. Wisa difikirin ku xiyanet li wan hatiye kirin. Xaricî li hember “Elî, Mûaviye û Îbn As” sûîqest plan dikin. Di vê sûîqestê de Hz. Elî wefat dike herdû yê din birasthatinî xilas dibin. Xaricî her çiqas hêzeke girîngin jî ji aliyê silteyê ve bi bandor nabin .

Li arîstokrasiya Kureyşê malbat,benda Mûaviye-Yezîd weke yekane aktorê bibandor derdikeve pêş. Benda Mûaviye-Yezîd, ji Îslama azadîxwaz tola hildide. Xeta dijîslamê ya navenda wê Şam e bi lezûbez pêş dixe. Bi tevgera dagirkirinên li ser navê Îslamiyetê ve li Rojhilata navîn di asta împaratoriyê de xwe rêxistin dike û pêşve diçe. Bi bûyera Kerbelayê re ferdên dawî yê Îslama azadîxwaz(ferdên malbata Hz. Mihemed) jî tên qetil kirin û silteya yekdestî ava dibe. Êdî yekane hêza li ser silteyê serdeste, xeta Ereb ya dijîslamê ya ku xwe dispêre arîstokrasiya qebîleyên bazirgan e. Ev xeta kevneşopî,alîgirê rastê, Ereb ya dijîslamê, heta sedsala 12. Jî weke hêzeke herêmî serdestiya xwe bênavber didomîne. Ji sedsala 12. ve xeta Îslama Ereb qels dibe û dest bi daketinê dike.

Di mijarên felsefe, raman, zanist, huner, çand, hiqûq, tip, mantiq de heta sedsala 12. Jî bi giştî xeta pêşveçûnê dişopîne. Di dema kamilbûna Îslamiyetê de kesayetên weke Îbn Sîna, Ebû Tufeyl, Îbn Ruşd, Farabî, El Kîndî derdikevin holê. Îbn Haldûn(1332-1406) weke lûtkeya ev çerxa kamilbûnê ye û dibe ku xeleka dawî ye. Îlahiyat û tevgereke felsefî ya ku nîqaşên “aqlê azad” pêş dixe, derdikeve holê. Ev tevger di dema xwe de di qada felsefe, aqlê azad û Îlahiyatê de di rewşa navenda cîhanê de ye. Hîn bêtir pêşveçûna vê xetê wê ji ronesansa nû re rê vekirina. Encax Gazalî(1058-1111) di vê mijarê de xala werçerxê ye. Âdeta li hember van hemûyan şer dide destpê kirin. Îslamiyetê weke nazarî û emelî, di bingeha ola kevneşop de ji nûve bi teşe dike. Ev ji rawestin û paşketinê re rê vedike. Êdî di zanistan de raserî(serdestî) derbasî Ewropayê dibe .

Em nikarin raman û kesayeta Gazalî ji serdema lê dijî qut bigrin dest. Çaxa lê jiyan kiriye serdema kaosê ye. Ji aliyê siyasî ve hêzan her tim bi hev re şer dikin hene .

Dema hatina sedsalên 11. û 12. Li Bexdayê xîlafeta Ebasiyan qels bûye û ketiye kontrola Selçuqiyan. Xelîfe û siltanê Selçûqiyan li ser esasê bîrdozî îtifaq çê dikin. Selçûqî bi şerê bixwîn bênavber sînorê xwe fireh dikin. Li Misrê dewleta Şiî Fatimî û dewleta Endûlûsa îslam her diçe xwin wenda dikin. Ji aliyê din ve êrîş û telana qewmên ji jêderka Asya navîn didomê .

Sefera yekemîn a Xaçiyan artêşa Selçûqiyan bi erdê re dike yek. Anatolya û Toros derbas dike digihîje Antaqya û Qudsa ku weke “axa pîroz” tê penase kirin. Bi sefera yekemîn ya xaçiyan

re Selçûqî, Fatimiyê şiî û xanedana Endûlûsa dest bi hilweşînê dike .

Li hember vê kêriya xaçiyan ya ku xwe dispêre telan, yaxme û dişibe kêriya kuliyan, tu hêz li berxwe nade .

Piştre Selahaddîn Eyûbiyê weke “Mêdî”yê hemû civaka îslam û Rojhilata navin derdikeve holê, wê li pêş vê kêriyê ben çê bike û biseknîne .

Gelê Ewropa jî ji van şeran zirarê mezin didîtin. Birçîbûn û xîzanî bilez belav dibû .

Tevgera Selçûqiyan ya dagirkirina hemû herêmê, zexta Bîzansa dirizê, piştre jî wê seferên xaçiyan bidome. Ev navbera kaosê, alozî-qeyran, wê bi dagirkirina Moxolan hin bêtir kûr bibe û belav bibe .

Li rastî vê li Anatolya, Mezopotamya, Asya navîn (Mavera un Nehîr) û li Erebîstanê bi dehan mîrîtiyên xweser û serbixwe derdikevin holê. Di navbera vê kaosê de bi qelsbûna silteya navendî, zext û rayedariya li ser gel jî kêm dibe. Gelên ku ji vê valetiyê sûdwerdigrin, di bin kontrola rayedarên nû de dikevin nav lêgerîna azadiyê .

Ev qeyrana siyasî bi heman rengî li ser qada olî û çandî jî bandor dike. Çanda civaka çemê bingehîn, li hember şaristaniya dewletî, ji bo ji xwe re cih veke hewldide. Bi daxwaza azadiyê, li ser hev raperîn, serhildan pêş dikevin. Nirxên xwe dispêrin çanda neolîtîkê bi tevgerên weke kevneşopiyên Zerdeşt-Manî-Mazdek; Elewî-şîa, Hurremî, Babekî, Îsmailiye-Karmatî hwd li ser rûyê erdê peyda dibin. Xizan, kole, yên ji derve hatine hiştin,

bindest, di bin van teşeyan de bi şîarên azadiyê li hember silteyan, çalakiyên tund û domdar pêşdixin .

Îslamiyet di hindirê xwe de jî dabeşî mezheba bûye, her yek ji wan mafdariya xwe diparêze. Felsefeya tesewûf her diçe kûr dibe .

Li rastî vê di hemû qadên weke felsefe, mantıq, hiqûq, dîrok hwd de pêşveçûnên girîng bidest dixe. Merov bêje, li vê qadê Îslamiyet serdema xwe ya kamilbûnê dijî, wê li cih bibe. Ev pêşveçûn silteya dewletên navendî, yekbûna olî û bawerî dilerizîne. Weke mînak baweriya Kurda ya Ezîdîtî, di pêşengiya Şeyh Addî de tam jî di navbera vê kaosê de derdikeve holê .

Gazalî bi gelemperî zarokê ev alozî, qeyran, nakokî û pevçûna ye. Ew di vê aloziyê de tercîhê xwe ne li aliyê azadiyê û gelan li aliyê dagirkeran ve diyar dike. Fikrê wî li ser vê bingehê kamil dibe û pêşvediçe.

Xalîfe û rayedarên navendî li hember vê rewşê pêwistî bi fikir û tanzîma navendî dibînin. pêwist bû ku Îslama kevneşop ji nû ve were înşakirin. Gazalî, li hember lêgerîna heqîqetê ya gelan, bi fikrê “heqîqeta teqez” derdikeve holê .

Gazalî girêdayî mezheba (algazel)şafiî ye, li Îranê bajarê Tûs li bajarokê Gazal weke zarokê malbateke xîzan tê dinyê. Gazalî li navendê zanistê weke Tûs, Cûcûna, Nîşabûr, Bexda, şam, Quds hwd yên wê demê, dixwîne, digere û lêkolîn dike. Di mijarên weke “ûsûl-î hadîs, usûl-î fikih, kelam, mantiq, hiqûq, munezere hwd de ders distîne. Ji vê dorhêla kaosê bandor dibe. Sefera yekemîn ya xaçiyan ew bixwe jiyan dike .

Gazaliyê bi ciwantiya xwe bala her kesekî dikşîne ser xwe, li ser daweta Nîzamulmulk diçe Bexdayê. Li wir Gazalî dan ser medreseya Nîzamiye(rektorê zanîngehê yê wê demê) ya ku di bin kontrola Selçûqiyan de ye. Di wateyekê de eynî weke di zîgûratan de rola rahîbên Sûmeran digire ser xwe. Di vê dorhêla aloziyê de li hember hemû dengên cûda, silteya Selçûqiyan û xelîfe diparêze. Bersiva hemû hêzên muxalif, ew amade dike û bersiv dide. Bi vî awayî silteya Selçûqiyan û xalîfe rewa dike. Wek fikrî digihîne avayiyeke navendî. Xwe ji çeşîdeke dijşoreşê an jî şoreşa xwedayî re amade dike. Her tiştê muxalif di bin navê "guneh" de qedexe dike û diqutifîne. Bi vî awayî rewatî dide silteya Selçûqiyan û xalîfe .

Li vê demê Hasan Sabah, bi fikrê Îsmaîliye li Îranê li hember îstîla û dagirkirina Selçûqiyan şerekê xedar dimeşîne. Nîzamulmulk (piştre ji aliyê fedaiyên Hesen Sabah ve tê kuştin) li dijî sîstema Îsmaîliye ji bo ku otorîteya navendî ya dewletê biparêze Gazalî dinirxîne û di asteke bilind de encam jî digre. Balkêş e, Hesen Sabah ji welatê xwe li dijî dagirkeran şer dike, Gazalî jî weke kesekê Îranî, dikeve xizmeta hêzên dagirker .

Gazalî vê navbera kaosê bi bîranîneke xwe zelal dike. "grûbeke rêbiran derket pêş me. Her tiştê me birin û çûn. Li pey wan çûm û min xwe avêt ber wan. Qey çi dibe, notê min yê dersan yê ku kêrî we nayê, wan bidin min. Dema ku reîsê wan pirs kir ku "ew çi ne?, tiştên çawane? Min got; Ji bo ku ez wan fêr bibim min welatê xwe terikand, çûm xerîbiyê. Çend kaxizê li vî cihê ne. Reîsê rêbira keniya û got; "tu çawa îdia dike ku tu wan zanî, dema em wan ji te digrin tu bê zanist dimîne" û wan

kaxiz li min vegerand. Ez piştre fikirîm, Allah û Teâlâ, ji bo min hişyar bike, bî wî awayî rêbir da axaftin. Dema gihîştim Tûs ê sê sala bi hemû hêza xwe xebitîm, notê ku min li Curcanê girtibûn, li vir min hemû ji ber kir. Edî gihîştibûm haleke wisa ku rêbir derkeve pêşiya min hemûya bigre dîsa jî zerar nedigihişt min”.

Ev derdikeve holê. Ji ber kirin di rêbaz de rê li ber dogmayan, kaliban vedike. Ji ber ku alimtî piştî Gazalî vediguhere, qalibên îslamê ji ber kirin û dubarekirinê. Kî ji ber ve çiqas qalib û dogma zanibe, ewqas alimê mezin tê hesibandin. Gazalî vê rêbaza tîne halekî tanzîmkirî .

Gazalî şerê herî mezin li hember felsefe û fîlozofan vedike. “Ha niha çîroka zanista fîlozofan guhdar bike: min wan weke çen tebeqe, zanista wan jî weke çend beş dît. Ji wan re, zarokê wan re û di nevbera yên kevin û nû de ruxmî cudahiya dûr û nêzikê rastiyê, pêwîste dexma kufir û jirêderketî lê bê dayîn.

Fîlozof rixmê çeşîdbûn û pirayiya wan, weke Dehriyyûn, Tabîiyyûn û îlahiyyûn dabeşî sê beşan dibin. Tebeqeya Dehriyyûn, grûbeke ji fîlozofê kevn e. Hebûna afirîner(xwedê) înkar dikin. Ev zindiq, bêbawerin. Tabiyyûn; van jî heyîna axretê qebûl nekir. Bihûşt, cehnem, qiyamet û hesab înkar kirin. Ev jî bêbawerin. Tebeqeya sêyemîn ya Îlahiyyûn jî fîlozofê piştre hatine ne. vanan herdû tebeqeyên berî xwe înkar kiribin jî xwe ji bîd’at û kufrê rizgar nekirine.” Fîlozofên ji ev tebeqeya sêyemîn in, her çiqas şaşitiyên yên berî xwe eşkere û vekirî nîşan bidin jî, ji ber ji pêxember bawer nekirine ew jî di kufrê de mane. Lewra ji bo ji kufrê rizgar bibin, ji pêxember û tiştê diyar kirine, bawerkirin jî şert e. “(El-Munkizû mîn ed-dalâl)

Felsefe bisînor dike û ji nû ve bişikil dike. Ya rast di Îslamiyetê de felsefe bi Gazalî re bidawî dibe. Ji bo felsefeyê asteng bike hewldanên mezin diyar dike. Piştî Gazalî (P.Z 1111) di qada felsefê de tu pêşketinên girîng çênabin. Gazalî destpêkê, aqiltiya Arîsto ya bi dogmayên olî re nakokî çêdike û Platonîtiya nû rexne dike. Îbnî Sîna û Farabiyê ku van yekan diparêzin dide ber topan. berevajiyê Farabî ji bo gihîştin û têgihîştina "heqîqeta teqez(ya teqez û bêdawî) kêm mayîna aqil diparêze. " Dibêje aqil tenê bi ya "îzafî" re sînordar e, têgihîştina ya teqez(mutleq) ne mimkin e".

Gazalî li hember fîlozofên Îslamê yên ku parastina fikrê "gerdûn di valetiyê de bêdawî, encax di demê de bidawî ye" dikin jî, derdikeve û parastina fikrê "demeke bêdawî, bi valetiyeke bêdawî re eleqedar e" dike .

Gazalî, demên destpêkê di felsefê de gumankerî pêşdixe. Gumankeriya Descartes bi serkeftina aqil digihişt encama " difikirim nexwe ez heme" , gumankeriya Gazalî jî di "îmana teqez" de şênber dibe. Dema li heqîqetê digere, li ser fîlozof û doktrînên demê lêkolîn dike, rexne dike û digihîje vê encamê. "tanzîmkirinên xwe dispêrin matematik-hendew, mantiq, zanistên xwezayê û felsefê, ji bo gihîştina rastiyê yek ji wan jî rêyeke mîsoger nîşan nade." Ew ji bo gihîştina rastiya teqez, şikil dide sîstema xwe.

Li gor Gazalî, "matematîk", ji bo peyitandina tevlîheviya xwezayê ne têrker e. Tenê dikare bûyerên zelal û hêsan bipeytîne. Ev rêbaza îspatê ya pişta xwe dide daneyên vekirî û

basit, bi ‘’tevliheviya xwezayê’’ û ‘’aqil’’ ve ku ne gengaze were ravekirin ji feraseta ku kêrî redkirina ‘’sirran’’ tê tevdigere.

Nêzîkayî ev e. Matematîk nikare hebûna xwedayî, bi matematîkî îspat bike. Nexwe Matematîk encax kêrî înkarkirina wî were. Ji ber vê jî digihîje encama “ kesên ku bi Matematîk re mijûl dibin, wek mecbûrî û mutleq divê qada îmanê biterikînin”.

Dîsa mijara mantiq bi heman ferasetê digre dest. Mantiqê weke amûreke peyitandinê(îspatkirin) dibîne. Ev amûr dibe ku hem li aliyê fikrekî were şixulandin, dibe ku li dijî fikrekî were şixulandin. Dibêje; “fîlozof û yên gotina dibêjein ji bo hevdu red bikin heman amûrê dişuxilînin.” Lewma ji bo ku xizmeta yek armanceke tenê nake, mahkûm dike. Ji van hemû yekan em dikarin bigihîjin van encaman.

1-Gazalî di vê rewşa qeyranê de rêbaza dogmatîk ya olî,kelam (exlaq, etîk) tesawûf-eşq(xweşikbûn, hîskirin) û felsefe-zanist(felsefe-raman) hwd hemûya sentez dike û digihijîne pîvanên hevpar. Ji ber ku rêbaza dişuxilîne olî ye, hemû pîvan jî dibin dogmatîk û kevneperest. Bi van pîvanan re lêgerîna heqîqetê ya di Îslamê de di pêşveçûnên zanistî, felsefî û fikrî de yeknesak(monoton) dibe û dikeve nav pêvajoya rawestin û paşketinê. Yên ku nakevin nav qalibên vê sentezê bi sûcdariyên mezin re rû bi rû dimînin. Bi gotinên zindik(bêbawer), kafir veder dibin .

2-Gazalî piştî ku ev sentez ava kir, hemû nêzîkayiyên li derveyê wê, weke biguman îlan dike. Bitaybet felsefe û zanist ji aliyê olê ve dikeve haleke biguman .

3-Fîlozofên demê yên weke Îbnî Sîna, Farabî hwd. bi sûcdariyên neheq, zext û rexneyan re rû bi rû dimînin .

4-Gazalî dema ku ji aliyê nazarî û pratîkî ve van sentez û pîvana ava dike, piştgiriya madî û manewî ya siltanê Selçûqiyan digre pişt xwe. Li ser navê silteyê li hember fikrên din şer dide destpê kirin. Her kesî an bi qutifandinê dikşîne nav pergala xwe, an jî dixe hemberî xwe û li ser navê olê veder dike .

5-Bi feraseta "Ebed-mubed" ol dixe xizmeta silteyê û silteyê weke hêmana xwedayî ya naguher, şîrove dike.

6-Gazali, ji aliyê cewher ve rixmê ku mantiqa Arîsto bikar tîne, ji yên piştî xwe re bi felsefe û zanistê re mijûlbûnê qedexe dike û vê yekê bi hêza silteyê ve dixe rêzik.

7-Ji ber ku Tesewufîtî hêzeke alternatîfe nikaribû bi heman tundî û qedexeyan ser wan de biçe, encax bi êrîşên siyasî, bîrdozî û derûnî wan diqutifîne û dikşîne çerçoveyekê. Ji bo silteyê bêbandor dike .

8-Li vir nêzîkayiya wî ev e: Yên bi vê cûreyên zanistê re mijul dibin, bi para heqîqeta ku ji vir bidest xistine, îdîa dikin ku giştî heqîqetê bidest xistin e. Ev jî têgihîştina Mislimana ya bi heqîqetê re qels dike, û qibleya wan şaş dike".

Weke li vir jî tê xuya kirin; her tiştî dixe yekdestiya silteyê û yekdestî ava dike. Ji nirxandin û şîroveyên cûda re cih nahêle .

" 9-Gazalî erka rêvebirina medreseya Nîzamiye dike. Ev ji bo rasyonelkirina(aqlîkirin) serdestiya Selçûqiyan xala destpêkê ye." Bi xwespartina vê hêza silteyê piştre, pîvanên nazarî û pratîkî yên senteza xwe ava dike. Hewceye em bal bikşînin ser vê yekê. Gazalî sentezekê ava dike. Pekî vê sentezê ji bo kî û li

ser navê çê dike? Vê yekê tenê weke li dijî filozofa, “yên ji rê derketine” weke parastina îslamê nirxandin xeletiyeke mezin e. Jiyana Gazalî, têkiliya silteyê ya bi Selçûqiyan re ketiye nav, derdixe holê ku vê yeke ji bo silteya navendî dike .

10 -Îslamiyet bi Gazalî re ji her aliyê ve siltewî dibe. Ji vê aliyê ve bi Gazalî re lêgerîna heqîqetê ya di Îslamiyetê de bigiştî dibe desthilatî. Di rastiya “îqtîdar heqîqet e, heqîqet îqtidar e” de şênber dibe. Gazalî lêgerîna heqîqetê yekalî dike û di kontrola dewletê de yekdest dike. Wê bi bitûnî siltewî dike .

11 -Bi vê ve girêdayî weke rêbaza gihîştina heqîqetê mantiq; “ne zanista afirîneriyê, weke zanista afirîşê” rol dileyîze. Ji ber vê yekê di lêgerîna heqîqetê de li şûna azadiyê vediguhere teşeya doktrîna îqtîdarê.

Erkê xwe yê berê wenda dike. ji ber ku her îqtîdar li ser vederkirinekê teşe digre. Yê din veder dike û red dike .

Li gor pênaseyên Heîdegger; “mantıq(aqil) neyarê herî serhişk yê fikrandinê ye.” Dema di nav qaliba de tê heps kirin, hemû rêkên raman digre. Ol mînakê herî şênber ê vê yekê ne .

12-ji hemû van yekan Gazalî weke “tirsa” di mîhwera îqtîdarê de xwendin hin rasttir e .

Gumankeriya Gazalî, “gumankeriya wî ya dişibe Hûme û Kant” dîsa bi vê têgihîştina îqtîdarê re destgirtin û nirxandin nêzîkayiyeke rasttir e. Gazalî her cureyê otorîte û vînê dixe haleke xasî îqtîdarê. Weke girêdayî îqtîdarê digre dest. Xwedê dixe navenda kar, bi vî awayî yê "bêdestpêk-bêdawî" ji mijara nîqaşa derdixîne .

Her cureyên fealiyetê axaftin û çalakiyê, wek talî û esasî bi îqtîdara navendî ve girê dide. Mîna ku dikare xwedê bixe navenda vê sîstema fikir ya di derbarê çêbûnê de ye, dikare zanist an jî îqtîdarê(silte) jî weke saziyekê diyarker û biryarê dikare bicih bike .

Ger ev otorîte ne teşebûseke azadîxwaz be, cihê ku lêgerîna heqîqetê bigihîjê wê îqtidar be .

Şaşitî ev e; Heqîqet-azadî di radeya bilind de zindî, livdar û dînamîk e. Ev ji aliyekê ve dişibe enerjiya herikbar. Nexwe weke ku Gazalî îdîa dike nayê şîrove kirin û di nav qaliban de nayê hepskirin. Weke ku Gazalî îdîa dike, nikare "wê şîrove bike û bike welatê xwe." Ji ber ku heqîqet "ji hewldana welatekî tekane, sabît, nelivdar" zêdetir, nêzî rastiya gerdûn, xweza û civakê ya zindî, livdar, guhêrbar û piralî ye. Xeta pêxembera ya çalakî û jiyanê jî vê zêde bi zêde piştrast dike. Mîtosa Adem û Hewa encameke vê taybetmendiyê ye. Çalakiya Adem û Hewa di eslê xwe de hewldana derbaskirina sînorên xetê wê hatine diyar kirin e. Fêkiya qedexekirî xwarin û ji bihuştê qewitîn, encama taybetmeniya lêgerîna heqîqetê ya kû di nav sînora de nayê hepskirin e .

Gazalî, raman, felsefe, zanist, mantiq, matematîk, gerdûn, xweza, civak û jiyan weke nazarî û pratîkî pênase kiriye, sînorên diyar daniye, û xistiye nav qalibên pîvanên wan diyar. Derketina dervayê van qaliban û fikrandin qedexe dike. Ev eynî tê wateya hemû rêwiyên tên û diçin, li ser cihê hesin yê Prokrûstûs dirêjkirinê .

Gazalî bi xeletiya mezin ya kû kiriye ve, bi fikrandineke melayketî ji bo pêşiya xeta kirina her kesî birîn û di xeteya xwe de her kesî yekkirin û sentezkirinê hewldide. Ev kevneperestî û mûhafazakariya herî mezin e. Ya din rastiya paşketina Îslamê ya heta roja me ye. Ji ber ku li vir jiyan tê sekinandin, li ser navê ol her tişt bi ûtopya bihuştê tê xeyalîkirin. Jiyana rast wek ku tune dibe. Eşkereye ku, ji xeteya gihiştina heqîqetê ne pêkan e .

Gazalî mîna Descartes destpê dike. (Gumankerî û serfiraziya aqil) lê belê mîna Pascal diqedîne. (ji gumankeriyê derbasbûna baweriyê) li ser gumankerî û kêm mayîna aqil dişuxile, hewldide li şûna wê baweriyê(îman) bicih bike .

Mixalifên Gazalî feraseta "Nîmeta herî mezin ya ku xwedê daye evdê xwe aqil e. Evdê ku ji vê nîmetê feyde nagire, gunehkarê herî mezin e. Xebatên şixulandina aqil jî felsefeyê bi xwe re tîne." esas digirtin.

Gazalî jî "berî aqil pêxemberan û baweriya ku ew agahdar dikin esas digirt".

Gazalî bi vî avayî aqil û ola kevneşop ji nûve sentez kir û hevsengî çêkir. Her tiştê din bi vê girêdayî di nav dubendiya "bidawî û bêdawî" de girt dest .

Eşkereye ku Gazalî, kevneşopdar û girtî ye. Paqijkirina bandora tesewûfê esas digre. Tesawûfê di nav nêzîkayiya kevneşop, olî de dihelîne û di nav qalibên wê de heps dike. Ji bo gihiştina heqîqeta teqez ji nû ve desthilatiya ola kevneşopî ji nû ve bi cih dike. ji bo gihîştina heqîqeta teqez vê yekê pêwist û mecbûrî dibîne .

**16-Rêbaza olî û Lêgerîna Heqîqetê:**

Nîetzsche; bi gotina "bawerî, weke dijminê heqîqetê ji derewa xetertir e. Yê guh dide, heqîqetê bilêv dike ne hêsantir e." neçariya di navbera ol û heqîqetê de, bi dogmatîzma olî negengazbûna gihîştina heqîqetê diyar dike .

Derbasbûna feraseta olî, merhaleyeke mezin e. "Aqilê ku xwe ji mîtolojiyê xwedî dike, bi pêşketina ol re dikeve bin emrê baweriyê, dibe piştrastkirina baweriyê. Bi vî awayî felsefe dibe qertafa teolojî(îlahiyat, olnasî)." Zindîtî, livdarî û meyla azadîxwaz cihê xwe ji rêbaza dogmatîk ya hişk re berdide. Çima؟

Nêzîkayiya dogmatîk ya olî di cewher de aîdê şaristaniya dewletî ye. Şaristaniya dewletî destpêka kedxwarî, zext, koletî û evdîtiyê ye. Ji bo koletiyê rewa bike pêwistî bi qaliban, dogmayên hişk û bi gotina xwedê hebû. Ev dijşoreşa herî mezin û dîrokî, guherîn û veguherînên paldayî çînatiyê, qada zihnî dagir kir û xist bin kontrola xwe. Êdî zîhniyet vê raber dike; têkiliya kedxwar û kedkar nayê pirsiyarkirin. Her tişt bi vê mantiqa nayê pirsiyarkirin, tê dest girtin. Li vir kedxwarî, têkiliya kedkar-kedxwar weke ya asayî li mejiyan de tê çandin .

ji bo vê jî; berî her tiştî pêwistî bi îqnakirina merova an jî ji bo pirsiyar nekin di asta herî bilind de pêwistî dogmayên hişk, yekalî, biqalib hebû. ji bo neyên pirsiyarîkirin jî pîrozî dan van qaliban. Bi bitûnî hatin qedexe kirin. Bi vî awayî destnedayî hat kirin. Ne hatina pirsiyarkirin, qedexekirin li ser navê xwedê

çêbû. Li ser navê xwedê qralên xwedayî derketin holê. Merov anîn rewşa ku wan pirsiyar neke .

Mantiq bi vî awayî hîmdar bû; "kedxwarî, dewlet, çîn pîrozê dest lê nayê dayîn." Ev tiştê dest lê nayê dayîn xwedî maf û serbestiya ye û dikare her tiştî bike. Kes nikare wê pirsiyar û rexne bike. Bi vê dogmayê kedxwarî, cûdatiya civakî, newekhevî, koletî ji ber vê yekê jî serî rakirin tê veşartin. Li vir kedxwarî veşartî û pêçayî ye.

Rêzik ev e: Çiqas dogmayên hişk hebin, ewqas zordestî, kedxwarî û zext heye. Çiqas dogmayên hişk hebin ewqas dewlet heye. Dewlet çiqas hebe, ewqas koletî û newekhevî heye. Çima pêwistî bi dogmayên olî yên hişkole hat dîtin؟

Li vir kedxwarî kûr dibe. Koletiyeke hewlnak-wehşî derdikeve holê. Ev rewşeke ku merov ne hînbûyî ye. Ji ber ku merov li civaka xwezayî xwedî cihekî wekhev û azad e. Têkiliyên kedxwar-kedkar û koletiyê nas nake. Ji bo ku civakê di vê mijarê de îqna bike û fêr bike pêwistî bi dogmayên hişk heye. Rêka heqîqet û jiyanê, "li gor gotin û ola ku ji bo gihîştina heqîqetê hatiye diyar kirin e" Li vir gotin, destureke xwedayî ye. Heqîqet li gor gotinên xwedê û ol teşe digre .

êdî serdema ku xwedayên bi maske(rûpoş) tên înşa kirin e. Her tişt tê maskekirin. " Xwedê di heman demê de li ser civakê weke serkarê ku li ser civakê kedxwarî û ferman pêk tîne û zordar e. Ev yek bi hêsanî tê hîskirin." (A. Firat)

Eşkereye ku rûpoşkirina zêde, bi hîle lêkirin û xapandina merov re, bi şêweyeke berevajî guhertin û veguhertina merov re eleqedar e. Bi xapandina merovan, newekhevi, koletî an tê

veşartin an jî weke tiştekî xwezayî ku xwedê afirandiye tê nîşan dan. Tiştên tên kirin û pergala kedxwarî li ser vê bingehê weke heqîqeta mîsoger di bîra(hafize) civakê de tê bi cih kirin. Her çiqas kedxwarî kûr dibe, belav dibe û dibe weke pergalekê, zîhniyeta olî jî bisaz dibe û sîstematîk dibe. Li vir zîhniyeta olî, bi rewa kirina zîhniyeta kedxwariyê re di nav bitûniya diyalektîkî de pêşvediçe û weke rastiyeke civakî, gav bi gav tê înşa kirin û li ser hemû civakê tê serdest kirin. Bi vî awayî pergala koletî, newekhevî û kedxwarî tê rewa kirin û weke çarenûsekê li ser civakê tê pejirandin. Ev çarenûs weke encameke xwezayî ya ku xwedê pêşkêş kiriye, afirandiyê tê diyarkirin û rewakirin. Bi vî awayî bi felsefeya çarenûsîtî koletî tê rewakirin .

Ji xwe di destpêka derketinê de yên dibin qral weke encama vê zîhniyet û nêzîkayiyê, xwe weke xwedayên qral îlan kirin, û di bîra civakê de rewa kirin. Xwe li ser vê bingehê îlan kirin. Piştre axaftinê xwe gelemperîkirin û xistin malê hemû civakê. Gotina weke gotinên xwedê pîroz kirin û weke rêzik, fermanekê derxistin pêş civakê. Di dîrokê de şerên herî mezin yê kedxwarî û wehşî, talanên hewlnak, pergala koletiyê ya kûr û belav dibe, di encama vê rêbaza dogmatîk ya olî de pêkhatiye .

Axaftinên hatine pîrozkirin yên xwedayên qral, di rêvebirina girseya de risteke bingehîn leyîstiye. Li gor axaftinên pîroz, fermanê xwedê tevgerîn, li gor wê jiyîn, pêwistiyên wê bicih anîn, bênîqaş ew qebûl kirin ji bo serdestan hêsaniyên mezin bidest xistiye. Bi van gotin û fermanên xwedê girseyan hin hêsantir rêvebirîne, beralîkirîne û pergala koletiyê domandine.

rêbaza dogmatîk ya olî, axaftina xwedê û pêwistiya axaftina bicih anîn, tirsa ku xwe dispêre pîroziya wê, îqnabûna encama vê tirsê, di rêvebirina girseyan de diyalektîka "şivan-kerî" afirandiye. Qral û wesfê wî şivantî, civaka di rewşa kêriyê de, encama vê axaftinê, çawa dixwazin wisa rêvebirine. Gava ku koletî, kedxwarî û newekhevî, kûr û belav dibe, rêbaza dogmatîk jî hişk dibe û belav dibe. Girêdayî vê, di navbera kedkar û kedxwar de diyalektîka "şivan-kêrî" ya domdar dibe û vediguhere zîhniyetê ava bûye .

Her tişt eynî li gor vê bitêşa bûye, rastiya xwezayî û civakî ketiye nav qalibên hişk û hatiye cemidandin. Feraseta berê ya xwezayê ya ku zindî, livdar, her tim diguhere û vediguhere, cihê xwe ji nêzîkayiyeke mirî, pasîf û tebatî ya xwezayê re berdaye. Bingeha vê koletî mayîndekirin û weke çarenûseke neguher di bîra merova de bicihkirin e. Pergala koletiyê di her qada jiyanê de weke çarenûsekê tê pêşkêşkirin .

Bi vî awayî xwezaya ku yekbûna diyalektîkî ya feraseta çalak, dînamîk, afirîner, bicoş, li serdema seretayî û serdema navîn bi temamî şûna xwe ji rêbaza dogmatîk re dihêle. rêbaza dogmatîk li şûna xwezaya, ji ber xwe ve pêşdikeve, ji ber xwe ve dixebite, ji ber xwe ve diguhere, vediguhere, pirrengî, pircureyî di hindirê xwe de dihewîne; rêkeke li gor axaftin û fermanên pîroz tevdigere, derdixe pêşiya merovan. Li ser vê bingehê dinyaya bireser, xwezaya zindî-livdar, pêşveçûnên xwezayî-civakî tîne rewşeke nefêmbar. Vê nefêmbariyê afirandin, ji pêwistiya veşartina kedxwariyê derdikeve holê .

Êdî dinya qadeke demborî ya jiyanê ye. nemayînde ye. Divê zêde nirx nedinê. Ji ber ku ya mayînde dinya din e. Hemû amadehî divê li gor wê were kirin .

Mînakên hatine afirandin-hatine hilberîn, yên pîroz tên esas girtin. Civak li gor vê tê şêwandin û tê beralîkirin. Kes û civak ne ji bo ya nemayînde ya li vê dinê, ji bo ya mayînde ya ku li dinya din bixebite, hewl bide. Li ser vê bingehê her tişt tê berevajîkirin. Rûpoşkirin û beravejîkirineke bêhempa tê pêşxistin. Ev şikil û rêbaza zîhniyetê li ser bingeha dijmîtolojî pêş dikeve û saz dibe. Hemû jiyan û civakê dixe nav qalibên dogmatîk û koletiyê sîstematîk dike .

Bi vê re aliyê erênî ya rêbaza olî, di civakê de diyarde û pîvanên exlaq pêş dixe. Ger aliyên erênî, neyînî û naveroka exlaq deynin aliyekî di eslê xwe de exlaq weke rêbaz ji bo civakê diyardeyeke jêveneger e. Ger exlaq nebe, pîvan nebe civak wê veguhere cenawirekê ku hevdu dixwe û tine dike. Civaka ku pîvanên exlaq ji holê radibin, dirizên, wê ji xwebûna xwe derkeve .

Encax zîhniyeta merov li gor xwezaya xwe nerm e. Xwedî taybetmendiya teşedan, vesazkirin, guhertin û veguhertinê ye. Weke pêwistî û encama vê nermbûnê, fikrê "qencî-xirabî" bi guhertin û jihev cûdakirinên mezin re rû bi rû maye. Ji aliyekê ve exlaq û felsefeya Zerdeşt ya fikrê qencî-xirabî esas digre, dîsa doktrîna mezin ya exlaqî ya konfuçyûs, weke encama vê pêşdikeve, ji aliyê din ve rêbaza dogmatîk ya hişk serdest dibe.

Exlaqê civakî di her dema dîrokê de, di jiyana civakî de risteke girîn leyîstiye. Demên ku exlaq herî zêde hilweşiyaye, di van

pêvajoyan de civak zêde bi zêde riziyaye û ji xwe dûr ketiye. Weke encameke hilweşîna exlaqî ya ku moderníteya sermayedar roja îro ava kiriye, hilweşîna mezin ya xwezayê, qirêşbûn û perçebûna civakê jî bixwe re aniye .

Fikrê Yewnan jî di bin bandora vê rêbaza hişk, dogmatîk de ye. Hin bêtir dogma û qalib li pêşin. Guhertin û veguhertina diyalektîkî sînordar e. Di yekemîn fîlozofên xwezayê de Thales, Pîtagoras, Anaxîmandros, Anaxîmenes hwd. nêzîkayiyeke diyalektîkî ya diyar heye. Encax ev serdest nabe. rêbaza bêtir derdikeve pêş û serdest dibe, îdealîzma Arîsto û Eflatûn e .

Arîsto û Eflatûn di rewşa avakerê exlaqê metafîzik de ne. Ev exlaqa xwe dispêre îdealîzmê, ji dogmatîzma serdema navîn û rêbaza digmatîk ya olî re buyê çavkanî. Lûtkeya herî bilind ya ku dogmatîzm gihîştiyê ye. Xirîstiyanî û Îslamiyet yekser ji Arîsto û Eflatûn sudwergirtiye û hêz girtiye. Ji ber vê îdealîzmê jî di nav alimên Îslamê de weke fîlozofê herî nezî pêxembertî hatiye nirxandin, ji ramanên fersefî re bûye bingeh .

"Rasyonalîstên(aqilparêz) Yewnan", stoaparêz her tiştî bi aqil rave dikin, Afirîner, avaker û pêşengê dogmatîzma Xiristiyanî, Platoniyê nû Agûstînûs, pirsgirêkê berepaş digre dest. Li gor Agûstînûs; "Hemû felsefeyên berî derketina Îsa xwe dispartin şaşitiyeke bingehîn. Ji yek rêka şaş bandorbûn. Hêza aqil weke hêza herî bilind ya merova hatibû mezinkirin. Lê belê heta ku merov bi îlhamdaneke(vahiy) ezmanî ve ronî nebe, wê demê tiştên ku wê her tim nizanibe wê hebin. Ew jî, di cîhanê de bigumanî û nediyariya avayiya aqil bixwe ye. Aqil, ji me re reka rastiyê, zanyariyê û rêka yên eşkere nikare diyar bike. Ji ber ku

ew bixwe ji aliyê wate ve nediyar e, ji aliyê jêderkê ve bi raz(sirr, veşartî) e. Ev sirr encax bi îlham dana Xiristiyanî çareser dibe. Li gor Agûstînûs aqil, ne xwerû û bitenê ye, xwedî xwezayeke cot û dabeşî ye. Merov ji xeyalê xwedê hatiye afirandin. Ew bi destê xwedê hatiye afirandin, di vê rewşa xwe ya xweser de, bi halê xwe yê yekemîn re wekhev e. Lê belê ev hemû bi ketina Adem re hatin wendakirin. Ha ji wê rojê ve hemû hêza xweser ya aqil şêlo bûye. Ger aqil bi tena serê xwe û bi tena melekeyên xwe were hiştin, rêka paşde vegerînê tu demê nikare peyda bike. Nikare xwe nû bike û bi hewldana xwe vegere cewhere xwe ya yekemîn û xwerû. Derfetên guhertineke bi vî awayî, encax bi alîkariyeke nesiruştî, bi hêza qenciya ezmanî ve çê dibe." (Ernst Cassîrer)

Dema Xiristiyanî dibe olê fermî yê Romê, koletiya hişk dikeve bin xizmeta pergalê. Dogmayên herî hişk li ser vê bilind dibin .

Îro rêbaza zanistî ya ku sermayedariyê weke olekî pêşxistiye jî rixmê ku weke dijberê wê dixuyê, ew bixwe jî di bin bandora rêbaza dogmatîk de ye. rêbaza dogmatîk heta atomên civakê xwe bicîh kiriye.

**Weke encamp:**

Lêgerîna heqîqetê domdar û bêdawî ye. Xwesteka gihîştina ya hin xweşiktir, hin baştir, weke hest û taybetmendiyeke merov her tim heye. Di zanebûnê de jî sînor tune ye. Zanist domdar, guhêrbar û bêdawî ye! Nexwe sekinîn û dogmatîkbûn bi vê yekê re binakok e .

rêbaza dogmatîk ya olî, zîhniyeta merova, têgihîştina wan, melekeyên şîroveya tiştên têgihîştinê, di nav qalib û dogmayan de heps dike .

Yên rêbaza olî diparêzin, di radeya bilind de bêhêvî û bêçare ne .

Weke encama vê bêçaretiyê fikrê cehnem û bihuştê hat pêşxistin. rêbaza dogmatîk ya li ser baweriya hişk hatiye avakirin û hemû pirtûkên pîroz, reşbîn û bêhêvî ne. Pirtûk bi kehanetên balkêş û hewlnak ve tijî ne. Li gor rêbaza dogmatîk rabirdûya merova tofan, siberoja wan jî li ser qiyametê teşe girtiye. Ev dinyaya objektîf ya ku merov lê jiyan dikin jî, demkî, derbasdar e û ji xewnekê pêk tê. Weke siyekê, weke sawîn tê dest girtin. Her tiştê objektîf weke tiştên sîtavî tê nirxandin. Xwedêgiravî jiyana dinyewî ji feryat û fixan, ji robara hestirên çavan pêk tê. Jiyan bi giştî bi qedexeyan, rêzik û tabûyan hatiye hûnandin. Her tiştê eleqedarî civak, xweza û merov e xistine bin kontrolê. Her tişt ji aliyê rêzikên hişk dogmatîk ve ji berê ve hatiye diyarkirin .

Li gor pirtûkên pîroz destpekê gotin hebû. Pergala gerdûnê, avayiya civakî, rastiya merov hemû ji gotina zaye. Xwedê destpêkê biryar da ku biafirîne. Kengê dema wê hat, got "çê bibe". Piştre merov çêbû, şewq çêbû, ezman çêbû, av çêbû, ax çêbû, mêş û morî çêbû. Her tişt bi "çê bibe" pêkhat. Nexwe li vir berî her tiştî gotin hebû. Gotina yekemîn jî fermana xwedê ya "çê bibe" ye. Li vir "gotin" pîroz û diyarker e. Gotin bixwe weke xwedê bêdestpêk û bêdawî ye. Gotin çeşîdekê xwedê ye .

"Dema ku têkiliyên pratîkî yên jiyana rojane, têkiliya merov bi merov re, têkiliya merov bi merovan re weke têkiliyên bêhempa û baş tê fêmkirin, pêşkêş dike, encax wê demê sîtawka olî ya dinyaya rast wê wenda bibe. Heta ku merovên yekbûyî bi azadî, li gor planekê bi şikilekî bihişmendî hilberînê tanzîm nekin, pêvajoya jiyana civakê ya xwe dispêre pêvajoya hilberîna madî, nikare perdeya ku wan pêçandiye biqetîne." (Karl Marks)

Ev derdikeve holê. bêçaretiya esasî û qelsiya olê, di hindirê xwe de hewandina xisleteke dogmatîk e. Ev jî havênê feraseta çarenûsîtî pêk tîne. Çavkaniya feraseta rêzikên negûher, neveguher, mutleq, mîsoger ol e. Ev jî li pêşiya her cureyên pêşketinan astengî derdixe. Ji evda re tenê fermanê ku rêzika teqez diyar dike, pêkanîn û bicih anîn dimîne. çarenûsparêztiya di zanistên civakî de jî çavkaniya xwe di radeyeke bilind de ji olê digre. çarenûsparêztî eynî weke olekê ye. Ji ber ku di mantiqê xwe de her tim nêzîkayiyeke bipêşveçûnên xeta rast heye. Tekoşîn û pêşveçûn weke encama vê mantiqê her tim ber bi pêş ve ye. Ji ber vê jî siberoja azad weke çarenûsekê wê were. Ol ji vê aliyê ve li ser zanistê jî di asteke girîng de bandor kiriye. Mantiq û zîhniyet xwe dispêre heman dogmatîkbûnê .

## C) RÊBAZA METAFÎZÎK:

Di ravekirina gerdûn û xwezayê de rêbazeke felsefî ya tê şixulîn e. Serdestan ji bo îqtîdara xwe bêdawî û mayînde bikin vê bi rêbaza dogmatîk ya olî re bihev ve kirîne û bi şikilekî çalak şixulandine. rêbaza metafîzîk, yê madî bi bitûnî red kiriye, her

tiştî bi rih, manewiyat, fikir û xwedê ve girêdaye. Wisa berpêş dikin ku bê xwedê gihîştina agahiyên rastiyê nepêkan e .

Metafîzik fikirîn taybetmendiyeke bingehîn ya merov e. Fikirîna ji fizîk wêdetir berhemeke zihnê merovan e. Huner, felsefe, hiqûq, edebiyat hwd. hemû encama şêweyê fikirîna metafizîk-ji fizîkê wêdetir e. Serdestan bi zîhniyeteka îdealîst vê weke rêbazekê şixulandine û pêşkêşî xizmeta îqtîdara xwe kirine. Metafizîk û îdealîzm hevgirtinekê ava dike .

**1-Metafizîk çiye؟:**

Him metafizîk him jî fikrê îdalîst mîna hemû şêweyên fikirînê berhemê zihnê merov e û encama rastiya dîrokî civakî ye .

Bingeha wê, sedemên wê, çawa û çîma ya wê di nav rastiya civakî de gerîn û şîrovekirin wê hîn bêtir encamdar be. Bi tevayî red-qebûl ne dahûrîner e. Ji ber ku ramanê metafizîk jî mîna hemû ramana ji xweseriya merova ye .

Merov di ravekirina gerdûn, xweza û civakê de çima ji bo çi serlêdana rêbazeke bi vî awayî kiriye.

Eşkereye ku bersiva vê bi jiyan, êş, zehmetî û dinyaya rûhî ya merova ve girêdaye. Gerdûn, civak û xwezaya ku rastiya wê nikare dahûrîne bi vê rêbaza dahûrandiye. Wek mînak huner, helbest, wêje di vê wateyê de, dibe ku şertên jiyana merova yên koletiyê, eşên mezin aniye halê tehamulê. An jî ev armanc kiriye. Lê belê di encamê de weke rêbazeke ji serdestan re xizmet dike, pergalê xurt dike, rist leyistiye .

Metafizîk bi şêweyê fikirîna felsefî, zanebûna tiştê ku em bi hestên xwe nagihîjinê ye. Ev zanebûn di jiyanê de bi cûreyên cûda derdikeve pêş me. Bergeha me ya jiyan û xwezayê bandor dike. Ji ber ku metafizîk taybetmendiyeke bingehîn ya merova ye. şêweyê fikirîna metafizîk berhemê zîhniyeta merov e .

Metafizîk weke jêderk peyveke Yewnanî ye. "Peyva meta ya tê wateya wêderê, ser û peyva physî-ka ya ku di wateye xweza, fizîk, made de tê şixulandin, vê peyvê pêk tînin .

Ev têgîn navê xwe ji "Andronîkosê Rodosî yê ku B.Z sedsala yekemîn de şopdarê Arîstoteles e" girtiye. Andronîkos pirtûkên Arîstoteles dixe nav birêzkirinekê. Yên di kategoriya yekemîn de weke "zanista xweza(fizîk)" dinirxîne. Her çardeh pirtûkên din jî navê "Meta ta physîka"(Ya piştî fizîkê tê) li wan dike .

"Di yekemin şixulîna metafizîk de, ji ber wateyeka ji têgihiştîna wêdetir hildigre, ev yek her diçe wê dikşîne derveyê dinê, vediguherîne têgihîştineke îdealîst û razdar ".

Têgîna metafîzîk bi sedsalan wateya xwe ya ji fizîkê wêdetir domandiye, car caran bi têgînên îlahiyat(olnasî), felsefe, hebûnnasî re wekhev hatiye şixulîn .

**3-Li ser Îdealîzmê:**

Îdealîzm; di wateya berfireh de, nêzîkayiya felsefî ya berpêş dike ku di gerdûnê de hemû pêvajoyên hêzên ruhî, bûyer û diyardeyan nîşan dike. Îdealîzm her tiştê heyî bi "raman" ve girê dide. Ji xeynî fikir hemû rastiyên objektîf red dike. Berpêş dike ku ji xeynî raman tu hebûn û rastiyên madî tune ne. Di taliyê de

yê madî weke sawînekê dinirxîne. Îdealîzm di vê wateyê de li dijaliyê ferasetên "rastîbînî, daringperestî(meteryalîzm) û siruştîparêzî" cih digre .

Îdealîzm, li bingeha her tiştî raman bicih dike. Avakerê esasî yê vê felsefê Platon e. Platon, "nazariya cihana îdeaya" bingeha felsefeya îdealîst ava dike .

Îdealîzm her tiştê li xwezayê, heyberan, cewhera her tiştî, weke dîmenên cûda yên yek hêzekê tesawûr dike. Hebûnê weke bitûniyeke tenê digre dest .

Rastiyê weke "îdea" dibîne û made weke sîtava wê dinirxîne. Dinyaya fizîkî weke sîtava îdeayê qebûl dike .

Her çiqas yê ku îdealîzm bibingeh kiriye Platon e, bi vê re bingeha wê digihîje heta fîlozofê Yewnana qedîm Ksenophanes. Ksenophanes yê zêde daxistiye Yekê û vê Yekê weke hemû fikirîn" diyarkiriye .

Ev raman, ji aliyê dibistan Elea ya ku Parmenîdes ava kiriye ve hin bêtir tê pêşxistin. Li gor dibistana Elea; "Hebûn naguhere û yek e. Kirde û bireser(tişte) yek û eynî ne." Li gor Platon jî, "rastî û hebûn, heyîna raman e".

Platon vê hîn bêtir pêş de dibe, weke "dinyaya îdeayan (dinyaya tê fikirîn) û dinyaya xuyaneka (dinyaya tê bihîstin) ji hev cûda dike. Dinyaya xuyaneka ji sîtava pêkhatî dihesibîne. Dinyaya îdeayan jî, weke rastiya naguher ya yekane û dinyaya rast digre dest. Platon bi vî awayî fikrandina xwedê jî weke felsefî bibingeh dike .

Platon gihîştina heqîqetê bi gihîştina vê dinyaya îdeayan pêkan dibîne. Ev nêzîkayî piştre ji aliyê Kant, George Berkeley û Davîd Hûme ve jî tê parastin. Ramanê îdealîst weke esasî ji aliyê Kant ve digihîje yekitiyê.

Berkeley felsefeya xwe weke "made nenasîn" pênase dike. Li gor wî: "hebûn, têgihîştine" Bi vî awayî her tiştî bi nêrînên hişk, olî yê dogmatîk ve girê dide. Di vê wateyê de metafizîk û îdealîzm perçeyekê rêbaza dogmatîk ya olî ne .

Metafîzîk, îdealîzm, hemû heyberên fîzîkî, bi temamiya yên xuyanek (berçav) ve bi teqez zihnê ve girêdayî, heta aqilekî di hişmendiya ku xuyanek û heyberan de ye nebe tinebûna heyînan dide pêş. Tê gotin ku; ‘’ heqîqet – heyberîtî di her mercê de girêdayî zihnê ye. Ji vî aliyê ve zanyariya rast a rastîtiyê encax û encax, pêşbînî dike ku serîlêdana çavkaniya hişmendiyeke ruhî (xwedayî) bide dikare bidestbixe. Hegel jî, îdealîzma dîyalektîk esas digre. Dîrok û fikir şopandina pêvajoyeke dîyalektîk dike û dide diyarkirin ku li ser vî bingehê pêşdikeve. Parastina vê wiha dike, ev pêvajo; ‘’gihiştina zihnê (geîst) an jî ruhê teqez wê bi dawî bibe’’.

"Diyalektîk, pêvajoyeka fizîkî "mutleq" ya ku hemû cûdahiyên dixuyên digihîjin yekîtiyê ye, yê hemû tiştê heyî dixwe de kom dike." Li gor Hegel; merhaleya yekemîn "rihê subjektîf" e û yek bi yek di jiyana merovan de îdeya ku hîn temam nebûyî ye. Merhaleya duyemîn "rihê objektîf" e û li vir xwe weke civak, dîrok û dewletê pêk tîne. Merhaleya sêyemîn "rihê teqez" e û li vir bi bitûnî digihîje hişmendiya xwe û xwe bi huner, ol û felsefê re nemir dike. Îdealîzma subjektîf, "heyîna objektîf" weke

berhemê hişmendiya merov dibîne. Çavkaniya heyînê tîne ser rihê merovî. Made bi giştî weke berhemê fikrandinê dihesibîne. Ev herdu îdealîzm jî metafizîkin û di pirsgirêka bingehîn ya felsefê de "rih" weke diyarkera esasî dinirxînin. Herdu jî "muxlaqparêz" in .

Ji Protagoras, Pyrrhon, Aînesîdemos, Arkesîlaos û Karneades yên ku gumankeriyê weke rêbaz dişuxilînin heta hemû gumankerên Sokratesparêz, hemû jî ji ber parastina fikrandina subjektîfî xwe ne dane alî .

Rene Descartes, metafizîkê û heybera(tişte) weke sewira(dizayn) zihnê merov qebûl kiriye û bi gelemperî îdealîzma subjektîf parastiye .

Pozîtivîzma(diyardeparêzî) Aûgûste Comte jî xwe dispêre heman ramanê. Li gor diyardeparêzan " yekane agahiyên bê navbeynkar ji me re hatiye dayîn diyarde, bi gotineke din tegihîn û hestên me ne".

Heîdegger bi gotina "Gerdûn encax qasî ku di hindirê wê de merov hene di wê radeyê de heye." vê îdealîzma subjektîf îfade dike .

**3-Di Şîrovekîrina Gerdûnê de rêbaza Metafizîk:**

Merov di dîrokê de her tim bi pirsa "gerdûn çawa, kengê ava bû?" re eleqedarbûne. Ji ber vê yekê her tim di nav lêgerîn û lêkolînê de bûne .

Li civak û xwezayê guherîn û veguherînê kifş kiriye. Jêderk û sedemên vê lêkolîn kiriye. Ji xeynî yê şênber, yê bi dest tê girtin, bi çav tê dîtin, bi guh tê bihîstin, bi ziman tê tamkirin, ji xeynî yê weke şênber tê ferqkirin, qadeke cûda ya heyînê heye an tune ye, li ser vê fikiriye. Ger hebe di navbera ya pirjihmar şênber û hebûna nayê xuyakirin de tekilî, pêwendî tê dayîn? Ha ev nêzîkayî qada metafizîkê pêk tîne .

Merov bi vê nêzîkayiye re dest bi "lêgerîneke hêza sermerovî û lêpirsînê" dike. Ev nêzîkayî bi demê re ji sewirîna fikrê yek xwedê re rê vekiriye. Bi vî awayî di lêgerîna heqîqetê de fikrê agahiyên rast ne di ya kû em fêm dikin û dibînin de, di ya xwedayî de ye, derxistiye holê û li ser hêmana naguheriya metafizîk hatiye rûniştandin. Di vê wateyê de gelek caran bi olnasiya metafizîk re wekhev hatiye nirxandin .

Ol çawa ku nayên hejandin û bêdawî ne, metafizîk jî heman zîhniyetê pêş dixe. ji sedsala 16. şûnde metafizîk di wateya hebûnnasî de tê bikar anîn. Weke agahiya tiştên dinyaya diyardeya derbas dike û têkiliya wê bi made re tune ye teşe digre. Di vê wateyê de metafizîk di gihîştina heqîqet û agahiya rast de berevajî rêbaza diyalektîk teşe digre .

Li vir dema weke rêbaza metafizîk tê dest girtin bi hebûnên derêsiruştî û fizîkê re têkilîdar e .

Arîstoteles, bi rêbaza metafizîk re heyîna derêxweza û made ye digre dest. Ev heyîna derexwezayê ya ku weke afirînerê her tiştî tê qebûl kirin, bêdawî, naguher û sabît e .

Xweza û civak her çiqas zindî û livdar e, diguhere û vediguher e, rixmê wê ev heyîna derêxwezayî naguher e, namir e, tune nabe

û bêdawiye. Fîlozofên Yewnan vê weke "hêmana bêdawî ya ji derveyê xwezaya di nav tevgerê de ye" diyarkirine .

Encax berî ku li ser bêçariyên rêbaza metafizîk rawestin, divê behsa têkiliya merov, civak û metafizîk bikin .

Heta têkiliya metafizîk û merov rast neyê fêmkirin, wê tenê bi aliyên li paş ve nirxandîn wê nefambar bihêle .

Nêzîkayiyên metafizîkî di dîrokê de her tim xwe pîroz kirine û weke heqîqeta yekane û bingehîn diyarkirine. Ji xeynî xwe tu heqîqet qebûl nekirine .

Dijberê wan jî wan înkarkirine, weke nerast, sefsete û xapandin şîrovekirine. Herdu jî li xalên serî nêzbûne. Herdu nêzîkayî jî li xwe negirtine ka "metafîzîk ji ber kîjan pêdivî û taybetmendiyên civakî-şexsî diqewime".

Metafizîknasên ku wê bilind dikin, pêwendiyê metafizîkê bi rastiya jiyanê, civak û cîhanê re înkar kirine. Rih bi tevayî ji made qut, razber dest girtine û made weke sawînekê şîrove kirine .

Yên girîngiya metafizîk înkar kirine jî, her tişt di yê madî de lê geriyane .

"Merov çawa dibe metafizîk? Ev ji kîjan pêwistiyê çê dibe? Aliyên wê yê erênî û neyînî çi ne?" kartêkerên mîna van li xwe ne girtine .

Halbûkî merov xwedî xisleteke metafizîk e. Ev taybetmendî jê re pêşwendiyke girîng bidest dixe. Ji ber kû agahî bidest girtin, agahî komkirin, fêrbûn, agahiyên xwe gihîştandina neslên pişt xwe xweseriya merova ye. Zanista rêbaz û zanyarî(epîstemolojî) bi saya taybetmendiyê merova yê metafizîk pêk tê.

Taybetmendiyên metafizîkî ji vî aliyê ve merov diperesîne û pêk tîne .

Merov qasî ku di asta metafizîkî de tê dahûrandin, di wê radeyê de pirsgirêkên civakî jî rast tên dahûrandin. Ji ber ku hemû raman berhemên zîhniyeta merov ya metafizîkin .

Beriya her tiştî divê ev were diyar kirin ku merov kirdeyê bingehîn yê agahiya ye. Hilberîn, afirandin, ferbûn, fêrkirin û veguhestina agahiya aîdê merova ye. Ji vê aliyê ve di rewşa kirde de ye. Nexwe bi zîhniyeteke qeba ya meteryalîst em nikarin bêjin metafizîk e û red bikin .

Ji ber merov hebûneke civakî ye. Metafizîk jî taybetmendiyeke bingehîn ya vê hebûnê ye. Exlaq, ol bi hemû şaxên xwe ve huner encama taybetmendiyên metafizîkî yê merovê sazûmanî û civakî ye. Ev dişibe pênaseya metafizîk .

Ger ev taybetmendî nebe, avayiya merov nayê hizirîn. Nexwe merov wê dakeve asta heywana. Ji wan tu ferqa wî/wê namîne. Wek mînak, merov an jî civaka ku exlaqê wê tune bûye, tê wateya gihîştiye ber heywanbûnê .

"Ger merov ji metafizîkê razber bikin, ya em ê wê veguherînin heywaneke zer yê super(Ev têgîna ku Nîetzsche ji bo Elmana şixulandiye li Elmanyaya Faşîst ya Naziya piştrast bûye.) an jî kompûtereke super. Çiqas şensê jiyanê ya merovahiya ku hatiye vê rewşê heye?" (Zanyarê Azad)

Li vir merov weke gerdûna biçûk, gerdûna ku ji aliyekê ve gihîştiye ferq û hişmendiya rastiya xwe ye.

"Merov weke gerdûna ku gihîştiya ferqa xwe, ji bo ku erjenga(him ji aliyê êşê him jî ji aliyê kêfxweşiyê) pê dihese

derbas bike, pêwiste xwe weke derê fizîkî înşa bike. Bi awayeke din nikare ji heqê êş û kêfxweşiyan derkeve".

Civak bê exlaq an weke civak hebûna xwe nikare bidomîne an jî bi tevayî ji cewhera xwe dûr dikeve û dibe heywan. Ev jî metafizîkê mecbûrî dike. Di dîrokê de hemû îqtîdarê xurt ji hev ketin û hilweşiyan. Îqtîdara Sovyeta sosyalîst bi nêzîkayiyeke li aliyê bindestan derket holê .

Şoreşa Sovyetê; Di dîrokê de tevgera herî mezin ya ku ser û bin bûye, di encama berdêlên mezin, şerên mezin û utopya, xeyalên mezin de hatibû avakirin. Rixmê vê emrê wê çima heftê salan derbas nekir? Bê guman gelek sedemên wê hene. Encax sedemeke herî girîng jî, exlaqa civakî ya xwe dispêre berjewendiyên civakê bixwe ava nekirina wê ye .

Qraltiya Babîl û Asûr, împaratoriya Roma rixmê hemû aqiltiya xwe hilweşîna wan bi kêmbûna exlaq re yekser pêwendîdar e .

Teknîk, îqtîdar û rêbazên zorê dibe ku civakê bike robot, bixe bin kontrolê, heta dikare bixe halê heywanên pêşketî, lê belê nikare civak weke civakê, merov weke merov bihêle. Ji ber ku merov û civakên bê exlaq hatine hiştin, neçarê belavbûn û hilweşînê ne .

Exlaq bi biryardayîna " hêza li ber êşa berxwedan û pêdiwiyên wê bicih anîn, ji zewk, hewes û şehwetê re sînor dayîn, zêdebûnê bi rêzikên ne fizîkî, civakî re girêdan, tercîxên di derbarê rêzik, ol, kevneşopiya pêkanîn an nepêkanîn" re têkilîdar e. Dîsa merov bi rêka hunerê gerdûneke xweser, ji nû ve, di asta bilindtir de, bi hêmayan(nîşe,sembol) diafirîne .

Civak di wateyekê de hebûna xwe bi wêje, deng, wêne, avahîsazî(mîmarî) ve didomîne. Civaka bê helbest, bê muzîk, bê avahîsazî, bê folklor(govend) tê fikirandin? Merov an jî civaka ji van mehrûm e ferqa wan ji heywana heye? Dîsa pêwiste hiqûq, ol, felsefe û polîtîka di heman vebirê(kategorî) de were dest girtin. Eşkereye ku afirîna li vê qadê taybetmendiyên metafizîk dihewîne .

Ger em destpêkê bala xwe bikşînin ser cih û girîngiya metafizîkê ya di jiyana merov û civakê de û piştre pirsgirêkan bigrin dest, bi vî awayî wê me bigihijîne encamên hin rasttir.

Metafizîk(derêsiruştî), li ser hebûnên li derveyê xwezayê heye, lêdikole û esas digre. Xweza rixmê ku di radeya bilind de zindî, livdar û guherbar e; hebûnê derêxwezayê teqez, neguherbar û bêdawî tê qebûlkirin. Ji ber ku zindîbûn û livdariya xwezayê bi neguherbarî, nelivdarî û teqezbûna hebûnên derexwezayî bi hev re nakokin, Fîlozofên Yewnanî mêcbûr man ku li derveyê xwezaya ku liv dide jî hêmaneke bêdawî bicih bikin".

Di jiyana rojane de li sûk, bazar û kolana em pir caran dibihîzin. "Wisa hatiyê wê wisa biçe", "Ev gel nabe merov", "Ez wisa me, naguherim" "Ez çibim ew im"

Em di ferqa wê de bin an jî ne di ferqê de bin, bi hişmendî an jî bê hişmendî ev nêzîkayî rêbaza metafizîk tîne ser ziman. Îfadeya bi rêbaza metafizîk nêzîkbûna bûyer û diyardeya ye .

Ji ber ku rêbaz û terzê metafizîk, guherîn û veguherînê sînordar dike. Diyardeyan weke naguher digre dest û ji hev cûda dike .

Fîlozof Heraklîtosê ku dibêje "Her tişt diherike, di heman çemê de di cara nayê şûştin"; dema ku gihîşt ferqa rêbaza diyalektîk, dibêjin bi gotina "min xwe kifş kir" diqîre. Her hal ev axaftineke qasî Firat kûr û bi wate ye. Di rastiyê de Heraklîtos xwe kifş kir an na, nayê zanîn. Encax, merov bi hezarê salane di nav lêgerîna xwe kifşkirinê de ne .

Heraklîtos, murîd û yên wî bişopînin nedixwest. Wî tenê xwebûna merov tewsiye dikir. "Heraklîtos dişibîbe fanosa bahrê, derdor ronî dike, ji keştiyê re nîşan dide ka kuder qerax(berav) e an jî zinar e. Lê balkêş e bang nake ku biçin gel wî. Yên din jî dişibin zengilxaneyê. Wisaye ku her tim banga ba xwe dikin." Li vir lêgerîna heqîqetê mîna çemekî domdarî û herikînê pêşkêş dikeve. Ksenofanes berevajkî wê bingeha hebûnê "weke xwedayê naguher" diyarkir. Di teşedana fikrê naguheriye de bû fîlozofê yekemîn .

Di lêgerîna heqîqetê de aliyên madî red dike, tenê bi aliyên fikrî ve tevdigere. Her tiştî bi hêzên derêsiruştî ve girê dide. Ji vê aliyê bi rêbêzan olî re dibe yek .

Parmenîdes jî tezê " bi tenê rêka raman gihîştina rastiye" pêşxist. Platon û Arîstoteles jî ev ramanên metafizîkî ji pir aliyan ve kûr kirin û sîstematîk kirin .

Rêbaza metafizîk, bi bandora olên semawî û bi hevgirtina îqtîdarê re di nav civakê de çalak bû .

Li gor metafizîkê; rêka gihîştina zanebûna rast û heqîqetê, ji fikrandinê derbas dibe. Bi vê re sînordar namîne, digihîje encama, rastî bixwe jî fikir e. Her tiştî bi fikir re dixe wekhev. Lewma metafizîk ji nêzîkayî "her tişt ji xwedê tê" dikeve

tevgerê. Bûyer û diyarde bi hêzen derêfizîkî tê îzahkirin. Li gor vê rêbaza guherîn û veguherîn tune ye. Li hember pirsa em ji kuderê tên emê biçin kuderê, dibêje bi mantiqê "xweza çawa hatibe afirandin, di nav westariyeke(sabîtî) wisa de ye." livdarî .

Rixmê ku ol û rêbaza metafizîk bi yek bûne, yên metafizîk esas digrin ne tenê yên oldarin. Yên bi îqtîdarê re hevgirtine, domdarî, naguherî û bêdawîtiya îqtîdarê diparêzin, hemû beşên ku pirsgirêkê di nav têkiliya "ebed-wext" de digrin, rêbaza van hemûyan jî metafizîk e. Li vir guhertin tune ye. Ji ber ku naxwazin îqtidar biguhere. Fikir jî li gor vê tê vesazkirin. Bi vê re neguherîna kedxwarî, koletî, pergala heyî di mejiyan de bicih dikin. Nêzîkayiya ev pergala koletiyê "wisa hatiyê wê wisa biçe" serdest dikin .

Ev tê vê wateyê; "Ey yên tên wêderkirin, ey koleno, ey bindestno rewşa hûn dijîn çarenûseke. Naguhere. Lewma, ji bo vê hewce nake hûn tekoşîn bidin." Ev nêzîkayiyeke çarenûsiye .

Rêbaza metafizîk her tiştî di nav kêşeya reş-spî de, hepsî nav qaliban dike. "Tiştek an wisa ye, an wiha ye. Di heman demê de him wisa him wiha nabe. Merovek an başe an jî xirabe." Halbukî ji xeynî taybetmendiyên kirêt, xirab yên merovekî/ê taybetmendiyên wî/wê yên erênî û xweşik jî hene. Nexwe merovek ne baş e ne jî xirab e. Vê yekê hin zêdetir sekna wî/wê ya di nav lêgerîna heqîqetê de diyar dike. Civaka lê dijî, teşe girtina kesayet, rewşa ruhî ya wê demê hwd...

Ev derdikeve holê. Rêbaza metafizîk; naguherî, westarî esas digre. Livdarî, guherîn û veguherînê zêde li xwe nagire. Ji nêzîkayiya "li bin rojê tu tiştê nû tune ye" dikeve mijarê û

bêdawîtî, nugheriya pergala sermayedar(kapîtalîst) diparêze. Bûyer û diyardeyan ji hev qut, ji hev razber digre dest. "Tiştek an ev e, an jî ew e. Di heman demê de him ev him ew nabe." bi vê mentiqê destpê dike. Tişta weke mîsoger û naguher digre dest. Xwe dispêre zîhniyeta "tiştek çibe wê ew be û wê wisa bimîne." Dibêje "hebûnek(pisîk) an zindiye an jî miriye" Halbukî di ceribandina "pisîka Şrödînger" ya binavûdeng de pisîk him sax e him jî miriye. Îhtimal nîvenîv e. Metafizîk bûyer û diyardeyan bi vê mantiqa naguherî û bêdawîtî, her tiştî di nav qaliban de digre dest û dogmatîk dike. Encama ku divê ji vir were derxistin; metafizîkê ne bigiştî qebûlkirin ne jî redkirin e .

Bêguman em na mahkûmî metafizîka ne. Lê belê em nikarin dev ji ya herî baş, herî xweşik û herî rast peydekirin û pêşxistinê biqerin. Ger mahkûmî xirabî, kirêtî, xeletî û koletiyê bûyîn ne çarenûs be; terzê jiyaneke baş, xweşik, azad û rast jî mimkin e. Em ne mecbûrî vebijarka herî xirab -jiyana nîhîlîstin(naparêz) ya ku bêçaretî û bêberpirsyariya, di serî de modernîteya kapîtalîst û hemû pergalên çînatî-dewletî jê re rê vedikin. Di vê mijarê de tekoşîn qasî dîrokê kevne, ji serdema înşakirina civakê ya ewil heta niha didome .

Weke encam, rêbaza metafizîk, dijberî rêbaza diyalektîk meteryalîst e. Avabûn, pêşveçûna dinya û gerdûnê hewl dide bi fikrên cûda rave bike .

Ji vê aliyê ve rêbaza metafizîk, di tiştan de cewhereka naguher û bêdawî heye dibêje. Wisa nîşan dide ku yê diyarker ev cewher e. Ev naguheriya bêdawî wê dibe ber fikrê xwedayekî "ebed-

mubed" e. Ev di pratîkê de pergalên kedxwarî û îstismar xwe weke "ebed-mubed" îlankirinê re şênber dibe .

Metafizîk rastiyê ne bi diyardeyan bi tenê weke pevxistî digre dest. Li gor vê hemû berrahiya tişta ji sawînekê pêk tên û demkî ne. Ya mayînde cewhera bêdawî û naguher e. Ji bûye û diyardeyan re nêzîkayiya metafizîk teng û sînordar e. Têkiliya di navbera parçe-tevayî de li xwe nagire .

Hemû tişta westar, nelivdar digre dest. Di navbera tişta de rastiya bandorkirin, guherîn û veguherînê qebûl nake. Metafizîk ji dîrokiyê dur e û xwe dispêre hebûna ya naguher-teqez.

"Me cotek pêlaveke zer kirrî. Piştî demeke diyar, piştî gelek selihînên binî û paniya wê, pîne hwd. bê kû ferq bikin ku ev ne heman pêlav e, dîsa em dibêjin ez ê pêlava xwe ya zer bixim lingê xwe." Lê belê em ji nişka ve guherîna pêlava xwe girîng nabînin, weke ku qet neguheriye, weke heman pêlavê qebûl dikin." (G. Polîtzer)

Di jiyana pratîk ya rojane de nêzîkayiyên ku pir caran em dişuxilînin yên bi vî awayî weke cewher nêzîkayiyên metafizîk in. Ev bizanebûn an bêzanebûn di encamê de tişta bêguherîn dest girtin e. Pêlava me ya zer kevin bûye, guheriye dibe ku êdî nayê şixulandin, lê em her tim wê weke berê digrin dest. Ger bala xwe bidin ser di vê rêbaza de livdarî, guherîn, veguherîn nayê dîtin .

Nexwe rêbaza metafizîk, rêbazeke livdariyê, guherîn û veguherînê, tekiliya di navbera tişta de nabîne. Eşkereye ku bi vê rêbaza gihîştina lêgerîna heqîqetê nepêkan e. Ji ber ku li vir heqîqet hêza derêsirûştî ya mayînde û naguher e. Heqîqeta yekane ew e. Ev tê çi wateyê؟

Ev tê wateya pergala ku serdestan avakiriye naguher û mayînde dîtinê .

"Ji bêdawîtiya sermayedariyê, bawerkirin kêmasî û xirabiyên(xirabûna exlaq, takekesî, hovîtî hwd) ku sermayedariyê di merova de avakiriye, weke ku her tim wê hebin bawerkirin, mîna metafizîkiyan fikrandine. Yên metafizîkî di xeyalê xwe de meroveke bêdawî, yanê naguher disewirîne."(G. Polîtzer)

Rêbaza metafizîk ji ber ku hebûnê derêsiruştî weke naguher, naveguher qebûl dike, objektîfiyê weke sawînê digre dest. Lewma merov ji civakê, civak ji xwezayê, xweza ji gerdûnê cûda, serbixwe digre dest .

Li vir metafizîk, "yên di rastiyê de ji hev naqetin, li ser kêfa xwe ji hev diqetîne. Merov di rastiyê de berhemeke dîroka civaka ye. Merov ne li derveyê civakê ye, encax di nav civakê de ye. Rêbaza metafizîk, yê di rastiyê de yek e ji hev cûda dike. Tişta weke mîsoger(naguher) dabeş dike".

Wek mînak dibêje; Pirsgirêka Kurd cûda ye, tevgera Kurd cûda ye. Bi mantiqa çareseriya pirsgirêka Kurd cûda ye, demokratîkbûn cûda ye, tevdigere. Bêguman pirsgirêka Kurd, demokratîkbûn û Tevgera Azadiya Kurd diyardeyên cûda ne. Lê belê her sê jî di nav hev de ne û bi hev re başebaş girêdayî ne. Ji bo yekê bigrin dest divê yên din jî bigrin dest. Li gor vê rêbaza tiştek an spiye an jî reş e. Navîna vê tune ye. Halbûkî bê ku pirsgirêka Kurd çareser bibe demokratîkbûn pêşnakeve. Rêbaza metafizîk, eşkiya Procrustê di mîtosa Yewnana de tîne bîra merov .

Procrust rêbirekî merova dişelîne, xirabiya dike ye. Bi kirina xirabiya navûdeng bûye. Ev rêbir kesê ku digre, rêwiya destpêkê dişelîne piştre li ser livînên hesin dirêj dike .

Rêbir Procrûst, rêwiyên ku digre(qurban) ger li ser livîna bicih nebe, lingê wan li gor bejna livîna qut dike û bi livîna re lihev tîne. Ger lingê rêwiya-qurbana ji livîna kin be wê demê lingê wan vedizelîne û dirêj dike. Bi vî awayî her kesî dike yek şikil .

Rêbaza metafizîk hinek jî bi vî awayî nêzî pirsgirêka dibe. Îqtîdar îro bi nêzîkayiyeke metafizîkî çareseriya pirsgirêka Kurd digre dest. Mîna Procrûst. Çareseriya pirsgirêka Kurd li ser livînên hesin yê netewperestiya Tirk dirêj dike .

Encax qebûl nake ku Kurd ne Kurdê berê ne. Ha helwest û encama nêzîkayiya metafizîkî afirandiye ev e. "Înkara guherînê, ji hev qetandina yên jihevnaqetin, ji derve hiştina dijberan..." xeta rêbaza metafizîk pêk tîne .

## D) RÊBAZA ZANISTÎ:

"Em di bin gefên yeknesakî û bêganetî de ne".
Francoîs Jacob

**Destpêk:**

Yeknesakî, yekkirin, bêganetî(guhnedêr) û li hember pirsgirêkên civakî bêxemî, afirandina sermayedarî û rahîbên zanista di mîhwera îqtîdarê de ye. Sermayedarî li hember pirsgirêkên civakî, şexs û civaka guhnedêr, bêxem û bêberpirsiyarî diafirîne. Hewldide ku şexs ji civakbûnê razber bike. Civakeke ji nirxen civakî exlaqî dûr ketiye, xerîbê xwe ye "dijpolîtîk" ava dike .

Ev ji hêla afirandina civaka wekhevîparêz, azadîxwaz, demokratîk û exlaqî ve tê wateya xeteriyeke mezin. Bigiştî sermayedarî bitaybet jî rêbaza zanistî ya di mîhwera Rojava de; biyeknesakî, rêzikên neguher û quralên xwe ve ji vê re xizmet dike. Zanist ne ji merovahî, heqîqet û azadiyê re ji kulmek serdestên xwedî yekestiyê re xizmet dike. Zanista mêtinker ya Rojava, zanyarî û rêbaza zanistê; bi pere, ragihandin û hêza çekan re dibe yek û dikeve rewşa koleyê sernerm, îteatkar yê îqtîdarê. Zanista mêtinkar ya Rojava, veguheriye rêbir Procrûst. Bigiştî afirandina civakeke azad, bitaybet jî rêya gihîştina heqîqet û azadiyê qut dike. Kesên serdest, nirxên wekhevîxwaz, azadîxwaz yê ku merova weke dîrokî civakî ava kiriye, "li ser livînên hesin yê zanista metinkar a Rojava dirêj dike. Aliyên

dirêj tên qut dike, aliyên kurt tê dikşîne û dirêj dike. Her tiştê ku li ev livînên hesin nayê, bi gotina "dijberî zanistê ye" wêder dike. Roja îro zanista Rojava li gelek qadan ji aliyê merovahiyê ve vediguhere cenawirekî .

Modernîteya sermayedar bi vî awayî, "bi alîkariya rêbaza zanistî, aqilê nêr-zekaya analîtîk, civakeke di xizmeta serdestan de ye, serî ditewîne û îtaet dike, biteşe dike. Bêrî feraseta çî rast e, çi şaş e; çi ji sermayedariyê re xizmet dike an nake esas digre .

Bi şoreşa senayiyê re "rêbaza zanistî" ya siltewî ya ku cihê rêbaza olî girtiye, di serî de rêbaza olî, hemû rêbazên kevneşop yê zanistê xist nav pirsiyariyê û rexne kir. Ji her yekê re sedemek dît û li derve hişt. Bi reform(guherîn) û ronesansê re li hember dêrê şerên mezin pêşket. "Rêbaza zanistê" û rêzikên fizîkê yê Newtonî bûn serdest. Hemû rêbazên agahiyan û zanistên kevneşopî yê ji pergala kedxwarî û koletiya Sermayedariyê re xizmet nake gotin "kêr nayê" û avêtin koşeyekê .

Taybet ber bi dawiya sedsala 19. ve bi merhaleya mêtinkar ya sermayedariyê re, rêbaza zanistê jî yekdest bû, dest bi xwe spartina hêza çeka kir û ket xizmeta hêzên mêtinkar. Yekemîn şerê cîhanê û bombeya ku di vî şerî de hate bikaranîn vê rastiyê ji serî heta binî dide ber çavan. Em wisa bawer dikin ku li vir li şûna têgînên "rebazê zanistî, rebazê zanistê, zanista Rojava" têgîna "zanista mêtinkar ya Rojava" were bikaranîn wê rasttir be .

## 1-**Rêbaza Zanistî çiye؟:**

Nexwe di vê merhaleya ku em gihîştinê û bi encamên xwe ve "rêbaza zanistî" yê ji sermayedariyê re xizmet dike, xwe dispêre diyalektîka "kirde-bireser(tişte)" tê wateya çê؟

Rêbaza zanistî herî hêsan û di cewher de xwe dispêre rêbaza Newtonî yê mekanîk. "Li gerdûnê cavdêriya diyardeyekê (xuyanek, fenomen), di derbarê vê xuyanekê de bi çavdêriyan hîpotez(feraziye)ên hevgirtî encax ne mîsoger rave kirin, ji bo texmînkirina şixulandina hîpotezê, bi cerbandin û çavdêriyê din testkirina texmîna, li gor encama di hîpotezê de guhertinên pêwist kirin, heta ku di navbera hîpotez û ceribandinê de nelihevkirin nemîne dubarekirin, dema ku bigiştî lihevkirin pêk were hîpotez vediguhere nazariyeke ku li ser ceribandin, fikrandin pêkane. Bi vî awayî grûba pêşniyazên ku beşeka xuyaneka rave dike, hêsanî tê fêmkirin û lihevgirtiye, tê avakirin".

Rêbaza zanistî mîna ji vir jî tê xuyakirin; di çerçoveya hin rêzikên westar(sabît) yên berê hatine diyarkirin, qaîde û hêmana de tê meşandin.

## 2-Avakerê Rêbaza Zanistî:

"Rixmê ku ev zanist, pergalên mezin ava kiriye, cîhan bi şikilekî herî zêde ravekiriye, mîna ku Kantê damezrînerê wê yê herî mezine dibêje, îro hîn jî pîvaneke mîsoger ya vê rêbaza yên ku ya esasî ji ya axaftinê vale cûda bike, tune ye. Niha ji bo ku

vê pîvanê bi deyn bigre berê xwe dide zanistê. Di ser de jî tiştê ji zanistê bi deyn dixwazê, îdîa dike ku milkiyeta wê aîdê xwe ye .

Di vê wateyê de "felsefe mîna dayîka hemû zanista" tevayî bûyereke modern e. Di nav pêşveçûna wê ya dîrokî de bê ku biryar bidin ka vê carê rêka rast dîtiye an na, ji bo gihîştina vê biryarê wê di dîrokê de bê kû lêkolîna wê bikin û derxin holê, rêka nîqaşkirina rast tune ye".

Ev herdu fealiyet, têkiliya di navbera têorî(nazarî) û pratîk(çalakî) de eşkereye. Kant û Robespîerre tevayiya diyalektîkî ya heman pêvajoyên dîrokî ya ku hevdû temam dikin e. "Kant serê xwedê difirîne, Robespîerre yê qral..." Herdu jî tekabulê heman merhaleya dîrokê ye. Ev merhale li Elmanya weke nazarî, li Fransa jî weke çalakî xwe diyar dike .

Weke encamên xwe herdu jî ji heman çînê re xizmet dikin. Robespîerre nûnerê kijan çînê be, Kant jî nûnerên wê çînê ye. Feraset û zîhniyeta serdestiya yekî tê çi wateyê û ji kî re xizmet dike, çavkaniya îlhama yê din jî ew e. Herdu jî tehakkûmê raber dikin .

"Serdema xwedayên bi maske û qralên nixumandî" cihê xwe ji "serdema xwedayên bê maske û qralên tazî" re dihêle. Li pêvajoya derbasbûnê di navbera herduyan de ji her alî ve nakokî û pevçûnên bêeman hene. Kursiyê zêr yê ku qral û xwedê vale dike, li şûna wan nûnerê çîna burjûwa ya ku li ser kêşeya "kirde-tişte" bilind dibe dirûnên. Çîroka li şûna olnasiyê cihgirtina felsefê jî hinekî bi vê yekê re girêdayî pêş dikeve .

Tevgera çiptaziya hemû Ewropa dilerizîne. Çalakiya Robespîerre cîhanê diguherîne. Çîna nû ji bo ku li cihê ku qral û xwedaya vale kiriye birûnên seriyan difirînin. Giyotîn(qinare, amûreke serî birinê yê serdema navîn) bênavber dişuxilin. Ji çalakî û hêza çiptaziyên ku bi şîara wekhevî, azadî û bratî dikevin tevgerê, bi hostatî sûdwerdigre. Kant jî, dest bi ji nû ve şîrovekirina cîhanê dike. Bi çalakiya xwe ya şîroveyî ve guhertina "serdema xwedayên bi maske û qralên nixumandî" armanc dike .

Pêwistiya Robespîerre bi Kant ya Kant jî bi Robespîerre heye. Çimkî ji bo Kant cîhana paldaye felsefeyê biguherîne pêwistî bi hêzeke civakî re yekbûnê hebû. Ev hêz jî di şertên wan rojan de di Robespîerre de kom dibû. Ev hêza civakî, "tevgera çiptaziya" bû .

Ev yekîtî axaftina Marks tîne bîra merov. Marks, "Felsefe, bê ku proleterya(karkerî) ji holê rake, pêk nayê. Proleterya bê kû felsefeyê pêk bîne ji holê narabe. " dibêje. Belê, "yekîtiyeka ji bo ji holê rabin..." derdikeve holê .

## 3-Dogmatîzma Rêbaza Zanista Mêtinker ya Rojava:

Ji bo gihîştina heqîqet û agahiyên rast dibe ku rêbazeke diyar pêwist be. Encax ji bo gihiştina her agahiyê di heman rêbaza de îsrarkirin, bi heman rêzikan tevgerandin, ji dogmatîzmeke hişk ya olî re rê vedike. Di rêbaz de dogmatîzm, digihijîne encamên şaş û çewt. Rêbaza zanistî her çiqas di lêgerîna heqîqet û

zanebûnê de siltewî û yekdest dibe, ji hemû rêbazên derveyê xwe re dibêje "derveyê zanistê " û mehkûm dike .

Ev dogmatîzm di gihîştina heqîqetê de ji rê derketineke. Ji ber ku di gihîştina heqîqetê de weke yekane rêka rast "rêbaza zanistî" berpêş dike .

Li gorî vî; ‘’ji dîrok, civak û merov, têkiliya civakî – merov, nirx –exlaq û ji bilî ku ji berjewendiyan serbixweye, jê tê bawerkirin ku gerdûnî nesneyi ye bi hişkbaweriya parastina rêbazeke zanistî dike û bi vê riyê xwe tîne rewşa rewakirina îdeolojiya entelektüel.’’ (H. G. Gadamer)

Dogmatîzma rêbaz ya zanista Rojava, zanistên xwezayê û zanistên beşerî di heman kalib û pîvanan de digre dest. Kevneşopiya Hermeneûtîk û dîrokîtî xwedî heq e ku li dijî vê wekhevkirin û dogmatîzmê derdikeve .

Rêbaza zanistî ya xwe dispêre diyalektîka "kirde-bireser" weke îfadeya herî zelal ya kevneşopiya "modern, aqilparêz û pozîtîvîst" "li kirde xweseriyeke epîstemolojîk" bar dike û tîne rewşa bijartî. Epîstemolojiya "kirde" ya di felsefeya modern de ji Descartes heta niha xweseriya xwe diparêze .

Dîsa di kêşeya kirde-bireser de "zanebûna objektîf ya zanistî bilind dike" xwezayê bigiştî ji bo merov bitaybet jî ji bo kedxwariya sermayedar dixe amûr .

Felsefeya modern ye berpêş dike ku xwedî qabiliyeta gihîştina zanebûna zanistî û mîsoger ya xwezayê ye, "kirde-merov" di asta xwedê de bilind dike û li ser cîhanê serdestiya wî ya teqez armanc dike. Serdestiya li ser cîhanê ya teqez; tê wateya hakîmiyeta kulmek çîna kedxwar û serdest .

Diyalektîka kirde-bireser, nêzîkayiya li hember kirde ya zêde, fîşal, xîsleta zêde lê barkirî, "bireser-xweza" dike tiştik. Ev nêzîkayiya îcada aqlê zanistî, zekaya analîtîk, ji xeynî komek kesên serdest, xwedî yekdestî, her kesî dike tiştik û dixe amûrê kedxwariyê .

Ev nêzîkayiya ku zanista Rojava li ser navê "rêbaza zanistî" pêşxistiye, mimkine ku weke "dogmatîzma rêbaz" jî binav bikin. Dogmatîzma rêbaz; berpêş dike ku yek aqil, yanê aqlê zanistî, yek çeşîdê agahiya, yanê agahiyên zanistî heye. Ev zanebûna zanistî jî ji zanistên xwezayî tê bidestxistin. Zanebûna zanistî, zanebûneke xwe dispêre rêbaz e. Rêbaza zanistên xwezayî teqez dike û wergiriya vê rêbaza qasî ku li zanistên beşerî jî pratîk bike, berfireh dike. Ev nêzîkayî helwesta nêzîkayiya aqilparêz û pozîtîvîst îfade dike. (H. G. Gadamer)

**4-Di lêgerîna Heqîqetê de Gumankerî:**

"Tiştekî ku mîsoger e heye. Ji rastiya tiştekî gumankirin. Gumankirin fikirîne. Fikirîn jî heyîn e. Nexwe heyîna min bêguman e. Difikirim nexwe heme. Zanebûna min a yekemîn ev agahiya saxlem e. Ez niha dikarim hemû zanebûnên din ji vê zanebûnê derbixim. Zanebûneka min tenê heye ew jî tu tiştî nizanim e".

Li heqîqetê gerîn, gihîştina zanebûna rast, ji dîrokê heta niha weke pirsgirêkeke bingehîn berdewam kiriye. Ji bo gihîştina zanebûna rast gumankerî jî weke rêbaz û amûr hatiye şixulandin.

Descartes hin pêşdetir çû û "gumankeriya mêtodîk(rêbazî)" pêşxist. Ev, "gumankeriya Descartes e".

Encax kokên gumankeriyê heta kûrahiya dîrokê dirêj dike. Fîlozofên Yewnan yên ne mimkiniya bidestxistina agahiyên rast û gihîştina heqîqetê berpêş kirine û bi guman nêzî vê bûne, herîkîna gumankerî pêşxistine. Ji aliyê Pyrrhon B.Z sedsala 4.,Karneades sedsala 2. û Aenesîmedos sedsala 1. hate pêşxistin. Pascal ji bo ku gumankerî bîne ser ziman gelek caran têgîna "Pyrrhonîtî" bikar anî. Gumankerî; "Doktrîna berpêş dike ku zihnê merov bi şikilekî mîsoger wê tu demê negihîje agahiyên rast."(Andre Lalande). Ev nêrîn ji her tiştî guman girtinê ferz dike. Ev jî encama bi ti awayî bi şikilekî mîsoger negihiştina agahiyên rast derdixe ji ber vê jî encama tu tiştê teqez yê rast tune ye, derdixe holê .

Gumanker a (septîk)îddîa dikin ku di jiyana rojane de agahiyên xwe dispêrin ceribandin û sehên me xapînokin. Yekemîn pêşengê vê ramanê fîlozofên mîna Heraklîtos, Parmenîdes û Demokrîtos in. Yekemîn yên gumankeriyê pêşxistine Sofîst in. Encax di gumankerê Yewnana kevin de Pyrrhon ev bitanzîm kir û veguherand herîkîna felsefî .

Demokrîtos, digot;rastî, berrahî û heqîqet ji atomên biçuk yên qasî ku bi çavan nexuyên pêk tê. Seh jî çavderiyên giştî yên ku ne çawaniyên rast yên tişt û gerdûnê ne pêktîne, ji ber vê jî gumankerî pêş dixist .

Heraklîtos, "di heman çemê de du cara nayê şuştin", "her tişt her tim di nav tevgerê de ye" Encax sehên me ji ber ku şewqa guherînê nade me, ava ku diguhere em her tim mîna ava westar

dibînin. Ger guherîn, veguherîn, tevger domdar be, agahiyên me jî wê her tim biguherin. Digihişt vê encamê .

Parmenîdes jî pirsgirêkê berevajkî digirt dest. Digihîşt vê encamê. Tişt-dinya-gerdûn rixmê ku naguherin, seh me dixapînin û weke ku her tim di nav guherîn û tevgerê de ne nîşan dide. Mînak, "pelê kesk, dibe zer, pênûsa ku digrim destê xwe kevin dibe. Tiştekî ku her tim tevdigere em nikarin jê re bêjin "mutleqa rast e." Ji ber ku li gor hêmana wekhevîbûnê "tiştek çi be ew e ".

Dîsa Zenonê ji Elea, "li hember pirî yek jê piştrasta ku berpêş dike piştrasta deraxe(girse) ye. Zenon ji kesên li pêşberî xwe re deraxeyeke genim nîşan dide. Li wan dipirse, ez libek ji vî genimî bigrim wê dîsa weke deraxe bimîne? Yê li pêşberî wî jî ger bersiva erê bide, wê demê dibêje ez ji vê deraxeyê genimekî bigrim yê dimîne dîsa deraxe ye. Piştre genimekî din jî bigrim, yê dimîne dîsa deraxe ye. Dema ku genimê dawî bigrim, li gor pîvanê te tineyiya dimîne lazime dîsa deraxe be"dibêje. Weke berevajiyê vê pirs dike genimek tenê jî deraxe ye? Yê li pêşberî wî ger bêje na, 'nexwe ez libeke din bixim ser vê libê. Piştre libeke din... Li gor pîvanên te divê tu demê ev nebin deraxe' dibêje".

Encama tê gihîştin ev e; "Rastiyek, bê ku piştrast hebe, weke rast nayê qebûl kirin." Têkilîdarê vê rastiyê dema ku "piştrastek" deynin holê, tê gotin "piştrastê piştrasta xwe piştrast bike". Ev heta dawî wisa diajo. Ji ber ku her tişt bi tiştên din re di nav têkiliyê de ye û ji bo ku em tiştekî biçûk bizanin divê, bi hemû gerdûnê re têkiliya wê bizanin. Em tevayîiya tu tiştekî nizanin,

ev tê wateya ku em tiştekî nizanin." Nexwe; ji ber ku em ji piştrasta ber bi piştrasta heta dawî nikarin biçin, ji ber vê jî zihn her tim bê ku piştrast hebe, saweke hêsan ya piştrast nebûye, weke xala destpêkê qebûl dike".

Protagoras dibêje; "merov pîvanê her tiştî ye." Sokrates jî vê yekê; "Carna heman ba ji hindir ve me dilerizîne, yên din na lerizîne. Ev nehatiye serê we? Nexwe bi tenê di derbarê bayê bixwe de emê çi bêjin? Ew teşe e an ne teşe e? An jî mîna ku Protagoras got, ji bo ew merovê dilerize teşe e, ji bo merovê nalerize ne teşe e?"  bi vî şikilî digirt dest .

Li gor gumankera, tişta bixwe na encax dîmenên wan yên xapîner yên ku xwe dispêrin hêsa dibînin. Li gor vê nêzîkayiyê em nikarin têbigihîjin avayiya rast ya tişta. Nexwe em nikarin li hember tişta hukmeke(darazî) mîsoger bidin. Gihîştine vê encamê ku ev rêya digihîje heqîqet û bextewariyê .

Di fîlozofên Yewnana kevin de "gumankeriya teqez" ne xaleke derketinê ye. Hin bêtir encama ku "di serpêhatiya zanebûnê de weke neserketîbûnêkê" derketiye holê ye. Di encama nakokiyên bi hevre yê ramana, wisa berpêş kirine ku têgihîştina rastiya gerdûnî û yekane ne pêkan e" Di vê xalê de di asta herî jor xwedî nêzîkayiyeke reşbînî û dudilî ne .

Ev kesên ku nazariya "yekemîn gumankerî- gumankeriya pêhesîtî" pêşxistine ne. Gumankerên ku li akademiya platon gihîştine jî weke "gumankeriya akademiyê" hatine binavkirin. Piştî ronesansê zanyarên xwezayê ji van bandor bûne.

Pyrrhon di gelek seferên leşkerî de bi Îskenderê mezin re hevaltî kiriye. Montaîgne ê ku ji gumankera bandor bûye jî bi

heman şêweyê Elmanya û Îtalya ziyaret kiriye. Rêka berhevdana pergalên cûda şixuland .

Pascal jî hemû doktrînên gumankerî ji nû ve girt dest û gihîşt encama "tiştê li vî aliyê Pîreneyan(çiyayê dinavbera Fransa û Îspanyayê de) raste li aliyê din şaş e"

Descartes jî, ji vir girt dest û "gumankeriya rêbazî-mêtodîk" pêşxist. Di gihîştina zanebûna rast de "gumankeriyê weke amûr-rê-rêbaz" şixuland .

**5-Rêbaza Descartesî(Deqartî):**

"Gumankerî cewhera rêbaza Deqartî pêk tîne. Biguman lêkolînkirin, biguman pêşveçûn ji bo Deqart dibe helwesta merovê rast difikire. Fîlozof bi gumankerî digihîje rastiya "cogîto ergo sûm "

Deqart; dema ku "felsefeya modern" ava dike, bi "siya teqez" dest bi kar dike û digihîje înkara guwahî(şahidî)ya hesta. "Em difikirin ku em dibihîzin, dibînin, tevdigerin encax; em fêm dikin ku ev xapîne" dibêje. Hin pêşdetir diçe û rastiyên matematîkî(bîrkarî) jî înkar dike. Dibêje "ji ber ku ecineke ku hêza wî têrê her tiştî dike û biniyeta xirab e, pêkan e ku di hemû fikirînê min de ji xapandina min bextewar e." Encax gumana Deqartî, bi temamî dijberî gumankeriya septîkên(gumanker) Yewnana kevin e. Gumana Deqartî nedomdar e demkî ye. Gumankeriya Deqart bi diyardeya "difikirim nexwe ez heme" bidawî dibe. Ev tê vê wateyê; "Dema ku dikeve ferqa ku ji xeynî diyardeya ku difikire û jê guman dike, dikare ji her tiştî guman

bike, wê demê guman diqede." "Rastiya difikirim nexwe ez heme, rastiya kû jê nayê gumankirin e.

Ev di heman demê de xala destpêkê û çavkaniya bingehîn ya rastiyên din yên ku jê nayê gumankirin e. Gelek rastiyên din, ji vê rastiya yekemîn derdikevin holê. Di wateyekê de afirînerê "xwedayî" yê rastiyên din e .

’‘ Gumana Descartes ji aliyê koka me ve bi armanca danîna holê ku em ruhin fikrên ku em xwediyê wan in hedefkirina demkî ji me dûrkirina wan bi pedogojiya çîlebazekî re xwediyê heman nirxêye’’.

Descartes û Bacon bingeha felsefe û modernîteya burjuva ava dikin. Felsefeya Deqart, felsefeya skolastîk (felsefeya serdema navîn) bi şikilekî tund rexne dike û li ser dijbertiya wê pêşve diçe. Cureyeke dijberî skolastîk e. Felsefeya Deqart; li ser dijberiya"yê her tim diherike û diguhere û yê naguhere" teşe digre. Li gor vê yê madî û yê ruhî ji hev cûda dike. Yê ruhî-xwedayî weke mayînde, yê mekanîk-madî jî weke demborî îlan dike. Sedsala ku Deqart lê dijiye, sed saleke mekanîkî ya ku bîrkarî derketiye pêş e .

’‘Ezîz Augustînus, bi şêweyeke ku di zihna me de gumanê pêwîstneke agahiyên hazir yên ku çavkaniya xwe xwedayîne ku di me hemûyan de newekhevin ‘’ dida pêş.

Descartes jî; "Hêza darizandina rastiyê, û hêza şaşitî û rastiyê ji hev cûdakirinê" hêza kû weke aqlê selîm an jî aqil tê binavkirin, weke xwezayî di hemû merovan de wekhev e." digot û berevejiyê wî diparast. Bi vê re digihîşt vê encamê. Şexs di fikir de negihîje encama ku dixwaze, çavkaniya sedema wê ev

e. Merov nikare aqlê xwe baş bikar bîne. Lewma, ji têgîna "guman" derdikeve rê. Bi vî awayî hêdî pêşveçûn lê belê tu demê gumanê ji dest neberdan, bingeha rêbaza Deqartî pêk tîne .

Bacon û Descartes, berevajiyê Pyrrhonê fîlozofê Yewnana klasîk, ji nêzîkayiya "ger em bi guman derkevin rê emê bigihîjin zanebûna rast, ji mîsogeriyan derketina rê xelitînê dayîna ber çav e." Descartes ji bo gihîştina zanebûna rast gumankeriyê esas digre. Guman tuneye ku gumankeriya Descartes, gumankeriya birêbaz e. Ji bo gihîştina rastiyê ji her tiştî gumankirin, her tiştî biguman dest girtin rêbaza esasî ye. Tu tiştê ku jê guman nake tune ye. Yekane tiştê ku jê guman nake, "ezê kû guman dike" ye. Ezîz Aûgûstînûs dibêje; "ger ku ez guman dikim ez heme." Descartesê ku vê yekê berevajî dike jî, digihîje encama " difikirim nexwe ez heme" (cogîto ergo sûm). Rêbaza xwe li ser vê hîmdar dike .

Pirsgirêka rêbaz, her çiqas di fîlozofê berê de jî heye, lê vê yekê cara ewil bi awayekî jidil ve Bacon û Descartes girt dest. Herdu fîlozof jî pirsgirêka rêbaz bi rehendên cur bi cur girtin dest û nîqaş kirin. Descartes ji bijîşkê tenduristiyê Isaac Bêckman yê ku bi bîrkarî re mijûl dibe di asteke bilind de jê bandor bû. Li ser vê pirtûka xwe ya bi navê "Li ser rêbaz axaftin" amade kir û da çapkirin .

Bacon jî li ser pirtûka "Organon"(navê kû ji zanista mantiq û şîroveya wê re tê gotin- Mantiq û ramanê Arîsto) ya Arîsto, pirtûka bi navê "Novûm Organûm" (Şîroveya tebîetê û di derbarê gerdûna merova de gotinên têr wate) nivisand. Herdu fîlozof jî giranî dan pirsgirêka rêbaz .

Bacon, "rêbaz û mantiqê îstîqra(enduksiyon) weke bingeha agahînasî dest girt. Li dijî skolastîkê şer da destpêkirin. Rêka ku ber bi ronakbûnê ve diçe vekir. Di vê wateyê de "avakerê felsefeya serdema nû û ezmûneriya zanistî" tê qebûl kirin. Baconê kû weke pêşengê têgîna "zanistê" ya ku bi I. Kant re pijiyaye tê qebûl kirin, di navbera bûyerên xwezayî û bûyerên dîrokî de cûdabûneke tevayî kiriye, bi vî awayî diyar kiriye ku bûyerên dîrokî nikare weke deraxa bûyerên bêpergal û lihevhatî bixe rojeva xwe, ji ber vê jî li ser diyardeyên xwezayî yên ku ji bidestxistina qanûnên zanistî re guncav e, Marx ê civan yê ku hîn bi felsefeya dîrokî û epîstemolojî re bendê xwe qut nekiriye ji Bacon re dibêje bav û kalê meteryalîzma Îngilîz û hemû zanistên modern yê ezmûnî ye, Fikrê wî Hobbes sîstematîze dike. Encax yê ku hêmanên Bacon û Hobbes bi teşe dike jî Locke e".

Ev rêbaza ji ya "yekjimar-kismî" gihîştina ber bi ya "tevayî", ji taybet ber bi ya giştî ye. Bacon, dibêje; " ji bo hînbûnê ceribandin, şopandin, bûyera dahûrandin û piştre jî ji bûyerên cûda gelemperîkirin û encam derxistin e." Ev rêbaza Bacon û Descartes bingeha "rêbaza zanistî" pêktîne .

"Rêbaza enduksiyon, girîngiya xwe ya zanistî di sedsalên 17. û 18. de bidest xistiye û bi piştgiriya Francîs Bacon, Galîle, Newton û John Stûart Mîll qederekî pêşketiye .

Descartesê ku rêbaza li ser ferdperestî-ez honandiye jî heman rêbazî esas digre. Ji perçe diyardeya ez-ferd-ferdperestî destpê dike digihîje gelemperî, xwedê.

"Rêzikê bingehîn yê rêbaza Deqartî, tu tiştê ku ne xipxuya ye weke rast negirtine. Rêzikeke din di nav giştî de yê bingehîn an jî yê hêsan dîtin, ji ya herî hêsan ber bi ya herî yekbûyî ve çûyîn e. Ev nêrîn bi meraqa zêde ya fîlozof ya bîrkarî re têkilîdar e." Rêbaza Descartes, eynî weke rêbazeke bîrkarî ye.

Descartes; ji formûla "difikirim nexwe ez heme" destpê dike û bingeha derefizîkî ava dike. Ezîz Aûgûstînûs, bê ku tu guman bike bi serekekirina xwedê digihîje "ezê." Descartes jî, berevajî ji ez derdikeve rê û digihîje xwedê. Xwedê jî cîhana madî diafirîne. Li vir "ez" cureyek ji xwedêye. Bi vî awayî, bingeha ferdparêziya burjuva ya gihîştiye hêzeke xwedayî û bûye bela sere merovahiyê diavêje. Em dikarin vanan wiha rêz bikin .

"Ya yekemîn tiştekî kû rastiya wê xupxuya nizanibim weke rastî nagrim dest, yanê ji xeynî tiştê ku di daraziyê min de bi şikilekî eşkere derdikevin û nikarim bixim nav tu gumanê, tu tiştî nasnakim." (Descartes)

Ya rast Descartes li vir weke yekane rastiya mîsoger raman dibîne. Ev nêzîkayî ji ber vê diqewime. Ji her tiştê serdema navîn-skolatîk guman dike. Lewma di darizandinê de derbas dike. Li gor şikilê kedxwariya sermayedariyê û ferdperestiya wê rêbazekî pêk tîne .

"Ya duyemîn, her yek ji zehmetiyên ku li ser lêkolîn dikim, qasî ku dibe dabeşî perçeya kirin û wan gihandina rewşa herî dahûrîner e".

(Descartes)

Ev dibe rêbaza yekemîn yê moderníteya sermayedar. Mêtinkariya Sermayedar bi mantiqê "dabeş bike, perçe bike û

bixe bin kontrolê" her tiştî xistiye bin kontrolê. DYE îro li Rojhilata Navîn bi polîtîkaya "îstîqrara bêîstîqrariyê" heman tiştî dike. Devletên heyî dabeş dike, perçe dike û dixe bin kontrola xwe bi vî awayî îstîqrara guncav pêk tîne. Bêîstîqrariya hindirîn(dabeşkirin, perçekirin, ji hêzê xistin) dibe îstîqrara ya derve(ji hêzê ketîn, ketina bin kontrolê)

Bi perçekirina hemû tişteya, madekirin û xistina bin kontrolê ye. Vê yekê, bi şopandina rêyeke ji ya hêsan ber bi ya tevlîhev pêktîne. Ya ras ev bi şikilê pêşveçûna sermayedariyê re lihev tê. Serdema sermayeya seretayî, serdema hevrikiya lîberal û serdema emperyal(mêtinkar) bi vê diyarkirinê re lihev tê. Ev li ser rêbaza enduksiyon yê Bacon û Descartes teşe digre. Ev di heman demê de nêzîkayiya heqîqet yekpare ye ji holê radike û tîne rewşa nefêmbar.

"Ya sêyemîn, fikrê xwe ji tiştên herî hêsan û yên ku nasîna wan herî hêsan destpê dikim û hêdî hêdî, rade bi rade bipêşveçûnê gihandina heta agahiyên tevlîhev û bi xwezayî di navbera tiştên ku li pey hev nayên jî pergalekê ferzkirin e."(Descartes)

"Ya dawî, li her derê bi ferzkirinê tevayî û çavnêrî kirinên gelemperî, pê bawerbûna ku tu tiştî li derve nehiştine".

(Descartes)

Descartes ev hemû pergaleke tevahî pêktîne. Li gor vê hin hêmanên exlaq jî pêşve dibe û pergala xwe temam dike .

Ya yekemîn, "bi ol ve başebaş girêdayî man, riayetkirina fêrbûn û qanûnên welatê min, di hemû mijarên din de kesên aqlêselim yên ku emê bi hev re bijîn, di sepandin de nêrînên ku

her kes diperjirîne û yê herî nerm jî pirroleyê dûr şopandin û xwe rêvebirin e." (Descartes)

Li vir riayetkirina ol, qanûn û rêbaza lîberal meşrûkirin heye. Her şexs weke kirdeyê ku xwe bi xwe rêve dibe tê dîtin .

Ya duyemîn, ev kirde di rastiya xwe de îsrarbûnê raber dike .

"Di çalakiyê min de qasî ji destê min tê hevgirtî û bibiryarbûn û nêrînên herî bi guman jî dema ku min biryar da ku gelekî bibawerin wê demê wan bi tiruşî şopandine."(Descartes)

Weke hêmana sêyemîn; "her dem ji enînivîsê zêdetir, hewldana xwe têkbirin, jî guhertina pergala dinyayê zêdetir, hewldana arezûyê xwe guhertin dayîn û bigelemperî li gor ku em nikarin li ser tiştekî li derveyê ramanê xwe bigiştî serdest bibin, tekilîdarî tiştê ji derveyê me, piştî ku tiştê ji destê me tê me kir, her tiştê ku me ji serkeftinê dûr dihêle, ji aliyê me ve ji negengazbûna bawerkirin û elimîne." (Descartes)

"Weke encam, bê ku xwesteka behskirina karên yên din, di karê xwe de cihê ku lê disekinim, yanê hemû jiyana xwe, aqlê xwe pêşxistin û şopandina rêbaza ku min li ser xwe ferz kiriye, qasî ku ji destê min tê, di zanebûna rastiyê de ji pêşveçûne re xwe fedakirinê bêtir tiştekî ku hin baştir bikim tuneye, difikirim."(Descartes)

Guman cewhera rêbaza Deqartî pêktîne. Bi guman lêkolan, bi guman bi rê de çûn, bi guman gihîştina encamê helwesteke bingehîn e. Ji her tiştî gumankirinê digihîje encama "difikirim nexwe ez heme"

Ji bûyîna rêbaza wê ya basit ber bi tevhev – hevgirtî ve li ser ji yê hevgirtî gihiştina ber bi yê basit ve sazkiriye. ‘’Hemû rêbaz ji bo ku hinek rastiyan dayne holê em di rewşa ku çavên zihna xwe ber bi wan ve badin di sîstema heyberan û rewşa wê de radizê. Pêşnûmeyên herî tevhev û tarî eger em pîle bi pîle dadixin pêşnûmeyên basit, piştre jî hîsên (pêjn) yên herî basit yên hepêşnûmeyan dîsa pîle bi pîle eger em hewldidin bigihijin agahiyên yên din wê deme em vê rêbaza bi şêweyê li gorî rastiyê dişopînin.’’ (Descartes)

Descartes ji gumanê derdikeve rê digihije ji her tiştê objektifî, digihîne heta ji hebûna dinyayê gumankirinê. Wisa ku hemû fikrên ku di encama hestên xwe de bidest dixin înkar dike û bi "ramanên zikmakî" ve girê dide. Ramanên din weke "sûnî(çêkirî)" dinirxîne. Ji ber vê yekê, " tu agahiyên mihtemel weke agahî negirtin, wê bi tevayî derxistina derveyê qada zanebûnê, tenê bi tenê yê mîsoger pejirandin" ifade dike. Yê mîsoger jî "zanebûnên zikmakî" ne. Ev jî digihîne ramana xwedayî.

**6-Rêbaza Felsefî yê ji Exlaq qutbûye:**

Jêderka peyva exlaq xwe dispêre peyva "hulk" ya Erebî, "ethos" Yewnanî û "mos" Latinî. Bi Erebî "hulk" tê wateya "huy ".

"exlaq-î hamîde" û "exlaq-î hasene" dibe exlaqê baş. "exlaq-î zemîme" û "exlaq-î seyyie" jî tê wateya exlaqê xirab. Bi têgîna

"ethos" ya Yewnanî re wekheve. Di Ingilîzî de exlaq bi peyva "ethics" tê pêşvazîkirin .

Dîsa "moralîty" a ku bi Ingilîzî di wateya exlaq de tê bikaranîn, ji peyva "mos" ya Latînî hatiye darîştin .

Bingeha exlaqê Tewrat, incîl û Kuranê xwe dispêre mîtosa Adem û Hewa. "Me got: Ey Adem! Tu û hevjîna xwe(Hewa) bi hev re li bihuştê bi cih bibin. Li vir bi hêsanî, kengê dixwazin ji fêkiyên bihuştê bixwin. Tenê nêzî vê darê nebin. Ger hun ji vê darê bixwin, hun herdu jî wê bibin ji zalimên li xwe xirabî dikin." (Quran, Baqara:35)

Gelek nirxandinên cûda yê vê mîtosa xuliqînê hene. Bi vê re destpêkeke ku têgînên "qencî-xirabî" hatine darîştin û di nav jiyana civakê de hatiye bi cih kirin .

"Ev axaftinên li jorê yên ku behsa Adem û Hewaya weke bav û dayika hemû neslê merova tên qebûlkirin, bi têgînên "qencî" û "xirabî" re rû bi rû mayîna wan vedibêje, îro mijarê ku em weke exlaq pênase dikin, bi hêsanî derdixe holê." (Mark Twaîn)

Exlaq tevayiya diyalektîki ya di civakekê de ji aliyê dab û nêrîtên avabûye, nirxdarazî, qural û qaîdeyan hatiye şêwandin .

Ev derdikeve holê. Exlaq; di jiyana rojane de tevayiya lebitînên şaş û yên rast yên ku hewceye ferd û civak lê riayet bike ne. Ev tevayiya lebitînên rojane tê wateya, ji aliyê merov-ferd- civak ve ji hev cûdakirina qencî û xirabiyê, diyarkirina qencî û xirabiyê.

Nexwe exlaq; di nav civakê de, rojane tiştê ku divê merov bike, lê riayet bike an jî tiştê hêvîdarê pêkanîna wê ne, tevayiya nirxdarazî, lebitîn û çalakiya ye.

Rêzikên exlaqî yên ji aliyê Zerdeşt ve hatiye avêtin xwedî çawaniya gerdûnî, li her derî derbasdar weke " derew nekirin, dizî nekirin, xwezayê neqirêjkirin hwd" hene her wiha rêzikên exlaqî yê li gor civaka li gor grûba, li gor kesan diguhere jî hene. Girêdayî pêşveçûnên civakî jî rêzikên exlaqî diguherin û vediguherin.

rêzikên exlaqî, li cih û demeke diyar nirxdaraziyên derbasdarin. Çawa ku rêzikên exlaqî yên ji bo her kesî derbasdarin tune ne, rêzikên exlaqî yên li her derê, di her demê de bigiştî derbasdarin jî tune ne .

Bi vê re em dikarin bêjin ku hin libat û çalakiyên weke (derew nekirin, dizî nekirin, li hember dayik û bav hurmet) li her derê û ji bo her kesî derbasdarin. Li vir tiştê ku tê diyarkirin, li her derê nederbasbûna rêzikên exlaqî ye .

Di dîrokê de yekemîn û yê herî mezin, kesê ku exlaq pêşxistiye weke Zerdeşt tê nasîn. Çawa ku çavkaniya îlhama ola ye, Exlaqnasên xwezayê, coşdar yên Yewnanî jî xwe dispêrin Zerdeşt. Ji xeynî Zerdeşt, Konfuçyûs û Bûda jî teorîsyenên mezin yê exlaqê ne .

Li vir exlaq û felsefe di nav hev de ne. Zerdeştî, Konfuçyûs û Bûda, çawa ku teorîsyenê exlaqê yê mezinin, qasî wê jî aliyên wan yê felsefî û olî jî mijara guftûgoyê ye.

Fîlozofên xwezayê yê Yewnanî, aliyê felsefî esas girtin lê felsefe ji exlaq qut nekirin. Encax bi îdealîzma ku bi Sokrates destpê kiriye, bi Eflatûn mîsoger bûye, bi Arîstoteles kûr û belavbûye, felsefe weke mîsoger ji exlaq hat qutkirin.

Sokrates di felsefeyê û dîroka felsefeyê de xwedî cihekî girîng e. Sokrates(BZ 470-399), di felsefeya Yewnanî de, rawestgeha qutbûna ji felsefeya xwezayê ye. Ji felsefeya xwezayê qutbûn, destpêka derbasbûna îdealîzmê ye. "Ew weke cihê kû bihişmendî û kesayeta exlaqî lê disekine têgîna rih dibîne. Ev çavkaniya xwe ji vir digre." Bi wî re exlaq digihîje lûtkeyê.

"Sokratesê ku merov dixe navenda felsefeyê, têkiliya merov bi xwe re, bi gerdûnê re û bi civakê re wê çawa be, li ser vê lêkolîn dike, rehendên exlaqî, civakî û ferdî yê jiyana merov derdixe pêş, hewl da ku ji merova re ravebike ku têkeliya derûnî rih e, hewce dike ku merov girîngî bidin rihê xwe. Ji bo vê ramanê xwe îfade bike û bi çalakiyên xwe şênber bike jî, salewext bi lingê tazî û kirasekî zirav geriyaye." Di felsefeya Sokrates de berî her tiştî, pêwistî, armanc, nirx û xwezaya merov sekiniye, ka çi wê wî temam bike lêkolîn kiriye".

Sokrates di vê wateyê de bi pêşxistina têgîna rihnasî rêka ber bi îdealîzmê ve diçe vekir. Encax exlaqa ku xwe dispêre vê jî pêşxist. Li gor jiyana xwe tanzîm kir .

"Sokrates li ser haceta ku 'xwedayê nû ava dike, bi nîqaş û nêrînên xwe civana jirê derdixe' mehkumê mirinê hat kirin. Rixmê ku derfetê xilasbûna wî hebû jî, ji bo tawîz nedana ji hêmanên xwe yê exlaqî, jehra zirgêjnok vedixwe û jiyana xwe bidawî dike .

Îdealîzm û rihparêziya bi Platon(Eflatûn) û Arîstoteles didome, hîn bêtir bikûrahî sîstematîk dibe. Felsefe ji exlaq hat qutkirin û razberkirin. Ev rêbaza nû gihîşt heta avakirina modernîteya sermayedar.

Bi vî awayî rêbaza felsefî yê ji exlaq û wijdan qutbûye, kevirên hîma kevneşopî û sîstematîka fikrê ku diçe ber bi sermayedariyê ve da ser hev. Platon û Arîsto bûn destpêkerê kevneşopiya fikirîna Rojava ya ku xwe dispêre zekaya analîtîk ya ji hesta qûtbûye. Bacon, Descartes û Newton vê mîrasê hin bêtir pêşxistin û hîma moderniteya sermayedar danîn .

Merov di hemû deman de bi derbaskirin û têkbirina zehmetiya hewldana lêgerîna heqîqetê domand. Ev lêgerîn eynî weke perçeyekê cewhera merov e. Merovê ku ji hestên xwe qutbûye, ji xwezaya xwe jî qutbûn destpêkir. Merov bû xerîbê xwe. Aqilê ku ji wijdan qûtbûye her cureyê zextê, kedxwariyê, tundî, şer û telanê, dijbertiya exlaq meşrû kir. Bi vê re jî nesekinî, teoriya vî karî kir, hewl da ku di bîra civakî ya merova de bi cih bike. Ji xeynî kulmek îqtîdarên hilbijartî, her tişt li her derê ji kedxwariyê re hat vekirin. Her tiş xistin bin xizmeta pergala kedxwariyê. Civaka li derveyê vê kulmek îqtîdarên bijartî, ji kolekirinê re hat vekirin. Civak ji serî heta binî ji koletiyê re hat vekirin. Edî her tişt di nav wergiriya kedxwariyê de bû .

Rêbaza felsefî, hestên ku ketiye bin xizmeta îqtîdarê û aqlê ji wijdan qutbûye, weke "heqîqeta teqez-rast û yekane" pêşwazî kir û zemîna "rêbaza zanistî" ya piştre pêşket jî ava kir. Ev zemîn di wateyekê de kevirê sorkirî yê rêya diçe cehnemê bûn. "Heqîqet îqtîdar e, îqtidar heqîqet e." Pêwiste îqtîdar ji her aliyê ve were vekirin, bi hemû rehendên xwe derxin holê. Pêwiste kêşeya "Heqîqet îqtîdar e, îqtîdar heqîqet e" were derbaskirin .

**7-Nêzîkayiya Rêbaza Zanistî:**

"Qopê ku mêtodê wî heye, ji yê bê mêtod dibeze zûtir bi pêşve diçe." (Francîs Bacon)

Rêbaza zanistî, di pêşketina sermayedari de, di veguherîna pergal û sazîbuna we de roleke girîng digre. Rogar, Francîs Bacon, Descartes ji vê nêzîkayî û xetê re pêşengiya felsefî dikin .

Di nêzîkayiya metoda zanistî de ji hev cûdakirina kirde-tişte esas e. Her tişt di nav vê kêşeyê de tê dest girtin. Bi taybet Reform, Ronesans û bi serdema ronakbûnê re, kêşeya kirde-tişte(bireser) dixin bingeha her tiştî. Ji aliyekê ve taybetmendiyê merov ji aliyê din ve objektîfbûna cîhanê weke du hêmanên esasî derdikevin holê. Cûdabûna kirde-tişte hemû qadên jiyanê dagir dike .

Bi rêbaza zanistî re aqil û rêbaza dogmatîk yê gotinên xwedê esas digre, girîngiya xwe wenda dike. Serdemeke nû ya ku rêbaza zanistî li navendê disekine pêş dikeve. " Xwedayên bi maske û xwe pêçayî û serdema qralên veşartî, cihê xwe ji xwedayên bê maske û serdema qralên tazî re berdide." Tiştê bingehîn yê vê serdemê diyar dike bê guman, hilberîna sermayedar, tekiliyê sermayedar û şikilê kedxwariya sermayedar e. Diyardeya qezencê, nihiçeke bingehîn yê her tiştî diyar dike û bandor dike ye. Qezenc, kedxwarî, û bihaya zêde, şikilê têgihîştina bûye û diyardeya yê civakê cûda dike. Eşkereye ku li vir di bin rêbaza tê pêşxistin de pêdiviya bingehîn şêweyê kedxwariya sermayedar e. Ji ber ku li vir civak jî di nav de her

tişt mijara kedxwariyê û qezencê ye. Her tişt tê kalêrkirin û dixin nav kedxwariyê.

Sermayedarî bi mantiqê hîn bêtir kedxwarî, hîn bêtir qezenc tevdigere û her çiqas radeya qezencê bilind dibe, serî li her cureyê şêtî dide. Her cureyê rê û rêbaz heq dibîne. Ji bo vê tu cînayet û qetlîamên ku neke tune ye. Di serî de merov her tişt mijara kedxwariyê ye. Ferd kirde, civak-xweza tişte ye. Kirde li ser tişte xwedî mafê paşrojmendiyê ye. Kengê, li kuderê û çawa dixwaze wisa dikare bikar bîne. Ev ji bo şikilê kedxwariya sermayedar guhertineke mezin ya rêbaz hewce dike. Ji bo kedxwariya sermayedar rêbazeke guncav tê pêşxistin. ji bo vê jî hewce dike ku rêbaza beriya vê bitund were rexne kirin û red kirin .

Descartes ji her tiştî gumankirinê dest bi kar dike. Tu tiştê ku jê guman nake tune ye. Piştî gumanê yekane rastiya ku digihîjê "difikirim nexwe ez heme" ye. Xala derketina wî dibe ev der. Ev derketin ji di encamên bingehîn re rê vedike. Ya yekemîn; rêka serbixwe fikirîna şexs vedike. Ev her diçe şexs dixe rewşa kirde .

Yê duyemîn; Xweza û civak weke kirde teşe digre. Şexsê ku di rewşa kirde de ye(kulmek kesên serdest yên dewleta netewe-bazara netewe-îqtîdar di destê wan de ye) li ser tişte(xweza-civak- şexsê hatiye wêderkirin) xwedî mafê her cureyê teserrufa ne. Çawa dixwaze wisa wî dagir dike. veqetîna kirde-tişte weke diyardeyekê mohra xwe li tevayî pergala sermayedar xistiye şikil digre. Bi girîngiya ku daye veqetîna kirde- tişte ve bi Bacon re sîstematîk dibe.

Li ser vê bingehê di navbera civaka feodal û civaka sermayedar de ji her aliyê ve pevçûn destpê dike. Ji aliyekê ve civaka berê ya bicih bûye, bisazî bûye, her qadê jiyanê dagir kiriye, bi exlaq dagirtiye, ji aliyê din ve jî rastiya civaka sermayedar ya ku nû pêş dikeve, dixwaze serdest bibe, dixwaze ji her awayê seqfê exlaqî xwe dûr bixe heye. Di nav herduyan de ji exlaqê heta felsefê, ji siyasetê heta aboriyê, ji huner heta şer li her qadê pevçûneke girîng tê jiyîn.

Encax li vir pevçûna zanist-dêr pevçûna esasî ye. Cewhera wê pêk tîne. Tevgerên Reform û Ronesansê li ser vê bingehê pêş dikeve .

Sermayedarî(kapîtalîzm) weke pergala kedxwariyê ya hemû dema û weke pergala koletiya ve serdemê ya xwedî ceribandina îqtîdar; tu rêzik, rêzik, pîvan, tabû, hiqûq, guneh û qedexe nas nake, civakê û bi civakê re hemû nirxên civakî heta dawî weke "tişteyekê" ji kedxwariya rût re vekirî dihêle. Li vir "objektîfî" dibe têgîna sereke ya pergala kedxwariya sermayedar .

Tu nirx tune ye ku modernîteya sermayedarî li ser navê "objektîfî" li ser maseyê kedxwariyê dirêj neke. Ji bo wê rêzik û hemana yekane kedxwarî û hin bêtir kedxwarî ye. Ji bo her tiştî bixe nav kedxwariyê tu destur, guneh û qedexe nas nake. Her tişt rûberê xwe ji xwe dike û ripîrût dikeve xizmeta kedxwariyê. Ji bo vê jî civaka bi exlaq ya berê weke cenawirekî kû pêwiste were perçekirin, tune bibe û bi tevayî ji muzeya tiştên kevin re were rêkirin .

**8-Sermayedarî(kapîtalîzm) Dijxweza û Civak e:**

"Têkiliyên cîhanî(hişmendî) yên merov bi xwezayê re girê dide, bi awayeke ku li pey xwe bandorên tirsnak bihêle, hatiye tunekirin. Merov, demekê di derbarê cihê xwe yê li xwezayê xwedî hin agahiyên qet ne hêsanin bû û di wê astê de jî bi ewle û azad bû." (P. Feyerabend)

Ev zanebûna "bi ewle û azad" ya merov bi xwezayê re dixe nav têkiliyeke lihevkirî, aîdê merovê civaka neolîtîkê bû. Têkilî û diyalektîka hişmendî ya di navbera merovê neolîtîkê û xwezayê de di radeya bilind de xweru, sade, xwezayî, biewle û azad bû .

Bi gelemperî civaka çînî-dewletî, bitaybet civaka sermayedar ev têkiliyên azad û biewle tune kir. Şûna vê hişmendî, zanebûn û têkiliyan, têoriyên razber yên kû pisporên modernîteya sermayedar pêşxistine, "yên merov jê fêm nake, bi xwe spartina pisporan jê bawer dikin." cih girt.

Temam, Gelo hewce nake ku merov têkiliyên xwe bi tiştê jiyanê xwezayê re, pêkhateyên bingehîn yên jiyana xwe fêm bike, têbigihîje؟

Ne lazime ku merov ev têkiliyên ku merov dike merov biparêze û li hember wan hurmetdar be؟

Merovê neolîtîkê qasî ku li hember xwezayê rêzdar bû, bi aqlê jinê yê hestyarî nêzî wê dibû û di asta dayikekê de ew diparast û pîroz dikir .

Îro sedema bingehîn ya çewtiya hişmendiya ekolojîk, qirêjbûna xwezayê, mantiqê ku sermayedarî bi fikra qezencê hîn

bêtir qezenc pêşxistiye ye. Nêzîkayiya zanista Rojava ya xwe dispêre pisporbûnê ye .

Di navbera nêzîkayiya azad, beravan ya civaka ku di asta "qêrî" de dibîne û nazariyên razber yên pispora de qutbûn; veqetîna kûr û nakokiye .

ji aliyekê ve xwezaya ku her kes digihîjê, zanebûn-hişmendiya xwezayî, ji aliyê din ve nazariyên razber yên van zanebûna tunekiriye, xwezayê kiriye amûrê kontrolê mijara axaftinê ye.

Civaka sermayedar, weke kirdeya bingehîn bi awayê "ferd, hemwelat, netew û dewlet" xwe rêxistin dike. Xwe weke "serdema xwedayên bê maske û qralên tazî" pênase dike. Yanê weke xwedayên bê maske û qralên tazî ji bo hîn bêtir kedxwariyê tu şêtiyên ku nikaribe bike tune ye. Ji nijadkujî heta hawirdor anîna halê nejiyînbar her cureyên çav tarîtiyê û şetiyê dike. Jİ bo vê hemû şeran, komkujiyên wehşî dide ber çav. Ji bo qezenca zêde her tişt heq tê dîtin. Sermayedarî bi temamî li ser bingeha dijbertiya civak û xwezayê şikil digre. Xweza û civak tişteya kedxwariyê ye. Hilweşîna xwezayê li ser vê feraset û zîhniyetê pêş dikeve. Birçîbûn, xizanî, bêkarî, kedwariya keda zaroka hwd. encamên vê yekê ne .

Levîathana berê eynî weke ku rabûye ser çar linga, tu axa ku nikare feth bike, bazara ku bidest nexe, merovê ku nikaribe bike kole, xwezaya ku nikaribe qirêj bike tune ye. Her tiştê dikeve ber paqij dike, tiştekî nahêle. Edî ji benê xwe xilas bûye, har bûye. Li ser vê bingehê weke dijberê xweza, civak û merov şêwe digre .

Nexwe, pêwiste li vir têgîna "nêzîkayiya objektîf" ya ku rêbaza zanistî dişuxilîne û weke bêguneh pêşwazî dike, bi cidiyetê pirsiyar bikin .

Ji ber ku di bingeha feraset û zîhniyeta ji hemû karesata re rê vedike de ev têgîn cih digre. Rêbaza zanistî di radeya bilind de weke têgîneke bêtawan dest girtin, têgihîştin ji hemû karesat, jirêderketin, şer, birçîbûn, bêkarî, kedxwarî, komkujiyên wehşî re rê vedike. Dema hay ji van hemûyan hebin, rêbaza zanistî bixwe amûrê herî mezin yê dabeşbûna çînî ye. Ev rêbaz bixwe di şêwegirtina civakê ya weke serdest-bindest de erkê amûrekî bingehîn pêktîne. Kedxwariya herî mezin, neheqî, kolekirin bi vê rêbaza tê pekanîn .

Di îflaskirina sosyalîzma pêkhatî ya heftê salî de veqetîna "kirde-tişte", "rêbaza zanistî" yê bûye îqtîdar rol dilîze. Di sosyalîzmê de jî rolekî girîng dan veqetîna "kirde-tişte" Ev li ser navê zanistê jirêderketina herî mezin re rê vekir. Sosyalîzma pêkhatî, rizgariya netewî û demokratiya civakî, weke şêweyeke sermayedariyê pêş ket .

"Berrahiya(rastî) civakî ya bi heman rêbaza ve hatiye înşakirin, bi heman rêbaza çiqas were rexnekirin dîsa heman encam e." Li vir çem di mecrayên berê hatine avakirin de diherikin û digihîjin behrên nas.

Îro tengasiya herî mezin ya sermayedariyê dîsa ev "rêbaza zanistî" ye. Ji ber ku şixulandina rêbazên berê pir caran hatiye şixulandin, ceribandin, ji afirandinan heman encama wêdetir kêrî kareke din nayê .

Nexwe ji xeynî rola kartêkerên ku temenê sermayedariyê dirêj dike,lîstinê wêdetir nagihîje tu cihê. Dikarin bêjin ku "rêbaza zanistî" qasî ku kêmasiya sermayedariyê ye mîna wê bêçaretî û kêmasiya bingehîn ya sosyalîzma pêkhatiye jî .

Divê neyê jibîr kirin ku "zanist hêza herî girîng e." DYE ya zanistê di destê xwe de dihêle, digre yekdestiya xwe weke hêza super rol dilîze. Zanistê dixe xizmeta kulmek kesên xwedî yekdestiyên li ser netewan. Her cureyên kedxwariyê, şerên herî hovane bi saya vê rêbazî tê pêkanîn. Hemû şerên hindirîn û derve li vir derdikeve holê .

Her tişt bi xwe pêçana mertalê rewatî û bêtewanîtî tê kirin. Dema wê tê ev rêbaz di asta tabû de tê pîrozkirin. Weke rastiya bênîqaş tê qebûlkirin. Weke rastiya yekanê li hafizeyan tê bicih kirin. Di asta olekî de li mejiyan tê enjektekirin .

Veqetîna "kirde-tişte" sedema heyîna modernîteya sermayedar e. Di eslê xwe de têkiliya vê têgînê bi "destkeftiyên zanistî" re jî tuneye. Di radeya bilind de têgînên dogmatîk, hişkbawer, hingofî ne. Di pêşveçûna xwezayî, û feraseta xwezayê de jirêderketinekê îfade dike. Qasî têgînên serdema navîn bawerhişk e. Veqetîna "kirde-tişte" him ji aliyê sermayedaran him jî ji aliyê sosyalîstan ve tê pîrozkirin weke rastiya bênîqaş tê pejirandin. Bi vê veqetînê re her tiştî ji bo xizmeta kedxwariyê tê pêşwazîkirin. Jiyan tenê di nav ya madî de difetise û nediyar dibe. Jiyan yekalî dibe. Wateya xwe wenda dike, tê rewşeke ji serdema navîn xirabtir. Ji azadiyê, wekheviyê, xweşikbunê, qenciyê, piştgiriyê, exlaqê civakî li paş tu tişt namîne. Hemû civak tê kolekirin û keda xwe tê xwarin. Jiyan ji her aliyê ve tê

perçekirin. Qelişînên mezin ava dibin. Bitûnî ji holê radibe. Bitûniya yekane ji parçeyên ku xwe di "hîn bêtir kedxwarî, hîn bêtir qezenc"  de asê kiriye, pêk tê .

Rastiya dîrokî- civakî û bitûniya jiyanê; bi "nîzamên zanistî" heta hucreyên xwe tê parçekirin. "tevayiya jiyana civakî ya bi mekan û demê re " tê parçekirin û wateya xwe wenda dike. Ji bo merovahiya weke wendahiya herî mezin ya nirxa derdikeve holê. Merovahî di dîrokê de tu demê ewqas bi parçebûn û wendabûna nirx re rû bi rû nemabû. Ev parçebûn di nav qaliban de asêbûn û yekalîbûna jiyanê û yeknasakiyê re rê vedike .

Ev di dîrokê de dibe çarenûsa herî xirab û kujende ya ku yên hatine wêderkirin jiyîne. Ev kolebûn, karkerbûn û cureyekê kansêrbûnê ye .

Ev " kansêrbûna civakî; ne nêzîkayiyeke alegorik, li hember jiyanê şîroveya pergalê ya herî watedar e".

Rêbaz û rêzikan her tim cewhereke determînîst-dogmatîk-biqalib dihewînin. Di van dogma û qaliban de îsrarkirin, derveyê xwestekê, mîna ku di mînaka sosyalîzma pêkhatî de bihuriye, digihîne heta înkara wekhevî, edalet û azadiyê.

Ji van hemûyan gihîştina vê encamê mimkin e. Di roja me de zilamên zanistê yên di xizmeta pergalê de ne û Rahibên Sûmerê parçeyê heman zîhniyet û aqilî ne. Berdewama hevdû ne .

Ji ber ku civaka şaristaniya dewletî bitûn e. Tenê li gor pêdiviyên girêdayê pêşveçûnê derdikevin holê, amûr û rêbaz diguherînin. Cewhera wê weke xwe dimîne .

Nexwe dema bi şaristaniyê re, bi moderníteya sermayedar re hesab ji hev dipirsin, bê ku sermayedariyê bi tevayî ji rexneyên tundraw(radîkal)-cidî derbas bikin, rêka çareseriyê ne pêkan e .

Ji demên bihûrî heta îro, di civaka merova de lêgerîna heqiqet û azadiyê bênavber berdewam kiriye. Ji mîtolojî, ol, felsefe heta zanistê di hemû rêbazên de ev feraset heye. Eşkereye ku rastiya jiyanê ne li derveyê van vebijarka ye. Encax girêka pirsgirêka dîsa ji van çavkaniya xwe ji van rêbazên digre .

Di merhaleya ku em gihîştinê de moderníteya sermayedar li gelek qadên jiyanê êdî gihîştiyê sînora nedomdariyê. Merov, civak û xwezayê gihandiye sînora hilweşîn û karesatê. Hilweşîna hawirdor, zêdebûna hejmar, bi lezûbez xeritandina çavkaniya, qeliştekên bêsînor yên civakî, mezinbûna nakokiyên civakî, gelemperîbûna jiyana bi stres, jiyana ku helbestkiya xwe wendakiriye, lûtkebûna bêkarî, birçîtî, bêedaletî, bi çekbûna nuklerî û cureyên nû yên şer tê wateya mahşera merovahiya serdema me. Ev keraseta herî mezin ya dîrokê ye .

Ev hemû tê wateya îflasa rejîma heqîqetê. zîhniyeta xwe dispêre qalibên weke "objektîf-subjektîf-meteryalîst, diyalektîk-metafizîk" di dîrokê de her tim ji aliyên serdestan ve piştgirî girtiye û hatiye pêşxistin .

Ji ber ev qalibên dualî yên zîhniyetê, bûne amûrê rewatiya pergalên avabûnê. Her tim pergalên kedxwariyê, koletiyê xwedîkrine û bihêz kirine. Bi kûrkirina ev xeta kedxwariyê re encama tê gihîştin ev e; wekhevbûna kêşeya Heqîqet û Îqtîdarê ye .

Eşkereye ku rejîma heqîqetê ya li vir, dibe piştrast û bingeha herî qewîm ya pergala koletî û şixulandinê(îstismar). Encama ku ev gihîştiye, hîn zêde kedxwarî hîn zêde koletî ye. Nexwe karê sereke yê ku bê kirin, ev rejîma îqtîdarê ya kevin bûye avêtina sergoya dîrokê ye. Divê li her qada jiyanê wê çareser bikin, derxin holê û li dijî wê bisekinin. Li vir dijî pergala kedxwariyê derketin divê bi rêxistin, bi armanc û tevayî be .

Divê neyê ji bîrkirin ku hemû înşa û pergalên civakî berhemên vê zîhniyetê ne .

Eşkereye ku dest û ling nikarin civakê înşa bikin. Hemû pêşveçûnên dîrokî civakî, ser û bin bûnê bi bandor û mezin, destpêkê di qada bîrdozî û zîhniyet de pêkhatine. Dîroka olên semawî di vê mijarê de gelekî bibandor û raveker e .

Xetayeka herî mezin ya şoreşa Bolşevik-sosyalîzma pêkhatî, şoreşa herî mezin ya ku bi berdêlên mezin bidest xist, di qada bîrdozî de bisazî nekir, û belav nekir. EV yek ji karkerên di bin kontrola xwe de hêvî kir .

Halbukî çîneke hatiye kolekirin, vîna wê şikestiye, nikare ji lêgerîna azadiya civakê re pêşengtî bike .

**9-zîhniyeta di mîhwera azadiyê de divê çawa be؟:**

Divê destpêkê, herdu şikilê zîhniyetê yê xwe dispêrin "subjektîfî û objektîfî" û digihîjin heman encamê, derxin holê û eşkere bikin .

Objektîfî; weke ku gelekî hatiye îdîakirin, ne îfadeyeke "rêzikên civak û xwezayê" ye. Berevajî zagonîbûn, ji şikilê

rojanekirina dogmayên olî yê rahibê Sûmeran bêtir ne tiştek e. Zagonîbûn îfadeya berjewendiyên serdesta yên bisazî bûne û hatine garantîkirine .

Wisa ku zagonîbûn, ji aliyên hemû pergalan ve yek bi yek li ser civaka terbiye bûye dan pejirandin, li ser rihê wan ferz kirine û bi wan dan nasîn.

Ji tiştan agahiyên nû " hin parçe werin qutkirin jî yên nû dixin şûna wê. Bitûnî temam dibe".

Ji vê aliyê ve hemû dahênan û kifşkirinên nû di kêliyê de bi bendekî, zagonekê bi pergalê ve hiphişk tê girêdan. Li derveyê pergalê, ji tiştekî ku ji pergalê re bibe alternatîf re destur nade .

Îro hemû artêşa "zilamên zanistê" ji aliyê NYE û YE yê ve tê fînanse kirin, eynî weke girtîgehekê li ezmûngehan tên xebitandin .

"Zilamên zanistê" yên ku xwezî bi rahibê Sûmeran naynin, bi hezar û yek benda hatine girêdan û jê re xizmet dikin .

Aliyê wê yê erênî jî hin bêtir nêzî zekaya hestyarî ye. Di kifşkirina hês, dîtina hindir û newaya roleke erênî dilîze. "Zanyariya Rojhilatanavîn û tesewûf bi vê dîtina hindir" dikeve nav hewldana bidest xistina bitûniyê .

Li vir hewce dike ku binê vê yekê xêz bikin û diyar bikin. " Kirdewariya(subjektivîte) Rojhilat, bi objektîfiya Rojava re dijbere." Dema ku di nav bitûniyekê de were destgirtin û lêkolan, wê were dîtin ku objektîfiya Rojhilat mijareke li ser exlaq de ye. Li vir di kirdewarî de wê xwe weke "dengê xwedê" pê bide hesandin. Di vê wateyê de herdu jî xizmeta pergala heyî dikin. Roja îro modernîteya sermayedar, li her qada jiyanê ev herdu

nêzîkayiya jî qasî lîstikvanê bûkok bi hostetî dike yek û dişuxilîne. Herdu jî di xizmeta wê de ne .

Dikarin bêjin ku di modernîteya sermayedar de heqîqet; "navê lîstika ku di sermaye, zanist, siyaset û serdestiyê de şênber dibe ye." Ji aliyê kapîtalîzma diravî ve cureyekê lîstika qumarê ye." Her lêgerîna heqîqetê ya li derveyê vê lîstok û dezgeha qirêj; dijminê pergala heyî ye û ji xezeba wê xelas nabe. Di encamê de an tune dibe an jî dikşînin nav pergalê û kedî dikin .

Pergala sermayedar; ji sala 1970 heta niha dadikeve û dihele. Pêvajoya 1968 bi tevgerên ciwana re destpê dike, destpêka navbera kaosê ye. Sermayedarî bi vî halê xwe ve êdî digihîje sînorê xwe ye nedomanê. Li qada teknîk hin nûkirinên qismî ji bo xelaskirina pergalê têr nake. Ji ber ku bi rêbazên zanistî re her tiştê li ser azadî, jiyan, wekhevi, merov û civakê tune dike. Li paş xwe ji xeynî jiyaneke hatiye şoraxkirin, kolekirin tiştek nahêle .

"Xwedayê dinyayê dîn bibû, ji xeynî zilamekî û jinekê hemû jiyan tune kiribû. Ax mîna kiloxekî bû, çalên wê ziwa, besterobarên wê boz, zemîna wê gewra maden bû. Jin û zilam bi hestirên çavê xwe ax avdan û disa berhemdar kirin, bi vî awayî jiyan li dinyayê vegeriya." (Xelîl Cibran)

Pirtûka Xelîl Cibran ya binavê Xwedayê cîhanê pûtê yekxwedayî yê li jorê dişkîne û hesteke sê libî ya ku vê hejmarê derdixe sêyan dihewîne. Ya yekemîn; baweriya bi hêz, hebandina pere, artêş hwd.

Ya duyemîn hêrsa îqtîdarê ya ku pêşiya wê nayê girtin. Rêvebirina dinyayê û hêrsa xwesteka îqtîdarbûnê. Hîtler,

Mussolînî di encama vê hêrs û hebandina îqtîdarê de cîhan veguherandin selexaneya bixwîn .

Ya sêyemîn "Evîna mezin ya ji bo roja îro" ev tê wateya, di asta xwedayî de hebandina civaka xeritandinê. Jin-Zilam hemû merov li vir di nav rojaneyî de dihelin. Ji koka xwe, nirxên xwe û dîroka xwe bi bitûnî qut dibin. Ji kokê qutbûn destpêka hemû karesata ye. Destpêk rê li ber ji cewhera xwe dûrketina merova û ji xwe re xerîbbûnê vedike. Di encamê de ji xwebûna xwe derdikeve û cureyekê meymûnbûn, robotbûn, morîbûn û bêeslbûnê dijî .

Eşkereye ku merov di jiyana rojane de di nav ev her sê hêzên xwedayî de çûnûhatînên kûr dijî. Hêrsokî, bêxewî, nakokî, bêntengî, pevçûn hwd. li pey hev diçin. Cibran vê " ji bo pirtûka biafirîne", "îlhameke" ku weke "cehnema hozan" pênase kiriye, temînkirina xwe diyar dike. Cibran ji ber van her sê xwedayan, "merov, xwedayê di zayîneke hêdî de ye" dibêje .

Ya rast bi vê re digihije encama "tu merovekî, ne zêdetirî..." Di roja îro de jî merov koleyekê vîna wî şikestiye, ketiye rewşa sermiyan e .

Dema Makyavel tê gotin, tiştê yekemîn tê bîra merov, biwêja " Her rêka diçe ber armancê heq e" Felsefeya siyasetê ya Makyavelî, "abc" alfabeya polîtîkaya kapîtalîst e. Li vir "armanc her tişt e." ji bo bigihîjin armancê her rê, rêbaz û amûr heq e. Ji bo vê mimkine hemû nirxên merovî werin fedakirin. "Merovê ku qet bawerî lê nayê, tenê amûreke û weke hemû amûra ji bo armancê bi şikilekî hovane mimkine bikarbînin û jêbibin!" Ji ber ku merovê dikeve rewşa tişte, di xizmeta kulmek kesên xwedî

yekdestiyên ser netewan de ne. Xala ku rêbaza zanistî ya îqtîdarbûyî gihîştiyê ha evder e .

Paul Feyerabend; "gelemperîkirina rêbaza zanistî û weke yekane rêbaza derbasdar teqezkirina wê" bi tundî rexne dike. Di berhemên xwe yê binavê "Li dijî rêbaz" weke "yekane rêbaza derbasdar" teqezkirina wê, tenê weke helwesteke "pozîtîvîstbûnê" ye rexne dike û çewtiya wê diyar dike. Di berdewamiya wê de kartêkerên " Hêza hîskirinê, qabiliyeta kûr ya têgihiştinê, şens ji hin tiştan bêtir rol dilîzin. Dîroka zanistê; ‘’rêbaza îdeal a zanistî bi şopandinê dîtina wê ku wê bi salan gelek heqîqetan, bi tevgera daneyên ku herî nabin, çêkirina gelek ceribandinên hindik an jî qet çênekirina, bi îlhameke di careke de gihiştinê bi gelek merovên zanistê tijîye’’.

Di berhemê xwe yê "li dijî rêbaz" de jî dibêje, "teoriyên zanistî weke dîrokî îzafî ne û ji aliyê zanebûnê ve li ser çavkaniyên din re ne an jî xwedî cîhekî bijartîne".

"Fikir, eynî mîna pepûleyan tenê bi heyînê re sînordar namîne; pêş dikeve, bi fikrên din re dikeve têkiliyê û bandor dikin." Halbûkî burjuvazî fikrê xwe "ebed-mubed" weke rastiya yekane îlan dike .

Dîsa KUHN, " Di demên borî de zanyaran dema ku serkeftinên zanistî derdixistin holê rêyeke çawa şopandin? Em li dîroka zanistê dinêrin û dibînin ku "objektîfî û helwesta bitenê ezmûnger tune ye" dibêje.

**10-Şoreşa Neolîtîkê, Zanista Kevneşopî û Diyalektîka Zanista mêtinkar ya Rojava:**

"Rêbaza zanistî" ji aliyê hêzên xwedayî ve ji ezmana bi selikê daneket. Ne ebedî ne ezelî ye. Xwe spart rêbaza kevneşop, danehev û ceribandinên berî xwe û pêşket, bihêz bû. Di lêgerîna heqîqet û azadiyê de çawa ku hemû rêbazên din guherîn, ew jî girêdayî pêşveçûnên dîrokî civakî, danehev û zanebûna, şûna xwe ji rêbazên cûda re wê berde.

Zanist di her dem, serdemê de û li her cihî "bi rêbazên nezanistî, bi nûveyên nezanistî" ve xurt û dewlemend bû. Paldanka wê ya bingehîn zanista kevneşop ya qebîleyan e. Pêşveçûna xwe ya esasî bi spartina wê bidest xist

Ji aliyekê ve xwe dispêre zanista kevneşop ya qebîleyan ji aliyê din ve ji bo ku xwe weke bênîqaş, rastî û heqîqeta yekane diyar bike, piştevana xwe tune kiriye. Ev kok hucreya ku xwe spartiyê bêhis û pis avêtiye aliyekî û weke "derveyê zanistê, xurafe" îlan kiriye, li dijî wê şerekî bêeman desptêkiriye.

"Yek rêbazên zanistî tune ye ku ji cihekî din nehatibe dizîn." Ji ber ku beriya her fikrekî heye. Pêşveçûna bê bingeh-kok çênabe. Her fikra nû, her teorî, her fikra zanistî yê nû cureyekê sentez e. Ji tunebûnê nehatine afirandin. Tiştê yekane yê ku rêbaza zanistî kiriye, piştevana xwe tune hesibandin û înkarkirine. Bi vî awayî xwe dike bênîqaş, weke yekane rêya derbasdar di bîra civakê de bicih kiriye.

Mimkine ku vê sentez û pêşveçûna diyalektîkî, di pêşveçûna dîrokî civakî ya pergala raman de bibînin. Mîtosên devkî yên şoreşa neolîtîkê, pêşveçûnên bawerî û civakî, di encama

ceribandin û daneheva hezar salan ya merovê neolîtîkê de pêşket. Mîtolojiya Sûmeran, girêdayî mîtosa devkî, dewlemend ya Mezopotamya Jorîn şikil girt. Bawerî, felsefe, û avayiya fikir ya Zerdeşt ya ku di pêşveçûnên dîrokê civakî de rawestgeheke bingehîn ya ramane, ji sentezbûna mîtolojiya Sûmera û pergala fikir û zîhniyeta neolîtîkê derket holê. Ramanê Yewnan yê ku di dîroka raman de rawestgeheke duyemîne, ji senteza felsefeya Zerdeşt û pergala raman a Misrê şêwe girt. Em nikarin zanista Rojava ji derveyê van bigrin dest. Piştevana esasî ya zanista Rojava dîsa avayiya ramanê xwezayî yê Rojhilate. Kopernîk, ji ramanên berê yê Yewnana bi taybet ji Phîlolaosê Pîtagorasî sûdwergirt .

"Stêrnasiya modern û dînamîka modern; şixulîna nezanistî ya fikrên berî tofanê nebûna nikaribû pêş bikeve." Fikrên berî tofanê, pergala nirxên neolîtîk ya Rojhilat e.

Dema ku ez serkeftina ku Arîstercûs û Copernîk, li hember hêsa ji aqil re dan qezenckirin difikirim, şaşwaziya min bêsînore. Ji ber ku aqil ji bo hêsa red bike, dibe efendiyê baweriyan" (Galileo)

Dîsa stêrnasî di radeyeke girîng de ji Pîtagorasî û ji "hezkirina çemberî(daîre) ya Platonî" sûdwergirtiye û pêşveçûna xwe bidest xistiye.

Tenduristî jî bi heman şikî ji feraseta giyaderman ya Rojhilat, heta ceribandin, ezmûn, danehev û derûniya "pîrejin, pîrik, sêrbaz û dermanfiroşên seyyar" sûdwergirtiye û bi rê de çûye .

Îro pêşveçûnên mezintirîn yê di tenduristiya Çînê de vê rastiyê gelekî kartêker piştrast dike. "Serdestiya zanistê ne encameke ku

bi lêkolînê an jî piştrastkirinê were bidest xistin, encameke bi zextên polîtîk, sazûmanî heta leşkerî tê bidest xistine".

Çîn heta serdema 19. ji serdestiya Zanistiya Rojava dûr sekinî. Encax destpêka sedsala 20. sermayedarî, bazara herî mezin ya cîhanê Çîn xist bin bandora xwe. Girêdayî vê neslekî ciwan yê nû yê kû ji kevneşopî, adetên Rojhilat, ji feraseta wan ya sînordar, asteng dike bêzarbûye, ji "serdestiya sermayedariyê ya madî û hişmendî bandor bûye" derket holê. Ev neslê ciwan, piştgiriya îqtîdarên hindir û derve girt pişta xwe û bi lezînî zanista Rojava îthal kirin .

Zanista Rojava xwe spart hêza îqtîdarê û di demeke kurt de hemû zanist-raman-dokrtînên Rojhilat bi gotina"kêr nayê-derveyê zanistê ye" avêt kevnarxaneya Asar-î Attîka (berhemên kevin). "Tenduristiya giyaderman, akûpûnktûr, moksayakma, dualîteya yîng/yang teoriya Çîn bu mijarê henekan, ji mufredata dibistan û nexweşxaneya hat derxistin. Tenduristiya Rojava weke yekane rêbaza aqîlane hat qebulkirin." Bi vî awayî zanista Rojava bi sparteka îqtîdarê serdestî bidest xist .

Encax partiya komûnîst a Çîn sala 1954 an li ser "merovên zanistê" kontrola polîtîk ava kir. Tenduristiya kevneşopî, bi spartina hêza îqtîdarê weke fermî dîsa xist nav dibistan û nexweşxaneya. Ev di navbera tenduristiya zanistî û tenduristiya kevneşopî de derfetên reqabeta serbest û wekhev ava kir. Di encama vê de derket holê ku Tenduristiya kevneşopî ya Çînê li gor "tenduristiya zanistî ya rojava" hîn bêtir encamgir û serdeste. Li vir ji bo herdu qadên tenduristiyê derfetên wekhev yê reqabet û pêşbirkê hebû .

Nexwe; "îdeolojiyên ne zanistîne, teorî, kevneşopî encax, ger ji bo wan derfetê wekhev yê reqabetê were dayîn, wê bibin pozberekî xurt û dikarin kêmasiyên diyar yê zanistê derxin holê." An jî serdestiya xwe diyar bikin .

Bi mînaka Çîn re careke din derket holê ku merovê neolîtîkê xwedî fikir, nêrîn û zanisteke ku divê girîngiya wê were fêmkirin .

Dayik niştîmana zanist, raman û pêşveçûnên dîrokî ya Kevana Zêrîne. Ev yek rastiyeke bênîqaş e. Herî kêm li gor şehade û nûveyên heyî wisa ye. Hemû destpêk li vir pêşketine û li ser rûyê erdê belavbûne.

Em dizanin ku " yên ku di derbarê destpêkê de agahiyên wan tune ye, hemû agahiyên wan bêbingeh, çewt û xelet e. Dişibe avahiyeke bêbingeh. Li hember erdhejekê, ji karesat û trajediyên mezin re rê vedike. Destpêk havênê bîr û hafizeya civakiye. Hemû heqîqet li vir veşartiye. Qasî ku hafizeya xwe ya civakî rast ava bikin, dikarin heqîqetê tehlîl bikin û ber bi jiyaneke azad ve biçin. Destpêk û sirrê lêgerîna heqîqet û azadiyê li vê erdnîgariyê veşartiye. Axaftina yekemîn li vir hat gotin û li ser rûyê erdê belav bû. Lêgerîna yekemîn li vir destpêkir. Serpêhatiya merova ya merovbûnê li vir derket holê. Dîroka merova yekem car li vir hat havênkirin. Şaristaniya yekemîn li vir derket holê û li ser rûyê erdê belav bû." (Şaristaniya xerawreşk) "Nêzî 12 hezar sal berê li herêma ku di navbera çemên Dîcle û Firatê de dimîne, guherînên herî girîng ya dîroka merovahiyê dihat jiyîn. Merovatî ji terzê jiyana nêçîr-komkirinê ber bi jiyana bicihbûyî, pergala hilberîner ve diçû. Nêçîrvan û

komkerên bi hezar salan berê bi jiyaneke hêsan, mutevazî têr nebûne, berevajî merhaleyeke bihempa jiyîne, em vê yekê ji şopa tiştên ku li xerawreşkê hiştine dibînin. Li Xerawreşkê nûveyên bi ihtîşam yê abîdewî, karkeriyeke mikemel ya kevir disewirîne, bi teknîka nepixandina ser kevir, motîfên hatine çêkirin û veguhestin, dewlemendiya naveroka wan jî diyar dike ku gihîştine asteke fikrî ya girîft." (Profesorê asarnas Klaûs Schmîdt)

Şaristaniya Xerawreşk jî bi tena serê xwe, di dîroka merovahiyê de cih, girîngî û kok hucre bûna vê erdnîgariyê tîne ber çavan.

Bi taybet kolanên arkeolojîk yê Xerawreşkê çawa ku li hemû qada bi wî awayî ye li qada zanistê jî li ber ser û binî bûnên mezin rê vekir. Îdîaya zanista Rojava ya "bûna heqîqeta yekane" bi ser û bin kir. Şoreşa gund û çandî ya gelên Mezopotamyaya jorîn li Kevana Zêrîn pêşxistiye, heta sedsala 19. bênavber serdestiya xwe berdewam kir .

"Lêkolînên herî dawî yên li qadên antropolojî(merovnasî), asarnasî (û taybet dîroka zanistê, parapsîkolojiya nû bi nû pêş dikeve) diyar kiriye ku bav û kalên me li gor nûjenên me, li gor raqîbên Rojava gelek caran encamên hîn têrker û baştir derxistine. Zanyarên rojava bi nêzîkayiyê objektîf ya ezmûnxane nikaribûn hin xuyanokan diyar bikin, lê merovê seretayî xwedî nazariyên tendûristiyê, zanyariya gerdûnî, doktrînên jiyannasî bûn. Vê bi encamên ku derxistine holê diyar kirine".

Bêguman merovê serdema neolîtîkê xwedî pergala girîn û cidî ya ramana mîtos, teknolojî, afirîna hunerî, pergala baweriyê û

xwedî nêrînên girîng bûn. Merovê serdema neolîtîkê bi pirsgirêkên dema xwe yê qirase re rû bi rû bû. Van hemû pirsgirêkên civakî bi hostetiyeke mezin, bi afirînerî çareserkirinê biser xist. Çareseriyên ku peydakirine, encamên ku derxistine holê mohra xwe li hezar salan da.

Dîtina agir bi serê xwe pêşveçûneke mezin ya ku jiyana hemû merovahiye bandorkiriye bû.

Em ji bîr nekin ku " yên mîtosa, agir dîtiye rêka parastina wan jî afirandiye." Merovê serdema neolîtîkê yekem car li erdnîgariya Kevana Zêrîn heywana kedî kir. Hin nebat kedî kirin û hilberandin. Teknîkên avdanê yên xwe dispêre teknolojiyeke mezin pêşxistin. Erdên heta roja îro tên şixulandin bi dorê çandiniyê, piştî ku riz çandin divê heft sala li wî erdî riz neçînin. Ev yek hîn wê demê dîtin. "Hin tiştên ku çandiniya îro jî derbas dike, di vê astê de çeşîd ji hev cûdakirin." Li Xerawreşka ku di cîhanê de perestgeha olîmpîk ya herî mezine, fîgûrên(nîgar) heywana, peykel, nepixandinên li ser kevirên çikandî yên giraniya wan 70 ton e, roja îro di asta berhemên herî mezin yên hunera Rojava re bikevin reqabetê. Dîsa bi keştiyên ku ji keştiyên modern hin xurttir diçin, okyanûs derbaskirin û di derbarê deryavanî û taybetmendiyen amûrên wê de xwedî asteke zanebûna kû bi fikrên zanistî re nakoke bûn. Rastiya van agahiya bi ceribandina hatiye piştrastkirin".

Merovên serdema neolîtîkê bi xwezayê re di nav têkiliyeke lihevhatî de bûn. Di vê wateyê de xwedî zîhniyet heta felsefeyeke ekolojîk bûn. Merovên ku şoreşa neolîtîkê afirandin; " di navbera merov û merov, merov û xwezayê de pêwendiyeke

mezin dîtin û ji bo civak û zanista xwe bi selihînin xwe spartin van pêwendiyan".

Nexwe zanista kevneşop, pergala fikrê Rojhilat, bi astengiya îqtîdar, bi asteniya pisporî ya ku zanista rojava xwe dispêre, demên ku bi wê re rû bi rû nemîne, pêşketinên mezin derdixe holê.

Merovên ku şoreşa neolîtîkê afirandin, ferq dikirin ku guhertin û veguhertin di jiyana civakê û xwezayê de roleke çawa dilîze û encamên çawa diafirîne. Di rêzikên pêşxistinê de vê guhertinê hesab dikirin .

Zanista yên beriya Sokrat bi ‘’aqilîtî’’ re destpêdike û ber bi sedsala derbasbûyî ve hildikêşe lûtkeyê. ‘Zagonên xwezayî yên neguher’’ piştî li ser israra dogmatik û dirêj niha vegera nêrîna guherîna dema kevirê’ gelek bûyereke nû ye .

Hîn zêdetir ev dahênan ne xweajoyî bûn. Berhemê fikir û hûnandinê bûn. Merovê kû nêçîr û karê komkirinê dikirin, ji karkerên sinaî û çandiniya modern bêtir, heta ji profsorên kolana asara bêtir demên wan yê vale hebû. Di derbarê vê mijarê de gelek nûve hene. Ji bo ramana xwerû gelek derfet hebûn. Merov di vê yekê de îsrar bike valeye. Merovê "serdema kevir" di dahênanên xwe de weke xweajoyî rêbaza rast yê zanistî şixulandiye. Ger wisa bûna û ev rêbaz gihîştandina encamê rast, nexwe piştre merovên zanistê çima ewqas pirr gihîştin encamên cûda? Û weke em dibînin tiştekî ku bi navê rêbaza zanistî tune ye. Nexwe, ger zanist ji ber serkeftinên xwe tê methkirin nexwe divê sed qat bêtir pesnê mîtolojiyê were dayîn. Ji ber ku serkeftinên wê di asteke bê qiyas de hin mezintir bûn. Afirînerên

mîtosa çandê destpêkirin, aqilparêz ji wê guhertin û him jî her tim ne ber bi ya baş ve." (P. Feyerabend)

Di avayiya zanista serdema neolitîkê ya ramana kevneşop de nêzîkayiyeke diyalektîk xwezayi, mantiqê guherîn û veguherînê serdeste. Di mîtos û destanên berê de ev mantiqê xwezayî yê guherîn veguherîna xwezayî û diyalektîkî ji serî heta binî derdikeve holê. rêzikên teqez, hişk tune ne. Berî zagona, rêzikên hişk "merhaleyên fikirînê", "hevsengiyên dînamîk" hene .

Wek mînak di dastana Ramayana de du hêzên bingehîn hene. Ji aliyekê ve Rama û Sîtayê qencî temsîk dike, ji aliyê din ve hêzên xirabiyê hene. Di felsefeya Zerdeşt de jî hema hevsengiya dualîst a dînamîk heye. Di dastana Mem û Zîn de ev hevsengî di navbera Mem û Zîn(yên baaş) û Beko Awan û Mîr(yên xirab) de ava dibe. Di şahname de dîsa heman hevsengiya hesas heye .

Bi heman şikilî di Hesîodosê ku merhaleyên fikir yê kevin diparêze, zagon piştre avadibin(quralêen Zeûs) berhemê hevsengiya hêzên li dijberî hevin.(di navbera xwedayên zincîrkirî de). Berhemên hevsengiyeke dînamîk(çalak)in".

Nexwe şêwe û merhaleyên ramanên xwezayî yên Rojhilat newestarin, li gor van hevsengiyên dînamîk diguherin. Bi van hevsengiyên dînamîk re têkilîdar diguherin û vediguherin. Zagon û rêzikên hişk piştî van hevsengiyên dînamîk avabûne. Halbukî di zanista mêtinkar ya Rojava de li sedsala 19. zagon neguher û teqez hatin qebûlkirin. Yanê divê weke berhemên hevsengiya di navbera hebûnên hevdu sînordar dikin de divê werin dîtin. Em dikarin vê yekê bi rihetî diyar bikin. Feraseta gerdûnnasî û avayiya fikir ya di dastanên Şehname, Ramayana,

Memê Alan û Hesîodos de ji zanista mêtinkar ya Rojava ya sedsala 19. hin bêtir pêşketî û serdestin .

**11-Zanista Mêtinkar ya Rojava Bi Şaşitiya dagirtiye:**

Rêbaza zanistî, "zanistê mêtinkar yê Rojava" ji bo gihîştina heqîqetê xwe ji merovahiyê re weke yekane rêya rast pêşkêş dike. Rabirdûyê înkar dike û xwe dixe bênîqaş. Halbûkî zanista mêtinkar ya Rojava bî şaşitiya dagirtiye.

**a-Zanista xwezayî kevneşopî a Rojhilat:**

Îro dema zanist tê gotin Rojava tê bîra. Tiştê bi navê rêbaza zanistiyê, veguheriye amûreke ji berjewendiyên pergala mêtinkar ya Rojava re xizmet dike. Ji vê alî ve "rêbaza zanistî" an jî bi navekî din yê xweser "Zanista Rojava" berjewendiyên mêtinkariya kapîtalîst îfade dike. Di xizmeta berjewendiyên aborî, siyasî yê Rojava û bêtirîn di xizmeta îqtîdarê sermayedar de ye. Vê yekê mîna "zanista mêtinkar ya Rojava" binav kirin, bawer dikim wê nirxandineke rast bibe .

Ji ber ku zanista mêtinkar a Rojava her zanistên li derveyê wê dimînin, pêşdikevin bitundî înkar dike. Her tiştê li derveyê wê dimînin bi gotina "derveyê zanistê" mehkûm dike .

Halbûkî koka zanistên xwezayî yê Rojhilat digihîje heta kûrahiya dîrokê. Civaka neolîtîkê afirînerê vê zanistê "kevana zêrîn" jî erdnîgariya wê ya bingehîne. Bandora şoreşa çandiniyê ya ku xwe dispêre zekaya hestyarî ya afirîner, wekhevîxwaz,

azadîxwaz a jinê, heta sedsala 19. şoreşa sinaiyê didomê. BZ 10000 salan de li erdnîgariya kevana zêrîn zanisteke bêhempa ya xwe dispêre çandiniyê, zanebûn, hêza raman, teknolojî û jiyan pêşdikeve.

Herî dawî kolandinên asarî yê li Xerawreşk-Riha, Newala Çorî-Curnê Reş, Çemê Helan-Êlih, Girê Kortik-Bismil hatîne kirin, nûve û belgeyên di van kolandina der derketine holê vê rastiyê zêdetir piştrast dike.

Nexwe zanistê tenê bi zanista Rojava, Ewropa re destpêkirin, bi wir re sînordarkirin gelek çewt û xapînere.

**b-Kok Hucreya Zanista Mêtinkar ya Rojava, Zanistên xwezayî yên Rojhilate:**

Zanista Rojava a mêtinkar, ji ezmana nehatiye xwarê. Ji nişka ve mîna dayîna xwedê nederket. Weke dîrokî civakî bi piştevaniya zanebûn û daneheva merovahî teşe girt .

Zanista xwezayî ya Rojhilat, şoreşa çandiniya bêhempa ya Kevana Zêrîn, mîna pêlên çandê li ser rûyê erdê belav bû. Şaristaniya Sûmer ya dewletî-çînî ya ku li Mezopotamya Jêrîn derketiye holê, li ser bingeha şoreşa neolîtîkê bilind bû. Şaristaniya Sûmer, pala xwe dida zekaya analîtîk ya zilam. Yekemîn tiştê ku kir, li hember jinê, û berhemên xwe dispêrin zekaya hestyarî ya jinê şêr îlan kir. Zanebûn, zanist û teknolojiyê dixe bin xizmeta îqtîdarê û nêrîtiyê pêş dixe. Ev nêrîtî û ji xizmeta îqtîdarê re pêşwazîkirin, bi sermayedariyê re derdikeve lûtkeyê .

Encax zanista Rojava xwe ji koka xwe qut dike, û ji rabirdûya xwe razber dike. Ji koka xew razberkirin, ji civakê qutbûnê derdixe û bi vê re vediguhere dijberiya merov û civakê. Weke ku tê îdîakirin zanista Rojava yekane zanist û heqîqeta rast e؟

Zanista mêtinkar a Rojava, zanista Rojhilat weke "ne zanistî" radigihîne. Zanista Rojava tenê rêbazekî esas digre. Nêzîkayiya "Rêbaza ku hun dişuxilînin ne zanistiye, ji ber vê em nikarin ji encamê wê bawer bikin û ji bo lêkolînê em nikarin pere bidin we" esas digre. Nexwe hemû zanebûnên li derveyê xwe dimînin di destpêkê de mehkûm dike. Rêbaza xwe weke yekane rêbaza rast îlan dike. Zanista Rojava weke yekane vebijarka zanistê dest girtin, rastiya civakî û pêşveçûna dîrokî û zanista Rojhilat a ku daneheva hezar salan ya merovahiyê ye înkarkirine .

Zanista mêtinkar ya Rojava îro bi encamên xwe ve veguheriye dijbertiya civakê û bûye amûrê herî bibandor yê îqtîdarê .

**c-Zanista Mêtinkar a Rojava xwe dispêre aqlê nêr:**

Di bingeha zanista Rojhilat ya xwezayî de ji aqlê analîtîk bêtir zekaya hestyarî ya jinê heye. Ji vê hêlê ve aliyên wê yê wekhevixwaz, azadîxwaz û civakî li pêşin. Berjewendiyên civakî esasin .

Zanistê Rojava, berhemê aqlê nêr, zekaya analîtîk e. Zekaya analîtîk aqlê nêr e. Cewhera aqlê nêr xwe dispêre tundiyê. Bi nêrîna îqtîdarê ye. Zext, kontrol kirin, kedxwarî, wêderkirin xisletên wî yên bingehînin. Zanista Rojava ya xwe dispêre aqlê

nêr van hemû van taybetmendiyan dihewîne. Di vê wateyê de bi gelemperî xwe dispêre dijbertiya jinê .

**d-Serkeftina Zanista mêtinkar a Rojava xwe dispêre îqtîdarê:**

Zanista Rojava dema ku rast were bikaranîn, bêguman gelek tiştên bide merovahiyê hene. Encax zanista mêtinkar a Rojava yekser bî îqtîdarê ve hevgirtiye û jê re xizmet dike. Serkeftin-seltanat û kontrola li ser rûyê erdê bidest xistiye xwe naspêre serketina xwebûna aqlê nêr. Di serkeftina wî de tiştê diyarker îqtîdar e. Amûrê herî çalak û diyarker yê îqtîdarê ye .

Ya yekemîn; Amûrê herî çalak yê îqtîdarê ye. Hêzên dagirker yên îqtîdarê di destê xwe de dihêlin, li cihê dagirkirine, bi rêka hezar û yek deq û dolaban, hile û amûran terzê jiyana xwe, adet û nêrîtên xwe terzê zîhniyet û fikrandina xwe ferz kirine. "Dema ew hatin di destê me de axên bibereket hebûn, di destê wan de jî încîl. Piştre axa me ya bibereket bu ya wan, di destê me de tenê încîl hebû." (gotinên mezinên Efrîqa) Zanista Rojava ji vê zîhniyetê re xizmet dike. Ev rastî, heta îro ji serî heta binî bi şêweyeke herî hişk didome .

Ya duyemîn; Zanista mêtinkar ya Rojava xwe dispêre hêza çekan. Hêza mêtinkar ya Rojava heta roja îro çekên herî semewq, herî xeter, herî tuneker afirandiye. Qraltiya zanista mêtinkar ya Rojava xwe dispêre ev hêza serdestiya çekan. Îro îqtîdar û zanista Rojava wekhev bûye û hevgirtiye. " Zanista Rojava - ez bala we bikşînim, ev parçeyekê herî biçûk yê zanista

berfireh û dewlemendî dihewîne ye- heta niha amûrên mirinê yê herî bibandor afirandiye." (P. Feyerabend)

Nexwe serdestî, serkeftin û yekanebûna zanista Rojava ya mêtinkar ne li ser hêza fikirandina azad e, xwe dispêre îqtîdar û hêza çekan .

**f-Zanista Mêtinkar a Rojava Tekparêz e:**

Xweza xwe ne dispêre tekîtiyê, xwe dispêre piranîparêzî, çeşîtdarî û cûdabûnê. Cûdabûn, çeşîtdarî û piranîparêzî dewlemendiya herî mezin ya rastiya jiyanê ye. Jiyan, xweza û gerdûn tenê di nav qalibên zanista Rojava de nayê hepskirin. Cur bi cur zanistên ku merovahiyê di merhaleya dîrokî de pêşxistiye hene. Rojhilat di vê mijarê de xwedî mîraseke gelekî dewlemende. Eşkereye ku keseke bi feraset û zîhniyeta zanistên cûda li cîhanê dinêre, wê ji feraseta zanista Rojava cûdatir binêre .

Zanista mêtinkar a Rojava ji bo her tiştî yekdest bike, weke yekane rastî û heqîqet xwe îlan dike, hemû rêbazên zanistê yên li derveyê wî diminin weke derçax, paşverû, xurafe îlan dike, bi vê re xwe li ser kursiyê bênîqaşbûnê bicih dike. Halbûkî " zanista cîhana yekemîn di nav gelek şêweyên zanebûnê de tenê yek ji wan e. Ji ber ku îdîaya ji vê zêdetir wateyekê dihewîne berdewam kiriye, ji lêkolînvanî derketiye û bûye grûba zextê. Pêşveçûna zanebunê li gelek cihan tê wateya mirina zihna û hevsengiya ekolojîk ya hesas ya ku vê zîhniyetê ava kiriye."

(Paul Feyerabend) Halbûkî ev tekîtî bi xwezaya dewlemend ya xweza-gerdûn û civakê re nakok e .

**e-Zanista Mêtinkar a Rojava Dijberî Civakêye:**

Sermayedarî dijberî aborî û civakê ye. Dijberî merov, xweza û jinê ye. Her tiştî mîna tişteyekî dixe xizmeta kedxwariyê. Tu tiştê ku bide merovahî û civakê nemaye. Pergala sermayedarî weke tevayî civakê ji bo xizmeta kulmek kesên xwedî yekdestî pêşkêş dike. Civak bixwe tişteyê ji kedxwariyê re hatiye vekirine. Di vê wateyê de bi tevayî dijberî civakê ye.

Zanista mêtinkar a Rojava di xizmeta îqtîdar, kedxwariyê de ji xweza, demokratîkbûn û azadiyê re xizmet nake. Ji civakbûnê bêtir ferdbûnê pêş dixe. Weke encama van hemûya Zanista Rojava ji aliyê erkê pêktîne û encamên xwe ve dijberî civakê ye .

**g-Zanista Mêtinkar a Rojava ji Exlaq Bêpar :**

Zanista mêtinkar a Rojava hemû nirxên civakî tune dihesibîne. "Zilamên zanistê" yên ku erkê rahibekî hildigrin, ji îqtîdarê re xizmet dikin. Yên xizmet nakin, merovên zanistê yên rast û birûmet, rastî xezeba bêeman ya îqtîdarê tên .

Zanista mêtinkar a Rojava hemû nirxên manewî, moral û exlaqê civakî tune dihesibîne. Dema çekên herî hewlnak diafirîne, encamên van yê li ser merovahî û civakî ji nedîtî ve tê. Dikarin bêjin ku zanista Rojava di derbarê exlaqê civakî, nirxên manewî û moral de tu destûr, rêzik, hêman nasnake. Ji exlaq

bêpar maye. Ji bo qezenc û kedxwarî komkujî û cinayetên herî hêwilnak pêş dixe .

**h-Zanista Mêtinkar a Rojava xwe dispêre yekdestîbûnê:**

Zanista mêtinkar a Rojava li îstîqameta berjewendiyên hindikaniya, li ser gerstêrka me serdestî pêk tîne. Ev serdestî girêdayî yêkdestîbûn û cîhanîbûna sermayedariyê pêş dikeve. Sermayedariya yekdest dibe tê wateya zanista Rojava ya yekdestbûyî. Zanebûn-zanist, zanîngeh, tehnîk hwd hemû di bingeha berjewendiyên çîna serdest de ji yekdestbûnê re xizmet dike. "Zanîngeh an jî weke giştî pergalên perwerdê tenê weke saziyên agahî belav dikin, tên qebûlkirin. Encax ev ne rast e, Hin çîn bi van saziyan hêzê di destê xwe de digrin, di heman demê de çînên din ji vê hêzê dûr dihêle." (Foûcaûlt)

**j-Zanista Mêtinkar a Rojava Dişibe Eşkiya Prokrûstes:**

Zanista Mêtinkar a Rojava, weke pergala xwe her tiştî li gel xwe navendî û yekdest dike. Zanebûna hatiye yekdestkirin, tê wateya zanista yekdestkirî. Di îstîqameta berjewendiyên kulmek kesên xwedî yekdestî de, tenê xwe sipartina "zekaya analîtîk", "aqil" "aqiltiya zanistî" ji civakê razberbûnê tîne. Zekayê analîtîk yê xwerû, aqil, rasyonalîteya zanistî vediguhere cureyekê rêbir Prokrûstes. Hewl dide ku hemû rêwiyên tên û diçin li gor standard û pîvanên xwe lihev bîne. Dibêje rastî û heqîqeta yekane ev e .

Halbûkî encamên zanistê rasterast civakê bandor dike. Ji vî alî ve tevlîbûna gel ji vê pevajoyê re, wê demokratîkbûna wê biafirîne. Heta ev pêk neyê, ji xeynî rêbir Prokrûstesê ku ji hindikayiyan re xizmet dike wêdetir nagihîje tu cihî.

**k-Zanista Mêtinkar a Rojava rêzikperest û dijdemokratî ye:**

Berî zanista mêtinkar a Rojava, gelo zanist tune bû؟

Zanistê bi modernîteya sermayedarî ve destpekirin heqîqetê îfade dike? Bi înkarkirina raborî û kok hucre îro wê rast were fêmkirin؟

BZ 10000 sal vir de şoreşa neolîtîkê ya li Kevana Zêrîn pêşketiye, heta sedsala 19. avabûna zanista emperyal, bênavber hebûn û serdestiya xwe domandiye, mohra xwe li hemû pêşveçûna daye .

Ji vê aliyê ve gelan, weke dîrokî- civakî xwedî danehev, ceribandin û ezmûnên mezinin .

Li ser ve mijarê bi rêbazên guncav gel tevlî nav vê pêvajoyê kirin, zanista alternatîf ya Rojhilat pêşxistin bêguman wê hîn bêtir demokratîk û bi feyde be. Ji ber ku zanista Rojava ji aliyê encamên xwe ve ne ji gel ji yên tên wêderkirin re, ji kulmek kesên xwedî yekdestiyê re xizmet dike. Zanist li vir di rewşa xizmeta sermayedariyê de ye. Gelek caran encamên wê ji bo gel zerar e. Di vê wateyê de ger gel tevlî vê pêvajoyê bibe, wê zanistê demokratîk bike. Santralên nuklerî, çekên kimyewî,

lênihêrîna hawirdor hwd. ji bo gelek tiştan yên herî li jêr biryar bidin, wê zanist demokratîk bibe .

Zanista mêtinkar a Rojava ji gel qut e, dijberî civakê ye û dijdemokratî ye. Li ser rêzikên sabît, sekan pêşve diçe. Di rêzikan de îsrar dike. " Li ser rêzikan îsrar, wê rewşê çareser neke, berevajî wê pêşketinê biseknîne." (P. Feyerabend) Zanista Rojava di xizmeta serdesta de, rêzikperest û dijdemokratî ye .

**-Weke encamp:**

"Zanist-rêbaza zanistî" yê di encama ronakbûn û şoreşên Ewropî de avabûye, weke hemû rêbazên din, ji bo fêmkirin, bi watekirina cîhanê û lêgerîna heqîqetê rêbazeke. Dema derket holê heta niha ji bo merovahiyê gelek tişt da qezenckirin. Di vê wateyê de "rêbazeke zanistî" heye; Rêbazeke ku dinya çawa avabûye, dişibe çê, gerdûn çawa avabûye, merov ji kuderê tê û diçe kuderê, têkiliyên dinya-merov-xweza çawa pêşketin, derdixe holê. Encax weke ku tê îdîakirin, bênîqaş zanist yekane rêbaza rast e? Yekane çavkaniya zanebûne, yekanê rêbaza agahiya ye؟

Merovan di dîrokê de hemû pirsgirêkên derketin pêşberî wan bi rêbazên çeşîtdar çareserkirin û bi vê re hebûna xwe heta îro ne domandin؟

Nexwe di vê rewşê de, rêbazên din yên zanebûnê em ê ji binî ve înkar bikin? Zanist bi Rojava ve tê sînordarkirin? Demên ku zanista mêtinkar a Rojava tunebû an jî ne serdest bû, gêl û civakan pirsgirêkên derdiketin pêşberî wan çawa çareser dikirin؟

Merovê civaka neolîtîkê, pirsgirêkên xwe bi kijan rêbazan çareserkir û rê li ber pêşveçûnên şoreşî vekir؟

Merhaleyên çîn û dewlet tunebû, merovan hemû pirsgirêkên xwe ne bi rêbazên xwe çareser dikirin؟

Pirsgirêkên civakî û xwezayê yên ku jiyan derdixist pêşberî wan, çareser dikirin û li ser linga neman؟

Nexwe li vir nêzîkayiyeke şaş û çewt heye. Zanista Rojava bi vî awayî pîrozkirin û weke yekane rêbaza derbasdar derxistina pêşberî merovahiyê, merovahiyê bêvebijark hiştine. Tiştê ku li pişt vê nêzîkayiyê ye zanista Rojava û diyalektîka îqtîdarê ye .

Berî her tiştî di sedsala 21 . de zanist û modernism (nûjenparêzî) , di îstîqameta berjewendiyên hindikayiyan de li ser kursiya îqtîdarê rûniştiye. Di çaxa me de îqtîdar û zanist hema hema yekparebûne û wekhevbûne. Dîsa weke ku tê îdîakirin zanist ne bêteref e .

Zanist û modernîzm di kursiyê îqtîdarê de hevkarên pardariya gelêrî ne. Ev hevkarên xurt, di çaxa me de kujerê bitesbît yê hemû cinayetên li hember merovahiyê hatine kirin in .

Ne bitenê ne jî. "Bi gelemperî aqilparêzî bi wan re ye. Aqilparêzî bîrdoziyeke wisaye, dike ku zanist bi şikilekî eşkere û sîstematîk tê afirandin û hemû kevneşopiyên din bêhikm dihêle." (Paul Feyerabend)

Ev bîrdozî lîberalîzma ku hemû "îzm" (paşgira ku wateya bîrdozî, bawerî û rêbazan dide) a di girdava xwe de dixeniqîne, di çirava xwe de direzîne û tune dike. Zanist û modernîzm di pêşengiya lîberalîzmê(serbestî) de li ser kursiya îqtîdarê seltenata xwe didomînin. Lîberalîzm bi hêrsa xurtkirina îqtîdarê,

zanistê weke yekane vebijarka bênîqaş rast pîrozkir û di mejiyan de bi cih kir. "Zilamê zanistê" ji ber ku bi modernîzmê re li trêna îqtîdarê siwar dibe, êdî tu ferqa wî ji rahîbên Sûmer, ji keşeyê dêrê û "qadiyê Osmaniyan" yê ku di derheqê Pîr Siltanan de fetwaya mirinê daye, namîne. Ji ber hemû xizmeta îqtîdarê dikin. Li vir qet wateya rêbaza dişuxilînin namîne. Bi ser de dema ku rêbaza zanistê bi modernîzmê re li ser kursiyê îqtîdarê dirûnê ji hemûyan bêtir xeter e .

Mîna tê îdîakirin " zanist bi awayekî aqilane pêş neket. Rasyonalîte û rêzikên eşkere, ev zanista ku aqilparêzan weke yekane çavkaniya agahiya ya derbasdar didîtin wê tune bikira".

Ger zanist bi awayê aqlane, di xeta berjewendiyên yên tên wêderkirin de pêş biketina bêguman, hewngirî(rasyonalîzm) wê zanista îro tune bikira. Ji ber ku "aqil û zekaya analitîk" bi şêweyekî herî hişk û dogmatîk bû îqtîdar. Zanebûna ku zanistî afirandiye, li dijberê wêderkirina, xistin xizmeta hindikayiyan. Eşkereye ku li vir tiştekî bi navê hewngirî tune ye. Tenê ji bo xizmeta îqtîdarê bike pêşkêşkirina aqlê analîtîk heye.

Her çiqas beriya wê jî hebû, bi yekemîn şerê cîhanê re zanist bi tevayî bû îqtîdar û cewhera xwe wenda kir. " Weke hin taybettir, zanista cîhana yekemîn di şertên taybet de derketiye holê. Ji ber vê dibêjim ku hin fikrên ne gerdûnî dihewîne. Mînak: Fikrê objektîfiyê û fikrê pêdiwiya bi melhezeyên çendahiyî piştrastkirina zanebûnê. Ev fikrên ku wezîfeya hişyarkerên xurt dilîzin, weke gerdûnî derbasdarbûna wan hat îlankirin. Bi vê îlanê re qasî şert û hawirdora jê re rê hatiye vekirin, zanisteke celebîn û xisûsî hat afirandin .

Halbûkî şert û hawirdorên cûda, ji gerdûnîkirina xisûsiyetên cûda re, nexwe ji zanisteke cûda re rê vedike. (ya rast vekir jî) pratîka zanistê gelek şikilên cûda digre. Ji ber wê ye kû zanisteke cîhana sêyemîn ya rêka xwe ji zanistên ku ji zanîngeha û amojgehên teknîkî tê fêrkirin qutkiriye, afirandina wê pêkane." (Paul Feyerabend)

Zanist bi modernîzmê re her çiqas li kursiyê îqtîdarê rûnişt hema hema erîşî her tiştê ku ne ji wê ye kir. Dema weke yekane rastiya li ser nayê nîqaşkirin, li qata xwedê rûnişt; hemû rêbazên li derveyê xwe "derveyê zanistê", derveyê rastiyê, xurafe, derew, "şaşitî-derewî" îlan kir. Xwe ji kokên xwe qut kir û weke ku ji ezmana, ji qata xwedê daketiye, weke "rastiya yekemîn ya nayê nîqaşkirin" pêşkêş kir. Bi tevayî bi mantiqê mêtingeh, "hemû zanistên ne rojavayî" hedef girt û dest bi rizandîn, tunekirina wan kir. Wisa berpêş kir ku ji xeynî rêbaza zanistî, hemû rêbaz îflas kirine û riziyane .

Halbûkî ev rêbaz bi tevayî îflas nekiribûn. Di lêgerîna heqîqetê de ew jî qasî "zanistê" rêbazeke xwedî fonksiyon bûn. sedema rast ya li hember "rêbaza zanistî" bê bandorkirina van rêbazên, ne serdestbûna yek ji wan an jî rastbûna wan bû. Sedema bingehîn îqtîdar bû. Pere û hêz bû. Serdestiya modernîzmê bû. Serdestiya leşkerî ya hêzên mîna DYE, YE yên "rêbaza zanistî" esas digrin bû.  Ji ber ku di serî de bombeya atomî, "zanist" xistibûn xizmeta şer .

Beriya rêbaza zanista mêtinkar a Rojava, di serî de gelên Rojhilat, rêbazên hemû gelên xwecihî hebû. Ev rêbaz xwe dispart serpêhatiya hezar salan û ji bo rêbaza zanista mêtinkar a

Rojava alternatîf bû. "Ji bo qeweta wan bigihîje çareseriya pirsgirêkên xela, demsal û karesatên xwezayî, rêbaz û pircureyên zanebûnê yê gelên xwecihî hebû. Ev rêbaz ( bi nêrîna Rojavayî) ji objektîfiyê bêpar in, ji çendahî bêtir girîngî didin çawaniyê, lê dîsa jî qat bi qat ji zanista mêtinkaran û tiştên hewariyên wan yên pêşketinê wê bibêjin baştir e." (Paul Feyerabend)

"Zanista Rojava", "Zanista aqlîtî" an jî "rêbaza zanistî" bizanebûn pişta xwe da serpêhatiyên bi hezar salan yên Rojhilat. Li ser navê "kêr nayên" avêt goşeyekî. An jî beşeka wê kir malê rêbaza xwe û pêwendiya wan bi gelên xwecihî re qut kir. Li hember van şerekî bêeman destpêkir .

Zanista bi modernîzmê re li ser kursiyê îqtîdarê rûniştiye, dı tunekirina hemû rêbazên derveyê xwe dimînin bibiryar bû. Ji aliye Rojavayiyan ve mîna yekane rêbaza rast qebûlkirina rêbaza zanistî, ne ji ber feraseteke hin baştir an jî jiyaneke hin baştir diafirîne ye, ji ber ku çekên hin baştir diafirîne ye." (Paul Feyerabend)

Eşkereye ku şaristaniya Rojava xwe çiqas bi etîketa demokratiyê cîla bike û hewldana veşartina xwe bide jî, xwedî taybetmendiyeke gelekî madeyî û êrişkar e. Weke herî dawî ji aliyê Emerîka ve dagirkirina Rojhilata Navîn, bi hêza leşkerî di nav gelan de nakokî, pevçûn û aloziya avakiriye vê yekê ji her alî ve dipeyitîne .

zîhniyeta Rojavayî ya ku dixwaze bi çekan serdestiyê bidest bixe, "rêbaza zanistî" ji zanistîtî qut kir, hema hema mehkûmê rêzikên sabît, dogmatîk kir. Li hemû saziyên fermî, dibistan û

zanîngehan ev rêzikên sabît ji merovan re dan fêrkirin û fêr dikin. Ji ber ku "modernîzma Rojavayî" ji bo berjewendiyên xwe "zanisteka ji made fêm dike û di lêkolînên çekan de encamên mikemel dide, tercix kir ".

Ev zanist qasî ku xwe ji bo hemû cîhanê yekane rêbaza rast îlan kir, ji bo xwe li hemû cîhanê belav bike û serdest bike dest bi hewldanê kir. Li gor ev hêmanên ku di îstîqameta berjewendiyên xwe de avabûne, her tiştî weke "madî" digre dest. Her tiştî di nav kêşeya "kirde-tişte" de digre dest. Hewl dide merov û xwezayê jî weke "kirde-tişte" îzbat bike. Sedema vê her tiştî madî kirin û ji mêtingehiyê re vekirine. " Merov û hebûnên din weke pergalên madî îlan dike. Ev îlankirin biser jî ket. Merov û hebûnên zindî beri her tiştî heyînên aliyên wan yê madî hene û bi rewşên herî tund re dikarin lihev bikin. (Ger hun li hember kûçikekî miameleya deraxa berteka bikin, wê vê yeke fêr bibe û weke deraxa bertekan tevbigere, bi vê re we dilê we xweş bike.)" (Paul Feyerabend)

Halbûkî merov zindiyê herî girîft û pêşketiye. Tenê bi qalibên madî nayê sînorkirin. Merov; lihevkirin, qasî ku madî ye, ewqas xwedi nirxên manewî, ruhî, moral, coşî, metafizîk, derunî ye. Hebûneke bi van nirxan re serî radike, berxwe dide ye. Îro di bingeha hemû nakokî û pevçûna de ev kêşe heye .

Zanistî di bingeha berjewendiyên modernîzmê(nûjenparêzî) de di nav qalibên madî de hatiye hepskirin. Merovê serî radike, dikare ev qalibên di asta ol de ne hilweşîne. Her gel, her civat, her çand, her şaristanî (wek mînak şaristaniya demokratîk) li ser bineha zanistî, ji bo pêdiwiyên xwe dikare zanisteke alternatîf,

demokratîk înşa bike û pêş bixe. Yanê zanisteke demokratîk, alternatîf pêkan e. Ji bo vê divê destpêkê qraltiya zanistaa îqtîdarbûyî hilweşînin. Ji ber ku di rewşa heyî de "rêbaza zanistî" di xizmeta modernîzmê de ye, ji zanistbûnê derketiye û ketiye asta olekê. Heta ku vê parçe nekin, li hember vê tekoşîn nekin, îqtîdara heyî, wê ji zanisteke demokratîk û alternatîf re destûr nede.

Bi gelemperî dîrok bi taybet dîroka heqîqet û şoreşên azadiyê, weke cewhera jiyana civakî, piralî, zindî, livdar, biziravî, girîft, kûr û tevayî ne. Xwedî naverokeke ewqas dewlemendin ku dîroknasên "herî baş" û zanistvanên rêbaz nikarin xeyal bikin .

Dîroka ku şikilê "bîra civakî-hişmendî" ye, bi pêşveçûnên mezin yên civakî, bi rasthatiniya, bi fetl û fitûl, bi konjonktûra, bi bûyerên li kêleka hev, di nav hev de, û bi ser û bin bûyînên şaşker ve tijî ye .

Di vê wateyê de bi taybet dîroka lêgerîna heqîqet û azadiyê, ji bo me bi hemû rehendên xwe, bi hûrgilî, giriftiya(tevlihevî)diyalektîka rastiya merov û civatên merovan pêş çavan dike. Di vê wateyê de encamên teqez yên bûyerên civakî û çalakiyên aîdê merovan, ji berê ve nayê texmînkirin û nayê ber çavan. Nêzîkayî û rêbaza dîrokê yê determînist bi şaşitiya dagirtiye.

Nexwe rêbaz bi qalibên westar û rêzikan ve nayê girêdan. Ji vî alî ve bi gotina Goethe " teorî her tim gewr, jiyan her tim keskê girtî ye." Divê rêbaz, qasî ku neyê xeyalkirin dewlemend be. Ji ber ku heqîqeta ku em li pey ketine an jî heqîqeta ku em hewl didin zelal bikin, diyardeyeke ku em zêde nizanin. Bi rêzik û

qalibên ji berê ve hatine diyarkirin, teqezkirin, çareseriya ev diyardeyên ku em nizanin ne rast e. Qasî ku em rêbaz dewlemend bikin û çareser bikin, şensê gihîştina heqîqetê û zanebûnê jî wê zêde bibe .

Nexwe azadiya merovan zêdekirin, teşebusa avakirina jiyaneke tije û hêja, teşebusa beranberî vê ya sirrên xweza û merova kifşkirinê, redkirina hemû standartên gerdûnî hewce dike." (Paul Feyerabend)

Di vê wateyê de di lêgerîna heqîqet û jiyana azad de rêzik, standard û qalibên hişk yên rêbaza divê werin redkirin. Rêzik û hêmanên neguher, teqez, mîsoger di lêgerîna heqîqet û azadiyê de her tim astengî çêkirine û rê li ber bawerhişkî vekirine. Weke encam; Rêbaza zanistî bi halê xwe yê herî hêsan xwe dispêre rêbaza mekanîk yê Newtonî. Îro bêguman ketiye xizmeta modernîteya sermayedar. Di domandina pergala mêtinkariyê de weke amûreke girîng rol dilîze .

## E- RÊBAZA DIYALEKTÎK A METERYALîST:

Hevçaxên wî navê "tarî" li Heraklîtosê bavê diyalektîkê kirine.

Dibêjin ku Heraklîtos rojek li "Perestgeha Artemîs, bi zarokan re kap diavêje (lîstikeka bi hestiya tê lîstin) Ji kesên ku bi şaşwazî lê dinêrin re wiha dibêje; 'Hun çima şaşbûn rezîlno' Qey min bi we re dewlet rêvebirina wê hin baştir bûna?" Rastî jî li vir yê tarî kiye؟

Dewlet weke dîrokî civakî bi avabûn, sazîbûn, pêşveçûn û sepandinên xwe ve reştariye. Di dîrokê de hemû cinayet, komjujî, zext, kedxwarin, koletî, kuştin-mirin û tundî weke encam û pêwistiya zîhniyeta dewletê pêş ketîne .

Dijberên wî ji ber ku ji Heraklîtos fêm nekirin navê "tarî" lêkirin. Halbûkî ew, çanda civaka çemê bingehîn ya dijberî şaristaniyê hin watedar didît. Rêvebirina dewletê û karên dewletê mîna reziltî dinirxand .

Heraklîtos dema diyalektîka xwe ava dike, ji pirsgirêka "hebûn" destpe dike .

Madeyê bingehîn an jî hêmana bingehîn weke "agir" diyar dike. "Cewhera xwezayê agir e." Sedema heyînê ya hemû hebûna û çavkaniya bingehîn weke agir derdixe holê. Ji ber agir her tim di nav guherîn û veguherînê de ye, di pirsgirêka hebûnê de diyarker e .

Li gel Heraklîtos çavkaniya guherîna diyalektîk agir e. Di agir de tiştên mîna westarî, sekinîn tune ne. Ev hebûna hemû dijberan pêktîne. Ev avabûn li ser nakokî û pevçûna ava dibe. Nexwe, "Hebûn çeşîdekî qada pevçûn û şer e." dibêje .

Li gor Heraklîtos "pevçûn-şer bingeha her tiştiye." (Polemos pater panton) "Agir, hewa, av, ax" di avabûna gerdûnê de diyarkerên esasî ne. Ev hêmanên çarmend " di nav pergaleka

diyarker de vediguherin hev." Agir vediguhere hewayê, hewa vediguhere avê, av vediguhere axê, ax jî vediguhere agir. Ev çar hêman her tim derbasî nav hev dibin. Ev derbasbûn ne rasthatinî ye, li gor "aqlê gerdûnî" (logos) pêktê. Yê pergal û herikînê pêk tîne logos e. Ji van hemûyan ev derdikeve holê:

Di felsefeya Zerdeşt de agir, hewa, av û ax weke parçeyekê xwezayê pîroz e. Ev pîrozkirina xwezayê, divê bi xwezayê re di nav hevsengiya diyalektîkî de be. Diyalektîka Heraklîtos xwe dispêre felsefeya Zerdeşt. Hucreya bingehîn dîsa "Kevana Zêrîn e".

Sokrates ji Eurîpîdes re dibêje; " Tiştê min fêmkirine pir xweşin, ez wisa difikirim ku yê min fêmnekirine jî wisa ne. Ji bo ku bigihîjin kûrahiya Heraklîtos noqaveke Delos'î pêwist e".

Dibistana Stoa, ew têgîna wî, logos ji xwe re esas girt û felsefeya xwe pêkanî. Ev têgîn ji Stoaparêzan derbasî tevgera Îsewî bû. Goethe, Hölderlîn, Nîkolaûs û Bergson jê bandor bûn .

"ji Cîhanê re wê her tim rastî pewist be, nexwe her tim wê Heraklîtos pêwist be." (Nîetzsche)

"Tu axaftina Heraklîtos tune ye ku min nexistiye nav mantiqa xwe" (Heqel)

Eşkereye ku di bingeha van hemûyan de çanda neolîtîkê ya Mezopotamya jorîn, kevneşopî û terzê fikirîna wê heye. Encax Heraklîtos, diyalektîkê ne bi dijberiya avayiya hindirîn ya madeyê, bi nakokiyên avayî yên derve re digirt dest. Bi kêşeya jiyan-mirin, sar-germ, şer-aşitî, ronahî-taritî, roj-şev, zêdek-kêmek, bî nêzîkayiya dualî ya Zerdeşt dinirxand .

Nexwe ji tehlîlkirina avayiya hindirîn ya rast ya gerdûn-xweza-civak dûr bû. Zîndeya hindirîn û hêza hindirîn nedidît. Tenê bi nakokiyên madî tevdigeriya .

Heraklîtos diyalektîkê ne weke rêbazekî ne jî weke amûrekî dişixulîne. Berevajî, ew avayiya vê hebûnê, weke vegotina diyalektîkî ya bi navê "logos" diyarbûye, didît. Ha ji ber vê sedemê, dema dibêje "robarek bi heman şikilî du cara naherike" an jî " di çemekê de di cara nayê şuştin" vê rastî û diyarkirina gerdûnî îzah dike .

Yên navê "tarî" li Heraklîtos kirine jî, her cureyê nêzîkayiyên subjektîf îdealîst (Sokrates, Kant) û objektîf îdealîst (Platon, Hegel) pêşxistin û çavkaniya wê spartin xwedê. Cihê logos û agir vê carê, rasterast, bi şikilekî eşkere ramanê xweser girt. Nûnerên vê yê herî diyar Platon, Kant û Hegel e .

Li hember vê aliyê ku pirsgirêkê tenê bi rehenda madeyî digre dest şêwe girt. (Heraklîtos, Feûerbach, Marks)

Sedem û çavkaniya made dîsa di nav made bixwe de geriyan. Bi vî awayî du şêweyên cûda yên şîrovakirina diyalektîkî, yên mohra xwe li her tiştî didin, derketin holê.

Marx û Engels berevajî feraseta diyalektîkî ya ji Yewnan hatiye, şîroveyeka nû ya diyalektîkî pêşxistin. Hegel şîroveya îdealîst ya diyalektîkê avêt û şîroveya meteryalîst bişikil kir. Bingeha objektîfî ya feraseta diyalektik meteryalîst, li sedsalên 18.- 19. sê pêşveçûnên bingehîn yên di zansita xwezayî de pêktîne .

Ya yekemîn; kifşkirina hucreya zindî ya destpêka organîzmayên girîft e .

Ya duyemîn; Kifşkirina destûra veguherîna enerjiyê ye. Ev bi xwe re têhn, elektrîk, meqnetîz, enerjiya kimyewî hwd. ji aliyê çawanî ve şikilên çûda yên heman rastiya madî ne .

Ya sêyemîn; Teoriya Darwîn ya peresanê ye. Darwîn bi lêkolîna xwe ya binavê Jêderka Cinsa, derxist holê ku hemû zindî encam û berhemên peresanê ne. Darwîn bi xwe spartina paleontolojî û nûveyên xwedîkirina heywana, destûra veguherîparêzî pêşxist .

Ev her sê kifşkirinên li qada xweza-madî, rehendên mekanîk yên fizîk û Paradîgmaya Newton derbas kir an jî hin bêtir kûr kir û rê li pêşiya şîroveyên nû vekir .

Ev di felsefê de ji aliyê Marks ve rê li ber pêşxistina feraseta diyalektîka meteryalîst vekir .

Weke dixuyê, di dîroka felsefeyê de nêzîkayiya diyalektîkî û terzê şîrovekirinê gelekî kevn e. Berhemê çanda civaka çemê bingehin e. Veguherîna vê ya pergaleke teorîk jî bi felsefeya Yewnanî destpê dike. Bi Hegel û Marks re hin bêtir tê kûrkirin û digihije şîroveyên cûda. Peyva diyalektîkê, di sê wateyên bingehîn de hatiye şîrovekirin û şixulandin .

Ya yekemîn; tê wateya hunera gotûbêj û nîqaşê. Fîlozofên Yewnana kevin bi rêka gotûbêj nakokiyên di fikrê yê li dijberî wan derdixistin holê û bi vê re gihîştina heqîqetê raber dikirin. Di vê wateyê de gotûbêj tê wateya " bi rêka nakokiya çareserkirinê, hunera gihîştina rastiyê "

Yewnaniyên kevin, diyalektîkê hin bêtir weke huner û rêbaza nîqaş û gengeşeyê girtin dest. Heraklîtos, dema dibêje "di çemekê de du cara nayê şûştin" guherîn û veguherîna li xwezayê

digirt dest. Encax Zenonê Elea'yî diyalektîkê weke hunerê "nakokî, dijberî, cûdayiya derxistina holê, nîqaşkirin û yê li hember xwe binxistin" digirt dest. Platon, diyalektîkê weke şeweyêke erenî yê şixulandina aqil şîrove dike. Arîsto jî weke " li dijî fikirîna teqez û zanistî, aqil şixulandin û rêbaza ravekirinê" dinirxand. Bi vî awayî destgirtina diyalektîkê a Heraklîtos dihat berevajîkirin .

Ya duyemîn; Diyalektîk weke şêweyê şixulandina aqil, darizandin, dan aqil hat destgirtin. Ev nêzîkayî ji aliyê Hegel ve hat pêşxistin û kûrkirin. Hat tanzîmkirin û gihişt şîroveyeke îdealîst. Li vir nêzîkayiyên ji xeynî Heraklîtos bi fikirandinê re eleqedarin. Kirde fikire. Nêrîna îdealîst pêktine .

Ya sêyemîn; Di hebûn û fikir de bi rêka nakokîbûnê guherîn, veguherîn û pêşveçûn derketina holê, weke destûra pêşveçûna xweza-gerdûnê û rêbaza lêkolîna wê hat dest girtin. Ev jî di çerçoveya her sê kifşkirina de bi Marx re gihîşt şîroveyeka meteryalîst .

Vebijarkên yekemîn û duyemîn, rasterast aîdê kirde û fikir in. Bi gotineke din tekilîdarî kirde û fikirandinê ye. Ya sêyemîn jî "him bi fikir him jî bi hebûnan ve " têkilîdar e .

"Ji ber ku şêweyê destgirtina bûyerên xwezayê, rêbaza naskirin û lêkolînê û feraset, şîrovekirina bûyerên xwezayê, teoriya wê meteryalîst bû, Marx jê re got diyalektîka meteryalîst".

Lêgerîna heqîqetê û gihîştina heqîqetê çawa ku pirsgirêka bingehîn ya hemû felsefeya ye ji bo Hegel û Marx jî pirsgirêkeke bingehîne .

Encax kok hucreya diyalektîkê Rojhilat e. Destpêkê li vir derketiye û şikil girtiye. Anîimîzm û totemîtî ya li civaka neolîtîk serdest bû, xwezayê bi şîroveya diyalektîk digirt dest. Li gor vê, xweza her tim di nav tevgerê de ye û bi rihên zindî dagirtiye .

Xweza, ji pêşveçûnên azadîxwaz re vekiriye. Westarî, sekanbûn tune ye. Di cewhera xwezayê de tevger, guherîn, veguherîn û çêbûn heye .

Bi guherîn û veguherînê re têkildar, li ser bingeha zindîbûnê, destgirtina xwezayê, di felsefeyên Rojhilat yên piştre de jî tê dîtin. Felsefeya Zerdeşt di vê mijarê de gelekî balkêş û raveker e. Felsefeya Zerdeşt ya li ser pevçûna ronahî-tarîtî, qencî-xirabî sazbûye, cewhera diyalektîkê pêktîne. Di xuliqînê de pevçûna dualî ya di navbera ronahî û taritiyê de hêmana diyalektîkê "yekîtiya dijberan-nakoki û pevçûna dijberan" pêktîne. Di destgirtina pirsgirêkan de nêzîkayiya biprensîb ya Zerdeşt "rast bifikre, rast biaxive, rast bike" him rêbaznasiya yekemîn him jî ji bo guherîn û veguherîna diyalektîkê mînakeke gelekî raveker e .

Di felsefeya Çîn û Hindî de jî ev dijberî esas e. " Çînî ezmana mîna nêriyekî zayandanî, erdê jî yanê axê mîna mêya berhemdar didîtin." Jiyan û pêşveçûn li ser nakokî û pevçûna van herduyan avabûye. Di cewher de şerê qencî û xirabiyê ye .

Aliyê din yê felsefeya Rojhilat nêzîkayiya metafizîkiye. Aliyê derdikeve ev e. Ev pêvajoya ku bi Rahibên Sûmeran ve destpê dike, bingeha hemû olên semawî jî pêktîne .

Yê pirsgirêkê yekem car birêkûpêk digre dest, Hegel e. Hegel, têgîna "îde, aqil an jî geîst" bingeh digre û gihiştina heqîqetê esas digre .

Marks jî ve berevajî dike. Yê madî dixe bingeha her tiştî û bi vî awayî gihîştina heqîqetê armanc dike. Rêbaza diyalektîk meteryalîst, 150 salên dawî di lêgerîna azadiyê ya kedkar û yên hatine wêderkirin de diyarker bûye. Li dijî serdestan tekoşînên civakî yên mezin bi xwe spartina vê rêbaza hat meşandin. Weke utopya mezin û hêviya azadiyê, girseyên kedkar bandor kir. Ji bo vê bi milyonan ketin tevgerê. Bi milyonan ji bo vê baweriyê jiyana xwe dan ber. Ji pêncan du parê cîhanê weke erdnîgarî ket dest û sosyalîzm hat înşakirin. Şoreşên herî mezin û bêhempa ya hemû demên borî pêkhat .

Encax encam weke tê xwestin nebû. Destkeftî û mewziyên bi ewqas berdêlên giran hatine bidestxistin, di carekê de veguherî dijberî xwe. Sosyalîzma pêkhatî ya hatiye înşakirin, weke sermayedariya burokratîk pratîk bû. Bêguman gelekî rexne û nirxandina vê hat kirin .

Nexwe bi rexne û nirxandinên hatine kirin şaşitiya esasî çibû؟

Esas xeletî çibû ku pergala hatiye avakirin di carekê de bigiştî hilweşiya؟

Eşkereye ku şaşitiya bingehîn rêbaza hatiye şixulandin bû. Rêbaz kêm û şaş bû. Li ser navê sosyalîzmê jî were kirin, xwe dispart qalibên zihnî yên rahibên Sûmeran avakiriye. Bi vî awayî pergala hatiye avakirin jî di encamê de ji entegrebûna sermayedariyê xilas nebû .

Çavkaniyên bingehîn yên rêbaza diyalektîka Marksîst, hêmanên ku Hegel peşxistiye ne. Cûdahiya di navber de li "şûna aqil-îde" cih dan "made" Lenîn; "Bi wateya herî guncav diyalektîk, lêkolîna pêşveçûnên di cewhera tiştan de ye." dibêje .

Hegel, rêbaza diyalektîk pêş dixe, birêkûpêk dike û "mantiqê diyalektîk" pêktîne .

Feurbach'ê ji Hegel bandorbûye jî berevajkî Hegel, weke bingeha her tiştî made girt dest û felsefeya xwe li ser "meteryalîzmê" bişikil dike. Felsefeya Feurbach weke "merovparêzî û siruştîparêzî" jî binavkirin pêkan e. Ji ber ku Feurbach, xwezayê bingeh digre. "Berî her tiştî bal kişandiye ser pêşaniya xwezayî û fikir jî weke sawîn û berhemê xwezayê dest girtiye. Her tiştî bi bingeha qeba meteryalîst girt dest û "îdealîzma objektîfî" pêşxist .

Marks jî qakilkê îdealîst ya rêbaza meteryalîzma Feurbach avêt, şûna wê nêrîna xwe ya meteryalîst avakir. " Feuerbach rixme bingeha xwe ya meteryalîst ji xeleka îdealîst ya kevneşop rizgar nebûye û îdealîzma wî, di felsefeya ol û exlaq de xwe bi eşkereyî diyar kiriye." (K. Marks)

Nêrîna cîhanê ya Marks meteryalîst e. Hemû bûyer û diyardeyan, pêşveçûnên dîrokî bi vê rebazê meteryalîst digre dest .

"Xweza mîhenga diyalektîkê ye. Dikarin bêjin ku zanistên modern yê xwezayê ji bo vê piştrastkirinê, materyalên gelek dewlemend û her diçe zêde dibin peydakiriye. Bi vî awayî îsbatkiriye ku pêvajoyên xwezayê ne metafizîk e, diyalektîk e. Bi yeknesakiya bêdawî ne li ser heman xelekê dizivire, ji xêzeka

rastîn ya dîrokê derbas dibe. Di vê mijarê de ji nebat û heywana heta merova, cîhana organîk ya îro berhemê pêvajoya pêşveçûnekê ye. Ji milyonan sal berê heta îro pêş dikeve. Darwînê ku van tişta derxistiye holê û derbeyeka tûj li têgihîştina metafizîkî ya xwezayê daye, divê em behsa wî bikin." (K. Marks)

"Hemû xweza, ji ya herî biçûk heta ya herî mezin, ji liba biçûk ya xîzê het rojê, ji hucreya zindî seretayî heta merov, her tim di nav heyîn, tunebûn, herikîn, livdariya û guherîna bêdawî de ye".

Berevajiyê îdealîzma ku cîhanê mîna "îdea teqez", "rihê gerdûnî", cismbûna "hiş" dibîne, Felsefeya meteryalîzma Marksîst, cîhanê weke madî qebûl dike. Hemû bûyerên cûda yên li cîhanê, weke şikilên cûda yê madeyê liv dide dibîne." (Engels)

Heraklîtos; bi gotina "cîhan tevayî ye. Ji aliyê tu merovî ve nehatiye afirandin. Ew di rewşa agirekê bipergal dibiriqe, bipergal ditemire, mêjveyî û bêdawî ye, di halê agireke zindî de bû û wê her tim wisa bimîne." yekemîn nêrîna madeyî û diyalektîkî tîne ser ziman. Hemû nêrînên diyalektîk madeyî yên piştre, weke berdewamiya vê xetê pêş dikevin .

Engels, bi gotina "nêrîna meteryalîst ya cîhanê, bê kû tiştekî li ser bikin, di halê xwe de têgihîştina xwezayê ye" vê fikrê xurt dike .

Heraklîtos fîlozofê pêşeng yê kû diyalektîkê weke hêmana çalak ya gerdûnê difikire ye. " Yê ku yekem car diyalektîkê weke rêbaz şixulandiye jî Sokrates e. Ji bo Sokrates diyalektîk; bi rêka pirs û bersivên beramberî hev, zelalkirina têgîna ye".

Di felsefeya serdema nû de yê ku yekem car têgîna diyalektîk bikaraniye jî Kant e. Li gor Kant " diyalektîk mantiqê şaşiyê ye".

"Pevçûna di navbera du îdîayên cûda, encax him bi piştrastkirina nepêkaniya dijberê tez him jî nêpekaniya dijberê antîtez, were zelalkirin".

Li gor Hegel her têgînê ku rastiyê pêktîne, di nav xwe de dijberê xwe dihewîne. Fikir ji têgînekê(tez), dizivire dijber a di hindirê wê de(antîtez) ji wê jî dîsa dizivire dijberî xwe(yanê têgîna yekemîn), di nav tevgerîna diyalektîkî de digihije têgîna sêyemîn ya kû yekîtiya herdu têgîna pêktîne(sentez). Ev pêvajo naveroka hişmendî a dihêle ku fikir bigihije xwe, zêde dike. Li gor Hegel diyalektîk; qasî ku pêvajoya fikir ya hebûnê diyar dike ye, hêmana avabûna dîroka cîhanê ye jî ".

Marks jî diyalektîka Hegel digre û pergala felsefî ya xas ava dike. Pergala Hegel a ku serberjêr disekinî, li ser lingê xwe rûniştand. Fikir weke sawîna made dinirxîne. Bi vê re têkilîdar pergala xwe ya diyalektîk meteryalîst pêş dixe .

Dîsa feraseta dîroka peşveçûnî bi rêbaza diyalektîk meteryalîst, bi şikilê "tez-antîtez-sentez" bi rêkûpêk dike. Li gor Marks; ji bo xweza û civak were fêmkirin, nêrîneke diyalektîk û meteryalîst pêwist e .

Li gor Hegel; Her tişt dijberî xwe di hindirê xwe de dihewîne. Nakokî û pevçûna di navbera herduyan de pêkhatineke nû derdixe holê .

Çavkaniya pêkhatina destpêkê jî "îde-aqil-geîst e." Made û fikir li ser nakokî-yekîtiya- dijberan- oto dînamîzm, ji hev zêde dibin .

Ji bo Hegel ev hêman gerdûniye. Li vir "îde" awayekê gerdûnê ye. Ji ber xwe ve heye. Xwe di hindirê xwe de dihewîne. Bi serê xwe pêkhatineke xwerû ye. Ev merhala yekemîn ya afirînê ye.

Di bingeha feraseta bi tena serê xwe heyîna "îde", di nav xwe de hewandina xwe, di hindirê xwe de xwerûbûn, bandora kûr ya felsefeya Zerdeşt heye. Zerdeşt dibêje " destpêkê ronahiya xwerû û taritî di rewşa xewê de ji ber xwe ve hebûn." Ronahî bi awayekî xwerû xwe di hindirê xwe de dihewîne .

Ji bo Hegel, "armanca îde; di dawiyê de xwe dîtin, xwebûn û gihîştina hişmendî û azadiyê ye ".

Di felsefeya Zerdeşt de rewş hema hema eynî ye. Dema ronahî li dijî tarîtiyê şer dike ji sê merhaleyan derbas dibe. Piştre azad dibe û xwebûna xwe bidest dixe .

Li gel Zerdeşt hêmanên exlaq û olî li pêşin, Li gel Hegel jî aliyê felsefî hîn bêtir derdikeve pêş .

Diyalektîka Hegel jî di merhaleyên sê libî de derbas dibe. Di nav her merhalê de "tez, antîtez, sentez" heye. Li ser van her sê merhaleyan bilind dibe û digihije merhaleyeke jor. Dibe xwedî berrahiyê. Di vê wateyê de xweza êdî ne bi tena xwe ye. Bûye tiştekî ji xeynî xwe û ji xwe re xerîb bûye. Bi cewhera xwe re bûye nakok. Ev merhaleya duyemîn e. Di merhaleya sêyemîn ya "îde-aqil-geîst" de hemû nakokî ji holê radibin. Îde ji nû ve dest bi xwebûnê dike. Hişmendî gihîştiye azadiya xwe .

Marks vê berevejî dike. Weke pêkhatina yekemîn made digre dest. Merhaleya yekemîn " civaka komînal a seretayî- merovê xwezayî ye" û di rewşa tez de ye. Merhaleya duyemîn antîtez e û civaka çînatî ye. Merhaleya sêyemîn yanê sentez jî civaka

bêkedxwarî- bê çînatî- civaka komînîst e. Dîsa Hegel diyalektîkê li derdora çar hêmanên bingehîn digre dest .

**1-"Di pêşveçûna diyalektîkî de qet westarî tune ye.**

Otodînamîzm heye. Diyalektîk pêşveçûneke pêçokeyî(helezonî) nîşan dide. Her tişt li ser her tiştî bandor dike. Encax tu tiştek ne weke halê xwe yê berê ye .

Nakokîbûn heye. Tiştek him xwe him jî dijberê xwe dihewîne. Her tişt diguhere û dibe dijberî xwe. Nakokîyeke mîna di navbera Jiyan û mirin, erêkirin-redkirin de heye. Erêkirin; tez, înkar; antîtez bi pevçûna vê nakokîyê re tiştê derdikeve holê yanê sentez, înkarkirina înkarê ye .

Di merhalê de pêşveçûn mijara axaftinê ye. (çendanî vediguhere çawanî) Guherîn hêdî hêdî pêş dikeve, carekê de bi veguherîna çawanî biencam dibe. Çûyîna hebûnê carna merhaleyan pêş dixe. Ev di civakê de bi şikilê reform û şoreşan e".

Hegel weke çavkanîya van hemûyan "aqil" diyar dike. Marks van digre dest û berevajî dike .

Li şûna çavkanîya bingehîn, destpêkera yekemîn a diyalektîkê "îde-aqil-geist", madeyê bicih dike. Bi vî awayî diyar dike ku diyalektîka Hegel ya serberjêrî disekinî, li ser lingê xwe rûnişt. Engels bendên diyalektîkê wisa rêz dike; "1) destûra veguherîna çendanî ber bi çawanî û çep gerîn; 2) Destûra derbasbûna nav hev ya dijberan û 3) destûra înkarkirina înkarê"

**-Marks cûdahîya di navbera xwe û Hegel de wiha diyar dike؛**

"Rêbaza min ya diyalektîkî, ne tenê di bingeh de ji ya Hegel cûdatir e, bi tevayî dijberî wî ye. Li gor Hegel pêvajoya veguherînê ya ku bi navê 'îde' vediguhere mijareke bêteref, afirînerê rastiyê ye û rastî şikilî îde yê fenomenal(derve-bûyerî) e. Li gor min jî berevajiyê vê pêvajoya fikirînê, ji xeynî dinyaya made ya ku di mejiyê merova de vediguhere şêweyên fikirandinê ne tiştek e." (K. Marks)

Tezê dîroka bi pêşveçûnî jî wiha formûle dike. Tez; " civaka komunal a seretayî ye." Antîtez; "şêweyê hilberîna sermayedarî û merovê beyanîbûyî ye" Sentez jî; "komunizm, ji nû ve merovê xwezayî ye." Vê formûlasyonê bi navê meteryalîzma dîrokî li ser civaka tetbîq dike. Dîroka civaka, "civaka komunal ya seretayî, civaka koledar, civaka feodal, civaka sermayedar û civaka komunîst" ji van her pênc civaka pêk tê. Bi derketina milkê taybet, saziyên seravayî ava dibin û merov dibe xerîbê xwe.

Li gor vê, her tişt bi dertermînîstî-mecbûrî pêş dikeve. Nêzîkayîyeke bi pêşveçûnî heye. Dîrok her tim ber bi pêşve diçe. Yên piştre tên, ji yê berî xwe bêtir pêşverû ne û wê înkar dikin. Di dawiyê de merovahî wê mecbûrî bigihîje komunîzmê. Ji civaka neolîtîk derbasbûna civaka koledar-çînî mecbûriye û li gor ya berî xwe weke pêşverû tê nirxandin. Bûyera di nav têkilîya sedem-encam de digre dest û derdixe holê ku siberoja herî dûr mimkin e were zanîn .

Rêbaza diyalektîk di jiyana merovahiyê de, di dest girtina bûyer û diyardeyan de jênevegere. Encax rast dest girtina diyalektîkê, ji nûve şîrovekirin, ji diyarkirina yek jê kêşeya "fikir-made" rizgarkirin giringe. Diyalektîkê li gor "meteryalîst-îdealîst", li gor kêşeya "rih-made" ya Hegel û Feuerbach şîrovekirin tengker û xapînere. Diyalektîkê bi tevayî dest girtin, ji nû ve şîrovekirin, nirxandin, ji tengayîya rizgarkirin ji aliyê lêgerîna heqîqet û pirsgirêka rêbaz ve girînge .

Di pêşveçûna diyalektîkî de westarî qet tune ye. Destûra her tişt bizêv e:

Ev destûr ne tenê ji bo "made" an jî "fikir" e, ji bo hevrayî û tevayîya lihevatî ya herduya derbasdare. Tevayî û bitunîya kêşeya "partîkul-pêlik" ya kuantomê ji aliyê vê taybetmendiya diyalektîkî ve gelekî raveker e. Ev halê tevgera her timî di rastiya "parçeyên bin atomî" û ji rastiya kuantomê di tevayiya "made-rih" de xwe îfade dike. Made di nav vê bitunîyê de di nav livdariya bênavber de ye. Livdarî taybetmendiya bingehîn ya madeyê ye. Guherîn û veguherîna bênavber li gor ev destûra livdariya hindirîn teşe digre .

**-Destûra înkarkirina înkarê an jî ji çendanî derbasbûna çawanî:**

Ev destûr him li gel Marks him jî li gel Hegel mantiqa pêşveçûna rasterast pêktîne. Yek ji wan "ide-geîst" li navendê bi

cih dike, yê din made bi cih dike. Dema ji çendanî derbasbûna çawanî, mantiqê yê piştre, yê berî xwe înkar dike şaş e. Yê berî ji aliye yê piştre ve tê tengkirin û astengkirin. Encax, qet înkar û tune nake. Zanyarên Hîndî vê rastîyê berî hezar salan bi mînaka "robar- uman" derxistine holê. " Dema robar tevlî umana dibin, heyîna xwe ya robarî wenda dikin. Encax qet tune nabin. Di nav umanê de heyîna xwe didomînin".

Dema ev nêzîkayî li qada civakî tê bikaranîn di asta bilind de rasteqîn e. Civaka neolîtîkê ji aliyê civaka şaristaniyê ve nehat tunekirin. Her çiqas hatiye astengkirin, tengkirin jî heyîna xwe didomîne .

**-Destûra, derbasbûna dijberan nav hev:**

Ev destûra herî girîng ya diyalektîkê ye. Yekitiya dijberan ne tenê ji rehendê fizîkî, li gor avayiya hindirîn ya madeyê ve jî wisa ye. Destûra yekitiya dijberan ji bo me bituniya kêşeya "made-fikir" îfade dike. Yek ji van weke diyarkera esasî derxistina holê, vê guncaniya diyalektîkî ji holê radike. Di kêşeya made- fikir de yek ne bingeh yê din ne talî ye. Yek ne diyarkera ya din e. Berevajî, yekîti, bituniya herduya, hevdu temamkirin heye .

Mînaka herî şênber ya vê kêşeya "partîkul-pêlik e." Mînak; kêşeya "mirin-jiyan" aslîbûna yek ji "fikir-made" na, di heman astê de bituniya herduyan îfade dike .

Yek ji wan weke diyarker- bingehîn dest girtin, ya din înkarkirin e. Ev jî tê wateya an înkarkirina made an jî ya

înkarkirina fikir. Halbûkî tu tişt ji hebûnê tune nabe, ji tunebûnê çênabe. Di lêgerîna heqîqetê de tevayîya herduyan hîn bêtir watedar e .

**-Destûra otodînamîzm:**

Vê destûrê bi heman nêzîkayiyê dest girtin, wê hin bêtir rasteqîn be. Her tişt ji ya hêsan ber bi ya girîft, ji ya jêr ber bi ya jor, ji ya kêm ber bi ya zêde pêşdikeve, ne ji aliyê "made-fikir" ve di nav tevayiya herduyan de pêş dikeve. Ya "jor-pirr-girîft"; ya "jêr-kêm-hêsan" înkar nake. Berevajî ya "jêr-hêsan-kêm" di rewşa kok hucrê de ye. Dayika berhemdar e. Rewşa kurkketinê ye .

Ev "kok hucre" nebe hebûna ya din jî ne pêkan e. Ger nirxên civaka neolîtîkê tune bûna, şaristanî jî ne dibû. Ronîbûna Zerdeşt nebûna ronîbûna Yewnana kevin jî ne dibû. Ronîbûna Yewnana kevin nebûna çanda Ewropa ya îro jî nedibû .

Pirsgirêkê berevajî dest girtin û şîrovekirin ji aliyê mantiqa diyalektîkî ve hîn rasteqîn e. Ji ber ku îro her tişt ji aliyê şaristaniyê ve hatiye berevajîkirin. Adorno bi gotina " Em niha di demeka ku heqîqet weke derewa, derew jî weke heqîqetê dixuyê de ne." diyar dike ku modernîteya sermayedar merov xistine çi halê .

Marx wiha raber dike; bi vê nêzîkayîya dîroka ya bipêşveçûnî, derbasbûna komunîzmê wê bi welatên Rojava yên senayîbûyî re, li rojavaya ku şoreş û proleterya pêşketîye wê pêk were. Encax

pratîk li îstîqameteke berevajî wê, li civakên mêtingeh yên xeleka herî qels ya sermayedariyêne pêş dikeve.

Têkilîdarê pirsên Sosyalîzma pêkhatî çima û çawa hilweşiya, di pirsa kêmasiya bingehîn ya rêbaza diyalektîk meteryalîst çibû de lêgerîn wê hîn bêtir bi wate be .

Descartes ji fikra "ez" ê cîhanê- gerdûnê îdraq dike derdikeve rê. Ji cûdahiya "ez û tiştên li derveyê min" tevdigere. Li gor Descartes "ez" kirde, "tiştên li derveyê min" jî tişte ne. Descartes hemû paradîgmaya xwe li ser vê kêşeyê dihonîne .

Bêguman nêzîkayiya dualî ya xwe dispêre kêşeya "ez û yên din" berî Descartes jî hebû. Di fîlozofên Yewnan de jî hebû. Di Xiristiyanî de ev hîn bêtir şênber û bikok bû. Destpêkê di her sê olên semawî de dabeşbûneke bingehîn heye .

Destpêkê merov tevayî ye. Bi xwezayê re lihevhatî ye. Dabeşbûna yekemîn; weke merov û tiştên li derveyê merov, derdikeve holê. Ev di wateyekê de teşe girtina "xwedê-evd e".

Hêza afirîner(efendiyê afirîner) ji her tiştî re qadir e. Evd ji pêkanîna hemû fermanên efendî berpirsiyar e. Ev di dîrokê de amûrê bingehîn yê dabeşbûna çînîye jî. Ev di cîhana hindirîn ya merov de bi cûdahiya "baş-xirab" rê li ber dabeşbûneke nû vedike. Cûdabûna "efendî-evd" parçeyekê vê ye. Şeytan hemû xirabiya, xwedê hemû qenciya temsîl dike. Bi vî awayî Şeytan jî bi dabeşbûna "baş-xirab" di pratîkê de di cûdabûna çînî de xwe dibîne. Yên ku fermanê xwedê û dewletê pêk tînin evdên baş in. Yên pêk naynin jî weke Şeytan tên deximandin .

Pirsgirêka têkiliya hebûn bi fikir re, a fikir bi hebûnê re, a rih bi xwezayê re, a xweza bi rih re, di derbarê şîrovekirina gerdûn

û xwezayê de pirsgirêka bingehîn e. Made rih afirand an rih made afirand? Destpêkê xweza an rih tê؟

Ev pirs xala bingehîn a derketina hemû felsefe û fîlozofan e. Fîlozofan di dîrokê de her tim ji bo vê pirsê nêzîkayîya dualî diyarkirine û wan dabeşî du aliyan kirine .

Yên dibêjin rih li gor xwezayê destpêke, rih made afirandiye, bi gelemperî aliyê "îdealîzmê" pêk tînin. Yên xwezayê weke kartêkera yekemîn rih jî duyemîn dest digrin jî aliyên "meteryalîst" pêk tînin .

"Yekane rastî, dînyaya madî ya em jî di nav de ne û weke sehekî tegihîştin e... Hişmendî û fikrê me, her çiqas li ser hêsan bixuyên jî, berhemê organê madî û gewdeyî yanê yê mejî ne. Made ne berhemê rih e, berevajî rih bixwe ji xeynî berhemê herî bilind yê made bêtir ne tiştek e." (Engels) Weke ji van hemûyan tê xuyakirin her tişt di nav kêşeyeke dijwar de tê dest girtin. Made sereta û diyarker e. Fikir û rih talî ye. Ev halê berevajîkirina îdealîzmê ye. Her çiqas berevajî îdealîzmê cih digre jî, ji ber ku heman mantiq e encam heman encam derdikeve. Yek dibêje rih-fikir yê din dibêje made. Ev tengbûn ji tevayî qutbûnê derdixe. Bi rastî jî ev nêzîkayî di pratîka sosyalîzma pêkhatî de ji gelek aliyan ve di pêşveçûnên civakî de xwe diyar kiriye. Pênasekirina teng ya çîna proleter hewcedariya vê zîhniyetê ye. Di dîroka sosyalîzma pêkhatî de, hemû pêşveçûnên civakî-çînî bi navenda Sovyet dest girtin, encama vê nêzîkayîyê ye .

Descartes feraseta îdealîst esas digre. Bi cûdabûna "kirde-tişte" civakê dabeşî çîna dike. Weke kirde şexs, li ser xwezaya

ku weke tişte tê dîtin xwedî her cureyê mafê teserûfê ye. Dikare her cureyê kedxwariyê pêk bîne.

Nîqaşên " avahiya bingehî-avahiya jorîn" berdewama vê astengiyê ye. Sazîbûna avahiya bingehî-avahiya jorîn di civaka neolîtîkê de tune ye. Nîqaşên ev avahiyên dualî aîdê civaka şaristaniyê ye. "avahiya bingehî" diyarker e an "avahiya jorîn" diyarker e, nîqaş û pirsgirêka wê ji xeynî dualîyeke dijwar, teng û astengiyê tu tişt îfade nake .

"Hegel pergala xwe destpêkê ji avahiya jorîn yanê dewlet û hiqûqê dide destpêkirin. Çawa ku pergala gerdûnî jî, ji aqil-geîst dide destpêkirin. Marks jî pêşaniyê dide hêz û têkiliyên hilberînê ê ku weke avahiya bingehî bi nav dike. Ew jî her çiqas dibêje min li ser lingê xwe bi cih kir jî, heman mantiqê Hegel parve dike. Ew jî çiye? Yek, bingeh e, yê din talî an jî yê tê diyarkirin e. Ev bi mantiqa qeba ya kirde- tişte ve çûyîne." (A. Firat)

Li vir di nav dualîteyeke dijwar de dest girtina her tiştî şaşitiya bingehîn pêk tîne. Made- tişte weke bingeh, yên li derveyê vê weke sawîna wê dest girtin, di cewhera xwe de weke rêbaz bi Hegel re di heman xalê de tevgerîn û hevdîtin e. Ji aliyê pratîkî ve encama derketiye wisa ye .

Pêşveçûnên di fizîka Quantomê de rewşeke berevajiyê vê derdixe holê. Diyar dike ku fikir ne sawînekek ji rêzê ya made ye. Piştrast dike ku "zindîtî, meyla azadiyê û hîskirine" di xwezayê bixwe de heye. Çawa ku ti tiştek ji tunebûnê pêk nayê, ji hebûnê tune nabe; zindîbûn, hîskirin û fikir jî weke meylekê di xwebûna xwezayê de heye. Yanê fikir û made weke hevratiya lihevhatî di xwezayê de heye. Van ji hev cûdakirin, yek ji wana

weke diyarkerê bingehîn pênasekirin, bi cewhera diyalektîkê re nakok e .

Rêbaza meteryalîst li ser navê ku aliyê îdealîst yê Hegel vala derxe, di îstîqameta berevajî de tevdigere û bi çerxa helezonî digihije heman encamê. Di lêgerîna heqîqetê de tenê "made-aborî-sermaye-tişte" esas girtin, bi nêzîkayiya qeba tişteyî ya Feurbach re wekhev e .

Sosyalîzma pêkhatî, rîzgarîya netewî û demokratiya civakî, di pratîkê de weke versiyoneke sermayedariyê şênberbûna wê, di xeletiya rêbaz de lêgerîn wê hîn bêtir biwate û rast be .

Cûdahiya teng ya çînî jî têkildarî vê pêş dikeve. Lenîn ji ber vê dibêje "pêşveçûn, şerê dijberan e." Diyar dike ku şerê çînatî ji cûdabûna "kole-efendî, serf-beg, proleter-burjûwazî" pêk tê. Civakê bi kategoriya "proleter-burjuwazî" dabeşkirin, tekoşîna azadiye teng kirine. Di dîrokê de her tim têkoşînên civakî ne tenê li ser bingeha kêşeya "kole-efendî, proleter-burjuwazî, serf-beg" de pêşketine. Di dîrokê de bi sedan mînak piştrast dikin ku ev ne wisa ye .

Agadeya bajarê zilmê yê Akadiya, ji aliyê qebîle û eşîrên Gûtîyên proto-Kurd ve hatiye hilweşandin. Împaratoriya Sargon Qassit' an hilweşand. Di dîrokê de hilweşandina, yekemîn Împaratoriya mezin ya dagirker-koledar Asûr, ne bi destê koleyan hilweşiya. Berevajîyê wê ji aliyê Konfederasyona eşîr û qabîleyên Medan yên ku li derveyê dewletê sekinîn, hat hilweşandin .

Împaratoriya koleya ya herî mezin a ku ji dîrokê heta îro hatiye împaratoriya Romê ji aliyê hêzeke sê libî hat hilweşandin.

Raperînên koleyan, tevgera Îsa û gelên derveyê dewletê yên "wehşî" rola esasî pêkanî. Şoreşa Fransa ji aliyê çiptaziyan ve pêk hat. Ji sedî heştê û pênc yên şoreşa mezin a Rus pêkanîn, gundî-mûjîk bûn .

Di tevgerên rizgariya netewî ya Viyetnam, Angola, Gîne, Mozambîkî, Cezayir, Kûba hwd. bi navê "proleter" tebeqeyeke civakî tune bû. Pêşveçûna dîrokî bi mantiqê dualîst a çînî dest girtin, ne ji xêra yên hatine wêderkirine, ji bo xirabiya wan e. Ji aliyekî ve wan tênê hiştin û ji civakê qutkirin e .

Dahûrandina dîrokê ya tenê xwe dispêre şerê çîna, analîtîk û razber e. Di tu demê dîrokê de şerê çînatîya xwerû yê ku bûye bingeha pêşveçûna civakî, tune ne. Pevçûnên şênber her tim li ser ev herdu bingehîn gewdeyên civakî, di navbera şaristaniya demokratîk û şaristaniya dewletî de hatiye jiyîn .

Ev derdikeve holê. Nexwe, têkoşîneke çînî ya bê şaristanî ne pêkan e. Aliyek şaristaniya dewletî-çînî ye. Aliyê din Şaristaniya demokratîk ya xwe dispêre nirxên neolîtîkê, derveyê dewletê wekhevîparêz, azadîxwaz e. Têkoşîna esasî di navbera van herduyan de ye. Di nav heman şaristaniyê de du tebeqeyên cûda nakokî pêk tînin. Herdu çîn jî afirîna şaristaniyê ne. Weke ku di sosyalîzma pêkhatî, demokratiya civakî û di tevgerên rizgariya netewî de derketiye holê, serbikeve jî dîsa encam li leha şaristaniya dewletî ye .

Sosyalîzma pêkhatî di esas de ji ber ku qalibên zîhniyeta modernîteya sermayedar, pîvan û sînorê wê derbas nekir, di encamê de cihê ku gihîştê dîsa sermayedarî bixwe bû. Çîna proleter li ser navê Sosyalîzma pêkhatî ket rê, Sosyalîzma

pêkhatî jî hewce dikir bi terzê jiyanê xwe bispêre wan û şikilê şaristaniyê zelal bike û biafirîne. Sosyalîzma pêkhatî van nekir. Bivênevê wê veguherîna dijberî xwe. Ev rewş hatiye sere hemû bîrdoziyên ku li ser navê azadiyê derketine rê.

Di feraseta dîroka bipêşveçûnî ya sosyalîzma pêkhatî de dem û mekana bûyer û diyardeyan an zêde xumam in an jî ne diyar in. Ev "analîzên bê dem û mekan" yên li ser navê zanistî û ezmungerî hatine pêşxistin, di cewhera xwe de nêzîkayiyeke ji rêzê yê modernîteya sermayedar in. Di bingeha ev nêzîkayiyên bê dem û mekan de nêzîkayiya "ebed-mubed" heye. Xwe weke yekane rastî û vebijarka hemû demên ne diyar û bêmekan nîşandan e. Ev cureyekê nêzîkayiya xwedayî ye .

Marks civaka sermayedar ya pêş dikeve, li dijî feodalîzmê weke "şoreşger-pêşverû" pênase dike. Piştgirî dide tekoşîna ku li dijî feodalîzmê pêş dixe. Li gor mantiqa dîroka bipêşveçûnî, civak her tim ber bi pêş ve diçe. Lewma civaka sermayedar "ji berê" (neolîtîk, koledar, feodal) hîn bêtir pêşverû û baş hesibandina wî her hal şaşitiya herî mezin e. Halbûkî şaristanî bitûn e. Ji aliyê kedxwarî, zext, kontrolkirin û kolekirinê ve sermayedarî ji van ne çêtir e, berevajî kombûna hemûyan, lûtke û şêweyê wan yê herî pêşketî ye. Ezmûn û ceribandinên hemûyan şênber dike. Cûdahiya di navber de, sermayedarî vê hin bêtir bipînî, bi rêbazên hin zirav, kûr û xeter pêk tîne .

Sermayedarî îro veguheriye mekanîzmayeke ku merovahiyê tune dike. Li beramberê "civakên berê" ne pêşverûye, berevajî hemû cîhanê bi mantiqa "hin bêtir qezenc hin bêtir kedxwarî" veguheran gola xwînê. Di dîrokê de tevgera herî berfireh û kûr

ya kedxwariyê pêş xist. Di cîhanê de bihostek axa ku nekiriye mêtingeh nehişt. Dema van pêktîne, ji koleyên li pîramîdên Misrê, li bajarên bin erdê yê Çînê, koleyên li perehebînîya Romê hatin xebitandin qat bi qat bêtir merov hatin tune kirin. Tenê di duyemîn şerê cîhanê de 50 milyon bêtir merov jiyana xwe ji dest dan. Tenê bi yek bombeyê bi sed hezaran merov tunekirin. Eşkereye ku pergaleke bi vî awayî "pêşverû" hesibandin xeletiyeke mezin e .

Weke dîrokî civakî, nirxên merovahiyê afirandiye, ezmûn û ceribandina bi keda "kole-serf-karker" ve sînordarkirin xeletiye. Ev tê wateya nirxên ku merovahî afirand. Eşkereye ku ev pirsgirêka pîvan têra xwe ne raveker e .

Ne tenê keda zindî ya bi dijwariya agirê dijî, keda civakî, keda gelek beşên civakê û pêvajoyan, tenê weke ked û berhema kole-serf-kedkar destgirtin berevajîkirineke mezin e. Nêzîkayîya felsefeya telan, derew, hîle, kedxwarî, xesp û diziyê ye. Sermiyanê tenê li ser keda kedkaran hûnandin, keda hemû beşên civakê ne dîtin e. Burjûvazî ne tenê karkeran îstîsmar dike. Hemû nirxên gelan ku weke dîrokî civakî afirandine xesp dike. Di serî de bedena jinê, ji hû heta bi mû her tiştî ji kedxwariyê re vedike. Hemû nirxên madî-manevî ku civakê afirandiye, vediguherîne sermiyanê û ji kedxwariyê re vekirî dihêle. Li vir kedxwariyê tenê bi kole-serf-karker ve sînordarkirin, çavkaniyê spartina wê, pergala kedxwariyê ji hemû beşên din yê civakê razberkirin e. Em dizanin ku sermayedarî civakê bi tevayî dixe nav kedxwariyê. Hemû nirxên weke madî manevî pêkhatine

xesp û telan dike. Di serî de xweza her tiştî ji kedxwariyê re vedike .

Nexwe sermayedariyê ravekirin, ji bo ji xelasbûna wê têkoşînkirin têr nake. Ya li vir girîng dema têkoşînkirinê, rêbaza ku wê bigihijîne encama rast afirandin e. Dema ku rêbaza rast neyê hilbijartin her tişt vediguhere berevajiyê xwe û berevajiyê armanca xwe. Rixmê ku demokratiya civakî, rizgariya netewî û sosyalîzma pêkhatî berdêlên giran dan, ji veguherîna versiyoneke sermayedariyê ne filitîn .

## F) RÊBAZA CIVAKA AZAD:

"Encax her kifş bi heman şêweyê nayê îzahkirin û rêbazên ku berê encam digirtin, ger li siberojê werin empozekirin divê zirar bide. Teoriyeke zanistê ya ji bo hemû fealiyetên zanistî hêmanên avayî û standardan ava dike, wan bi rêka serlêdana aqil erê dike, divê kesên ku jê re xerîbin bandor bike. Lê belê teoriyeke bi vî awayî yekser bi merovên têkilîdar û merovên zanistê yê di derbarê lêkolînê de bi hin gavên şenber re rû bi rû dimînin, amûrekî xav e .

Paul Feyerabend

**Destpêk:**

Di lêgerîna heqîqet û azadiyê de rêbaz û rêzikên pêbawer, encamdêr û sabît yên ji berê ve hatine diyarkirin tune ne. Di

çerçoveya rêzikên hatine diyarkirin de tenê "rêbaza zanistî pêbawer" îlankirin, mînakeke ji rêzê yê dogmatîzmê ye .

Rastiya jiyanê guhêrbar, pirhejmar, rengîni û cûdaye. Nexwe di lêgerîna heqîqetê de her proje, her fikir, her teorî û rêbaza di nav şertên xwe yê xweser de divê werin dest girtin. Li gor rêzik û standardên ji berê ve hatine diyarkirin nayê dest girtin. "Şert û merc her çi jî be, amûrekî pîvandinê yê gerdûnî yê ku her mezinahîyê dipîve her çiqas ne rasteqîn be, fikrê rêbaza mayînde û gerdûnê yê ku pîvanê gerdûnî yê besbûnîyê ye, heta fikrê aqiltî yê mayînde û gerdûnî jî di wê astê de ne rasteqîn e".

Di nav yekitiya mijarê de, min hewl da ku di lêgerîna heqîqet û azadiyê de nebesbûna rêbazên mîtolojîk, olî, metafizîk, meteryalîst û zanistî derbixim holê. Bi van rêbazên gihîştina wateya jiyanê, afirandina jiyana azad û ji bo gihîştina heqîqetê ne encamgir e. Nexwe çareserî çiye? Di gihîştina jiyana azad û heqîqetê de divê kijan rêbaz esas bigrin؟

Ji bo afirandina jiyaneke azad çavkaniya bingehîn ya agahiya û xala destpêkê divê çibe؟

Li vir çavkaniya esasî û xala derketinê merov bixwe ye. Ji ber ku lêgerîna heqîqet û azadiyê aîdê merova ye. Merov weke hebûneke civakî, di dîrokê de her tim ji bo ku ji koletiyê rizgar bibe û jiyaneke azad biafirîne, lêgerîna xwe bênavber domandiye. Ji bo vê utopyayan, mîtosan, olan, fikrê ezmanî, raman û felsefeyan, bîrdozî pêş xistiye. Encax, di dema şaristaniya dewletî de keda mezin, hewldan û bi berdêlan ev lêgerîna bênavber domandiye, her tim veguheriye dijberî xwe.

Li hember şaristaniya xwe dispêre koletiyê, pergaleke çalak-şênber, alternatîf ne afirandiye. Çima؟

Ji ber ku merovan tiştê wendakiriye ne li cihê wendakiriye, li cihê şaş, bi rêbaz û amûrên polîtîk yê şaş lê geriyaye .

Rêbazên şaristaniya dewletî-çîni ya ku li dijî derdikeve, ji bo hilweşîne hewldide, şixulandiye. Heman rêbaz û amûrên polîtîk heman encam derxistiye. Dewlet hilweşandiye û li şûna wê dewleteke nû, hîn xurttir ava kiriye. Li şûna cenawirê hewldide ku bikuje, cenawirekî hîn xurttir afirandiye. Ev jî şibandina celadê xwe, hebandina celadê xwe afirandiye û rê li ber berdewamkirina pergala koletiyê verkiriye .

Merov divê yê wendakiriye li cihê wendakiriye bigere. Heqîqeta wendayî, "bihuşta" wendakirî, azadiya wendakirî, wekheviya wendakirî di çand û civaka "çanda çemê bingehîn" ya li "Kêvana Zêrîn" pêkhatiye veşartiye. Halbûkî yên ji bo heqîqet û azadiyê derketine rê, çareseriyê her tim di nav şaristaniya dewletî de li Rojava, di nav şaristaniya Rojava de geriyane. Her hal sedema encam negirtinê û binketinê divê ev be.

Ji ber ku civaka çemê bingehîn berhemê civatên bi aqlê dewletê, bi zîhniyeta wê, çanda wê, bi koletî û kedxwariyê re hev du nasnekirine bû. Berhemê zîhniyet û aqlê merovê xwezayî û neolîtîkê bû .

Cehnema li dijî tê derketin, tê mehkûmkirin jî encama aqilê analitîk yê şaristaniya dewletî afirandiye bû. Koletî, kedxwarî û zext destûra mecbûrî ya şaristaniya dewletî ye. Herdu jî afirînên zîhniyet, xeyal û aqilê merovin .

Nexwe şîfreya heqîqet û azadiyê ne di civakên dewletî de, di civaka azad, çanda çemê bingehîn de, li Mezopotamya jorîn, di nirxên ku merova dike merov de, di merov bixwe de divê lê bigerin. "Her li çi bigerî, di xwe de bigere/ Ne li Qudsê, Mekeyê, Hec ê." Sirrê heqîqetî di tevayîya rastiya merov de veşartiye. Nexwe "xwe bizane"!

"Xwe bizane" kok hucreya hemû zanebûna ye. Şîfreya zêrîn ya lêgerîna heqîqet û azadiyê ye.

Ji aliyê dîrokî civakî ve û bi rehenda heyînî merov, him kirde him jî tişteya hemû zanebûna ye .

Mîna nakokiyekê jî bixuyê, merov him hebûneke li pey heqîqetê dibeze, him jî çavkaniya heqîqetê ye. Ji vî alî ve bi şîara "xwe bizane" derketina rê, mimkine nêzîkayiyeke raveker be. Lêgerîna heqîqet û azadiyê weke rêbazî li ser vê xalê destpêkirin, lêgerîna merovan ya utopîk a hezar salan mimkine bigihijîne encameke dewînî .

Nirxandin û tehlîleke ji rastiya dîrokî-civakî, ji rojaneyîtîya tê jiyîn qut, eşkereye ku wê kêmasî û şaşitiyên girîng bihewîne. Ev di heman demê de tê wateya utopyayên li ser siberojê jî şaş werin hunandin. Pêşveçûnên dîrokî civakî yê diyalektîk qasî ku di nav yekbûnê de tê dest girtin bi wate ne. Nêzîkayiyên ji vê yekbûnê qut wê şaş bin. Dîrok bîr û hefizeya civakî ye. Ev bîra civakî li ser diyalektîka raborî, rojane û siberojê hatiye avakirin. Kêmbûna lingekî wê rê li ber çelexwaritî û şaşitiyan vedike .

Di vê wateyê de, rastiya civaka xwezayî û neolîtîkê ya di jiyana merovahiyê de serdema herî dirêj e, bê kû bi tevayî were dîtin û ravekirin, îro û siberoj rast nayê hunandin .

Bûyer û diyardeyan tenê bi rehendên rojane, bi rewşa tê jiyîn ve îzahkirin û şopandin ne bes e. Ev merova dibe encamên şaş. Yê rojaneyî bi hezar û yek bendikan girêdayî ye. Li ser bingeha raboriyê teşe digrê û ava dibe. Raboriyê di nav xwe de dihewîne. Rojaneyî li derveyê raboriyê nikare hebe. Ji bo ravekirina rojaneyî raborî, ji bo ravekirina raborî jî ravekirina rojaneyî pêwist e. Raborî û siberoja rojaneyî di nav xwe de dihewîne. Simbileka genim ya niha qasî ku libeke genim ya berî xwe ye, bi dehan simbilên siberojê jî di nav xwe de dihewîne. Ji aliyê dîrokî civakî ve raborî, rojaneyî û siberoj tevayîya diyalektîkî ye. Raborî, rojaneyî û siberoj jî di merov de dibe yek. Ji xeynî ked, aqil û xeyalê merova xuya nabe. Ji bo siberojê hûnandina çandina genim, di vê qadê de kêmasî, nebesî û şaşitiyên berê û yê rojane rast tesbîtkirin û derbaskirinê re pêkan e .

Dema rojane, di lêgerîna heqîqetê de bersivê hemû pirsgirêkan di hindirê xwe de nahewîne. Ji bo vê jî divê raborî jî detayî were dest girtin û tehlîlkirin. Ev jî têr nake, divê siberoj jî di nav diyalektîka heqîqet û azadiyê de were hûnandin .

Li ser raborî lêkolan-vekolan jî pirsgirêka rê-rêbaz hewce dike. Ger rêbaz nebe raborî rast zelal nabe.

Bêguman li vir rêbaz dive rêka ku digihîne heqîqet û jiyana azad be. Xeletiya rêbaz di lêgerîna heqîqetê de digihîne encamên şaş. Di civaka sermayedar de heqîqet û îqtidar bûne wekhev û bi yek bûne. Ji ber vê ji her alî ve çareserkirina îqtîdarê, bi hemû rehendên xwe ve dahûrandin û derxistina holê hewce ye. Heta kêşeya "heqîqet û îqtîdar" neyê derbaskirin nagihîjin encamên rast. Ji vî alî ve li dijî pergala dewletî, kedxwar, koleker, weke

dîrokî civakî, li her qada jiyanê helwesteke tevayî danîn wê watedar be. Berî her tiştî rêbazên mîtolojîk, olî, metafizîk, zanistî yên hatine ceribandin û bê encam mane, divê werin derbaskirin. Dîrok çeşîdekê hişmendî, bîra civakê û rastiya tekoşîna civakî ye. Divê neyê ji bîr kirin ku merov him kirde him jî tişteyê têkoşîna civakî ye .

Raborî, rojaneyî û siberoj bitûnî ye. Di kêliyê de asê bûn, kêliyê pîrozkirin û keliyê jiyîn, pergala heyî derbas nekirin, xwe pê ve girêdan di lêgerîna heqîqet û azadiyê de ne çareserî, bêçaretî ye .

Ji ber ku dîrok di rojaneyî de, di kûrahiya dîroka rojaneyî de veşartiye. Di kêliyê de asê bûn, bê kok bûn, bê hafize bûn û bê dîrokbûn e. Di kêliyê de asê bûn ji lêgerîna mezin a heqîqetê qutbûn e. Ev jî xerîb bûn, ji cewhera xwe dûrketin û bêhiş bûnê îfade dike .

Eleqeya ji heqîqet û jiyana azad re, eleqeya ji civakbûnê re ye. Ji vê dûrketin rêka ku diçe ber xerîb bûnê, ji merov dûrketinê ye. Xerîb bûn îxaneta merov ya cewhera xwe re ye. Xerîb bûn û ji cewhera xwe dûrketin bi şaristaniya hiyerarşîk-dewletî ve destpekir. Ev herçû di moderníteya sermayedar de gihîşt xerîb bûna merov ya li hember xwe. Hevaltiya merov bi merov re cihê xwe ji felsefeya "merov gurê merov e" re berda .

Di roja îro de pirsgirêkên ku xerîb bûne rê li ber vekiriye, çavkaniya bingehîn ya hemû pirsgirêkan e. Pirsgirêken civakî gihîştine rewşa dêwasa. Li gor xîsleta sermayedariyê merov; dijberî aborî, jin û civakê ye .

Ji ber ku xwezaya civakî xwedî xîsleteke dijsermîyan, dijyekdestî û dijsermayedar e. Halbûkî selefdarî, selefxurî, bazara reş di civaka sermayedar de şikilê jiyanê ye. Bi her rê û rêbaza pere bidest xistin heq tê dîtin .

Sermayedarî; pergala kulmek yekdestên ku xweza û nirxên bingehîn yê merovahiyê parçe dikin, tune dikin û mezin dibin e. Di vê kedxwariyê de beşek ji karkeran ku bi dayîna par avakiriye jî heye. Ji xeynî ev beşa kedkarên tawîzdêr, arîstokratbûyî; karkerên li derveyê ve dimînin, gundî, kedkar, jin, dikandar û bêşekar, weke beşa civakê ya ne sermayedar, bingeha civakê pêktînin.  Di avabûna milkê sermayedar de para beşa karkeran pir kêm e .

Ya diyarker kedxwariya civak û xwezayê ye. Sermayedarî di her qada jiyanê de rizîye û bûye kurtêlxur .

Ev hemû bi rastiya merov û civakbûnê re têkilîdar e. Heqîqet jiyana civakî ya têkilîdarê merov e. Jiyaneke hatiye kolekirin, pûçkirin bi cewhera merov re nakok e .

Ji vî alî ve bi şîara jiyaneke azad, wekhev û adil derketina rê watedar e. Jiyana azad, xweseriya merovê azad e. Merovê vîna wî/wê şikestiye, hatiye berdestkirin, hatiye kolekirin nikare jiyana azad biafirîne. Em digihîjin wê baweriyê ku li navenda lêgerîna heqîqet û azadiyê kole-serf-karker bi cih kirin xeletiyeke mezin e .

Heqîqeta merova û lêgerîna heqîqetê bi civakbûnê re eleqedar e. Hêqîqeta ku merov lê digere civakbûneke wekhev, azad, demokratîk, piştevan e. Utopyayên weke "girava atlas", "bihuşta

wendayî" "welatê rojê" ku di dîrokê de gelek caran dibin rojev, girêdayî hesreta lêgerîna heqîqetê ye .

Ji ber van hemû yekan pirsgirêka heqîqet û azadiyê çareserkirin, bi çareserkirina pirsgirêka rêbaz pêkan e. Pirsgirêka rêbaz rast çareserkirin, bi çax û şaristaniye re hesab ji hev pirsîn e. Ev jî sermayedariyê weke dîrokî civakî, li her qada jiyanê, bi parzûna tundraw a rexneyê derbaskirinê re mimkin e .

**1-Rêbazên hatine ceribandin şîfreya jiyanê çareser nekirin:**

Ji Sûmeran heta îro yên derketine rê, rêbazên şixulandine, wateya jiyanê zelal nekir û encamên tê xwestin ne afirand. Ol, felsefe, metafizîk, zanist û dîsiplînên hwd. aîdê civaka dewletî ne û di dîrokê de her tim bûne amûrê veşartina kedxwariyê, zextê û kolekirinê. Lêgerîna heqîqet û azadiyê şîlo kirine .

Di pêvajoya heta sermayedariyê de civak di nav qalibên hişk, dogmatîk yên nirxa de hatiye kontrolkirin û hemû rêkên gihîştina heqîqetê hatine astengkirin. Bi sermayedariyê re rûbera exlaqî hatiye parçekirin, polîtîka veguheriye hunerekî karê herî qirêj pê tên kirin. Bi sermayedariyê re li şûna fermanê xwedê yên parçebûne û bêbandor bûne, bi rêbaza zanistî re kêşeya "kirde-tişte" hatiye bi cih kirin.

Ji van hemûyan ev derdikeve holê. Gihîştina heqîqetê pirsgirêkeka rêbaz e. Sermayedarî "rêbaza zanistî" anîyê halê amûrê xurtkirina îqtîdara xwe. Xala esasî ya asêbûna sermayedariyê ev e. Neçariya sosyalîstan jî ev e. Neçariya

lêgerînvanê heqîqet û azadiyê jî ev e. Ji ber ku hemû heman rêbaza dişuxilînin. Têkoşînên bêhempa yên azadiyê, her tim bi van qalib, mantik û zihnîyetan ve domandin, çavkaniya xwe ji pirsgirêka rêbaza şaş digre. Nexwe ji bo çareserkirina şîfreya jiyanê û gihîştina heqîqetê, pêwiste rêbazên hatine şixulandin û bêencam mane werin derbaskirin .

**2-Şîfreya Jiyana Azad Merov Bixwe ye:**

Mîtolojiya ku di lêgerîna heqîqetê de rêbaza yekemîn e, avabûna gerdûnê eşkere dike, bi vê re têkilîdar ji bo avabûna merov jî îzahateke li gor xwe derdixe holê .

Dîsiplînên mina ol, felsefe, metafizîk û zanist, ji xeynî feraseta kozmolojî (zanista gerdûnê) feraseta antropolojî(zanista merova) jî pêşxistin e. Qasî pirsa merov ji kuderê tê diçe kuderê, bi pirsên merov çiye, Merov kiye, di gerdûnê de cîh û pozîzyona wî/wê çiye re jî eleqedar bûne. Hîn ji destpêkê ve, pirsgirêka destpêka gerdûn, xweza û cîhanê, bi pirsgirêka destpêka merov re di nav hev de pêşketiye. Pirsgirêkên di derbara herduyan de bi hev re hatine destgirtin û hizirîn .

Nêzîkayîye çareserkirina merova, çareserkirina gerdûnê ye, ji destpêkê ve di gelek fîlozofan de heye. Hêmana "Xwe bizane", "xwe zanebûn", " xwebûn", "xwe nasîn" ne tenê weke hêmaneke teorîk pêşketiye. Ev di lêgerîna merov de di lêgerîna "ez kî me" de rêbaza ku pêşxistiye ye. Tezê destirtina merovan e. Berpirsiyariyeke bingehîn e. Di gelek fîlozof û hînkerê exlaqî de ev hêman, âdeta di rewşa fermanê olî, destûra teqez a exlaqî de

ye. Ev ji bo çareserkirina destpêka gerdûn û merov, dîsa ji merov bixwe destpêkirin felsefeyeke bingehîn e .

Di hemû merovan de û di xwezayê de "xwesteka zanebûnê" heye. Hezkirina ku em ji sehekan digrin jî ve yekê ji me re dibêje." (Arîsto)

Arîsto " xwesteka zanebûnê" û lêgerîna heqîqetê di diyalektîka xweza û merov de lê digere. Herduyan di nav tevayiyê de digre dest. Bi vê re vê yeke diparêze; hemû agahî û zanebûn ji xwezaya bingehîn a merova çavkaniya xwe digrin. Li gor Arîsto; "Mîna di zanebûna merova de pêk tê di xwezayê de jî hin şêweyên bilindtir, ji hin şêweyên li jêr dizên. Sehek, têgihîştin, hafize, sêwirandin û aqil bi bendeke hevpar bi hev re hatine girêdan." Diyar dike ku ev yek bi şikilekî herî gihiştî di merovan de şekil girtiye .

Li vir jî çavkaniya bingehî ya derketin û lêgerînê dîsa xwezaya merov e. Di lêgerîna heqîqetê de gihîştina tevayiya zanebûnê, gerdûnê çareserkirin, ji merov destpêkirina kar ve pêkan e. Ji ber ku çavkaniya esasî ya hemû sirra merov bixwe ye. Nexwe xwe zanîn, tê wateya gerdûnê zanîn .

"Di cîhanê de tiştê herî girîng, zanebûna xwe bûyînê ye." (Montaigne) Xwebûn, xwe zanîn e. Di lêgerîna heqîqetê de şert û gavê yekemîn yê xwe pêkanînê ye. Ji bo roja îro, xwe zanîn û xwebûn, ji zîncîrê bi zengar yê modernîteya sermayedar, ji koletiya wê rizgarbûn û bi azadbûnê pêkan e .

Ev jî weke dîrokî civakî bi gihîştina diyalektîka xwezaya merov ya yekbûyî ve pêk tê. Heraklîtos; bi gotina "min xwe lêkolîn kir" felsefeyê bi du hevokan xulase dike. Li gor wî ji bo

zanîna rastiyê û gihiştina wateya wê bi pêkanîna " xwe fikirandin" (selfreflection) û " xwe lêkolîn kirin" çê dibe .

Xwe lêkolînkirin, di cêwhera xwe de merov lêkolînkirin e. Di lêkolînên Sokrates de, yekane gerdûna hêmana "xwe bizane", "gerdûna merov e." Ev nêzîkayiya wî jî dîsa antropolojîk (zanista merov) e. Sokrates, "Encax bi rêka gotûbêj an jî bi ramanê diyalektîk em dikarin bigihîjin zanebûna xwezaya merov." Bi vê re destgirtina pirsgirêkê teng dike. Rêbaza diyalektîk, ji ber wê jî hêmana "xwe bizane" teng dike, û tenê di asta gotûbêj de digre dest .

Sokrates dema mehkumê mirinê dibe di paraznameya xwe de; "jiyaneke nehatiye lekolînkirin, nehatiye rexnekirin, qiymeta wê ya jiyînê tune ye." dibêje û careke din girêdayî têkiliya merov bi merov re, merov bi xwezayê re, merov bi civakê re, tekiliya civak bi xwezayê re, diyalektîka taybetmendiyên merov yê exlaq, zanebûn, her tim lekolînkirin û rexnekirinê îfade dike. Li vir gihîştina rastiyê, bi xwe nasînê, gihîştina heqîqetê bi lêkolînkirin û rexnekirinê pêkan e. Stoaparêzan jî vê nêzîkayîya Sokrates, bi gotina " xwe pirsiyarkirin, xweseriya merov û erkeke bingehîn ya merov e." dîsa rastiya merova nîşan dikin .

Ev derdikeve holê; lêkolîn, rexnekirin, xwesteka zanebûnê û hewldana dîtina heqîqetê di xwezaya merovan de heye. "Merov hêza xwezayî ya rexnekirin, darizandin û têgihîştinê piştrast dike û fêm dike ku di têkiliya di navbera xwe û xwezayê de rola pêşeng ne xweza, ew bixwe ye." (Ernest Cassirer) Rexneyên xwezayî, hêza têgihîştinê, têkiliya di navbera xwe û xwezayê de

pirsiyarkirin, eynî weke taybetmendiyeke xwezayî ya merova ye. Ev taybetmendî jî di cewhera merova de heye .

Jiyan û xweza her tim di nav xwe de diguhere, vediguhere û bi coşdariya robarekî diherike. Ev taybetmendiyeke xwezayî ye di cewhera gerdûn û jiyanê de heye. Merovan di dîrokê de her tim sedema vê dîsa di gerdûnê de, weke parçeyekê gerdûnê di merov de lê geriyane .

Ev jî bi aqil kirine. "Aqil, hêza rasteqîn ya merov, çavkaniya hevpar ya dirustî û exlaqîtî ye." (Ernest Cassîrer) Nexwe di lêgerîna heqîqet û azadiyê de çavkaniya bingehîn û hevpar merov bixwe ye. Merov encax bi piştevaniya xwe dikare lêgerîna xwe bidomîne. "Hişê te ji serê te neçe. Zêde bi arezû nebe. Bibe efendiyê xwe û weke merovekî, hemwelatiyekî û weke mexluqekî bi mirin li jiyanê binêre..." (Marcûs Aûrelîus)

Ji ber ku yê efendiyê xwe bi xwe ye, yê destûra xwe bixwe çêdike û li ser xwe tetbiq dike, yekane cinsê zindiyê azad yê bi vî awayî merov e. Di gerdûnê de şahid, bersûc û darêzgerê hemû guherîn û veguherîna merovê bihişmendî, azad û difikire ye. Ji vî alî ve diyalektîka merovê tê dahûrandin, gerdûna tê dahûrandine, dîsa derdikeve pêşberî me.

Brûno di doktrîna xwe de, li têgîna "bêdawîtî" wateyeke berevajî fîlozofên Yewnana kevin, lê bar dike. "Bêdawîtî êdî tenê nayê wateya neyînandin(negatîon) û sînordarkirin. Berevajî, tê wateya pirrbûna rastiyê ya nayê pîvandin û xeritandin, hêza aqlê merova ya nehatiye sînordarkirin. Brûno, Kopernîk doktrîna aqilparêz ha di vê wateyê de fêm dike û şîrove dike." Ev di lêgerîna merov ya heqîqetê de nêzîkayiyeke nû îfade

dike. Di gerdûna bêsînor de nêzîkayiyeke aqil ya bêsînor heye. Êdî aqil tu astengî nasnake. "Aqlê merov, bi gerdûna bêdawî, bi pîvandina hêza xwe digihîje hişmendiya bêdawîtiya xwe".

Nexwe merov çeşîdeke mîkro gerdûn e. Çareserkirina merov, dibe ku bibe destpêk û gavê yekemîn a çareserkirina gerdûna makro.

Pêvajoya dîrokî ya em lê dijîn ji bo rê-rêbazên nû û ji bo hûnandinên cûda yê heqîqetê guncav e. Ezmûn û ceribandinên merovahiyê yê bi hezaran sala heye. Pêşveçûna teknîkê gihîştiye rewşa dêwasa. Bîr û hişê civakî yê merovahiyê xwedî ceribandin û ezmûneke mezin e. Merov bi hişmendiya xwe ya civakî dewlemend, gihîştiye terzê dewlemend ya fikrîna metafizîk .

Yekîtiya diyalektîkî ya van hemûyan, li ser bingeha civaka xwezayî, di mîhwera azadîxwaz de rêxistinbûn, ji binketinan encamên rast derxistin bi vê re ji bo utopyayên nû yê azadiyê bijîn, ji her demê bêtir şert û mercên civakî hene .

Ji ber ku ezmûn û ceribandinên merovahiyê yê bi hezaran sala û rizîbûna pergala sermayedar van derfetan zêdetir xurt dike .

Di destpêkê de merov esas e. Ya bingehîn e. Kok hucreya divê were çareserkirin e. Encax tiştê li vir tê gotin; "ne cihaneke navenparêziya merov e ne jî nêzîkayiyeke merovparêz e." Ya divê were esas girtin; weke dîrokî, civakî û biyolojîk tevayiya rastiyên di merov de tîr dibe ye .

Di dîrokê de her tim lêgerîna merov a heqîqetê, têkoşîna afirandina jiyana azad e. Hewldana vê ya bi ked, dilxwazî û baweriyeke mezin pêkanînê ye. Nexwe him weke rêbaz him jî weke rejîma heqîqetê, bê kû bi dilxwazî li pey jiyana azad

bikevin ne dikarin bigihîjin agahiya pêwist ne jî pêşengtiyên nû û utopyayên civakî jiyanî bikin .

**3-Merov çawa bû merov:**

Merov hebûneke ku teslîmê xerîzeyê xwe bûye, berpisiyartiya wî ya exlaqî tune ye an, ferdekî civakî yê bi aqilê xwe pêktîne? Ev pirs olan, felsefeyan û huneran diyarkiriye û hin jî diyar dike".

Hin peyv hene li derveyê wateya xwe ya peyvê, wateyeke tîrbûyî îfade dikin. Di fêmkirina rastiya dîrokî civakî de rolê mifteyê dilîzin. Di jiyana merovan de cihekî tê pîrozkirin digrin. Azadî, edalet, wekhevî, heqîqet, aşitî, merov, hevokên hwd xwedî vê misyonê ne .

Encax gelek caran ev peyv wateya xwe ya esasî wenda kirine, hatine xumamkirin. Wate û sînora van peyva rast diyarkirin, xizmeta rast fêmkirina têkiliya di navbera merov û merov, merov û civak, civak û dîrokê dike. Li vir li ser peyva "MEROV" sekinîn ji aliyê mijara me ve wê raveker be .

Peyva merov, peyveke kok-çavkanî ye û di çawaniyeke ku îstîqameta her tiştî diyar dike. Ji vî alî ve têgîna "merov" rast pênasekirin girîng e.

Têgîna merov, destpêkê pirr eşkere û zelal dixuyê. Halbûkî ji hemû têgînan, têgîna herî binakok, dûdilî, bi xuman û tevlîhev e. Têgîneke ji şîrovekirinên şaş û dijber re vekirî ye .

Di dîrokê de her tim serdestên ku şaristaniya dewletî pêşxistine, hemû xirabiyên ku kirine bi xwe veşartina li pişt vê

têgînê kirine. Nexwe têgîna "merov" çi tîne bîra merov? Têgîna merov çi îfade dike? "merov" tê çi wateyê? Têgîna "merov" kijan ramana tîne bîra merov? Berî her tiştî bi şêweyê herî hêsan em dikarin wisa bifikrin. Her merov, mîna min hebûneke zindiye! Gur çawa gurîtîya xwe dike, puşt çawa puştî dike, zivistan çawa zivistanî dike, merov jî wisa merovîtî dike! Eşkereye ku ev reyeke gelek hêsan û kurterê ye. ji ber wê jî şaş e. "Merov ji bo navê xwe heq bike tu hewldan nîşan nade, bi vî awayî xwe weke porzer, Aryen û Nazî diyar dike. Hun çi bikin, çi bêjin nikarin wan bînin aqlê selîmiyê." (J. B. Vercors) Eşkereye ku di vê nêzîkayiyê de nekafîtîyek xumamek heye .

Nexwe em wateya peyva merov hin bêtir vekin. "Merov ji ya bipêsîran zindiyê du destê wî/wê, du lingê wî/wê hene, li ser du linga digere, bi ziman lihev dike, xwedî aqil e".

Belê ev hemû taybetmendî di cinsên din yên bipêsîr de jî tune ne? Mînak Meymûn li gor mih hîn biaqil tevdigere. Em ê merov li kuderê bi cih bikin؟

Pirsgirêkê bi merovbûna merov, bi pirsa "merov çawa bû merov" re dest girtin dibe ku hîn bêtir îzahker be. Qutbûna ji prîmata ve em dest bi kar bikin. Taybetmendiyên bingehîn yê merova ji zindiyên din cûda dike çi ne؟

Wek nimûne "bejinkurtê pîgme" tiştê ku tu heywan nikare bike, dike. Li rûyê ezmana dema brûsk lê didin, dema gurmîna esman, dema firtone dirabe, serê xwe radike ezmana û çêra pê dike. Ev tê wateya çi؟

Ev raperîneke, ev serhildaneke. Ev çalakiyeke serî li ber rakirine. Ev hişmendiyeke. Ev haydarbûn e. Li vir fîzarî ezmana

kirin, ji ezmana hêvî kirin, serî li ber rakirin an jî naletkirin taybetmendiyeke xas ya merova ye. Ji bo van ji ezmana hêvîkirinê, fêmkirina ezmana, rol dayîn, cih jê re dayîn pêwist e .

Li vir zanebûn û haydarbûn heye. Merovbûna merov, çalakiyeke serî rakirinê ye, bi vî awayî şîrovekirin pêkan e. Amûr çêkirin, aqil, nermbûna aqil, melekeya fikirînê, hemû bi vê rê tê ravekirin. Merovbûna merov, li hember yê xirab serîrakirinê, pê re tekoşîn danê re destpê dike. Ev serîrakirin, di çîroka merovbûna merov de destpêka lêgerîna azadiyê ye. Li hember pirsa ez kî me, yekem derketina merov e. Heywan her çiqas biaqil be jî ne di ferq û hişmendiya xwe de ye. Bûyera serîrakirinê aîdê merovan e. Vê di olên semawî de di di mîtosa "Adem-Hewa" yê ku weke merovên yekemîn tên qebûlkirin de jî dibînin .

Xwedê dara zanebûnê nîşanî Adem û Hewa kir. Got, Hun fêkiyê vê darê tam nekin! Fêkî ji wan re qedexe kir. Encax wan fêkiya qedexe xwarin. Bi vî awayî yekemîn serhildan pêkhat.

"Kuştin, zehmetî, xişm, nakokî, hêrs tenê li dinyaya hişmendî heye. Her hest, her êş bivê nevê hişmendiyeke şexsî dixwaze. Hebûna bê hişmendî, nagihîje ferqa tu tiştî, tu tiştî nabihîze. Dema piling xwe davêje ser xezalê, wê difetisîne û parçe dike zext, tirs, zewq û êş tenê di hişê wan de heye." (J. B. Vercors) Nexwe piling-xweza, xezal-xweza di nav aşitî û lihevkirinê de ne .

Serhildana bîrdar tenê aîdê merov e. Amûr çêkirin tenê xweseriya merova ye. Exlaq tenê xweseriya merova ye. Fikirîna

metafizîk aîdê merov e. Merov bi merovbûnê re di lêgerîna heqîqet- azadiyê de hebûneke li dijî xirabiyê, koletiyê serî hildide .

Lêgerîna Mûsa, Îsa û Hz. Mihemed jî çeşîdekê sehildanê ye. Li dijî nezaniyê serhildana hişê merov a dîtin û lêgerîna zanebûnê ye. Dibe ku merovê destpêkê dema li şikeftê wêneyê yekemîn çêkir, serhildana yekemîn pêkanî. Temam, bi serî rakirinê merov dibe merov؟

Li vir çawaniya serhildanê girîng e. Promete dema li hember Zeûs serî rakir bi zinaran ve hat zincîrkirin. Ev çeşîdekê lêgerîna zanebûn û azadiyê bû. Li meydanên Romê dema koleyan li hember hev şer dikirin, ev ji merovbûna wan re xizmet nedikir. Spartakus, di serhildana koleyan de çima rawestgeh û îmtiyazeke e. Ew li şûna li hember koleya şer bike, li hember efendî serî hilda. Yanê li hember yên xirab temsîl dikin serî hilda. Ev rêk, ew rêka ku diçe ber gihîştina merov bi cewhera xwe re. Li vir bijartin girîng e .

"Serfiraziya merov ya dawî xwe wendakirin e? Erê, cûda rê tune ye. Ger rojekê em biserkevin em ê bibin melayket, ger bin bikevin, bikevin bin linga, heywan.

Tenê dema em serî radikin merovin, ne melayket ne heywan. Merov serî rakirine, şer e. Schîller dema mir, Goethe ji bo wê: ' Merovek bû, yanê şerwan bû' nivîsand. Dudilî dîsa destpê dike. Em dibêjin tenê bi şerkirinê merovbûn çê dibe, ema bi her cureyên şer merovbûn pêk tê?" (J. B. Vercors)

Li vir naveroka serî rakirinê, armanc û hedefa wê diyarker e. Em pirsgirêkê ji nû ve li paş bigerin û binirxînin .

Merov li gor hemû cureyên zindiya xwedî hunera mejiyekî hin pêşketîtir, qabilîyetê razber fikirîn- axaftin, weke civakî dîrokî zanebûn, ceribandin, ezmûn danehev, hafizeyeka xurt a civakî, amûr çêkirin, şixulandin û afirandinê ye.

Navê xeleka dawî ya vê cînsê Homp Sapîens e. Homo Sapîens bi Latinî tê wateya "merovê biaqil", "merovê difikire", "merovê dizane." " Merov, aîdê malbata Homînoîdea (merivokîyên mezin) ya malbata jor a Homînoîdea(merivokî) ye".

Homo Sapîens tê wateya merovê fikirîna xwe difikire. Merov tenê na fikire. Di heman demê de dikeve ferqa fikrandina xwe .

Xanxanka şecereya merova ya li jêr, derdixe holê ku merov, tevayiya hemû cinsên zindiya û çesîdê herî pêşketiye. Şecereya merova: Riwek(nebat), kuvarik(karî), Protîsta, Bakterî(dirmî), Heywan, famîleya bêmazmazk, famîleya mazmazkan, famîleya xijendeyan, Masî, Amfibî(bejavî), famîlyeya guhandaran, famîleya goştxuran, guhandarên bahrê, famîlyeya kojeran, famîleya şevşevokan, famîleya mêşxuran, famileya humbaniya, Prîmat, Meymûnê pêşîn, Famîleya Meymûna, Merovekîyan, Gîbon, Şempanze, gorîlla gorîlla, Orangutan (Pongo Pygmaeûs), Merov (Çavkanî: HUMAN, Edîtor Robert Wînston)

Merov ji prîmatan qut bû di encama peresaneke dirêj de dest bi merovbûnê kir. Li gor nûveyên heyî yên derketine holê, yekemîn heyîna merovekî; Li gor tomarên fosil, fosilên herî kevin yên li gor pênaseya merovê nûjen, aîde 130000 sal berê ye û li Efrîqa hatine dîtin".

Tê îdîakirin ku Cromagnonê nijadê cureya jêrîn ya Homo Sapîens (bi zimanê dawerî diaxive) jî, berî niha nêzî 50 hezar sal derketiye holê .

Di derbarê peresan û belevbûna merovahiyê de du nêrînên bingehîn hene .

Ya yekemîn; "fikrê yek libî ji herêmê belavbûn e. Li gor vê merovê yekemîn ji geliya Rîf ya Efrîqa derket û weke pêla li ser ruyê erdê belavbû .

Ya duyemîn jî; Merov li herêmên cûda yê dinyayê werar bû, ji prîmata qut bû û bû merov. Ev fikrê "herêma pirhejmar e".

Tê texmînkirin ku "zindiyê li ser du linga disekine û çavên wê/wî li pêş dinêre weke kalikê hevbeş yekemîn yê Homo sapîens sapîen (merovê fikrîna xwe difikire) û hemû prîmatên din ye merovekî ye, 7- 6,5 milyon sal berî niha li Efrîqayê derketiye holê".

Ev cinsê zindiya di encama derfetên jiyanê, xweza û hawirdorê, bi demê re mecbûrî ji ser darê daketiye û li ser du lingan sekiniye .

Berpêş dikin ku peresana organîk ya merov ava dike "Antopoggenesîs" berî serdema me nêzî 4- 3,5 milyon sal berê hat destpêkirin. Destpêka li hember têgîna merov bişikilbûna wê jî bi cinsê "Homo" destpê dike .

1,8milyon sal berî niha cinsê "Homo" yê li ser lingê çîk disekine derdikeve holê. Îskeletê Homo Erectûs ye navê Tûrkana boy lê hatiye kirin yê şikilekî deverû ketiye nav çiravekê hat dîtin, Ji ber ku hema hema bi tevayî gihîştiye heta roja îro, di derbarê Homo Erectûsan de gelek agahiyan bidest

xistiye. Nûve diyar dikin ku Homo Erectûs gelek girs in, bi nêçîrî an jî bi kelaxan xwe xwedî dikin".

Homo Trîcapûsan nêzî 1,5- 1 milyon sal jiyîne. Cinsê herî nêzî Homo Sapîensa ye .

Hin nûveyên bastannasiyî piştrast dikin ku Homo sapîens û Neandertalê 250-300 hezar sal berî niha derketiye holê û demeke dirêj li ser rûyê erdê bi hev re sekinîne, rastî hev hatine. Cinsê Neandertala, 30 hezar sal berî niha bi hin sedemên nayên zanîn, ji holê rabû .

Em dikarin ji ber van hemû tişta vê diyar bikin. Merov xwedî aqil e. Xîsleta bingehîn ya aqil jî hişmendiye. Hişmendî; taybetmendiya bingehîn a zihnê merov e. Hişmendî aîdê merovaye. Merov bi vê hişmendîyê xwedî hunera tekilîyên bi cinsê xwe re, bi zindîyên din û xwezayê re tanzîmkirinê ye .

Cinsê Homo Sapîens bi hişmendî re gihîşt hin çawaniyên mîna "xwe şopandin, têgihîştina demê û vîna azad" ku di zindiyên din de tune ne. Bi vî awayî cinsê Homo Sapîens "baş-xirab, rast-şaş, xweşik-kirêt" ji hev cûda kir. Li gor vê serî rakir û têkoşîn da .

Merov di saya vê hişmendiyê de yekane cinsê zindiya yê avayîyên pêşketî yê civakî ava dike û civakbûnê pêk tîne ye .

Di navbera merov û heywana de cûdahiya çawanî jî ji vir derdikeve holê û diyar dibe. Ev cûdahî ؛

'1-"Heywan, tenê ji bo xwe û çêlîkê xwe tiştê yekser pêwistin diafirîne(hilberandin).' Bi gotineke din, 'heywan yekalî diafirîne, merov di asta gerdûnî de diafirîne'.

' 2-Heywan tenê rasterast di bin serdestiya pêdiwiyên xwe yê fizîkî de diafirîne. Merov jî, di afirînê de azad e'.

Heywan ' tenê ji bo xwe diafirîne' Merov di nav fealiyeta hilberandinê de hemû xwezayê ji nû ve diafirîne .

Berhemê heywan yekser aîdê bedenê wê ye. Merov jî li hember berhem azad e.

Heywan tenê li gor pîvan û pêdiviyên cinsê xwe şikil dide made. Merov li gor pîvanên her cinsê afirandinê û li gor pîvanên heyî şikil dana made dizane. Ji ber van hemûyan merov dikare li gor destûrên xweşikbûnê jî şikil bide..." (Y. Davîdov)

Weke li vir jî tê xuyakirin, bi qutbûna ji prîmatan ve merov xwedî hin taybetmendiyên pêşketî, cûda û gelemper yê hemû taybetmendiyên heywana derbas dike ye. Pêwiste careke din diyar bikin ku merovê tê dahûrandin tê wateya dahûrandina dinyaya hemû zindî û hemû cinsê heywana .

**4-Merov çawa li ser rûyê erdê belav bûʕ:**

Efrîqaya Başûr, xeta Rîf, li gor daneyên heyî weke navenda belavbûna merov ya ser ruyê erdê  tê nirxandin.

Şîrove û nirxandinên li ser belge û nûveyên heta îro hatine derxistin, tezê "herêma yek libî" ji her alî ve xurt dike. Ji ber ku Rîfa Efrîqaya Başûr xwedî çol, daristan, rûberka riwêkî ya dewlemend û çavkaniyên avê ye. Ev taybetmendî ji aliyê ewlekariya cins û zêdebûna wê herêmeke stratejîk ava dike .

Klan û qebîleyên yekemîn ji geliya Rif derdikevin bi grûbên 25-30 kesan ve peravên geliyê yên weke rêkên xwezayî dişopînin û heta Torosan pêşve diçin. Koç bi şopandina vê rêya

xwezayî pêk tên. Geliya Rîf xala yekbûn û ji hev cûdabûn a parzemînên Efrîqa û Asya pêk tîne .

Yên li Rîfê man jî bi milyonan sal weke klan jiyîn. Her ku Klan û qebîle zêdebûn, ber bi hindirî Efrîqa ve her tim pêlên koçê destpêkir. Li ser dinyayê belavbûna eslî li Efrîqaya Bakûr pêk tê .

Heta Homo Sapîens gelekî cins heman rê dişopînin û mîna pêlên koçê belav dibin .

Cinsa Homo Sapînsê;zimanê sembolî ku weke kalikê zimanê modern tê qebûlkirin şixulandiye, 60-50 hezar sal berê ji xeta Rîf derketiye ber bi Bakûr ve, îdîaya hevpare ku vê demê li ser ruyê erdê belavbûne .

Cinsên din bi demê re ji holê radibin, lê yê hîn pêşketîtir "homo sapînsê bûye efendiyê nû" bi nêçîrvanî û komkerî hebûna xwe didomîne .

Deriyê esasî yê derketina ji geliyê Rîf û belavbûna cîhanê kevana Toros-Zagros e. Peravên Suweyş-Behra spî jî herêmên xwezayî yê belavbûnê ne. Erdnîgariya Mezopotamya jorîn ya ku îro Kurd lê dijîn, Ji bo jiyanê yek ji herema herî guncav û stratejîk e.

Çavkaniyên avê yên ji her derê xwezayî û ji her derê dibarin, gelek cureyên fêkiya yê dewlemend -li hin erdnîgarîya ji bo vê tebîra bihuştê tê şixulandin- ji bo heywana rûberka riwêkî ya dewlemend, ji bo çandiniyê deştên fireh, zevîyên xwezayî, dîsa ji bo ewlehiya cins şikeftên belavbûyî ji bo jiyana merovan gelekî girîng in. Li Riha, Amed, Êliha, Mêrdîn, Semsûr a ku

weke dilê vê navenda stratejîk in, li gelek cihên hwd. bi hezaran şikeftên xwezayî jî bi tena serê xwe vê rastiyê piştrast dike .

Dîsa Xerawreşk(Riha), Newala Çorî (Curnê Reş-Sîwereg), Berçem(Erxanî) Girê Kortik(Bismil), Çemê Halan(Êlih) û li cihên hwd. nûveyên di kolanên arkeolojîk de hatine dîtin vê rastiye ji her alî ve dirust dike. Li ser van qadên stratejîk civakbûneke mezin derdikeve pêşberî dîrokê. Ji zimanê nîşanî derbasbûna zimanê sembolî pêşveçûneke mezin bidest dixe. Her ku civakbûn pêş dikeve merov xwezayê bi kûrahî û berfirehî nas dike. Nebatên kifş dike, nas dike, heywana û jiyana nû bi navbeynkariya ziman vediguhezîne hemcinsê xwe. Çanda gund-çandinî weke pêlan li ser ruyê erdê belav dibe .

Keşfên jiyana merova bi kûrahî bandor dikin tên pîrozkirin. Ev naskirina nû, kifşkirin û veguhestina hemcinsên xwe, her diçe rê li ber avabûna zimanê hevpar û civakbûnê vedike. Avabûna zimanê hevpar-= nasnameyê ji hev cûdakirinê ye. Bi vî awayî li "Kevana Zêrîn" nasnameyên du qewmî derdikevin holê. Ji bo pêşveçûn û merhaleyeke jortir hemû derfetên civakî ava dibin .

Li ser vê bingehê li Kevana Zêrîn li serdema "Neolîtîka pêşîn" yekemîn jiyana xwecihî destpê dike. Dibe ku gundên yekemîn ava dibin. Civaka neolîtîka pêşîn şikil digre. Girêdayî jiyana xwecihî, di merhaleya duyemîn de nêçîrvanî û komkerî cihê xwe hêdî hêdî ji çandiniyê û kedîkirina heywana re dihêle. Li ser vê şoreşeke mezin a Neolîtîkê mezin dibe. Şoreşa neolitîkê di cewhera xwe de şoreşa jin, ax û gund e. Riha-Xerawreşk, Curnê Reş- Newala Çorî, Erxanî-Berçem, Bismil-Girê Kortik, Êlih-

Çemê Halan li cihên hwd nûveyên di kolanên arkeolojîk de derketine ve yekê ji her alî ve dirûst dike .

Civatên aîdê koma ziman ya Aryenî, yekem jiyana xwecihî, piştî wê şoreşa "gund-çandinî-jinê" jî li "Kevana Zerîn" pêk tînin .

Têgîn û çanda "ARD" (ax-zevî-cih) li vê erdnîgariyê aîdê gelê herî qedîm Kurda ye. Ev çand li vê erdnîgariyê-navendê li ser ruyê erdê belav dibe .

Li Mezopotamyaya jêrîn jî weke aliyekî li kêlekê koma zimanê Semîtîk pêş dikeve. Çanda Semîtîk, xwedî zimanekî dewlemend, şivantî û çanda eşirtiyê ye. Çandeke pir pêşketî ya çandinî-şivantî pêş dikeve. Ziman dastanî ye. Akad, Babil, Asûr, Kenan û bi nasnavê Îsraîl ve di dîroka niviskî de cih digre. Koma çand-ziman ya sêyemîn jî koma "zimanê Ûral-Altay"e. Li herêmeka, ji quntarê Sibîryayan heta Yaqûtîstanê dirêj dike, pêk tê. Welatê vê komê Çîn e. Ev çand; di serî de Tirk, Moxol, Fîn, Çîn, Teter, Viyetnam û Japon sêyemîn herêma herî fireh ya Bakûr pêk tîne .

Afirînerê şaristaniyê, yekemîn pêşengên Sûmeran çanda Til Xelef e. (BZ 6.000-4.000) Çanda Til Xelef, li Mezopotamya Jêrîn bi koçên fizîkî weke pêlan belav bû. Sûmeriyan di navenda belavbûna çanda Til Xelef de bûn. Ev hemû pêşveçûn têzê yekemîn piştrast dikin .

Dema van hemûyan bigrin dest derdikeve holê ku merov bi tena serê xwe gerdûna biçûk e. Dema tevayiya rastiyên di merov de tîrbûne derxin holê û di lêgerîna heqîqetê de weke rêbaz bigrin dest, dibe ku me bigihîne encama rast.

**5-Merov Tevayiya Hemû Rastiyên Civakî ye:**

Em dikarin ji aliyê afirîş û avabûn ve weke civakî dîrokî kombûna rastiyên piralî yên di merov de tîr dibin, tevîhev dibin û hevpar dibin, bi xetên bingehîn, di bin van sernivîsan de kom bikin .

**a-Merov Çavkaniya herî bikok û bingehîn ya Agahîya ye**

Merov di nav zindiyan de cinsê herî pêşketiye. Nexwe bi pêkhatinên nav atomî û heyînên di navbera atoman de, bendên di navbera zindîbûnê de bi şikilekî herî pêşketî û bilind di merovan de heye. Li vir merovê tê dahûrandin tê wateya hemû zindiyên tên dahûrandin. Sirrê esasî di merov bixwe de veşartiye.

Merov bixwe weke şikilgirtin û rêzbûna madî- zindî ya difikire, dihonîne, hîs dike, dibihîze sêwirandin pêkan e. Berî her tiştî ne tênê pêkhatin û şikilgirtineke kombûna ji madeyê ye. Ne avayîyeke ku hestên zindî tune ne. Berevajî rêzbûn û şikilgirtineke dewlemend ya xweser e .

Merov şêwegirtineke mikemel e. Hemû destûrên Fizîk û Kîmyayê, tevayîya made-enerjî-fikir, hunera razberkirinê di asta herî jor de herî kamil û bi terzekî nêzî mikemeliyê dîtin pêkan e .

Merov, rêka esasî ya zanebûnê ye. Merovê hatiye dahûrandin, agahdarbûna kokdar ya derketiye holê ye. Em dikarin ji vî alî ve

di derbarê çawaniya heqîqetê de merov weke tevayîya rastiyên tîrbûyî û saxlem bifikrin .

**b-Merov hemû avayiyên jiyana biyolojîk temsîl dike:**

Kêşeya zindî ne zindî ya di cewhera xwezayê de heye, bi şikilê herî dewlemend di merov de heye. Zindîtî û hîskirin di merov de gihîştiye lûtkeyê. Merov bi rehendên madî ve jî li beramberî vê zindîbûnê xwedî asta herî pêşketî ye. Di navbera vê zindîbûna asta herî dawî, hunera razberkirinê û rêzbûn-şikilgirtina mejî de nenasberîyên ne derketine holê tijî ne. Bi zelalkirina van, çareserkirina sirran re çareseriya hemû sirrên dinyaya biyolojîk pêkan e .

Ji ber vê; Vê têkiliya eslî ya di hemû gerdûnê de tê şopandin weke îmkana zindîbûnê şîrovekirin watedar e. Girêdayê vê; Fizîka Kuantomê derxistiye holê ku pêl bi xîsleta partîkul e. Ev jî vê yekê qewîm dike .

Ecebe fizîk û kîmyaya Kuantomê, dibe ku berdewamiya kêşeyen "pêl û partîkul", "îdea û made" be؟

"Em dikarin hêman û kêşeya "hebûn-valahî" tevî nav vê nêzîkayiyê bikin. Ji ber ku hebûna bê valahî, valahiya bê hebûn nayê fikirîn. Encax dema kû kêşeya hebûn-valahî ya zorê dide sînorê hizrîna merov were derbaskirin herdu jî ji holê radibin" (A. Firat)

**c-Merov yê jiyana civakî a herî pêşketî diafirîne ye:**

Merov di dîrokê de civakbûna herî pêşketî ya li gor xweseriya xwe û şêweyê civakê yê herî pêşketî pêş xistiye. Ev pêşveçûn; xwe dispêre hêmana domdanî, guherîn û veguherînê. Ev taybetmendî jî bi tena serê xwe merov dixe mijara lêkolînê. Ji pîramîdan qutbûn, merhaleyên pêşveçûna cins in. Ji avabûna merov heta niha li gor xweza û cewhera xwe ji ya hêsan ber bi ya tevlîhev her cureyên civatê afirandiye û jiyan dike. Civak bixwe berhemê zîhniyeta merov e. Ji vî alî ve tevayiya zîhniyeta merov e. Ji vê re merovê raser gotin jî gengaze. Organîzasyona mikemel e, ya dikare merovê raser ava bike .

Di vê wateyê de pêwiste civaka merov û civakbûnê weke kategoriyeke bingehîn vekolin. ji ber vê ؛

Civak; aîdê merova ye û encama aqil û zîhniyeta merov e. Ji xeynî merov tu zindî ne xwedî taybetmendiya afirandina civak û civakbûnê ne. Ev jî taybetmendiya bingehîn ya merov ji heywana weke çawanî qut dike ye .

Civak û merov bi hev de, hevdû merc dikin û şikil didin hev. Civak ji aliyên merovan ve tên ava kirin. Encax civaka ku hatiye avakirin bixwe jî ferd-merova înşa dike, şikil dide. Bandorkirin û şikildaneke beramber heye.

Di dîrokê de hemû civak û avayiyên civakî him ji aliyê mekan ve him jî ji aliyê demê ve di nav sînordarkirin û astengkirinê de ye. Civak û çanda ku civakan afirandiye mîna zindiyan di demeke sînordar de, di nav mekaneke diyar û sînordar de zayîn, pêşveçûn û bi encambûna wan heye. Ji vî alî ve civak ji aliyê dem û mekan ve di nav sînordarkirinê de ne .

Hemû avayiyên civakî afirîneka zîhniyeta merovin. Civakbûn; ji aliyê aqlê merov ve hatiye afirandin, ev xîsleta civakbûnê ye. Ji xeynî merov di tu zindiyan de civakbûn tune ye .

Têkiliya civak merov ne têkiliyeke razber e. Têkiliyeke diyalektîkî ya hevdû merc dike û şikil dide hev e. Taybetmendiya ferd a pêşketî ya civakbûnê ne aferîşî ye. Civakbûna merov bi ked û hewldaneke mezin pêk tê. Dema merov çavê xwe li jiyanê vedike, bi afirandin û daneheva civakbûnê ya bi hezar salan û bi terzê jiyanê re rû bi rû dimîne. Van dipejirîne û dibe civakî. Civakbûn ne bi tena serê xwe bi civakê re pêk tê. Hemû tiştên ku civakê bi salan avakiriyê çand, ziman, jiyan, huner, exlaq hwd dipejirîne û civakî dibe .

**d-"Merov xwedî zîhniyeteke nerm-livdar û azad e":**

zîhniyeta merov ji aliyê peşveçûnê ve di asta herî jor de ye. Bê ku xwezaya zîhniyeta merov fêm bikin, îdiayên rêbaz û tevger vala ne. Herî kêm asta pêşveçûna heyî, hin ji bo fêmkirina vê têr nake .

zîhniyeta merov xwedî avayîyeke dualî ye. Ya yekemîn, yê hîn kevintir, ya aqlê hestiyarî ava dike, aqlê hestyarî hîn pêşketiye û ji aliyê peresanê ve kevintir e, aliyê " rast yê mejiyê"

Ya duyemîn; beşa mejî "çepê ye" ya ji fikrê analitîk re hîn vekirîtir e, her tim ji pêşveçûnê re vekiriye û nerm e.

Di wateya giştî de zihn; pirr nerm, bêsînor û xwedî îmkana azadiya livdarina bêdawî, "qasî komek rast têgihîştinên berfireh,

komek têgihîştinên şaş" û xwedî taybetmendiya metafizîk jiyînê ye. Di vê wateyê de merov yekane cinsê zindiya ya bêhempa ye .

**e-Merov xwedî taybetmendiyên metafizîk e:**

Merov yekane cinsê zindiya yê difikire, di ferqa fikrîna xwe de ye, xwedî huner û kapasîteya fikrînê ye, rêzikên exlaqî pêş dixe û bi van rêzikan civakbûnê pêş dixe. Xwedî qabiliyeta bi huner bi rêka nîgaşan ji nû ve û di asta herî bilind de afirandina jiyanê ye. Hunera polîtîka, ol, felsefe, hiqûq, dîrok disiplînên hwd jî aîdê merov in. Nexwe merov yekane cinsê zindî yê xwedî taybetmendiyên metafizîk e .

Weke encam; Yekane çavkaniya agahiyan ya van hemû taybetmendiyan di nav hev de, di heman dem û mekanê de bi tevayî dijî, merov e. Ev çavkaniya heyîn û afirîşê ye. Merov gerdûna mîkro ye. Ji vî alî ve merov çareserkirin û bi tevayî fêmkirin di cewher de gerdûna makro çareserkirin û fêmkirin e. Merovê dahurandî, destpêka gerdûna dahurandî ye .

Nexwe merov esas girtin, merov dahûrandin di gihîştina heqîqetê de dibe ku rê û rêbazeke encamgir be .

Ez kî me? Di gerdûnê de cihê min çiye? Ji kuderê têm û diçim kuderê? Destpêk û dawiyeke gerdûnê heye? Ger weke rêbaz merov esas were girtin digihijîne van pirsan. Ji ber ku dema tevayiya rastiyên di merov de kom dibin werin esas girtin xala bingehîn ya derketinê pêkan e .

Li vir merov; di gihîştina heqîqet, agahî û azadiyê de him kirde him jî tişte ye. Di vekirina deriyê heqîqetê û ketina hindir de rola

mifteyê dikare bilîze. Merov yekane xwezaya civakî ya herî mezin e .

Bêgûman xwezayeke madî ya li derveyê merov dimîne heye. Encax civakbûna merov jî xwezayeke duyemîne. Xwezaya civakî, qasî ku bi xwezaya madî re lihev dike di wê radeyê de wate bidest dixe. Ji ber ku lêgerîna merov ya wekhevî, azadî û heqîqetê têkilîdarê xwezaya civakî ye .

Xwezaya civakî di cewhera xwe de xwezaya merov e. Di asta herî jor de teorîzekirina vê xwezayê, veguherandina agahiyên tevahî, di gihîştina heqîqet û jiyana azad de dibe ku rêbazek be. Ji bo di asta herî bilind de, li ser bingeha ji nu ve afirîna jiyana azad, yekbûn û sentezbûna xwezaya madî û xwezaya civakî, ji bo derbaskirina hemû qeyranên şaristaniya dewletî avakiriye, dibe ku bibe çareseriyeke demokratîk .

Dema ku dîroka xwezaya civakî ji nû ve were dest girtin û vekolandin, ji bo gihîştina heqîqetê û jiyana azad, dibe ku rê veke. Li vir qasî diyarkirinê kokdar yê teorîk, ser û bin bûyînên pratîk kokdar jî pêwist û hewce ne. Merov qasî ku bi kûrahî, bi tevayî û bi berfireh bigihije ferqa hêza hişmendî, xwezaya civakî bi terzê rexneyî bigre dest û şîrove bike, dikare pratîka jiyana azad pêş bixe. Ev haydarbûna civakî ye .

Nexwe hemû rêbazên din ji parzûna rexneyê derbaskirinê, bi sentezkirina xwezaya madî û xwezaya civakî weke "xwezaya sêyemîn" jiyaneke azad demokratîk dikarin biafirînin û bigihîjin heqîqetê.

## VI-LI ŞÛNA GOTINA DAWÎ, GOTIN:

Mîtosa Sûmeran piştî ku serdest bû, li dijî pergala raman ya Mezopotamya jorîn ya bi nêrîna jinê û terzê jiyanê şereke

bêeman destpêkir. Hemû afirînekên aîde jinê weke "afirînekên cadû-pîrebook" li mejiyan bi cih dike. Li ser vê bingehê hafizeyeke civakî ava dike. Xwedayê qurnaz yê Sûmeran Enkî û xwedawend Înanna, dastana naletkirina Agadeya ku xwedawenda Îştar weke mijar digre dest û mîtosên nakokî û pevçûnên di navbera xwedayê sereke yê Babil Mardûk û xwedawenda Tîamat de diqewime digre dest vê yekê ji her alî ve piştrast dikin. Şaristaniya Sûmera ya şaristaniya dewletî-çînî temsîl dike; hewl dide ku çanda neolîtîkê ya kevneşop, avayîya raman, zanista xwezayî ya xwe dispêre hişmendîya qebîleyan bê bandor bike. Weke heqîqeta yekane xwe li mejiyan bi cih dike .

Rêbaza dogmatîk ya olî, vî şerî hin bêtir kûr dike û belav dike. Piştî ku Xirîstiyanî derket holê û bi taybet piştî ku bû ola serdest ya Romê, " Doktrîna dêrê heqîqet e, her tiştê li derveyê vê dimîne weke yawetiyên pagan(pirrxwedaparêz)a " tê gotin. Li hember hemû olên din û mîtosê şereke bêeman dest pê dike .

Zanista Rojava ya bûye îqtîdar dema derdikeve holê heman rêbaza dişuxilîne. Hemû lêgerînên heqîqetê yên li derveyê wê dimînin, rê û rêbazên gihîştina agahiyan "xurafe, derveyê zanistê" îlan dike û bêbandor dike .

Halbûkî di civaka azad, xwezayî ya neolîtîkê de ji bo sihir, sternasî, mîtos hwd. baweriyên pir cûda, ol, doktrîn û saziyan re cih heye. Hêman cûdahî, piranîparêzî û çeşîdbûn, rêbaza bîngehîn yê bi dest xistina agahiyan e. Li şûna yek rêbaza gelek rêbaz hene .

Ema " têza serdestiya zanistê ji xwezaya wê tê, digihije derêzanistê û hema hema ji bo her kesî dibe tiştekeyekê îmanê."

Zanista Rojava weke ku tê îdîakirin ne serbixwe, ne bêalî ne jî qismî ye. Zanista Rojava parçeyeke bingehîn ji tevîneka demokratî, heq û azadiyên civakî ye. Bi dewlet, îqtîdar, zext, pere û çapemeniyê re di nav hev de ne. Van ji hevdu cûdakirin ne mimkin e. Sînor û çerçoveya demokratî, heq û azadiyan li gor berjewendiyên îqtîdarê tê diyarkirin. Zanist jî xizmeta vê dike .

Demekê dêr, parçeyek ji tevîneka bingehîn ya civakê bû. Bi îqtîdarê re di nav hev de bû. Her tişt li gor berjewendiyên dêrê dihat tanzîmkirin. Yekane "rastî û heqîqet" rastiya dêrê bû. Zanista Rojava li gor berjewendiyên pergala sermayedar dêr-ol û dewletê ji hev cûda kir û li xwe anî .

Zanista Rojava ne bêteref ne jî serbixwe ye. Ji ber ku yên îro bûne mijara zanistê; her cureyên çekan yê îqtîdarê xurt dike (ji bombeyên atomî heta çekên kimyewî-biyolojîk), pergalên kedxwarinê (Taylorîzm, Fordîzm, hevkarbûna qezencê hwd.) bernameyên perwerda bişavker(asîmîleker), girtîgeh, perwerdeya artêşan hwd her tişt e .

Nexwe serdestiya zanista Rojava ji bo demokratî, jiyana azad, lêgerîna heqîqet û azadiyê gefeke mezin e .

Wekheviya li ser navê zanist û demokratiyê pêşkêş dikin sexte û dirûye. Wekheviya li vir tê raberkirin, wekheviya ji destûr, hiqûq û mafên Rojava sûdwergirtinê yê. Halbûkî ya pêkan ne ji destûren Rojava sûdwergirtin e, wekheviya gelên cûda ye. Yanê, Gelên mîna Kurd, Tirk, Ereb, Ermen hwd. ji destûrên komara Tirkiyê(ev destûrên bişavtiner in) ne bi şikilekî wekhev sûdwergirtin, divê wekheviya hebûne ya bi nasnameyên xwe yê civakî be. Gelên çermsor û zencîyan di destûrên DYÊ de bi

merovên spî re bi şikilekî wekhev ji destûran sûdwergirtin ne wekhevî ye. Ya li vir girîng e, wekheviya nasnamên civakî ya nijadên spî, reşik û çermsora ye .

Zanista mêtinkar a Rojava li ser navê demokrasî, heqîqet û azadî yê ji gelên din re tenê wekheviya ji kevneşopî, çand û destûrên zilamên spî sudwergirtinê raber dike. Ev tê wateya ne wekheviya herî mezin. Ji ber ku destûr, kevneşop û çand li gor berjewendiyên zilanên spî teşe girtine. Zanista rojava jî amûrê bingehîn yê vê ne wekheviyê ye. Ya pêkan wekheviya kevneşop û nasnamên cûda ye .

Zanista mêtinkar a Rojava zanista kevneşopî û kevneşopên herêmî tune dihesibîne. Hemû kevneşop, çand û terzên jiyanê yên li derveyê wê dimînin bi sedema -bi zanistê re nakokin- weke deveyê zanistê û paşverû îlan dike. Ger çermsor "reqsa baranê" yê Rojhilatanavîn "diaya baranê" dike ev ne paşverûtiye, tekilîdare diyalektîka têkiliya bi xwezayê re ye .

Li vir li aliyekî zanist li aliyê din mîtos, ol û sihir heye. Divê ev hevdû ne red bikin di mercên wekhev û azad de bi serbestî di nav reqabet û pêşbirkê de bin. Ji kevneşopên din re wekhevî pejirandin, ger ji jiyana merov û civakê re têkar be dibe wekhevî .

Em dizanin ku li gor her bîrdoziyê tenê yek heqîqet heye. Yekane tiştê ku li ser civak û merovahiyê ferzkirine heqîqeta bîrdoziya wan bixwe ye. Ev şaş û çewt e .

Rastî bi tenê yek heqîqet heye, an heqîqeteke xweser ya her çand, kevneşopî û gelan heye؟

Dîrok bîra civakî ye. Mîtolojiya Sûmeran, dema cihê mîtosa devkî ya neolîtîkê girt bihuştek ne afirand. Dema ku ol cihê mîtolojiya Sûmeran girt, encax li dinya din bihuştek soz da. Halbûkî merovan li vê dinê cehnema serdema navîn jiyan kir. Dema zanist cihê ol girt, berde afirîna bihuştê, ji xeynî birçîbûn, xizanî, riswayî ji bo merovahiyê tu tişt ne da. Tenê tiştek guherî şûna pergalekê, pergala din girt. Cihê rêbazekê rêbaza din girt. Cihê bîrdoziyekê bîrdoziya din girt. Ema di navbera van pergalan de cudahiyeke çawanî tune ye. Hin kevneşopiyan weke "şaş, xirab, baş tesnîfkirin" kevneşopa serdest li ser wan ferzkirine .

Ji dema felsefeya sîstematîk ava bû heta niha fîlozofan, bênavber li ser xwezaya heqîqet û zanebûnê lekolandin. Ema fîlozofan di dîrokê de her tim ji zor û zehmetiyan re tehemûlkirin, bi bahaya jiyana xwe çima li heqîqetê digerin, çima ketine pey heqîqet û jiyana azad, pêwistiya îzahkirinê ne dîtine. Ev nakokiyeke mezine!

Xiristiyanî, hezkirinê li merovahiyê nesîhet kir. Ema bi hezaran merov şewitand, kuşt, seqet kir. Şoreşa Fransî aqil û dilpakî nesîhet kir ema, bi behra xwînê bidawî bû. DYÊ li ser mafê azadiyê û bidest xistina dilxweşiya her kesî hat avakirin. Ema koletî û kêmî xwe dîtin dîsa hebû. Dibe ku ji bo sedema vê serneketîbûnê, di rêbazên perwerdê yên ne çalak îsrar bikin. Ema rêbazên çalak bihatina şixulandin jî ev ne zanyarî ne jî merovî dibûn. Melekeya kuştinê ji holê rakin, merov wê azweriyê xwe wenda bikin. Melekeya derewkirinê ji holê rakin, heqîqeta wê demê, dibe ku sêwirandina berevajî dikeve jî tune bibe".

Di pergala sermayedar de li ser navê demokrasiyê weke hêmaneke gelemperî, şeklî be jî biryarên siyasî her tim bi yekîtiya dengan tên girtin. Encax li aliyê din merovên zanistê yên rastîn yên li dijî vê derdikevin bi hezar û yek hincetan û bi hîle tên bêdengkirin û bêbandor dibin. Halbûkî biryara demokratîk ya rast, zanista kevneşopî, lêgerîna heqîqet û azadiyê, "nêrînên pispor" yê zanista Rojava pêş dixe û gelek caran weke "yekane rastî" berpêş dike, dikare bêbandor bihêle .

"Zanist ne cihekî kû dijwariya zekaya xwezayî ya neslê merovan negihîjê ye. Ev dijwariya zeka, di hemû "mijarên girîng yên civakî" ku niha di bin yekdestiya pisporan de ne, şixulîna wê ji bo merovahîye mimkine ku encamên hin bi feyde derbixe. Zanist bi tenê yek ji rêkên digihîne heqîqetê ye. Feqet ne rêka yekane ya gihîştina heqîqet û bidestxistina zanebûnê ye .

Em dikarin bêjin ku di çaxa me de zanyarên demokrat, pêşverû û şoreşger, merovên zansitê -mîna ku keşe li hember xwedê serî ditewîne- li hember zanista Rojava serî ditewîne. Hin kesayetên istîsna jî tên bêbandorkirin .

Nexwe di lêgerîna heqîqet û azadiyê de, ji hemû van rêbazên bi derxistina dersên rast, rêbazên nû yên van derbas dikin ji bo gihîştina heqîqetê û zanebûnê divê lê were gerîn. Ji xeynî rêbaza zanistî ya di serdema me de Rojava weke yekane vebijark derxistiye pêşiya merovahiyê pîr "hatiye pênasekirin û mayinde ye", divê rêbazên nû werin pêşxistin .

Zerdeşt dibêje ku destpêkê ronahiya bêdawî hebû. Li kêleka ronahiya bêdawî, tarîtiya bêdawî hebû. Herdu jî di nav xewa kûr de bûn. Destpêkê wê ronahî şiyar bibûna. Ruyê erdê wê bi

roniyên birqok ronahî bibûna. Encax tarîtî serî li hîle û dek û dolaban da. Hin zûtir şiyar bû û bi dizî ket nav ronahiya xwerû. Ha ji wê rojê ve heta îro şerê ronahî û tarîtiyê didome .

Ev mîtosa afirîşa felsefeya Zerdeşt e. Di bingeha afirîşê de hîleya hêzên tarî, dirûtî û dek û dolabên wan hene .

Piştî wê halê kaosî ya heta îro didome ye. Ev pêvajoya hîle dek û dolaban li ser nakokî û pevçûna sazbûye. Ev asta tekoşîna civakî ya di lêgerîna heqîqet û azadiyê de diyar dike .

Ronahî; qencî, xweşikbûn, edalet, heqîqet, wekhevî û dirustiyê temsîl dikê. Ev rastiya civaka çemê bingehin e. Merov bi heqîqetê re di nav lihevkirinê de ye. Neheqî, newekhevî, bêedaletiyeke xwe dispêre kedxwariyê tune ye. Ev, di jiyana merovde pêvajoya herî dirêj û diyarker e, ji bo dîroka merovhiyê jî şaristaniya demokratîk û azadîxwaz e .

Taritî jî; derew, hîle, dirûtî, kedxwarî, zext, koletî û şerî bixwîn temsîl dike. Ev şaristaniya dewletî-çîni ya pênc hezar sal ya ku rahibên Sûmeran di Zîggûratan de avakirine ye.

Taritî zû şiyar bû. Bi hîle ket nav ronahiyê. Ronahiya xwerû xira bû. Merov, heqîqet û azadiya xwe wenda kir. Merovahi, ji wê rojê ve li heqîqet û azadiya ku wenda kiriye digere. Lêgerîn ji pênc hezar salan ve bênavber didome. Dîroka şaristaniya dewletî, şerê di navbera du gewdeyên ronahî (şaristaniya demokratîk) û tarîtî (şaristaniya çînî) de ye .

Di dîroka şaristaniya dewletî de, di lêgerîna heqîqetê de rêbazên hatine şixulandin bi zanebûn an bê zanebûn ji aliyê encamên derxistine holê ve ji serdestan re xizmet kiriye. Rêbaz li gor berjewendiyên wan hatine şêwandin. Hafizeya civakî û

hişmendiya dîrokê li ser ev rêbaza çelexwarî, bi hîle û tarî hatiye hûnandin. Ji bo domandina vê qalib û dogmayên hişk hatine avakirin. Ev qalibên zîhniyet ji aliyê encamên xwe ve kêrî şaristaniya dewletî- çînî hatiye.

Yên hatine wêederkirin, di lêgerîna heqîqet û azadiyê de rêbazeke aîdê xwe pêş ne xistine. Rêbazên afireka dijberî xwe şixulandine. Dewleta kû weke çavkaniya hemû xirabî, kedxwarî û zextê dibînin hilweşandine, li şûna wê bi heman zîhniyet û amûran ve dewleteke nû ava kirine. Ev dewleta nû ku li ser navê azadî, wekhevî, demokratî avakirine, hin gelek dem derbas nebûye ya din bi bîr aniye. Ev jî di encamê de ji xeynî şibîna dijminê xwe, wan ne gihandiye cihekî .

Yên hatine wêderkirin, kedkar, gelên stembar, bi berdêl û fedekariyên mezin têkoşînên pirr mezin, bêhempa dane, rixmê wê heman encam derketiye holê. Pergala kedxwariyê ya tarî, xirab ya ku dijberî wê ne bi vîn, bawerî û şerekî mezin hilweşandine. Encax pergala ku li ser navê "xweşikbûn, dirustbûn, azadî û wekhevî" afirandin bûye dubarekirina pergala berê, heta hin dema bûye karîkatoreka wê ya xirab .

Li dijî newekhevîyê û koletiyê têkoşîn dane, feqet gelek caran pergaleke ji ya berê hin hişktir ya kedxwarî, newekhevî û koletiyê afirandine. Ji xeynî vê negihîştine encamekê .

Sedema bingehîn ya vê yekê rêbaza şixulandine ye. Rêbazekî civakî ku yê berê derbas dike, azadiyê pêş dixe û aîdê wan e, ne afirandine. Weke ku di nav pirtûkê de bi berfirehî em li ser sekinîn rêbaza mîtolojîk bi xwezayê re hin bêtir lihevkirî bû. Her tişt zindî û livdar bû. Ji pêşketinê re vekirîbû. Lêgerîna heqîqetê

di nav xwezayê bi xwe de dihat gerîn. Mîtosa serdema neolîtîkê tekabulê hêzên xwezayî-bireserî dikir. Aliyekê van bireseran bi jiyanê re têkilîdar bû, aliyê din jî dinyaya bi rihan tijîye bû. Di wateya teng de, bi zimanê xwezayê ji bo lêgerîna heqîqetê bi kêr dihat. Rêbaza mîtolojîk ji her alî ve înkarkirin, ji çîrokekê pêkhatî ferzkirin şaşitî û jirêderketine.

Bi rahibên Sûmer yê mêtinkar ve di rêbaz de jî guherîneke çawanî pêk hat. Dema Zîggûratên ku weke kok hucreya şaristaniya dewletî tê qebûlkirin, werin lêkolan ev derdikeve holê. rahibên Zîggûratan li gor avayiya civakî ya nû pêkhatiye, bîrdozî-ramaneke nû afirandin. Mîtosên devkî kevin yên xwe dispêrin xwezayê, adet û nêrîtan girtin û veguherandin fikrekî sîstematîk, niviskî. Bi nivîsa yekemîn re, yekemîn mîtolojiya nivîskî weke bîrdoziyeke serdest teşe girt. Mîtosên bi xwezayê re lihevhatî yê civatên neolîtîkê di asta olekê de ji nû ve şêwandin .

Enkiyê qurnaz "M" yên Înannayê dizî. Mîtosên devkî yê neolîtîkê yên azadîxwaz, azadiya zayendên civakî û xwe dispêre pergala xwedawenda berevajî kirin û veguherandin pergala xwedayan. "Îlahiyateke (xwedanasî)  xwe dispêre vê pêş xistin. Em bêjin ku ev xwedanasî bîrdozî û teoriya civak û dewleta şaristaniye, xelet nabe. Ev hêza bîrdozî, di avakirina dewlet û şaristaniya dewletî de xwedî cihekî gelek girîng e. Di şertên madî de xwedî diyarkirineke di asta wekhev de ye. Ev hêz û kartêkeriya xwedanasî neyê dîtin, dahûrandineke rast ya dewlet û şaristaniya dewletî-çînî nayê kirin. Kok hucreya wê baş nayê

zelalkirin. Di derketina holê ya dewletê de qasî derfetên madî, ev hêza bîrdozî jî pêkereke bingehîn e .

Xwedanasiya rahibên Sûmeran li Zîggûratan afirandiye di dîrokê de yekemî bîrdozî rêbaz heta zanista tekoşîna çîna ye. Di têkoşîna çîna de yekemîn qalibê zihiyetê serdest yê li gor berjewendiyên serdest şêwe girtiye ev e. Weke bîrdozî yekemîn dijêrîşa mezin e. Hedefa yekemîn ya vê êrîşê jin e. Ji ber vê di dîrokê de ya yekemîn hatiye xistin û kolekirin jin e .

Kolekirina jinê kok hucreya hemû kolekirina ye. Heta ev koletî neyê zelalkirin koletiyên din zelal nabin. Di mîtolojiya Sûmer de bi taybet di têkiliyên Înanna- Enkî, Mardûk-Tîamat de ev weke gelekî kartêker derdikeve holê .

"Di mîtolojiyan de rola xwedawenda, çaxa berê ya kû jin hin bêtir azadbûn hin bêtir xwedî rewşeke birêz bûn tesewir dike." (F. Engels)

Ev qalibê zîhniyetê çavkaniya bingehîn a hemû rêbazên e. Hemû rêbazên din li ser ve qalibê bi kûrbûnê şêwe girtine. Wê hin bêtir derbaskirine hin bêtir xurtkirine, belevkirine û pêş xistine. Şêweyên wê yên aliyên qeba hatine ziravkirin, kûrkirin e. Her sê olên semawî û rêbaza zanistê, li ser ev qalibên ku rahibê Sûmer avakiriye, pêş ketine. Ji ber vê yekê jî hemû xizmeta çîna serdest kirine .

Yên li ser navê azadî û wekheviyê derketine rê û van rêbazên dişuxilînin jî negihîştine encameke cûda. Ji ber ku ev rêbaz zanista tekoşîna çînên Sûmeran bû. Pergala kedxwarî, koletî, serdest-bindest, dewlet, hiyerarşî li ser vê hilkişiya .

Nexwe heta ku bîrdoziya xwe dispêre xwedanasiya rahibên Sûmeran avakiriye neyê zelalkirin, em nikarin têqînên çîn, ol, dewlet û rastiya civakên koledar-feodal-kapîtalîst jî baş ravebikin .

Ji Sûmeran heta niha dema ku dîroka civakê tê lekolan ji tevayî ev xala hevbeş derdikeve; Ji Sûmeran heta sermayedariyê di hemû zîhniyeta civakên dewletî-çînî de bandora olê ya diyarker heye. Li ser hemûya îmze û mohra xwedanasiyê ya jê naçe heye.

Heta vê mohr û îmzeyê rast tehlîl nekin, bi giştî zelan nekin, rastiya li bin vê îmzeyê veşartî dernexin ronahiyê, civaka demokratîk, wekhevîparêz, azadîxwaz nayê pêşxistin. Dîrok bi mînakên vê re tije ye. Li Fransayê tevgera civakî a herî mezin ya ku "çip taziyan" bi dirûşma "wekhevî, azadî, biratî" destpê kiribûn, çima negihîşt serfîraziyê. Di demeke pirr kurt de veguherî dijberê xwe. Şoreşa Sowyetê ya ku girseyên kedkaran bi diruşma "an sosyalîzm an mirin", bi berdêlên giran, bi utopyayeke mezin gihand serkeftinê, di nav 70 sala de çima veguherî sermayedariya burokratîk ؟

Sedema van hemûyan ne derbaskirina van qalibên zîhniyetê ye. Xala herî qels ya Şoreşa Bolşevîk a ku hemû cîhan lerizand; şoreş di asta bîrdozî de kûr nekirin, exlaqê sosyalîst, nirxên manewî, moral jiyanî nekirin û şoreşa zîhniyet pêk ne anîn bû .

Qalibên zîhniyet û dewletê yên ku rahibên Sûmeran avakirine, bê ku biguherînin girtin nav xwe. Li şûna dewleta çarîtî ya bi sedemên "ev xirabe, kedxware, çewsînere, dîktaror e" hilweşandin, bi navê "dîktatoriya proleterya" cenawirekî ku wî bibîr naîne heta wî derbas dike, bi qalibên (burokrasî, artêş,

polîs, zîhniyet) afirandin. Bi vî awayî kedkar û karkeran dijberî xwe afirandin .

Dewleteke qelsbûyî hilweşandin li şûna wê ya hîn xurttir ava kirin. Ji vî alî ve encam ne guherî. Ji ber ku dewlet û zîhniyeta ku dewlet xwe dispêrê baş ne dahurandibûn .

Zihniyeta sosyalîzma pêkhatê li ser meteryalîzma qeba şêwe girtibû. Nirxên manewê-moral di asta talê de diman. Eşkereye ku tenê bi dahûrandina "sermiyan-pere-meta" ji dahûrandina rastiya dêrokê civakê a sermayedariyê dûr e. Dahûrandineke tenê bi aborê, qalibên nû yên dogmayê olê bibêr naênin afirandiye. Li ser navê meteryalêzma diyalektêk û dêrokê ketine nav êdealêzma objektêfê .

Rixmê ku roja êro jê teknêk, danûstan û zanebûn di asta dêwasa de pêşketiye jê,  bi giştê bêrdozê bi taybet jê şêweyên êlahiyatê ewqas xurt, bibandor, kaşker, bandorker be, sedema wê ev e .

Ji ber ku bêdozê hêza herê xurt e. Fetihkirina mejiyan, guherên û veguherêna civakê bi bêrdoziyan ve pêk tê. Yên kû bêrdoziya wan tune ye pêşeroja wan jê tune ye. Dema dêroka olan tê vekolan, wê were dêtin ku; bêrdoziya olê civakan heta atomên xwe  bandor kiriye, xistiye bin kontrolê, di nav qalibên hişk de heps kiriye.

Eşkereye ku hêza bêrdozî (hêza xwedanasê-êlahiyat) qasê şert û sedemên madê xurt û diyarker e .

Hemû pergalên civakên dewletê, xwe spartine qalibên zihnî yên rahibên Sûmeran afirandiye û heman rêbaz şixulandine. Hemû pergal xwe bi felsefeya naguher "ebed-mubed" danên

holê. Xwe bi vi awayê şewandine. Rêbaz her eynê û naguher dimêne. Encama gihiştine jê her eynê bûye .

Li vir tiştê girêng, dema li ser navê azadiyê derkevin rê, ev qalib û zihniyeta parçekirin, pirsgirêka rêbaza alternatêf çareserkirin e .

Ev derdikeve holê, di dêrokê de pergalên damezrandê her tim, rêbazên digihêne heman encamê şixulandine. Hemû li rêkên berê hatine diyarkirin meşiyane. Ji ber vê jê encam neguheriye. Pergala berê li ser navê "koletê-xirabê-zext-bêedaletê" çiqas were rexnekirin jê encam naguhere. Ji ber rêbaza tê şixulandin weke xwe dimêne. Hemû têkoşênên civakê yên li ser navê azadê, wekhevê, sosyalêzm û demokratiyê hatine pêşxistin, xwe spartin rêbazên dijberê xwe û hatin pêşxistin. Mênaka vê ya herê şênber pratêka sosyalêzma pêkhatiye. Encama gihêştinê ji xeynê karêkatoreke sermayedariyê negihêşt cihekê. Rastiya rê li ber vê vekiriye têkilidarê rêbaz e .

Yên hatine wêderkirin di dêrokê de her tim ji bo azadiyê lêgerên destpêkirin. Şereke dijwar meşandin. Berdêlên giran dan. Rixmê vê lêgerêna heqêqetê encam ne da. Çima? Ji ber ku heman rêbazên serdest dişuxilênin, bikaranên. Li vir her çiqas armanc cûda be jê, dema heman rêbaz be encama digihêjin jê naguhere .

Dema bal bikşênin ser dêroka pênc hezar sal ya şaristaniya dewletê, derdikeve holê ku di lêgerêna azadiyê de rêbaz û vebijareke nû pêwist û mecbûrê ye. Ji xeynê rêbaza heta êro hatine şixulandin, vebijareke cûda pêwiste. Gelek caran hatiye izbatkirin ku rêbazên berê hatine şixulandin heman encamê

derdixin holê. Heman rêba terzê jiyana wekhev ya kolekirinê diafirênin. Nexwe, di lêgerîna heqîqet û azadiyê de çareseriyê li derveyê van vebijarka gerîn hewce dike. Lewre li bingeha hemû pirsgirêkên tên jiyîn, ev rêbazên şaş, çewt heye. Sedema îflasa modernîteya sermayedar ya gihiştiye sînorê nedomanê jî dîsa ev rêbaz in .

Nexwe lêgerîna heqîqetê û çareseriya demokratîk divê li derveyê ev rejîmên heqiqietê yên îflas kirine, li derveyê terzê jiyana kolekirinê lê were gerîn. Di van rêbaz û terzên jiyanê de di qalibên "objektîf-subjektîf, îdealist-materyalîst, diyalektîk-metafizîk, felsefî-zanistî, mîtolojîk-olî" de îsrarkirin, tê wateya di koletiyê de îsrarkirinê .

Ev rêbaz di dîrokê de her tim îqtîdara serdestan xurt kiriye, koletiyê kûr kiriye. Di vê de îsrarkirin di koletiyê de îsrarkirine. Weke ku dîroka bi hezar salan ya şaristaniya dewletî jî derxistiye holê, encama ku ev rêbaz bigihînê koletî û pergala kedxwariyê ye .

Tiştê ku vê pergalê li ser linga dihêle xwîn e. Pergaleke li ser xwîn-şer-ferman rakirin-koletîyê hatiye avakirin. Di pergala sermayedarî de xwîn rijandin belavbûye, kûr bûye û derketiye asta herî jor. Di dîroka şaristaniya dewletî de bilindbûn û daketina hemû îqtidaran bi çemên xwînê hatiye diyarkirin .

Ji bo lêgerîna heqîqet û azadiyê bigihîje encamên mayînde, pêwiste destpêkê rêbaz biguhere .

Lêgerîna nû û çareserî divê li komunalitê were gerîn. Rih û kok hucreya jiyaneke azad, wekhev û demokratîk, pergala nirxên komunal ya xwe dispêre parvekirinê, pişteviyê ye. Di rihê

komunalîteya parveker-piştevan de îsrarkirin di azadbûn û demokratbûnê de îsrar e .

Di vê pergala hawirnas de; baran rihê axê, dil û bereketa wê ye. Ev têkilîdarê qirêjkirin û qetilkirina xwezayê ye. Xwezaya tê qirêjkirin û xeritandin, bereketa xwe dixeritîne û merovahiyê tîne ber qedandinê. Mîna di civaka xwezayî de pêkhatiye, paratina xwezayê û di asta dayikê de pîrozkirin, di lêgerîna heqîqetê de wê bibe gavê yekemîn .

Ked û xwêdan tevayî ye. Weke dîrokî civakî afirîn, berhema keda merov ya paldayî xwezayê ye. Tenê di mîhwera kole, kedkar, serf de pîrozkirina kedê, di bingeha hemû pêşveçûna şaristanyiyê de, diwateya teng de bi cih kirin û pîrozkirina "kedê" ji rê derxistin e. Dînamoyê dîrokê û pêşveçûna dîrokê spartina yên tên wêderkirin nêzîkayiyeke hîn raveker e. Pîrozkirina zêde rê li ber tabû, tengbûn û bawerhişkiyê vedike .

Rondik, êşa dil e. Rondik barandin têkilîdarê êş, kêfxweşî, xem û hêrsa merov e. Ji bo têkoşîna jiyaneke hin baş, hin azad û hin xweşik, şkence û zehmetiyên merovan jiyîne îfade dikin. Ji aliyê civakî ve rawestina rondikên dil, di lêgerîna heqîqet û azadiyê de bi gihîştina encamên şênber ve pêkane .

Ev jî bi afirandina civaka demokratîk , ekolojîk, wekhevîparêziya zayend, merov ji gurbûna merov derbikeve , û merov bibe rêhavalê rast yê merov encax wê gengaz bibe .

Nexwe kedkar, yên hatine wêderkirin, hêzên ne ketine rêgeha civaka dewletî, di lêgerîna heqîqet û azadiyê de, ji xeynî van rêbazên hatine ceribandin û bêencam mane, mecbûrin rêbazeke nû ya ku merov bigihîne azadiyê, bi evîneke mezin, bi bawerî,

vîn û têrbûna raman biafirînin. Jiyana azad encax û encax tenê bi tenê bi rêbaza rast tê afirandin .

**Berhemên nivîskar**

-Evîna ku di parzûna Amedê de derbas bûye (Helbest)
-Welatê di Berbangê de mezin bûye (Helbest)
-Di bergeha hawîrnasî (ekolojî) de li dîrokê nêrîn (Lêkolîn)
-Xeyalên Sara (ceribandin-rojnivîsk)
-Şaristaniya Xerabreşk (lêkolîn-lêhûrbûn)
-Heqîqet û Azadî (lêkolîn-lêhûrbûn)

# NAVEROK


| | |
|---|---|
| -PÊŞGOTİN | 5 |
| -DİYALEKTÎKA HEQÎQET AZADÎ Û RÊBAZ/ DESTPÊK | 26 |
| -Rêbaz çiye? | 30 |
| -Bi Rêbaza Rast Çawa bigihêjin encama rast? | 33 |
| II-HEQÎQET YEKPAREYE | 43 |

| | |
|---|---|
| 1-Heqîqet Çiye ؟ | 43 |
| 2-Di Derbarê Heqîqetê de çend pênase | 48 |
| a) Di Zerdeşt de "mala Heqîqet û edaletê | 48 |
| b) "Heqîqet perçe nabe" | 4 |
| c) "Ji xeteyan derbasbûna heqîqetê çênabe" | 49 |
| d) "Pirsgirêk ji pevçûna du xeteyan derdikevin" | 50 |
| e) "Jiyana şaş rast nayê jiyîn" | 50 |
| f) Heqîqet û Fîlozofên Hindî | 52 |
| g) Rejima Heqîqetê | 53 |
| h) Xwedawenda çiya Nînhursaq | 54 |
| III-DIYALEKTÎKA HEQÎQETÊ | 57 |
| 1-Baxçê gula baxçevan û rêwî | 61 |
| 2-Agir û Pepûleyan | 63 |
| IV-HEQÎQET Û MEROV | 65 |
| 1-Lêgerîna merov ya Heqîqet û azadiyê | 65 |
| a) Laneta Agade yê | 68 |
| b) jiyane ku milekê wê Nemrûd milê din Îbrahîm e | 71 |
| c) prometeusê zincîrkirî | 75 |
| d) Mûsa , Lêgerînvanê Heqîqetê yê serdemên kaosî: | 78 |
| e) Îsa yê li Golgota yê çarmix kirî: | 79 |
| f) Baxçeyên Manî yên bi ronahî | 86 |
| g) Hz. Mihemedê li dijî Ebû Cehil Serî hildaye | 94 |
| h) Tevgera çîp taziyan | 100 |
| j) Şoreşa mezin ya Sovyetê | 100 |
| 2-Yên nêzî heqîqetê bûn bi xezeba pergalê ve çûn | 102 |
| 3-zîhniyeta Merova û lêgerîna heqîqetê | 108 |
| 4-Lêgerîna heqîqetê encameke civakbûnêye | 112 |
| 5-cewhera wendakirî heqîqeta wendakirî ye | 115 |

| | |
|---|---|
| 6-Dilxwaziya Azadîxwaz a xwezayê | 116 |
| 7-Li gor Mitolojî yekemîn çalakiya azadiyê | 118 |
| 8-Ji nû ve pênasekirina azadiyê | 121 |
| V-DI LÊGERÎNA HEQÎQETÊ DE RÊBAZÊN TÊN ŞIXULAND | 130 |
| A-RÊBAZA MÎTOLOJÎ | 132 |
| RÊBAZA DOGMATÎK YA OLÎ | 146 |
| Destpêk | 146 |
| 1- bergeha di derbarê afirandinê de | 147 |
| 2-Di derbarê rêbaza dogmatîk ya olî de hin destnîşanî | 147 |
| 3- Di Civaka xwezayî de xweza û bawerî di nav ahengê de bû | 153 |
| 4-Fikrê mêjve û bêdawîtî bi merova re destpê kir | 155 |
| 5-Têgîna li ser tirs û guman şekil digre | 155 |
| 6-çavkaniyên bingehîn yê afirînê | 158 |
| 7-Ol tê çi wateyê? | 160 |
| 8-Hebûna Heqîqet û RastiyaGumankerî | 162 |
| 9-merov pîvanê her tiştî ye | 163 |
| 10 -Difikirim nexwe ez heme | 163 |
| 11-Şaristaniyeke ku sirrê wê zelal nebûye: Pîramîd | 164 |
| 12 -Sirrê Hermesê Terzî û lêgerîna wî ya Heqîqetê/ | 167 |
| a)" Merov xwedayên bi mirin, xweda merovên bê mirin e | 168 |
| b) Teoriya Hermesê Terzî ya "Heqîqeta teqez" a bi şewqa ezmanî | 169 |
| c) Di derbarê gihêştina Heqîqetê de ezmûna pratîkî ya Terzî Hermes | 174 |
| 13 - /Yehovayê di nav Eloah'a de | 179 |
| 14 -Felsefe û Exlaqê Zerdeşt | 184 |

| | |
|---|---|
| a) diyalektîka Ronahî û tarîtiyê | 185 |
| b) Felsefeya Zerdeşt û Azadbûna Merov | 191 |
| c) Rexneyek û Şîroveyek | 193 |
| 15-Di Îslamiyetê de Lêgerîna Heqîqetê û Gazalî | 195 |
| 16-Rêbaza Olî û Lêgerîna Heqîqetê | 209 |
| Weke encamp | 215 |
| C) RÊBAZA METAFÎZÎK | 217 |
| 1-Metafîzîk çi ye? | 218 |
| 2- Li ser Îdealîzm | 219 |
| 3-Di şirovekirina Gerdûnê de Rêbaza Metafîzîk | 222 |
| d-RÊBAZA ZANISTÎ | 234 |
| 1-Destpêk/Rêbaza zanistî çiye? | 236 |
| 2-Avakerê Rêbaza zanistî | 236 |
| 3-Dogmatîzma Rêbaza Zanista Mêtinger ya Rojava | 238 |
| 4- Di Lêgerîna Heqîqet de Gumankerî | 240 |
| 5- Rêbaz Kartezyen | 244 |
| 6- Rêbaza Felsefeya ji Exlaq qut bûye | 251 |
| 7- Feraseta Rêbaza Zanistî | 256 |
| 8-Sermayedarî dijxweza û dijcivakî | 258 |
| 9-Feraseta bi mihwera azadiyê divê Çawa be? | 265 |
| 10-Şoreşa Neolîtîk, Zanista kevneşopî û Diyalektîka Zanista Mêtinkar a –Rojava | 270 |
| 11-Zanista Rojava ya Mêtinkar Bi Şaşbûnê barkiriye. | 278 |
| a) Zanista Rojhilat ya Xwezayî, kevneşopî | 278 |
| b) Bingeha koka Zanista Mêtinkar ya Rojava, Zanista Xwezayî ya Rojhilate | 279 |
| c) Zanista Rojava ya Mêtinkar xwe dispêre Aqilê Nêr | 280 |

| | |
|---|---|
| d) Serkeftina Zanista Metinkar ya Rojava xwe dispêre Silte yê | 281 |
| f) Zanista Metinkar ya Rojava yekperest e | 282 |
| e)Zanista Mêtinkar ya Rojava li dijî Civakê ye | 283 |
| g) Zanista Mêtinkar ya Rojava Bê Exlaq e | 283 |
| h) Zanista Mêtinkar ya Rojava xwe dispêre Yekdestbûnê | 284 |
| j) Zanista Mêtinkar ya Rojava Dişibe eşqiya Prokrûstes | 284 |
| k) Zanista Mêtinkar rêzikperest û dijdemokratîk e | 285 |
| Weke encam | 286 |
| E) RÊBAZA METERYALÎZMA DIYALEKTÎK | 294 |
| F) RÊBAZA CIVAKA AZAD/ Destpêk | 317 |
| 1- Rêbazên hatine ceribandin Şîfreya Jiyanê ji hev dernexistine | 324 |
| 2- Şîfreya Jiyana Azad Merov bixwe ye | 325 |
| 3 -Merov çawa bû Merov | 330 |
| 4- Merov Li ser rûyê erdê Çawa belavbûne? | 337 |
| 5- Merov komîneke Giştî ya Berrahiyên Civakî ne | 341 |
| a) Merov rih û bingeha Agahiyane | 341 |
| b) Merov bi giştî saziyên jiyanê yên Biyolojîk temsîl dike | 342 |
| c) Merov afirînerê Jiyana Civakî ya herî pêşketî ye | 343 |
| d) Merov xwedî zîhniyeta herî nerm-bi tevger-Azad e | 344 |
| e) Merov xwedî taybetmendiyên Metafizîk e | 345 |
| VI- LI ŞÛNA GOTINÊN DAWÎ | 348 |